# *TEZÊN AZADIYÊ -I*
# *ABDULLAH ÖCALAN*

*Weşanên AkademiyaJineolojiyê*

**Cihê Çapkirinê: Çapxaneya Roj**
**Dîroka Çapkirinê: Kanun 2017**

## *PÊŞGOTIN*

Ji bo jiyaneke rast, a bingeh ew e, divê mirov beriya her tiştî jinê terîf bike û rola wê ya di nava jiyana civakî de diyar bike. Em vî hukmê xwe ji bo taybetiyên biyolojîk û statuya civakî ya jinê nadin. Têgîna jinê weke hebûn girîng e. Mirov çiqasî jinê terîf bike, terîfkirina mêr jî ewqasî pêkan dibe. Em bi mêr nikarin dest pê bikin, jiyan û jinê rast terîf bikin. Hebûna xwezayî ya jinê di statuyeke navendîtir de ye. Ji aliyê biyolojîk ve jî ev wisa ye. Civaka serwer a mêr, statuya jinê têra xwe biçûk xistiye û tune hesibandiye, lê ev, ji bo serwextbûna me ya li rastiya jinê divê nebe asteng. Xwezaya jiyanê zêdetir bi jinê re têkildar e. Her çiqasî jin gelekî ji jiyana civakî hatibe dûrkirin jî dîsa ev rastî bi vî rengî ye û nabe şaşî, berevajî piştrast dike. Ya rastî, mêr bi hêza xwe ya zordar û tuneker di şexsê jinê de êrîşî jiyanê dike. Tunekerî û dijminatiya jiyanê ya mêr weke serwerê civakî têkiliya xwe ji nêz ve bi rastiya wî ya civakî re heye.

Em dema vî hukmê xwe gerdûnî bikin, em dikarin dualîteya enerjî-madeyê ji xwe re bikin bingeh. Enerjî li gorî madeyê bêhtir bingeh e. Made bi xwe

enerjiya pêkhatî ye. Made şêweyê bi formbûyî yê hebûn û veşartina enerjiyê ye. Made bi vê xisleta xwe enerjiyê dixe qefesê û herikîna wê dicemidîne. Her forma madeyê para xwe ya enerjiyê cuda ye. Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên madî diyar dike. Enerjiya di form û madeya jinê de ji enerjiya di madeya mêr de cuda ye. Enerjiya jin hildigire hem zêde ye, hem jî xisleta enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên madî bi gewde dibe. Şêwe di tevahiya gerdûnê de weke enerjiya cemidî muhafezekar in. Di civakê de serwerbûna mêr, şêweyê bûyîna desthilatdariyê ye. Di vê rewşê de enerjiya hildigire bi giranî bûye xwedî form. Enerjiya venaguhere formê gelekî kêm e û li cem kêm kesayetan pêk tê. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne. Di form û qefesa mêr de neyê girtin wê weke enerjiya jiyanê herikîna xwe dewam bike. Jêhatîbûna manedanê, helbestwarîtî û xweşiktiya jinê ya nehatiye cemidandin û hişk-kirin, bi vê rewşa enerjiyê ya giraniya xwe heye, ji nêz ve têkildar e. Ji bo serwextbûna li vê rastiyê divê mirov hûrûkûr li jiyana zindî û ruhberan serwext bibe. Em kengî bi vê perspketîfa felsefîk berê xwe bidin rastiya jinê, em ê bigihîjin wê encamê ku divê têkiliya jiyana manedar bi aliyên jinê yên xweşik, rast û baş bêne pêşxistin.

***Abdulah Öcalan***

## BEŞA YEKEMÎN

## CIVAKA NEOLÎTÎK DI ZÎHN, DEST Û DILÊ DAYIKÊ DE HAT AVAKIRIN

Zanabûna mirov a bingehîn di kûraniyên neolîtîkê de veşarî ye û ji wê derê derketiye û bi pêş ketiye. Dîsa hêzeke din a girîng ku çandê afirandiye,; derketinên û sazîbûna pêxemberan ên bilind in. Ew rêya ku diçe felsefeya Grek di vir re, di ser şopa kevneşopiya Zerduşt re derbas bûye. Ev jî ji zanabûna herêmê çavkaniya xwe digire. Herêma herî bingehîn a zayîna çanda dayik û xwedawendê ye. Xwedawenda Hûrî Hepat, piştre di pirtûkên pîroz ên olê de weke dayika destpêkê bûye Hewa û derketiye. Li gel Hîtîtiyan Kûpapa, li gel Frîgan Kîbele, li gel Ereban bûye Kibele û li Kabeyê bi cî bûye. Di koka hemûyan de jina ku neolîtîkê afirandiye û xwedabûna wê, kevneşopiya Stêrk a li asîmanan bi stêrkan temsîl dibe heye. Li gel Sumeran Înanna-Îştar, li gel Misiriyan Îsîs, li gel Yewnanan Afrodît, li gel Romayiyan Venus, di Xiristiyaniyê de jî bûye Meyrem. Hemû xwedawendên mezin ên tên zanîn; Îştar, Înanna, Îsîs, Demeter, Kîbele û Îndîa ji vê demê ve mane.

Ji ber ku hêza sereke ya dema çandinî û sewalkariyê ye, wê şêwazekî jinane dexmeya xwe li pêşketina fikir û ziman bide. Hê jî di gelek zimanan de

ev pêvekên (qertafên) pêş û paş ên mê tên bikaranîn. Ji ber ku kedîkirina heywanan û xwedîkirina nebatan bi giranî bi fikir û kirinên jinê ve girêdayî ne, wê bibe sedem ku girîngî bidin xwedawenda dayik a ku hemûyan afirandiye. Weke xwedawenda serwer jin, gelek bi berfirehî girîngiyê girtiye. Ev rewş ji wan pêykerên jinê yên hema bêje li her cihê cîwarbûnê yên neolîtîkê hene bi zelalî tê fêmkirin. Ya ku dişibe wan axên bi ber û bereket, a ku dizê xwedawenda dayik e. Jin, pîroziyeke mezin bi dest dixe, ola totem a kevn dadixîne plana duyem, çanda xwe serwer dike; nirxên asîmanî yên Roj, Heyv û Stêrk ji bo wê tên gotin. Di zimanê Aryen de "Stark" hem di maneya xweda, hem mezinahiya pîroz hem jî stêrk de ye. Têgînbûna Star bi serê xwe jî ji bo nasandina rastiya olê ya vê demê aşkerayiyek tîne.

Di şêwazê fikirandina dema neolîtîkê de, hêmana mê, li gor rêza girîngiya ji bo civakê pêwîst e, avahiyeke fikrê ya xweda-mirov hemû heyînên girîng tên xwedayikirin hakim e. Di her astê de, avahiyeke fikir û baweriyê ya xwe spartiye xwedawenda dayik bi pêş dikeve. Cara yekê ye ku li Xeleka bi Bereket, di bin navê xwedawend Stêrk an jî Sterk de xwedawenda dayik bilindî asîmanan dikin, nemir dikin. Têgînkirina Star bi serê xwe jî ji bo nasandina rastiya ola vê demê zelaliyek tîne.

Ji heywnan ga, çêlek, bizin û beraz ji ber ku girîng dibin, di xwedayikirinê de tim fîgurên wan tên bikaranîn. Li cihê ku xwedawend lê bin ew jî hene, hevparên wan in. Ga, weke Apîs yek ji xwedayên herî girîng ên Misiriyan e. Horûs, bizin, dîsa heyînên pîroz in. Li Hindistanê çêlek hê jî pîroz e, dest nadinê.

Hêza maneyê ya di olên berê de hîn berbelav e, îcar ji bo hejmareke hîn kêm lê girîngiya wan sereke ye tê dayîn. Totemên hejmara wan gelek in dadixînin xwedayên hejmara wan heta bibêjî hatine sînorkirin, hebûna herî mezin jî sembola hêza zayînê dayika xwedawend e. Li herêman navên xwedawendan jî derdikevin holê. Tek peykerekî mêr jî nayê dîtin. Di hembêza xwedawenda dayik de mêr, hîn zêdetir di asta kur-hevser de mane dibîne. Di mîtolojiyê de weke du kesên pevre Îştar-Dumuzî, Îsîs-Osîrîs, Afrodît-Adonîs, Kîbele-Attîs çanda dayika xwedawend a çavkaniya xwe ji serdema neolîtîkê digire temsîl dike. Xwedî wateyeke wisan e ku di bingeha çanda hemû mirovahiyê de ye jî. Di vê derê de xisûsa herî girîng ku divê bê fêmkirin ev rastî ye; bi pêşengî û pîroziya jinê, bi sernermiyeke zarokane mêr bi jinê ve girêdayî ye. Serdemeke dirêj a beriya dîrokê wiha hatiye jiyankirin.

Ji ber ku hêza sereke ya şoreşa çandiniyê, neolîtîkê jin e, bi hêza ji zayokiya wê jî digire hemû

xweda bi şeklê jinê ne. Di demên destpêkê yên Sumerî, Misrî û Hindî de xwedayîbûn, bi pêveka pêş a mê tê binavkirin. Aliyê mêrane wê pir paşê derkeve holê. Hemû peykerên ji serdema neolîtîkê mayî bi şeklê jinê hatine çêkirin. Peykerên mêr bi qasî bibêjî tune ne kêm in. Xweda û mirov bi hev re ne. Xwedayekî ji mirov qut bûye, pir cuda, her wiha ya feraseteke olê hê pêş neketiye. Şeklê olî yê çax û demê, dibe îfadeya îdeolojîk a di civakîbûnê de qebîle û yekîneyên hîn pêşketî. Ji bo her qebîleyê xwedayên li gor diyardeyên bingehîn ku di jiyana wan de rol dilîzin pêk tên, çêdibin. Çi qas hêzên bingehîn tên ferqkirin, çiqas bi feyde û zirarên vana têdigihîjin, digihên ew qas hejmar têgîn, her wiha xwedayan. Şêwazê fikrê û pergala têgînan bi tevahî bi xwedayan îfade dikin û didin meşandin. Lê ev, li gor dereceyên wî tên rêzkirin.

Ji ber rola dayikê di hilberîn û zayokiyê de dibe sedem ku girîngiyeke bêhempa bi dest bixe û rê li ber serdema xwedawendan vedike. Ji ber ku gelek vedîtin bi destê jinê tên kirin. Îhtimaleke mezin e nebatên bi feyde, darên fêkiyan, heywanên kedîkirî, cotkirina axê, çêkirina xênî û malan, xwedîkirina zarok, tevrik, destar û erebeya ga, vedîtinên jinê bin. Di pişt van pêşketinên mezin de serdema xwedawendên dayik, rola jinê sembolîze dike.

Hiyarerşiya jin-dayikê ya bi vî rengî hê jî di nav hemû civakan de cihê rêzê û otorîteyê dibîne. Ev yek di heman demê de bingehê dîrokî yê têgîna “dayikê” ye. Ji ber ku dayik di şert û mercên herî zehmet de dizê û xwedî dike. Di vî warî de jî xwediyê rola sereke ye. Bêguman, hiyarerşî, otorîte û çanda li ser vî hîmî pêk bê, wê girêdan û dilsoziyeke mezin bibîne. Têgîna “dayikê” ji ber vê yekê, heta îro wek bingehê hebûna civakê bi hêz hatiye û wekî din raveya vê rastiyê nîn e. Weke ku yeqîn tê kirin, hurmet û rêza ji dayikê re bi sedema taybetiya wê ya zayînê nîn e. Pêwîst e dayik, wek rastiya civakî ya herî girîng û têgîna “dayika xwedawend” were fêmkirin. Deriyên wê li rastiya dewletê girtî ne û hemû taybetiyên ku rê nadin dewletê di himbêza xwe de dihewîne

Ji ber ku jin hêza sereke ya dema çandinî û heywankariyê ye, wê şêwazeke jinane dexmeya xwe li pêşketina fikir û ziman bide. Hê jî di gelek zimanan de gelek pêvekên pêş û paş tên bikaranîn. Ji ber ku xwedîkirina nebatan û kedîkirina heywanan, bi giranî girêdayî fikir û kirinên wê ne, dibe sedem ku weke dayika xwedawend a ku hemûyan zaye girîngiyê qezenç bike.

Di neolîtîkê de feraseta ola xwedayê dostê mirovan, wesfê bingehîn ê civaka wê demê jî dide. Avahiya civakê yê bê pevçûn û li gor dema wehşetê ya

berê derfetên weke bihuştê ji xwezayê feyde girtin, xweda her tim bi nasnameyeke dostane sembolîzekirin, rêya manegirtinê li ber vedike. Bi mirovan re di nav hev de ne. Ji ber ku civak bi diyardeyên ku temsîl dike re di nav hev de ye. Ya girîngtir jî divê mirov li hember hêza sêhirdar a têgînan ku xwedayî dibin şaşwaz nebe. Ev dem, demên afirînerî û zayînê yên destpêkê ne. Her têgîneke nû derfeteke nû, her wiha xwedayekî nû ye.

Di civaka neolîtîkê de giraniya jinê ew qas heye ku mêr her wekî bintûte, tune dixuyê. Wekî îro ku jin di civakê de weke hêza bingehîn hatiye linavbirin. Jin, ev hêza xwe di xwedîkirina nebatan, kedîkirina heywanan, avakirina malê, tevn û hêran, zarok zayîn û mezinkirinê de bi dest dixe. Ev, bihêzbûneke derasayî ye. Nebatên weke genim û garis, darên weke berû û mêwê jî di nav hebûnên pîroziyeke xwedayî dihewînin de weke nîmetên li pêş in tên.

Bi vî awayî rewşeke ayînî ya jinê ku pêşî lê nayê girtin, pêş dikeve. Pîroziya bi hêza civakê pêk hatiye zêdetir xwe eşkere bi sêhr û efsûnkariyê nîşan dide. Asta têgihîştinê dikare xwe bi efsûnkariyê bixe pratîkê. Sihirbazî jî dayika zanistê ye. Jin bi sedema timî li xwezayê temaşe dike, zayînê nas dike, jiyanê dibîne û ev yek wê dike zana û hozana civakê. Ji ber vê rastiyê ye, sihirbaz û efsûnkar bi piranî jin in.

Jin bi çavdêrî û rola xwe di sihir-efsûnkariyê de zana dibe. Di vê nîzama malbatî û kedîkirinê de çiqas zarok û mêrên dost (xizm) li dora xwe bide hevdu, ew çend dibe jineke bi hêz.

Bi sedema xebat û tevgera xwe di civaka xwezayî de çi diqewime, çi dibe, herî baş jin fêm dike. Ji vê serdemê, li ser hemû berhemên hatine verotin û niqirandin şopên jinan hene. Klan yekîtiyek e, li dora jina dayik pêk tê. Zarokanîna jinê, xwedîkirina zarokan dibe sedema ku bibe berhevkareke nebatan a baş û xwedî jî bike. Zarok tenê dayikê nas dike, hînê mêr wek milk li ser jinê xwediyê tesîrekê nîn e. Nedihat zanîn jin ji kîjan mêrî ducanî dibe, lê dihat zanîn zarok ji kîjan jinê dibe. Ev mecbûriyeta xwezayî, hêza civakîbûna xwe dispêre jinê jî nîşan dide. Peyvên di vê serdemê de bûne têgîn bi piranî mê ne û ev jî vê rastiyê îspat dikin. Di vê serdemê de şervanî û serdestiya mêr, paşê bi nêçîra heywanên xurt derdikeve pêş. Mêr bi taybetiyên xwe yên bedenî û fizîkî diçe dûr nêçîrê û neçar dimîne klanê ji xeteran biparêze. Ev rolên mêr ên diyarker nîn in, sedemên tepisok mayîna wî jî rave dikin. Di nav klanê de têkiliyên taybet hê pêş neketine. Berhevkirina nebatan û nêçîr a her kesî ye. Zarok ên hemû qebîlê ne. Ne mêr û ne jî jin hê taybet nebûne. Ji ber van taybetiyên bingehîn ji civakê re tê gotin civaka seretayî ya komînî.

Forma klanê û awayê wê; zemînê pêşketina têgînên bawerî û zanebûna bingehîn in, di heman demê de bîr û hafiza seretayî û derketina civakê ye. Di klan û qebîleyê de civakeke têkûz a xwe spartiye hêza jinê û hawîrdora xwezayî heye. Mirovatî hebûna xwe bêyî mêtingerî û zordestiyê, bi piştgiriya hevdu dimeşîne. Bi gotineke din mirovatî ji van nirxên bingehîn pêk tê. Ev tecrubeyên civakî yên bi mîlyonan sal ajotine ji dest neçûne, jixwe fikirandineke berovajî tewş û beradayî ye. Di xwezayê de weke ku tu tişt wenda nabe, di şêwazê hebûna civakê de ev rastî hêza xwe hê zêdetir dewam dike.

Azadiya qebîleyê hêzeke pir xurt e. Perestinên olî yên bi giranî ji bo dayika xwedawend bi pêş dikevin, çêdibin. Giranî didin ku jinê bi stêrk û heyvê temsîl bikin, lê zêdetir weke dayika xwezayî ya hêzên xwezayî yên herêmî xwedî giraniyeke mezin e. Ne zehmet e mirov bigihê vê têgihîştinê. Keda jinê ya ku çandinî û kedîkirinê afirandiye, weke dayika ku zarok tîne jin, di dîrokê de pîroziya herî mezin dibîne. Bi maneyeke din hêza afirîner a jiyanê ye. Xweza, dayika ax e. Temsîla xwedawendê ku weke hêza keşfa berhemên xweza, nebat û daran e, bi kesayeteke xwezayî rê li ber kûrbûna maneyê vedike. Ew girîngiya jin-dayikê ku derasayî zêde dibe, li hember mêr rê li ber serdestiyeke aşîkar vedike.

Em di vê şeklê civakê de rast li awayê hoveber (prîmîtîf) ê siyasetê jî tên. Civak bi qasî çend qebîleyan mezin dibe û bi pirsgirêka rêveberiyê re rû bi rû dimîne. Kesên zêde bi tecrûbe, ezmûn û pêşketinê berdewam dikin bi xwezayî dibin pêşeng, li ser vî esasî dabeşbûneke weke şaman û efsûnkarî çêdibe. Di van şertan de pêşengtiya polîtîk û manewî cara yekê ji hev cuda dibin. Ji ber ku şoreşa çandinî û heywankariyê bi giranî li derdora jinê şekil digire, pêk tê, demeke dirêj taybetiyên civaka dayiksalarî serwer in. Kulta (perestişa) hêzdar, xurt, bihêz a dayikê berhema vê demê ye. Mêr, heta bibêjî bintûte û gelêrî ye. Jina dayik e jî pir diyarker û cureyîn e. Weke xuyana manewî jî ev rewş, bingeha çanda xwedawendiyê ye. Di cewherê xwe de xwedawendî, îfadeya tevahî taybetiyên jina ku şoreşa neolîtîkî bi serfirazî pêk aniye ye. Dema ku hişmendiya şoreşa mirovahiyê ya mezin di dinyaya zîhniyetê de xuya bû, rê li ber pîrozîkirin û bilindkirina ku xwedawenda jin dike navenda xwe vedike. Afirînerî, nasîna nebatan, çandiniya wan, kedîkirina heywanan, çêkirina dîzik û kûzikan, tevn û çêkirina xaniyan, xwedîkirina zarokan, tevrik-kirin, li hêviya çêbûna darên fêkiyan mayîn hemû di seraktoriya jinê de pêk tên. Xwedawenda bi hêz, çavkaniya xwe ji vê civaka neolîtîk digire.

Di Cewherê Xwe de Xwedawendî, Îfadeya Jinê ye Ku Şoreşa Neolîtîkê Bi Serfirazî Pêk Aniye

Jiyan li dora jina dayik bi rêxistin dibû. Ango mûcîze dibûn malê jina dayik; di vê çarçoveyê de xwe digihandin xwedawendiyê. Bi hêza çor a mil û destan xwe nedigihandin rûmetbilindiya xwedawendîtiyê, qedirbilindiyeke zîhnî bû ku bi pêkanîna jiyanê û xwedîderketina li wê pêk dihat. Civaka Neolîtîk bi dest, dil û zîhnê jina dayik pêk dihat. Li ser tevahiya vedîtin û keşfên bi cotkarî û heywan xwedîkirinê re têkildar mohra wê hebû. Bi derengî be jî xwedawenda bajarê pêşî Ûrûkê Înannayê li dijî mêrê desteserkar û xasûk Xweda Enkî şer dike bi sedema ku "104 vedîtinên wê" dizîne û destana pêşî vê rastiyê îfade dike. Tevî ku bajarbûna pêşî ye, xwedawendek hê bajêr rêve dibe û li dijî xwedatiya mêr têdikoşe. Bêguman ev gelekî manedar e. Hêza çanda civakî ya jina dayik, tevgera wê û berxwedana wê li dijî şaristaniyê tîne ziman. Gelekî zehmet e ku mirov çanda jina dayik bi zîhniyeta roja me ya îro ya şaristaniya mêrê serwer şîrove bike. Ev çand rastiyek e ku bi hezarê salan dewam kiriye. Sîstema şaristaniya navendî ya ji pênc hezar salî zêdetir dom kiriye, timî weke sîstemeke serwer a mêr pêşde çû û ev vê rastiyê îspat dike. Çawa ku di xwezayê de dibe, di civakê de jî her tişt bi dijberê xwe pêşde diçe. Li gorî vê yekê, pêşdeçûna sîstema şaristaniyê bi serweriya mêr bi tenê bi hebûna sîstema jina dayik a xwedî erk tiştekî îfade dike.

Li ser hîmê van şîroveyan, em dikarin metafîzika xwedatî û pîroztiyê ya li dora jiyana kolektîf a jin-dayikê hat avakirin, fêm bikin. Dayika mîna xwezayê da, za, xwedî kir û kezeba xwe şewitî rola wê ya sereke di çanda manewî û madî de destnîşan kir. Eger em mêraniya mêr bidin aliyekî hînê siya wî jî li ser kolektîvîtiya civakê tune ye û nabe. Şêwazê jiyanê yê civakê destûra vê yekê nade. Ji lewra wesfên mêr ên weke cinsê serdest mêr, xwediyê milk û xwediyê dewletê bi tevahî xwedî karektereke civakî ne û paşê çêdibin. Wexta civak tê gotin, jin-dayik, zarokên wê û birayên wê îfade dike. Eger namzetê mêrtiyê yê muhtemel mêr be, kêrhatina xwe ji bilî mêrtiyê bi marîfeteke din, mînak bi nêçîrvanekiyeke baş, bi gihandina nebatan û xwedîkirina heywanan îspat bike, dikare bibe endamê civatê. Hînê his û heqekî mîna mêrê jinê me, bavê zaroka me weke diyardeyeke civakî çênebûye. Em ji bîr nekin ku bavtî û heta dayiktî, herçend neyê gotin aliyên wan ên derûnî û psîkolojîk nîn e jî ya esas diyarde, hiskirin, serwextbûn û têgînên sosyolojîk in.

Ji ber ku di mijarên bicihûwarbûn, debar, lixwekirin, zêdebûna mirovan û parastinê de şêweyekî tevlîhev ê avabûnê heye, rastiyên civakî yên kapasîteya wan a manedanê xurtbûyî, mewzûbehs in. Di wezna kapasîteya manedanê de pêşketina

serdemeke heqîqetê dest pê dike. Nexasim serdemeke heqîqetê ya mîtolojîk, olî û hunerî li dora jin-dayikê (serdema heykelên jin-dayika qelew) pêş dikeve, bi pîroziya xwe hemûyî derdikeve ser dikê. Ziman pêş dikevin. Hêza îfadeyê ya mîtolojîk, olî û hunerî, serdemeke ku qîmeta xwe ya orjînalbûnê zêde ye, dide destpêkirin. Serdema herî bi heybet a prehistoryayê ye. Ew serdemeke welê ye, civak cara pêşî ye ku xwe bi heqîqetên pîroz (bi rêbazên mîtolojîk, olî, hunerî) diyar dike. Mirovatî hê jî mîrateya vê demê dixwe. Di serî de zanista tibî û hozantiya felsefî, her du şêweyên din ên heqîqetê di vê serdemê de hîmê xwe danîne. Hozantiya jinê û tiba wê di vê demê de weke heqîqetên bi tesîr ên demê di jiyanê de cihê xwe girtine. Ji ber ku jinê di pênc qadên girîng ên heqîqetê de hêz bi dest xistiye, xwedawendiya jinê di vê serdemê de serwer bûye. Bêguman di vê bidestxistina hêzê de pêşdebirina wê ya cotkarî û aboriya malê, bi rola sereke radibin.

Komên mirovan di nava zîhnê xwe de timî li objeyên madî yên pêdiviya wan pê heye geriyane û xwestine baştir bikin; xwarin, bicihbûn, zêdebûn û parastin timî fikarên wan ên bingehîn bûn. Komên destpêkê yên ku hewl didan pêwîstiyên xwe yên bingehîn bi cî bînin, berê çi didîtin û peyda dikirin qîma xwe pê dianîn. Di şikeftan de bi cî bûne, li keviyên gol û daristanan xwe parastine û ji dayika dizê re jî qedir girtine. Her diçe nêçîrvanî jî dikeve dewrê.

Hem bicîanîna pêwîstiya xweparastinê û hem jî xwe xwedîkirina bi goşt vê çandê xurt dike. Lê belê ji destpêka civakbûnê ve di navbera berhevkirina pincaran a jinê û nêçîrvaniya ku bi giranî bi destê zilam de tengezariyek heye û pêşketina beridînên çandî yên cihê têne dîtin. Li her du aliyan jî bûyerên yekalî ango pêşketin û paşketin hene; yek ji wan her diçe dibe 'mêrê weke şêran', ya din jî gav bi gav dikeve nav çanda 'jina weke dewaran'. Têgihîştinên cihê yên li ekonomiyê cara pêşî bi vî rengî hîmê xwe datînin.

Di serdema neolîtîkê de çanda jinê derdikeve asta herî jor. Piştî dema dawî ya qeşayî ango ji 15 hezar sal B.Z. ve, nexasim li qûntara sîstemên Toros-Zagrosan gelek cureyên nebat û heywanan, dihêle ku mirov bi hûnandina jiyaneke mîna bihuştê rabin. Ji wê demê heta roja me ya îro çemê mezin ê civakbûnê ku diherike bi dîroka nivîskî û şaristaniyê cihêwaztir bû û mohra xwe li globalbûnê xist. Rewşa kom û malikên zimanan ên ku heta roja me hatine jî berhemên vê demê ne.

Di vê dema dîrokî ya dirêj a mirovatiyê de xusûsa bi tenê ya mirov dikare li ser kapîtalîzmê bibêje ew e ku mêrê çanda nêçîrvaniyê her ku çûye hegemonîk bûye. Bi qasî ku tê tespîtkirin çanda neolîtîk a di salên 10 hezarî B.Z. de mayînde bûye, bi giranî çanda jin-dayikê ye. Di pêvajoya berhevkirina nebatan de ji şikeftê derdikeve li kêleka wê li bin holikan bi cih dibe, tovên nebatan datîne û bi vî awayî

rê li şoreşa gund û cotkariyê vedike. Li gorî daneyên di erdkolanên arkeolojîk ên di roja me ya îro de ev çanda em behsa wê dikin li tevahiya Mezopotamya Jor, nexasim li hundirê qûntara çiyayên Toros-Zagrosê li Bradostiyan, Xerza, Amanos, li herêmên hundir ên qûntara çiyayên Torosa Navîn, Newala Çorî, Çayonu û Çemê Halanê tê dîtin. Berhemê zêde hindik be jî êdî didin serhev û hiltînin.

Ne weke têgîn, lê weke cewher mirov dikare cara pêşî ekonomiyê di vê daneheva berheman de bibîne. Weke tê zanîn, gotina eko-nomos Yewnanî ye û maneya wê; qanûna malbat, xaneyê ye. Kengî malbatên li dora dayikê çêbûne bi erdê re mijûl dibin û zêde nebe jî hin qût û zad hiltînin û dixin kewaran, mirov dikare êdî behsa ekonomiyê bike. Lê ev danehev û hilanîna qût û zad ji bo bazirganiyê nîn e, ji bo malbatê ye. Jixwe ekonomiya rast û insanî jî ev e. Ji ber ku mirov danehevên xwe diyarî hev dikin, kes çavê xwe berî qût û zadê hev nade. Bi vî awayî danehev ji bo mirovan nabe sedema tehlûkeyê. Prensîba ‘mal timayiyê tîne’ herhal ji vê demê maye. Çanda xelat û diyariyê şêweyekî girîng ê ekonomiyê ye. Bi ahenga pêşketina mirov re jî têra xwe li hev dike.

Çanda qurbankirinê jî mirov dikare ji vê demê bide destpêkirinê. Hatina aborî ya mirovan her diçe zêde dibe. Ji ber vê yekê, weke hurmeta wan a ji nasnameya wan re şêweyê qurbankirinê ji têgîna

xwedayan re çêdibe. Bi vî awayî mirov dikare meselê fêm bike û bibîne. Ji ber ku bereket malavahî û spasdariyê hewce dike. Têkiliyeke xwe ya xurt bi şoreşa cotkariyê re heye. Li gorî şêweyê koma mirovan ê beridîne, xwestine xwe bi nasname bikin, xwe mezin bikin, xwestine dua bikin, îbadetê bikin û bi pêşketina cîhana zîhnî hebûnên xwe pêşkêş kirine. Berhemên arkeolojîk vê fikrê bi awayekî balkêş piştrast dikin. Hînê bi awayekî berçavtir têgîna dayika xwedawend û dayika pîroz jî weke belgeyan li pêşberî me radiwestin. Pirbûna fîgurên jinan jî vê rastiyê têra xwe piştrast dikin.

Rolgirtina jinê di navenda ekonomiyê de xusûsek e ku tê fêmkirin. Ji ber ku zarokan tîne û wan xwedî dike. Ma jin ji ekonomiyê fêm neke, wê kî fêm bike! Bi giştî di dîroka şaristaniyê de, bi taybetî jî di modernîteya kapîtalîst de wexta jin li derve hat hiştin, ekonomiya ku mêrên tirtire li ser herî zêde lîstin, veguherî guloka pirsgirêkan. Ev lîstika tu têkiliya xwe ya organîk bi ekonomiyê re nîn e, bi tenê bi hêrsa hêzê û kara zêde radibe, di serî de jin dixwaze tevahiya hêzên ekonomîk bike bin destê xwe. Di encama vê lîstikê de her cure hiyerarşî, desthilatdarî û hêzên dewletê weke ûr û girêkekê li ser civakê mezin dibin û ev yek jî dihêle ku ev lîstik bigihîje qonaxekê dewam neke û neyê lîstin. Piştî jinan di serî de cotkar, ji yên bi ekonomiya rastî re têkildar şivan, zenaetkar û

bazirganên piçûk jî ji aliyê amûrên yekdestdariya sermaye û desthilatdariyê ve gav bi gav ji ekonomiyê hatin dûrxistin û bi temamî atmosfereke xenîmetê hat afirandin. Em bi mijarekê re rûbirû ne ku divê herî zêde bê rohnîkirin.

Civaka nû bi giranî xwe dispêre jiyana gund, têkiliyên klanê jî werdigerin têkiliyên etnîk. Şêweyên nû yên pêkhatinên madî, eger çarçoveyên xwe yên manedartir nebin nikarin bimeşin û heta nikarin dest pê nekin. Tevî ku nasnameya civaka klan a berê bi 'totemê' dewam dikir, weke veguherîna zîhniyetê û zimanê wî sembola civaka neolîtîk fîgura 'xwedawend-dayik' e. Fîgurên toteman kêm dibin, fîgurên xwedawend-dayikê zêde dibin, naverastê tijî dikin. Ev fîgur jina dayik a ku rola wê mezin dibe temsîl dikin. Ji aliyê olî ve, ev qonaxeke li pêş e, bi xwe re dewlemendiyeke mezin a têgînê tîne. Di ziman de pêvekên (qertafên) 'mêbûnê' derdikevin pêş. Di pêvekên zimanê sembol de jin rewşa xwe ya sereke demeke dirêj diparêze. Em îro jî vê taybetmendiyê di gelek zimanan de dibînin. Bi xwedawend-dayikê re civak bi pîrozbûneke zêde dikemile. Civaka nû tê maneya têgîn û binavkirinên nû. Pêvajoya em jêre şoreşa zîhniyetê dibêjin, ji ber ku afirîneriyê dixwaze, divê em wê di nava sosyolojiya azadiyê de bigirin dest û li ser rawestin. Dîroknasên di karê xwe de hoste hemfikir in ku ev pêvajoya behsa wê tê kirin, têrûtijî

pêk hatiye, qewimiye. Tê maneya; bi hezaran diyarde, bi hezaran nav û şoreşên zîhnî. Ji şoreşa zîhnî ya li Ewrûpayê berfirehtir, şoreşeke mezin a resen û hewldaneke afirîner mewzûbehs e. Yek ji tespîtên dîrokî ye ku piraniya vedîtin û bi tevahî têgînên îro em bikar tînin di wê demê de hatine afirandin.

Ev civaka di mîhwera jin-dayikê de çêbûye, ji aliyê avakirina civaka xizman a pêşî jî girîng e. Xizmtî bi nêzîkatiya jin-dayikê diyar dibe. Ji klana destpêkê, bi wê xizmtiyê mirovatî digihîje civaka pêşî ya qebîleyê. Weke şêweyê civakeke nasnameya orjînal a bi hêz, şopên qebîleyê hê jî dewam dikin. Saziyên orjînal ên weke ziman, dîn, mîtolojî, huner, hozanî, zanyarî û zanistî bandora xwe heta roja me ya îro anîn û tîrêjên xwe yên destpêkê ji nava wê civakê weşandin, peşikandin. Gavavêtinên orjînal ên weke tevn, dîzik, kûzik, çandiniya erdê, destar û alavên pê mal tê avakirin, di wê demê de pêk hatine û civak di vî warî de deyndarê wê demê ye. Di wê demê de mirov bi awayekî pîroz bi erd û axê ve hatiye girêdan û pêkanîna welatokan, berhema wê civakê ye. Mirov dikare bibêje; der barê jiyana civakî de ji sedî 90'ê 'cara pêşî' gavavêtinên dema wê civakê ne.

Rêxistiniya civakî ya bi şêwazê klan di zeman û mekan de belav dibe, berfireh û cur be cur dibe, ev yek di xwezaya wê şêwazê de heye. Civata li dora jina dayik

mezin dibe û nasnameya xwe xurt dike, li gorî agahiyên di dest de hene di nav vê civakê de nerehetiya mêr dest pê dike. Jin-dayik zarok li dora wê zêde dibin û ji bo alîkariya wê bike rû dide hin mêran û ev yek jî rê li ber çavnebarî û hêrsa mêrên din vedike.

Di destpêkê de ev nakokiya piçûk her ku diçe mezin dibe. Bi pêşketina nêçîrê, hêza mêr a şer derdikeve pêş û bi vê re zanebûna mêr jî zêde dibe. Pîr û yextiyarên li der ve jî têne hiştin li ser vî hîmî, ber bi îdeolojiyeke serwer a mêran ve diçin. Bi taybetî ola "şamanîzm" vê rastiyê bi awayekî balkêş nîşanî me dide. Şaman zêdetir protîpa rahîbên mêr temsîl dikin. Li dijî jinan bi awayekî sîstematîk tevdigerin û dixwazin nîzama malê pêş bixînin. Dema jin xwediyê nîzama malbatî û kedîkirinê ye, mêr nîvkovî li bin holikan dihewe. Bi şamanîzmê mêr dikare nîzamekî dijber ê malbatê ava bike. Pîremêrên bi ezmûn ên li der ve hatine hiştin û şaman li hev dikin. Ev hevgirtina her du aliyan pêşketineke girîng e. Hin xortan jî digirin nava xwe û bi serweriya îdolojîk hikum li wan dikin. Bi vî awayî di nav komê de rewşa xwe bi hêz dikin. Bi hêzbûna mêr her ku diçe bi qîmet dibe. Hem nêçîrê dike, hem jî klanê li dijî xeterên ji der ve werin diparêze. Di vî karî de taybetiyên eskerî kuştin û birîndarkirin hene. Ev destpêka çanda şer e.

Dema behsa man û nemanê tê kirin, neçar e her kes bi otorîte û hîyarerşiyê ve girêdayî be. Kesê herî bi qabîliyet, gotin û otorîteya wî jî payeberz dibe. Li dijî çanda jin-dayikê, serweriya çandeke din, dest pê dike, pêş dikeve. Ev pêşketina hiyarerşî û otorîtê beriya civaka bi çîn, di dîrokê de destpêka qonax û werçerxeke girîng e. Naverok û rengê xwe ji çanda jin-dayikê cuda ye. Di çanda jin-dayikê de bi piranî berhevkirina gîhayan û paşê zîraet, xebateke hewceyî bi şer nabîne. Lê nêçîr ku bi piranî bi destê mêran hatiye kirin, çandeke otorîter û dijwar a şer e. Di encamê de otorîteya bavikanî rehên xwe berdidin.

Di salên 4 hezarî B.Z. de ji ber ku li zeviyê gîsin girîng bû, bi gîrîngîgirtina şivantiyê jî di nav pêvajoya hilberînê de cihê jinê teng dibe. Bi demê re di malê de tê girtin û ev heta roja me hîn kûrtir tê. Her wiha nivîsandin û têgînkirina dîrokê gelek li paş cihê ku jinê heq kiriye ye, ev misoger e û nayê nîqaşkirin. Bi pêvajoya şaristaniyê re desthilatdariya mêr xurt dibe, bi demê re jin ji saziyên jêr û jor ên civaka çînîdar li derve tê hiştin. Ev pêkanîn, bingeha nivîsandina pirtûkên "dîroka bê jin" in jî. Em çelexarîkirineke mezin jî weke encama newekheviya di navbera cinsan de pêşkêş dikin.

Dengê Înanna ya ku her ku diçe kêm dibe dengê jina bêbandorbûyî ye

Civaka neolîtîk kengî ket tengavê yan jî hewl dan ji wê bibihurin? Di vê mijarê de mirov dikare li ser hîmê sedemên derve û hundir şîroveyan bike. Kengî mêr qelsiya xwe bihurand û bû nêçîrvanekî baş û bi kesên di xizmeta xwe de gihîşt statuyeke baş, heye ku ji bo nîzama dapîrtiyê bûbe tehlûke.

Di vê mijarê de têkoşîna di navbera Xwedawenda Ûrûkê Înannayê (Koka xwe ji Xwedawenda Dayik a Mezopotamya Jor Star-Îştarê digire) û Xwedayê Erîdûyê Enkî (xwedayê pêşî yê mêr ê bajêr) de gelekî balkêş e. Înanna hewl dide ispat bike ku çima mafên xwedatiyê hemû yên xwedawenda dayik in (îdîa dike ku 104 Me'yên navdar, nod û neh fazîlet, qabîliyet, vedîtin, afirîneriyên hunerî yên jinê ne), lê xweda Enkî jêre waz dike ku mafên ew behsa wan dike girîngiya xwe nemane, divê weke jineke sernerm bavê xwe guhdarî (Kengî xwe weke bav-mêr-xweda îlan dike, Xwedawend Înannayê êdî xistiye statuya keç û jina xwe) bike.

Civaka Sumer a çînîdar û xwedayê wan ê mêr ê xasûk Enkî ji dest Înannaya xwedawenda Sumeran nirxên wê yên cewherî, çiqas nirxên di civaka neolîtîk de afirandibin hebin hemûyan digire, ya rastî bi vî rengî ji cinsê jina di civakê de tevahî hebûna wê digire. Destana mîtolojîk a çûndina navdar û vegera serkeftî ya Enkî ya ji Urukê îfade dike, bi tevahî 104 "Me"yên

wê, qanûnên wê digire û vedigere Urukê ji wan destanên nayên jibîrkirin e, ev ne lihevhatinek e û beredayî nîn e. Ev, vegotineke mîtolojîk, olî û edebî ye ji bo serboriyên di civakê de diqewimin di têkilî û nakokiyên navbera xweda û xwedawendan de xuya dibin rê li ber pevçûn û danûstendineke çawa vedikin. Ne di dest de ye ku mirov li van kar û serfiraziyên şahane yên wêjevanên Sumerî şaşwaz nemîne û heyran nebe. Ya rastî cewhera wêjeyê jî ev e.

Xwedayên xasûk her tim dizîn, firotin. Bi tevahî bi jinê dan windakirin. Her ku bi jinê dan windakirin, xizaniya civakê ya mezin a destpêkê weke çarenûsekê dest pê kir hikmê xwe danî, pêk anî. Piştre mirovan kirin evd. Li ser wê/î her cure zordestiyê, derew û dagirkeriyê anîn kirin rewşeke mîna mafê pîroz. Yên piştre hatin her tim van her du karên bêyom cîla kirin û bi pêş xistin û vê jî weke hunera herî baş a jiyanê zanîn. Hewlnak kuştin, amûrên mirinê yên bêhempa bi pêş xistin. Ew xweda û xwedawendên li gel mirovan, her tim hêz didan wan veguherandin ruh û can stîner ên har û tolê hildigirin. Jiyana bihuşta dinyayê veguherandin dojehê. Rojhilata Navîn wiha hat lanetkirin. Welat wiha bûn çol.

Li gel Sumeran Nînhursag, ev xwedawenda ku em dikarin weke keybanûya çiya bi têgîn bikin, xwedawenda pergala qadên çiya yên Bakur û Rojhilat

–bi stêrkê tê temsîlkirin- bi kurdî weke "Stêrk" tê binavkirin, di pergala dewleta Sumer a bi hakimiyeta mêr de daxistin plana duyem, bi kolekirinê cins jî li dijî jinê hêz winda kir. Ev, qadeke mezin a pevçûnê ye. Li ba Sumeran jin hê rêzdariyeke mezin dibîne û hê her tiştên xwe winda nekiriye; di pergala xwedayan de nîvî bi nîvî cî digire. Nînhursag, bi xwedayê mêr ê xasûk û zanyar "Enkî" re di nav hesapgirtineke mil bi mil de ye û ev şer bi gelemperî bi lihevhatinê bi encam dibe. Piştre dema mîna "Înanna"yê derdikeve pêşberî me û weke xwedawenda afirînera neolîtîkê "me"yên xwe, yanê vedîtinên xwe yên bixwe cardin ji "Enkî" dewr digire, ji bajarê Enkî Erîdûyê vedigere bajarê xwe Urukê, xwediyê serkeftineke şahane ye.

Yek ji yekem pêşketinên gîrîng ku di civaka Sumer de bi pêş dikeve, asta ku cudahiya cinsiyetê gihîştiyê ye. Hêza hilberînê ya serwer a serdema neolîtîkê ya Sumer lê derketiye û li ber serê wê ye jin e. Çandinî û kedîkirin bi giranî vedîtina jinê ye. Dîsa pergala jiyana cîwarbûyî, yanê şoreşa gund, ji ber ku hîn zêdetir bersiv dide xwezaya jinê bi dexmeya jinê ye. Dîzîk û kûzikvanî, tevn, hêrandina daneyan hemû karên bi pêşengiya jinê ne. Malbat li derdora jinê dicive û diyarkirina nijadê li gor jinê çêdibe. Pergala dayiksalarî serwer e. Ev, îfadeya xwe ya îdeolojîk di stêrkan û baweriyên olî yên bi giranî xwedawend in û bi heyvê tên temsîlkirin de dibînin. Di civaka Sumeran

de cudahiya çînî û cudahiya cinsî ya bi viya re di heman demê de bi pêş dikeve îfadeya xwe ya îdeolojîk bi zêdeyî di mîtolojiyê de dijî. Cudahiya statuyê ku di vê derê de xuya dibe balkêş e. Cih û rewşa xwedawendan hê di destpêkê de giraniya wê zêde heye, lê her ku diçe lawaz dibe; di dema Babîl de destpêkê di şexsê Tîamat de derba kujer dixwe. Mardûkê kurê wê yê biçûk e, çanda mêrê serdest ku bi lez ber bi yekxwedayiyê ve baz dide temsîl dike. Hz. Îbrahîm, piştre wê vê çandê esas bigire û wê bi rola mezinê pêxember ê herî girîng ê yekxwedayiyê rabe. Jin, destpêkê di perestgehan de bi qasî rahibên mêr bi bandor e lê li malê dikeve plana duyem. Kerxaneya destpêkê jî di bin navê musakadîm de vedîtineke Sumer e. Statuya jinê, bi qasî pêla duyem a şaristaniyê hê neketiye. Statuyeke nêzî lihevkirinê di hemû mîtolojiyên Sumer de xuya dibe.

Di civaka xwedayan –pantheon- de xwedawend her ku diçe cî û girîngiya xwe winda dike, ev dîsa tam bi vegotineke mîtolojîk, helbestî tê dayîn. Di ola yekxwdayî ku gavek ji wê wêdetir e de, hem weke îfadeya îdeolojîk û tirsandin, hem jî di civakê de jin di rewşa cinsa kirine kole de ye. Ji her aliyî ve rewşa xwe kerkirin û dev û zimanê xwe lalkirin heye. Ji çaxê xwedawendan tu şop jî nemaye. Di ayîndeya xwe de jî bi sedema ku bi Adem sûcê destpêkê daye kirin di rewşa kesa bingehîn ku gunehkar hatiye kirin û

berpirsiyar de ye. Di vê derê de ji aliyê mêr ve serdestiya balkêş, bi rêya mîtolojî û ola ku çavkaniya xwe ji wê digire rewa û serdest dikin. Çaxê bi serdestiya mêr jî di her astê de tê bilindkirin û dikin temsîlkarê pîroz ê olê.

Dîroka pêşxistina koletiya cins bi xasûkî heye. Dema mirov li mîtolojiya Sumer dinihêre bav "Enkî" weke zanyarê xasûk û mezin ê viya bi mantiqê lihevkirinê bi pêş dixîne, çawa Babîl derdikeve pêş xwedayê Babîl Mardûk, di şexsê Tîamat de her cure derbeyê li dayika xwedawend dixe. Destana Afirandinê ya Babîl "Enûma Elîş" xwedî girîngiyeke dualî ye: şexsiyeta mutleq ê kraltiyê êdî xuya bûye û ev, bi Qanûnên Hamûrabî di girîngiyeke dîrokî de ye û nivîskî ye. Ji aliyê din ve di mîtolojiya Sumer de qanûnên ol ên misoger û li hember nayê rabûn, rêzikên xwe derxistiye holê. Ev, di koletiya çîn û cins de merhaleyeke pir mezin temsîl dike û rê li ber sazîbûna wê ya herî mezin vedike. Pêşiya otorîteya mutleq, bi awayekî bi xweda re wekhev heta dawiyê vebûye. Bi rengekî mayînde di koletiya malên taybet û kerxaneyan de girtina jinê tam kûr bûye, bi sazî û qanûnî bûye.

Di serdemên civakê yên beriya şaristaniyê de bi zora cara pêşî ji aliyê 'mêrê xurt' ve hat birêxistinkirin ne tenê heywan pê ketin dafik û xefikê. Keda hisî ya jinê ku mirov dikare weke nûra çavan jî bi nav bike û

daneheva malbat û klanê ye, heman rêxistiniyê çav berdayê, dest avêtê û xist dafikê. Cara pêşî ye zor evçend cidî tê birêxistinkirin. Bi vê zorê, jin, zarokên wê û xizmên wê yên din; bi tevahî danehevên wan ên madî û manewî, ekonomiya malê ya destpêkê hatin desteserkirin, talankirin. Li ser vî hîmî, proto-rahib şaman, şêxê xwedî tecrûbe û ezmûn mêrê xurt ê xwedî rêxistinkirina zorê destê xwe dan hev û bi vî awayî di dîrokê de rêveberiya pîroz a hiyerarşîk a bavikanî cara pêşî pêk hat û em qonaxên vê bi heman rengî di tevahiya pêvajoyên dîrokê de dibînin. Eşkere ye ku ji destpêka derketina xwe ev hiyerarşî di jiyana ekonomîk û civakî de heta qonaxa çînîbûn, bajarbûn û dewletbûnê bi roleke diyarker rabû.

Ûrûk, çandeke mirovatiyê ya ji rêzê nîn e. Destpêka mûcîzeyeke nû ye. Dengê Xwedawenda Ûrûkê Înannayê hînê jî çavkaniya tevahî destan, helbest û stranan e. Ev deng, dengê vê çanda muhteşem û bi heybet e. Di heman demê de dengê wê jinê ye ku mêrê kirêt hînê ew ne lewitandî ye. Çanda Ûrûkê li cografya xwe kulîlk vekirin. Bajarên li pey hev dihatin avakirin zêde bûn. Kêmberek ji bajaran çêbû. Mêrê bihêz û xasûk vê carê çavkaniya danehevan di derfetên bajaran de dît ku her diçû zêde dibûn. Bi awayekî berevajî çandek herikî û çû heta qûntarên çiyan. Bajar cografya neolîtîk dadiqurtîne û ev destpêka vê pêvajoyê ye. Dengê Înannayê yê ku her

diçe kêm dibe û ev dengê jinê ye ku her diçe bê tesîr dibe. Êdî dengê mêrê bihêz û xasûk her diçe gur derdikeve. Di zimanê Sumerî de daçekên pêş bi karektera jinê ne, ango mê ne. Ev xusûs di pêkhatina ziman de rola jinê nîşan dide.

Li vir hewce nake ku em behsa serhatiya cografya şaristaniyê ya ku xwe dispêre hêzê bikin. Lê were nivîsandin baş e

Xwedawend Înanna hewl dide 99 vedîtinên berhemên hunerî ji destê xwedayê pêşî yê mêr ê xasûk û zordar (mêrê serwer ê kirin xweda) û parêzvanê bajarê Erîdûyê Enkî rizgar bike. Destana behsa vî şerê di navbera xwendawend Înanna û Enkî de dike, ya rastî destana pêşî û herî bi bandor e. Keybanûyên Ingilîstan û Holandayê yên warisê wê têne hesibandin mîna fîgurên sembol ên wê jinê bin ku pêjna tevahiya krêtiyên mêrê xasûkî û zordar jê tê. Ev yek jî weke ku tevahiya serhatiya şaristaniyê xulase tîne ziman.

Li hemberî mêrê bi hêz qurbana pêşî jin e. Ji ber têkiliya xwe ya bi jiyanê re mejiyê jinê yê hisî hînê pêşketîtir e. Bi kedeke bi êşê strayî, weke diya zarokan, berpirsiyara sereke ya jiyanê ye. Bi qasî ku haya wê ji jiyanê heye dizane wê çawa dewam jî bike. Pel û pincaran berhev dike. Ev berhevkariya wê hem encameke mejiyê wê yê hisî ye, hem jî ji ber ku ji xwezayê hîn bûye. Daneheva civakî demeke dirêj li

dora jin-dayikê pêk hatiye û em ji agahiyên antropolojiyê jî dizanin ku jin-dayikê bi şiklekî, ji dewlemendî û nirxan re rola navendê bi cih aniye. Mirov dikare texmîn bike ku dayika nirxên zêde ye. Ji lewra mirov dikare fêm bike ku mêrê bi hêz ê bi rola nêçîrvaniyê radibe çima çav berdaye vê daneheva civakî ya jin-dayikê. Diyar e ku wexta li ser vê danehevê serdest bibe wê gelek avantajan bi dest bixe. Gelek tişt hene ku dilê xwe dibijîne wan û çavbirçiyê wan e. Rewşa jinê ya weke objeyeke cinsî, bavtiya zarokan û hin tiştên din rê dide mêrê bi hêz ji bo li ser danehevên çandî yên madî û manewî bi xwedî gotin be. Hêza bi nêçîrvaniyê digihîjê, firsend û keysê dide wî hiyarerşiya civakî çêke û serdest bibe. Em di van bûyer, diyarde û pêşketinan de cara pêşî dikarin bibînin ku mejiyê analîtîk di bunyeya civakê de bi armanceke xirab û bi awayekî sîstematîk hatiye bikaranîn.

Ji çanda dayika pîroz derbasbûna çanda bavan, dihêle ku mejiyê bûyeran bihûne, zirxê pîroztiyê jî li xwe bike. Mirov dikare texmîn bike ku sîstema bavikan bi vî awayî şax û rehên xwe berdane erdê û xwe girtiye. Em derketina bi heybet a zîhniyeta bavikan li tejaneya Dîcle-Firatê bi belgeyên dîrokî jî îspat dikin. Zîhniyeta navborî li derdora salên 5500 û 4000'î B.Z. li Mezopotamya Jêr derketiye û li tevahiya Mezopotamyayê belav bûye û em dibînin ku weke çandeke sereke bûye xwedî rol.

Berî ku em behsa vê çandê bikin, em Berî Zayînê li Mezopotamya Jêr li keviyên deştan û li qûntarên çiyan civakeke dayikan a xwe dispêre bereketa berheman dibînin ku di tevahiya qonaxên mezolîtîk û neolîtîk de xwedî roleke sereke ye û em vê yekê nexasim ji agahiyên arkeolojîk fêm dikin. Em di çanda nivîskî de jî li gelek îşaretên di vî warî de rast tên. Di civaka Neolîtîk de hêmanên ziman û dîn ên xwe dispêrin dayikê gelekî pêşketî ne.

Mirov dikare bibêje ku pirsgirêka civakî cara pêşî bi awayekî cidî di nava komên bavikan de yên li dora mêrê bi hêz civiyabûn derket holê. Ev destpêka koletiya jinê ye û ji zarokan dest pê kir zemînê koletiya mêr jî amade kir. Koleyên jin û mêr di serî de çiqas bibin xwediyê tecrubeya danehev a nirx û berhemê zêde, ew çend jî êdî têne kontrolkirin û serdestiya li ser wan zêde dibe. Desthilatdarî û otorîte her diçe girîng dibe. Weke beşekî xwedî îmtiyaz mêrê bi hêz + pîremêrê bi ezmûn + hevkariya şaman kulmozeke desthilatdariyê ava dike ku kes nikare xwe li ber bigire. Di nava vê kulmozê de mejiyê bûyeran dihûne, ji bo serdestiya xwe ya zîhnî bi awayekî awarte vegotina mîtolojiyan pêş dixîne.

Ev dinya mîtolojîk a em wê di civaka Sumeran de bi dîrokî jî nas dikin, mêr dike mîna xwedê û wî weke yê erd û ezman afirandiye mezin dike. Xwedawendiya jinê û pîrozbûna wê heta mirov bêje piçûk tê xistin û weke xwediyê hêza mutleq a serwer

mêr bi her kesî didin qebûlkirin û bi tevneke mezin a mîtolojîk a destanan têkiliya yê hukim dike û ya hukim lê tê kirin, yê diafirîne û ya tê afirandin, tê çêkirin. Ev dinya mîtolojîk a bi piraniya civakê didin qebûlkirin, weke vegotineke bingehîn bi nirx dibe û dibe olî.

Mêrê xurt ew mêr e ku bi nêçîrvaniyê gihîştiye hêza xwe û dixwaze ji çembera jin-dayikê rizgar bibe. Hêza wî ya fizîkî û teknîka nêçîrvaniyê şensê wî yê bi awayekî serketî nêçîrê bike zêde dike. Bi ciwanên ku dixwazin ji van xisletên wî sûdê bigirin bi wan re yekîtiyekê datîne û bi vê yekê re serketî dibin. Belkî jî di dîrokê de eskerên xulam ên pêşî bi vî awayî çêbûn. Mêrê nêçîrvan di dîrokê de eşkere ji jinê zêdetir serdest bûye. Hevgirtina bi kalemerên qebîleyê re, wê bavpîrtiyê li hemberî dapîrtiyê xurtir bike.

Xeleka dawî ya bi wan re hevgirtinê dike, yên derman didin civakê û xwediyên mûcîzeyan Şaman in. Fonksiyonên hevpar ên rahib û sêhrbaz li cemê henin. Perwerdekar e; belkî jî di civakê de pisporê pêşî ye. Hinekî bi qeşmerî be jî pisporiya şaman di nava civatê de bi sazî dibe. Şaman zêdetir mêr e. Di avakirina xanedaniyê de bi hevgirtina bi van hêzan re nîzama dapîrtiyê derbeke mezin dixwe. Em di metnên Sumeran de şopên têkoşîneke mezin di navbera wan de dibînin. Mêr di bin vî nîzamî de hem xwediyê zarokan e, bav e; hem dixwaze bibe xwediyê gelek zarokan (ji bo hêzê bi taybet jî zarokên kur), hem jî

xwe dispêre van û danehevên jin-dayikê hemûyan desteser dike. Pergala milkiyetê pêş dikeve. Li kêleka milkiyeta kolektîf a dewleta rahib, milkiyeta taybet a xanedaniyê jî çêdibe. Bavtiya ji zarokan re ji vî alî ve jî hewce dike. Ango ji bo mîrate ji zarokan re (bêtir jî mêr) bimîne mafê bavtiyê şert e.

Têkoşîna di navbera aliyan de herçend di dema civaka Sumeran de heta salên 2000'î B.Z. mêzîna wê li dijî jinê xira bibe jî di nava weznekê de ye. Têkoşîna di navbera jin û mêr de ya heta îro dewam dike, mirov di dîrokê de bi rengên wê lêbikole wê sûdewar be û mirov wê karibe jê hîn bibe. Em ê hewl bidin vê yekê bikin.

Rahib karên rêveberiyê bi piranî bi rewakirinê dimeşînin. Di vê de hunera wan a herî mezin, berdevkiya xwedê û zanista bi yekdestiya wan bi dest dixin. Berdevkiya wan a Xwedê û vedîtinên wan ên zanistî hêzeke mezin a rêveberiyê dide. Em ji bîr nekin ku di kapîtalîzmê de jî ZANIST HÊZ e. Em bi bîr bixin ku hîmê vê zanistê di civaka neolîtîk de, nemaze di dema Til Xelef de (B.Z. 6000-4000) hat danîn. Kêrhatinî û alîkariya xwedawendên jin-dayikê di vê demê de diyarker in. Divê baş were fêmkirin ku jin-dayik di kedîkirina heywanan, tevahiya nebatan, tevn, kûzik û gîzikan, destar û hêran, mal û malên pîroz de hîndekar û perwerdekara pêşî ye. Xwedawenda dayik

Înanna di têkoşîna xwe ya li dijî xweda Enkî de, îdîaya wê ya herî mezin ew e ku bi israr ji Enkî re dibêje; sed û çar vedîtinên (me'yên) wê jê dizîne û ew xwediyê van vedîtinan e. Di bin vê israrê de ev rastiya em balê dikişînin ser heye. Ango gelek vedîtin berhemên jin-dayikê ne. Rêveberên mêr ev ji wan dizîn. Em ê bibînin ku qonaxa şaristaniyê hinekî jî li ser vî esasî hatiye avakirin.

Pirsa, ‘di sîstema Zîgûratan de rewşa jinê û malbatê çi bû ?’ girîng e. Dijberiya olê dayik-xwedawendê bi olê rahibên Zîgûratan re di metnên Sumeran de gelekî tê dîtin. Dijberî xwe bi gelek awayan nîşan dide. Rahîbe di bin giraniya xwe de perestgehan ava dikin. Hema bêjin her bajarek xwedawendeke xwe ya star û parastinê heye. Mînaka balkêş serhatiya Xwedawenda Ûrûkê Înannayê ye. Ûrûk (herhal navê Iraqa îro ji Ûrûkê tê) di dîrokê de weke dewlet-bajarê pêşî yê Sumeran xwedî cih û maneyekê ye ku di vê mijarê de mînakeke hêjayî lêkolînê ye. Her weha ji ber ku bajarê qralê yekemîn Gilgamêş e jî navdar e. Dibe ku Ûrûk mînaka pêşî ya dewlet-bajar be.

Di dîrokê de salên 3800-3000 B.Z. weke dema Ûrûkê cih digire. Ji ber ku damezrîner xwedawend Înanna ye, ev jî kevntiya bajêr û rola jin-dayikê ya hînê sereke ye, nîşan dide. Têkoşîna Ûrûkê li dijî Erîdûyê (bajarê xweda Enkî; belkî jî dewleta yekemîn a

rahiban) destanwarî ye. Di şexsê Înanna û Enkî de têkoşîna di navbera mêr û jinê de bi qasî mînakeke berçav e, her wisa aliyê wê yê destanwarî jî nîşan dide. Fîgurê xwedawendê bi demê re kêm dibe. Di dema Babîlê de jin ji sedî sed têkçûyî xuya dike. Jin bi qasî ku kole ye, her wisa êdî bi awayekî fermî orûsipiyeke taybet û giştî ye.

Tê zanîn ku di beşekî Zîgûratê de jinan weke objeyeke eşqê cih girtine. Hem jî keçên malbatên herî baş weke objeyeke eşqê rol girtine û ev yek jî payeyeke anorê ye. Keçikên neqandî û cihêwaz li wir têne qebûlkirin. Di nîzama rahiban de pêşandana jinan muhteşem e. Li Zîgûratan di nîzama qesran de di warê ciwanî û delaliyê de bi her awayî tên perwerdekirin. Di hin warên huner û muzîkê de dibin hoste û pispor. Ji bo ku mêrên herêmên dewrûberê biecibînin, têne pêşkêşkirin. Wexta bi hinan ji wan re li hev bikin, dihatin zewicandin. Bi vî awayî hem hatina aborî û hem jî bandora perestgehê gelekî zêde dibe.

Jingirtina ji perestgehê bi tenê para mêrên esilzade dikeve. Ji ber ku ev jin li perestgehê hatine perwerdekirin, qebîleyên nû yên diçin nava wan temsîl dikin û bi dewlet-civaka nû ve girê didin. Bi awayekî din, ev jin mîna ajanên gelekî baş ên civak-dewleta nû ya rahiban in. Di serî de Îsraîl hînê jî gelek dewlet vê rêbazê pir bi tesîr bi kar tînin. Bi vî rengî kolektîfkirina jinê prototîpa hunerê 'mala giştî' ye. Jin çiqas piçûk dikeve, jina eşqê û xwedawenda esilzade

ya perestgehan, dibe karkereke xirab a xwe dixe bazarê û neçar dibe dikeve ‘mala giştî’ ango kerxaneyê. Civaka Sumeran di vî warî de jî xwedî anor an jî bêanoriya yekemîn e.

Lê tiştekî din jî heye ku ez nebêjim nabe ez vê mijarê li pey xwe bihêlim. Eger ev rêbaz nehatibûya îstîsmarkirin û ber bi payeyeke birûmet-tir ve biçûya wê bibûya tiştekî îdeal. Çi nîzama jin-dayikê jêre pêşengî kir, çi jî nîzama mêr-bav jêre pêşengiyê dike, di wan de gihandin û mezinkirina keçan bi awayekî baş zehmet e. Ne zanîn, ne jî derfetên madî ji bo vê rê didin. Gihandin û mezinkirina jinê hostatî û madiyatê dixwaze. Ji bo jinan dibûya ku perestgehên jinan îdeal bûya. Lê civaka mêr têde serwer bi darê zorê û îstîsmarê van saziyan dixe.

Mirov dikare di vê mijarê de ji mînaka Sumeran têra xwe hîn bibe. Di dema Sumeran de saziyek heye civak dilê xwe dibijînê û her kes hewl dide keçên xwe bide wir. Li gorî vê, bi vî halê xwe jî hînê mînakek e ku mirovatiyê xwe negihandiyê. Keçik di van perestgehan de (mirov dikare wan bişibîne enstîtuyên keçikan ên îro) ji bo gelekî pêş bikevin xwedî derfet in. Armanca wan a bingehîn jî neqandina mêran nîn e, armanca wan pêşengiya dewlet-civaka nû ye. Ji bo civakeke hînê bi esil û bi eşq a destê mirov jê nebe alîkar in, kêrhatî ne. Di civakeke îdeal de divê keçik di nîzama hêlînek, dibistaneke bilind û pîroz de werin perwerdekirin. Bi taybetî her malbat û malbatên fireh

perwerdekirina wan a jinan gelekî paşverû ye û ji dayîna koletiya civaka giştî (civaka mêr) pêve tu armancên xwe nîn in.

'Enstîtuyên Jinan ên Azad' dikarin bi rola perestgehên hemdem rabin. Ez ê di parêznameya xwe ya bi navê Sosyolojiya Azadiyê de hewl bidim li ser vê babetê rawestim. Her weha ez ê hewl bidim bi tevahî li ser dabaşa malbatê jî bisekinim û ji hev derxînim.

Diyar e ku Zîgûratan gihandin û perwerdekirina jinê li gorî ku bikeve xizmeta dewlet-civaka nû kirine. Em fêm dikin ku rahib bi rastî hem bi awayekî balê bikişînin û avzûnkirî fikirîne, hem jî civak dewleta nû nêzî îdealê bi rêkûpêk kirine.

Derfetên xwedîkirinê yên li dora jinê pêş dikevin destpêka ekonomiyê ne. Xweza û jin di nava ahengeke lihevkirî de ne. Têgihîştineke ola xwezayî yê zindî bi dayika xwedawend tê sembolîzekirin. Beşekî mezin a amûrên madî yên hilberandinê, vedîtinên jinê ne. Li ser çanda xwedîkirin û cilûbergan jî mohra jinê heye. Bi şaristaniyê re ev nirx hemû wê bêne înkarkirin û di bin hegemonya zilam de veguherin amûrên zordestî û karê. Erdên dayik in, wê piçûk û haqîr bêne dîtin. Pirtûkên Pîroz wê weha bang li mêr bikin: 'Jin zeviyê we ne, hûn çawa dixwazin wisa biajon.' Ji vê jî xirabtir, ji ber ku bajarên Sumeran bi armanca kar û qezencê timî erd bi kar dianîn, axa zeviyan diriziya û vê yekê rê li ber çolbûnê vedikir û ev yek bi çolbûna lihevçêkirî

re mezintir kirine. Di çolbûna Mezopotamyayê de rola şaristaniyê gelekî balkêş e.

Tu koletî bi qasî koletiya jinê ji dil nehatiye qebûlkirin û rewakirin

Mîna belavbûna li dinyayê ya çanda civaka neolîtîk a çavkaniya wê Kevana Bi Bereket, pêvajoyeke mezin a duyemîn bi heman rengî li pey wê tê. Vê carê erdên Kevana Bi Bereket ên bi rola 'dergûşa şaristaniyê' rabûn, ewladê xwe yê za û mezin kir (êdî keçik nîn e, kur e) wê bi keçikên gihîştî yên dinyayê re bizewicîne û xwe zêde bike. Ev şibandin li cih e. Em dikarin qebûl bikin ku keçên xwedawend-dayikê di belavkirina çanda neolîtîkê de her devera lê gihîştin bi sazî kirin. Civaka şareza ya çanda serwer a mêr îfade dike, li deverên belav bû tê maneya bi sazîbûna zarokê kur. Mêrê xasûk zaroka keç kire pîreka xwe û bi xwe ve girê da. Ji neslê wî (civaka bi giranî jin wê di nava civaka mêr têde serwer de bihele) wê her mêr zêde bibin û mêrtiya şaristaniya me wê heta îro zêde bibe, bi hêz bibe û dewam bike.

Di civakên şaristaniyê de taybetiyeke ku xwe bi sazî kiriye heye ku divê mirov pir balê bikişîne ser. Em ji vê rastiyê re dikarin bibêjin rewşa civakê ya li gorî desthilatdariyê. Mîna ku jin çawa li ser kevneşopiya pîrekbûnê ji nû ve were afirandin, desthilatî jî bi

heman şêweyî heta civakê ji pîrekbûnê re amade neke, ji girtina bin ewlehiyê ya hebûna xwe piştrast nabe. Kengî bi tevahî çanda jin-dayikê ji aliyê mêrê bi hêz û yên di xizmeta wî de bi têkoşînên berfireh û demdirêj hat têkbirin û civaka cinsiyetparêz serwer bû, pîrektî weke koletiya herî kevn bi sazî bû. Ev çalakiya serweriyê belkî jî şaristanî hînê bi temamî pêşneketibû di nava civakê de cihê xwe dît. Ev têkoşîneke ew çend dijwar û zêde ye, tevî encamên xwe ji bîra mirovan çûye. Nayê bîra jinê ku çi, kengî û li ku çawa wenda kiriye. Stûxwariya jinê weke rewşeke normal û xwezayî ya jinê dihesibîne. Ji ber vê yekê tu koletî bi qasî koletiya jinê ji dil nehatiye qebûlkirin û rewakirin.

Du encamên vê pêkhatinê yên malwêran û xiraker li ser civakê çêbûne: ya yekemîn, civak li koletiyê vekiriye; bi tevahî koletî li ser hîmê pîrek-kirinê hatin meşandin. Pîrektî ne tenê weke tê zanîn objeyeke cinsiyetparêz e. Taybetmendiyeke biyolojîk bi bîra mirov naxîne. Pîrektî di cewherê xwe de taybetiyeke civakî ye. Koletî, stûxwarkirin, daqurtandina heqaretê, girî, hînbûna derewan, bêîdîabûn, xwepêşkêşkirin û her wekî din, bi tevahî tevger û helwestên bi vî awayî yên exlaqê azadiyê red dikin ji pîşeyê pîrektiyê têne hesibandin. Ji vî alî ve zemînek e, civak lê piçûk tê xistin e. Zemînê bingehîn ê koletiyê ye. Bê exlaqî, bi tevahî koletî û yên herî kevn, li ser vî zemînê bi sazî bûye kar dikin. Ha civaka

şaristaniyê bi nîşandana vî zemînî ya tevahiya kategoriyên civakê têkildar e. Ji bo sîstem bimeşe hewce dibînin ku civakê bi tevahî bikin pîrek. Desthilatî bi mêrtiyê re hemta û hemcewher e. Naxwe wê wextê pîrek-kirina civakê ferz e. Ji ber ku desthilatî prensîba azadî û wekheviyê nas nake. Berevajî nikare hebe. Wekheviya desthilatî û civaka cinsiyetparêz cewherî ye.

Yewnanî xwediyê yek ji qonaxên mezin ên şaristaniyê têne hesibandin. Li cem Yewnaniyan bi awayekî fermî ciwanên kur weke ‘kurên qûnde’ ji mêrekî bi tecrûbe re dihatin pêşkêşkirin. Min demeke dirêj sedema vê yekê ji hev dernexistibû. Fîlozofekî mîna Sokrates jî di vî warî de weha dibêje: ‘Ya girîng ew e ku kurik timî were bikaranîn û ji aliyê efendiyê xwe ve were terbiyekirin.’ Di vir de mentiq û armanc timî bikaranîna kurikan nîn e, zêdetir dixwazin wan bi taybetiyên pîrektiyê amade bikin. Em hînê bi awayekî zelal û were fêmkirin bibêjin; şaristaniya Yewnan civakeke bûye pîrek dixwaze. Heta ku ciwanên bi şeref û bi esil hebin ev civak ê çênebe; ji bo ev civak çêbibe divê tevgerên mîna jinan ji dil dawerivînin hinavên xwe û qebûl bikin.

Di tevahî civakên şaristaniyan de meylên bi heman rengî hene. Kuriktî (qûnde) di vê civakê de gelekî zêde û belav e. Ketiye rewşeke welê ku her efendî kurikekî xwe heye û ev yek weke kevneşopiyekê rûniştiye. Girtina kuran a ber destê

mêrên xwedî ezmûn ji rêderketineke cinsî û nexweşiyekê wêdetir, girîng e ku mirov wê weke diyardeyeke civakî ya civaka desthilatdar û civaka çînî bi nav bike. Di civaka şareza de desthilatî û seksualîte nexweşiyên civakî ne. Hem jî nexweşiyên mîna kansêrê. Bêyî hevdu nikarin hebin û hevdu zêde dikin: mîna şaneyên kansêrî yên zêde dibin. Jixwe em ê têkiliya di navbera kansêra ferdî û kansêra civakî de di modernîteya kapîtalîst de bi berfirehî şîrove bikin.

Ez ji wir dixwazim bêm vir: di civakên şareza de zemînê desthilatiyê bi hezarên salan hûrûkûr û bi mîsala pîrek-kirinê hatiye amadekirin. Hukmê kevneşopiya şaristaniyê ew e ku jin 'zeviya mêr' e. Kevneşopiyên bi heman rengî di nava civakê de jî xwedî hukm in. Mêr divê weke jinê xwe pêşkêşî desthilatdariyê bike. Yê serî rake, isyan bike, li ber xwepêşkêşkirinê rabe, wê hewl bidin bi şer wî amade bikin, wî bînin wê astê.

Jin, di çavê xwedayê Rojhilata Navîn de afirîdeyeke kêm e. Wê daxistine rewşa pêvekeke pir bintûte ya mêr. Koletiya cins heta awayên herî bê wate gihandine. Jin, diyariyek e ku bêsînor ji mêr re hatiye pêşkêşkirin. Ne weke mirov lê weke mal heta ku dixwaze dikare were kirîn û firotin. Ji bo li serê hemû mirovahiyê vê komployê bikin hemû olên serdema navîn her wekî bi hev re di nav pêşbirkê de ne. Gihîştiye rewşeke wisa ku rehmetê ji serdema

destpêkê re bixwînin. Di Xiristiyaniyê de engizîsyon, di Îslamê de girtina deriyên îçtihatê, li ser avahiya zîhnê mirov weke terora herî berfireh e. Ji aliyê din ve komplokariya qesrê çaxê xwe yê herî pêşketî dijî. Baweriya di perestgehê de bi komploya di qesrê de bi encam dibe. Her du jî hevdu derdixin holê, dizên.

Mîna xuyakirina dabeşbûna çînîdar a civakê ji bihuştê avêtina Adem û Hewayê û ew mehkûmî xizmetkariyê kirin bi vî rengî di nav mirovan de veqetîneke cîdî pêk tînin; xwedayên Sumer dikin afirîner û qûlên wan weke xizmetkar ji nû ve diafirînin. Afirînerî û kişkişandina di mîtolojiyên Enkî û Nînhursag-Înannayê de, ji aliyekî ve afirînkariya jinê ya kevn di plana duyem de dihêle û ji çav de dixîne îfadeya vê ye, ji aliyê din ve jî şekilgirina mirovê kole û xizmetkar sembolîze dike. Di hemû dumendiya xweda-qûl a paşê de ev sêwirana rahibên Sumer rol dilîze. Tevî ku ev xisûs gelek girîng e jî, pirtûkên olê xwe ji vê didin alî û heta bi tundî red dikin, sedema vê jî pêwîstiya veşartina rûyê wan ê rastîn, her wiha berjewendiyên wan e. Di civaka Sumer de nasnameyên xwedayî ku tên sêwirandin, xuyakirineke nû ya hem hêzên xwezayê û hem jî civakê, her wekî kozikgirtin e. Li gel aliyê xwezayî aliyê civakî jî derdikeve pêş, giraniya jinê her ku diçe kêm dibe; di veqetîna qûl, xizmetkar û mirov de pêşketinên balkêş tên dîtin.

Hêza polîtîk a civakê ku zêde dibe, dibe sedem ku beşek ji xwedayan ji nav derkevin û bilind bibin, hin nasname winda dibin û bi guherînên şekil ên girîng re rû bi rû dimînin. Di merhaleya Babîl de hêza mûtleq a monark, di bilindbûna xweda Mardûk de xuya dibe. Ev merhaleya dawî ya mîtolojiya Sumer nîşan dide ku hatiye gihîştine derketina olên yekxwedayî.

Dema qebîleyên çolê yên bi koka xwe Semîtîk hêz bi dest dixin çawa ku jiyana xwe ya bavkanî bi şaristaniya Sumer re digihînin hev, şerê xwedayan a di mîtologyayê de gur û geş dibe. Bandorên Sumer û jinê ji holê radibin û kevneşopiya qebîleya baviksalarî ya çolê dema dibe hêza polîtîk, wê berê xwe bide despotîzm û monarkê. Di şexsê Hamûrabî de kevneşopiya qebîle çolê wê koka feraseta kraltiya bi rengê "qanûn ez im" pêk bîne. Di heman demê de zêdebûna nakokiyên di navbera qebîleyan û di nav qebîleyê de, wê bi awayê kevneşopiya pêxember Îbrahîm, li hember hêza polîtîk a navendî ku xwe bi xweda re dike yek, ber bi muxalefetê ve daf bide. Pêxemberî, di feraseta ol a Sumer de wê rê li ber qutbûneke bi kok vebike. Li hember dema xwedayên di şeklê mirovan de, wê derbasî feraseta mirovahiyeke tu carî nikaribe bibe xweda bibin.

Di vê pêvajoyê de, bi taybetî di kevneşopiya Semîtîk de, rêzikên pir hişk ên civaka baviksalarî ya

xwe dispêre mêr, di cewhera xwe de bi rêzikên dayiksalariyê ya çanda Îştar (bi Înanna û Star re yek e) ku xwedawendeke neolîtîk a çiya û çandiniyê ye re dijberbûnek dihewîne. Ev, bi bermahiyên dawî bi bihurandina giraniya xwedawenda di çanda Sumer a di dema Babîl de ji nêz ve girêdayî ye, têkildar e. Ji vê demê û şûn de dayik, jineke xwedawenda kevn, êdî li mala xwe, sernerm û bi namûs e. Wekheviya wê ya bi xwedayan re li derekê, di rewşeke wisan de ye ku nikare dengê xwe bide bihîstin û rûyê xwe vebike. Hêdî hêdî di nav pûşiyan de tê pêçan, mîna harema mûtleq a mêrê xurt dîl tê girtin. Mûsa, di kevneşopiya Îbrahîm de ev hîn bi pêş xistiye.

Ger ku koletiya jinê li Erebistanê pir kûr be, bi vê pêşketina dîrokê ve girêdayî ye.

Dayika Îsa Meyrem, di awayê herî kevn ê kevneşopiyê de xwedawend e. Lê ji ber ku jin her tim statuya xwe winda kiriye, di dema zayîna Îsa de, heta tam rewşa amûra zayînê daketiye. Bi giştî jî wiha ye. Di navbera salên 2000 B.Z. û 2000 P.Z. de dîroka jinê, bi qasî ku dagirkerî û desthilatiya siyasî ji aliyê mêr ve bi pêş bikeve bi hîle û zorê, her tim dîroka çîna her tim di herî binî de ye. Li gel kolebûna mêr, bi sedema taybetiya cins, jin bi koletiyeke hîn giran tê mehkumkirin. Di dema Babîl de xwedawenda dayik Tîamat bi hev re şer dikin; heta di dema Mûsa de bi xizma xwe Marîam re şerekî dijwar tê jiyankirin. Bi hêsanî serî ji Mûsa re nedaniye.

Dema mirov li dayika Îsa Meyremê dihinêre tu bandoreke wê tune ye. Reb pif kiriye wê jî zaye. Maneya viya; mêr serdestê mûtleq e. Pifkirin, serdestiyê tîne ziman. Ji mezinkirina zarokê di hembêza wê û wêdetir tu rola jinê nemaye, sîmgeya vê ye. Mijareke din a girîng jî, ji vê pifkirinê re dibêjin Ruh-ul Qudûs (Ruhê Pîroz) û hewl didin ew hêza xwedayî ya rastî divê di jinê de temsîla xwe bibîne çelexwarî bikin, di şexsê Meyremê de ji jinê tê dizîn. Di şopa Sumer de ya bi viya re heman mîna ye dayika xwedawend e. Ya rastî ev mijar di warê îdeolojîk de xwedî girîngiyeke gelek mezin e. Ev nasnameya îdeolojîk, wê rê li ber veke jin di dema feodal de hîn jî ji holê rabe, bandora xwe winda bike, di viya de roleke xwe ya diyarker heye. Ji wê rojê û pê ve Meyrem her tim bintûte ne, bêdeng ji zarokên xwe re digirîn, bi tevahî bi mêrê xwe ve hatine girêdan û weke dîlên heta bi hetayê ne. Tevî ku tu eleqeya vê rewşê bi xwezayîbûna jinê re tune ye, bi serdestiya siyasî ya mezin a mêr re girêdana vê jî misoger e. Demekê çawa çaxê xwedawendên jin serwer bû, di vê dema dîrokê ya çînîdar û bi dewlet de jî çaxê xwedayên mêrane serwer e. Ev rastî, di kûraniyên dîrokê de terkî tarîtiyê hatiye kirin û ji aliyê mêr ve her tim bi feraseteke namûs-haremê bi durûtî hatiye veşartin. Lê bi asta azadiya civakî ya ku wê têkoşîna azadiyê derxe holê ve hevgirtî wê ev derkeve holê û manedar bibe.

Şexsiyeta Hz. Mihemed, di bin badora şertên demê ku bi kurtasî hatin ziman pêşketineke heta bibêjî bi nakok nîşan dide. Çandên sê împaratoriyên mezin ku belav dibin, gelek li pêşiya çanda qebîleya Ereb e. Cudahiya navbera wan bi qasî çiyan mezin e ku mirov nikare bide ber hev. Totemên qebîleyan ên li Panteona (civaka xwedayan) Kabeyê kom bûne ne zindî ne û tu taybetiya wan a wê tu hêzî îlham bidin nemaye. Her çiqas Lat, Menat û Ûzza mîna yên herî mezin hurmetê dibînin û qebîleyên giregir temsîl dikin jî, ev jî nikarin îlhamê bidin şaristaniyeke nû; berevajî, her ku diçe ji sedema wan fikrên nû û terîqetên mîstîk tên qedexekirin. Di joravahiyê de zîhniyet û saziyên ku muhafezakariya qebîleyê esas digire serwer e. Her kes tenê bi qebîleya xwe pesnên xwe dide. Jin biçûk tên dîtin, zarokên keçik terkî mirinê dikin.

Di navbera Mekke û Şamê de rêwîtiyên bazirganiyê, ji bo Hz. Mihemed di kamilbûna fikrî de xwedî girîngiyeke bingehîn e. Tê zanîn ku rahibên Nestûrî yên Xiristiyan pir guhdar kiriye, bi wan re nîqaş kiriye. Ji ber Xetîce bi wî bawer bûye, jê hez kiriye û pêre zewiciye, xwedî girîngiyeke diyarker e ku derbarê jinan de bigihê fikrên erênî. Bêyî Xetîce, mimkun naxuyê ku Mihemed bibe pêxember. Bi vî aliyê xwe ve Xetîce, sergirtî be jî ji Meyrem gelek zêdetir xwedî bandorek e û di rewşa temsîlkirina

çanda jina xwedawend de ye. Ger ku dîroka Îslamê rola Xetîce bi layiqî nade sedem serdestiya avahiya civakî ya mêrê serdest e. Aşîkar e ku di civaka Mekkeyê de ya pêşî destekê daye Mihemed Xetîce ye. Bi temen jî ji Mihemed mezin e û bi qasî xwedî karwanekî bazirganiyê be dewlemend û bihêz e. Civaka Mekkeyê jinê biçûk dibîne û bi qasî wê zarokên keçik bi saxî terkî mirinê bike bi serdestiya mêr e, di vê rewşê de aşkera ye ku wê Xetîce nakokiyeke cidî derxîne holê. Li gorî ku wê bi tena serê xwe nikaribe bi vê civaka har re serî bikşîne, têkilî û zewaca wê ya bi Mihemed re wê pir watedar be. Ji hezkirinê jî wêdetir, li hember civaka fermî ya Mekkeyê weke mînakeke destpêkê ya îdeolojîk û kakilê polîtîk e. Heta ku bimire Mihemed bi jineke din re nazewice, ev ji hurmetê jî wêdetir bi hêza madî û manewî a Xetîceyê re girêdayî ye. Di pêkhatinê de para wê aşkere diyar e, ji ber ku pêxemberiya Mihemed destpêkê ew erê dike.

Paşê yê destpêkê ji Hz. Mihemed bawer bibin pismamê wî Hz. Elî yê zarok û Zeyd ê ku di rewşa koleyê wî de ye. Ev dîmen, wesfa şoreşger a komê bi aşkerayî nîşan dide. Di şexsê Elî de bi rengekî şoreşger girêdanên qebîleyê parçe dike, di şexsê Zeyd de jî koletiyê bexş dike û bi şoreşê ji holê radike. Ya rastî di van her sêyan de sê şoreş, seretayî be jî hatine pêkanîn. Bi têkiliya Xetîceyê şoreşa jinê, bi Elî şoreşa qebîleyê û bi Zeyd re li hember koletiyê şoreş tê pêkanîn. Ji ber ku jiyaneke komunî li dar xistine jî,

şêwazekî şoreşgerane di jiyana wan de heye. Ji ber ku kom li ser van esasan mezin dibe, manîfestoya îdeolojîk jêveneger e. Mihemed beriya ku bibe pêxember demeke dirêj li Çiyayê Hîrayê dimîne, ev pêvajoya lêhûrbûna îdeolojîk e. Di demên pêkhatinên pêxemberî de pêvajoyên heman mîna vê tên jiyankirin. Di Ehdê Atîk de dûdirêj tê qalkirin ku Mûsa li çiyayên Sînayê pêvajoyeke wiha jiyan kiriye.

Tevî van gavên dîrokî, mirovê bi koletî û serftiyê hatiye biçûkxistin, ji qezenckirina girîngiyeke navendî bi tevahî dûr e. Lê jin hîn jî di kûrahiyan de, kêm, bêaqil û ya tim ji bo guneh vedixwîne, mehkûmî nasnameyeke xizmê şeytên hatiye kirin û mîna ji çarenûsa xwe re hatiye razîkirin disekine. Mirovahî hinek tê pêşxistin lê ew hê ji mîna mirovekê nayê hesibandin. Tebeqeya serdest û dagirker jî, bi nazenînî hewl didin bi wesfên xwedayî û ji nîjada mirovê hatiye biçûkxistin cuda bidin nasandin; bi hewldanên girîng nasnameyên îdeolojîk ên li gor vê tên pêşxistin. Çarenûs û rastiya ku şaristaniyên berê layiqî mirov didîtin bi xetên qalind wiha ye.

Pirsgirêka Jinê bi qasî di çarçoveya civaka kapîtalîst de neyê girtin berfireh e

Jin, weke çîna herî kevn û di bin de mijara çewisandin û dagirkeriyeke qat bi qat e. Pirsgirêka jinê

ku hê nû nû pêşiya wê vedibe, bi qasî di nav çarçoveya civaka kapîtalîst de neyê girtin mijareke berfireh e. Azadiya jinê weke pîvanga giştî ya hemû azadiyan hê xwe amade dike ku gavên destpêkê bavêje. Ji çaxê jinê derbasbûna çaxê mêr, li dijî jinê rê li ber windahiyên mezin vekiriye. Dîroka civaka çînîdar a pênc hezar salî zêdetir bi jinê daye widakirin. Bi her aliyî ve çewisandin, heqaret, cudakeriya cinsî, her cure newekhevî layiqî jinê hatiye dîtin. Jina her wekî şewitiye, hatiye şewitandin, hewl dide ji bin ariya xwe nû nû xwe paqij bike û derkeve. Li şûna ku weke mijareke sereke, mafên takekesî bêyî ku bi şertekî ve bên girêdan ji bo jinê bên dayîn, ji dawiyê ve û ew jî bi sînor dikin rojev ku ev, bi aliyên neheqiyê yê kûr û dîrokî ve girêdayî ye. Mijar, bi qasî ku bibe baskekî zanistê yê civaknasiyê berfireh û bi serê xwe bi bername, bi plan, demdirêjî bi rêxistinî pêwîst e bikeve têkoşîna demokratîk, siyasî û hiqûqê girîng e. Ji têkoşîna neteweyî, çînî hem ji aliyê cewherî û hem jî şeklî ve hîn xweser e û di girîngiyeke jiyanî de ye.

Ji bo vê mijarê dixwazim mînaka jinê analîz bikim û bi vî awayî vî beşî bi dawî bikim. Bêguman lêkolînên femînîst hê bi pêşketinên nû ji bo rastiya jinê derkeve rûyê zemîn alîkariyeke girîng didin. Lê ez yeqîn dikim ku ev xebatên ez behsa wan dikim bi giranî di bin şert û mercên serweriya zilam de têne meşandin. Bi zêdeyî reformîst in. Gelekî heyatî ye ku

mirov bi nêzikatiyekê di tevahiya kokê de bi mijarê ve dakeve.

Lêkolînên biyolojîk di nava cinsê mirov de rola jinê ya kokbûnê rohnî dikin. Yê ji gewdê rastî veqetiyayî ne jin, zilam e. Ji ber ku jin ji diyalektîka pêkhatina gerdûnê dernakeve hestiyar e. Nemaze di dema şaristaniyê de tim li qatê herî jêr hat hiştin, vê kir ku ev avahiya xwe heta roja me ya îro bîne. Aqlê zilam timî dixwaze aqlê jinê yê hisbarkirî weke 'kêmaqiliyê' û vê jî weke karektera wê bi xwe nîşan bide. Aqlê zilam, li ser jinê çend operasyonên mezin meşandine, dimeşîne:

Yekemîn, ew kiriye koleya pêşî ya malê. Ev pêvajo bi tepisandin, zordestî, destavêtin, heqaret û tevkujiyên xeternak barkirî ye. Rola ji bo wê tê naskirin ew e, ji nîzama milk re bi qasî ku tê xwestin 'dolan' bîne. Îdeolojiya xanedaniyê bi vê dolê ve gelekî girêdayî ye. Di nava vê statuyê de jin ji sedî sed milk e. Bi qasî ku nikaribe rûyê xwe nîşanî kesekî din bide, namûs û malê xwediyê xwe ye.

Duyemîn, amûrekî seksê ye. Di tevahiya xwezayê de têkiliya cinsî ji bo zêdebûnê ye. Bi armanca dewama jiyanê ye. Li cem mêrê mirov, nexasim bi êsîrkirina jinê re, bi giranî jî di pêvajoya şaristaniyê de rola bingehîn ji seksê, xwesteka têkiliya cinsî ya sînornenas û belovajî pêşketina wê re tê dayîn. Li cem heywanan demên cotbûnê gelekî bi sînor in (bi giranî salê carekê), lê li cem mirovê mêr

hema hema dixwazin têkiliya cinsî derxin rojê bîst û çar saetan. Jin ber bi roja me ya îro ve kirine amûrek timî her cure seks, xwesteka cinsî û desthilatdariyê li ser tê ceribandin. Cihêkirina ji hev a malên taybet û giştî êdî tu maneya xwe nemaye. Ji ber ku her cih û her jin êdî jina mala giştî û taybet tê hesêb.

Sêyemîn, kedkara bêheqdest û bêberdêl e. Karûbarên herî zehmet bi wê têne kirin. Berdêla wê, hinekî din wê neçarî 'kêmbûnê' dikin. Ew qas piçûk hatiye xistin, bi rastî xwe li gorî mêr 'kêm' mayî qebûl dike û ji lewra jî bi her çar lep û lingan xwe bi dest û serdestiya mêr ve girê dide.

Çaremîn, ew kirine metayê herî tenik. Marks ji bo pere dibêje 'qralîçeya metayan.' Ya rastî, ev rol zêdetir a mêr e. Qralîçeya rastî ya metayan jin e. Têkiliyek nîn e ku jin jêre neyê pêşkêşkirin. Ti qad jî nîn e ku jin têde neyê bikaranîn. Bi cudahiyekê, her çiqas her meta berdêlekî xwe yê hatiye qebûlkirin hebe jî ji bo jinê ev berdêl ji bêşermiyeke mezin a bi navê 'eşqê' bigirin heta zirta "Heqê keda dayikan nayê dayîn" bêhurmetiyeke mezin e.

Kirine ku evdîtî-koletî weke rejîmeke asayî were qebûlkirin. Koletiya jinê ya şaxên wê kevin diçin, xwe heta dema pêşî ya hiyararşîk dike jî kirine mijara herî berfireh a jiyanê. Mîna ku ji civaka dayikê ya neolîtîk, ji civaka dayika pîroz tolê hilîne, nîzamên xwedayî yên bi serweriya mêr hatin avakirin. Xwedawendiya jinê

şopên wê hêdî hêdî wenda dibin, xwedayên di formê mêr de serdema serweriya wan a bi heybet dest pê dike. Hê di wê demê de jin hem di tevahiya perestgehê de, hem jî di kerxaneyên rezîl de neçarî fahîşetiyê kirin, ew di wir de girtin.

Dîltiya jinê têra xwe hatiye kûrkirin. Jin ne bi tenê li malê zarokan tîne û weke koleya bi barên herî giran radibe xizmetê ji mêr re dike; tevlîbûna wê ya polîtîka, spor, zanist û rêveberiyê qedexe ye. Jinê dibezînin tevahiya karên giran ên hilberînê. Eflatûn di wê fikrê de ye ku jiyana bi jinê re wê zirarê bide esilzadetiya mêr. Ji ber vê sedemê homoseks zêde bûye. Li derveyî jinê jî koletî gelekî pir û belav bûye. Cara pêşî hejmareke zêde ya koleyan derdikeve holê. Saziya eskeran a pere tê vedîtin. Ne bi tenê alav, koleyan jî difiroşin derve. Li beramberî vê çîneke efendiyan a herî kurtêlxur çêbû. Têgîna arîstokrasiyê pêk tê. Qada civakî bi hêmanên civakî yên kurtêlxur tijî bûne. Beşên herî nêzî çîna bûrjûvayê berhemên şaristaniya Grek in. Bi kurtî, li pirsgirêkên qada civakî yê nû zêde bûne û yên kevn jî bi awayekî hê zêdetir giranbûyî dewam kirine.

Hiyerarşiyên pêşî bi giştî weke serweriya mêr li ser jinê pêk hat, lewma mirov dikare ji pirsgirêka pêşî ya civakî re pirsgirêka jinê bibêje. Paşê çînên civakî, bi avabûna çîna kole û pirsgirêkên civakî yên li cudabûna

cinsan guhdarî nakin ku îlhama xwe ji koletiya jinê girtin, derketin holê. Di vê qonaxê de, di civakê de hiyerarşî û çînîbûn dikevin zik hev û her ku diçe dema civakên bi pirsgirêk a di tevahiya qadên civakî de bi bandor dest pê dike. Cinsparêzî û çînîparêziyê yekser mohra xwe li her qada civakî xistin.

Yek ji sêlingên distana modernîteyê, kapîtalîzm bi xwe wexta şensê sîstembûnê zevt kir, bi tesfiyekirina civakbûnên sereke yên pêşî û paşiyê dîrokê bûn, dest bi kar kir. Berê pêşî bi slogana ‘nêçîra pîresêhran’ hêza civakbûna jinê ya hewl dida li ser piyan bimîne, di nava agir de bi qirçeqirç şewitandin. Mirov nikare nêçîra pîresêhran ji sermayeyê serbixwe bifikire. Di avakirina hegemonya xwe li ser jinê de weke koletiyeke kûr, ev gerdîşên şewitandinê heta dawiyê li hesabê wê hatin. Di roja me ya îro de bi vî awayî piçûkxistina jinê û ketina wê ya xizmeta sîstemê, bi pêkanîna van şewitandinên di dema qonaxa derketina holê ya hegemonya kapîtalîst de ji nêz ve têkildar e. Bîranînên dehşet ên şewitandinê, jin li Ewrûpayê bi awayekî bêsînor xistiye xizmeta mêr.

Sîstemê piştî jinê, bi awayekî bêrehm civakbûna gund-cotkariyê jî hilweşand. Heta ku aliyê wê yê komin demokratîk li ser piyan bimana wê desthilatdarî û kara herî zêde bi dest nehata xistin û ji ber vê jî civakbûna gund-cotkariyê bivê nevê, bûbûya hedef.

Jiyana modern a serdest li dora koleya herî kevn ango jinê bi temamî veguherandine xefikekê. Jin di kapîtalîzmê de xistine rewşeke welê ku mirov jêre bibêje 'keybanûya metayê' di cih de ye. Ne bi tenê bêheqdest tê xebitandin, bi heqdesta herî kêm dixebite û ji bo kêmkirina heqdestan weke amûrekê tê bikaranîn. Yek ji wan hêmanên sereke ye ku bi nermî tê xebitandin. Makîneyeke zarokanînê ya îndustriyel e ku timî ji sîstemê re nifşên nû amade dike. Amûra sereke ya îndustriya reklamê ye. Ji bo pêkhatina desthilatdariya cinsiyetparêz amûrek e. Ji împaratorê global heta bi împaratorê biçûk ê nava malê amûrê desthilatdarî û xweşiya bê sînor a hemû mêrên serwer e. Ji bo yên hîç desthilatdariya wan tune ye, alaveke desthilatdariyê diafirîne. Jin bi qasî ku di dema modernîteya kapîtalîst de hatiye îstîsmarkirin di demeke din a dîrokê de nehatiye îstîsmarkirin.

Bi sîstema kapîtalîzmê re rengê jinê yê derketiye holê, eger mirov mîna mal bibîne, dikare me hînê nêzî rastiyê bike. Em dizanin, di serdema koletiya klasîk de herî zêde jin li bazaran dihat kirîn û firotin. Ev rewş di serdema koletiya feodal de jî bi navê cariyetiyê dewam kiriye. Ya li vir tê firotin bi tevahî jin e. Qelen û kara siyasî ya ji vê meseleyê, aliyekî din ê mijarê ye, xwe dawerivandiye heta nava malê. Di kapîtalîzmê de mîna qesabekî (goştfiroş) gewdeyê wê parçe parçe ji

hev tê veqetandin û ji bo her parçeyekî buhayek hatiye destnîşankirin. Ji porê wê heta paniya wê, ji sînga wê heta qorika wê, ji navika wê heta berzika wê, ji nav milên wê heta çongên wê, ji nava wê heta çîpên wê, ji çavên wê heta lêvên wê, ji hinarokên rûyê wê û heta parçeyên stûyê wê, tu cih û parçeyê wê nemaye buha lê nehatibe birîn. Pir mixabin nehatiye pirsîn, gelo ruhê wê heye yan na, eger heye, nehatiye hişê wan bibêjin ew çiqasî dike.

Jixwe ji aliyê mejî ve ji berê de "kêmaqil" e. Li malên taybet û kerxaneyan amûrek e ku zewqê dide. Makîneya zarokanînê ye. Karê herî zehmet zarokanîn ji kedê nayê hesibandin. Dîsa yek ji karê herî zehmet zarok mezinkirin, heqdesta wê nîn e. Li hemû saziyên girîng ên wek ekonomî, civakî, siyasî û saziyên eskerî cihê wê ji bo bibe numûne heye. Amûreke reklaman e jê nayê gerîn. Di nav afirîneran de ya herî zêde wek malekî cinsî li pazaran tê firotin e. Ya herî zêde jê re dijûn têne dayîn û tê lêdan e. Di çîroka evînê de ya herî zêde tê xapandin ew e. Li her tiştê wê dest tê werdan. Nasnameyeke ji bo bi jintî bipeyive ya herî zêde bi deng û rengê wê hatiye lîstin. Mirovek e, bi mirovatî hevaltî pê re nayê kirin. Jin ew kes e ku li ba mêrê herî ji xwe re bibêje ez mêr im, ji hisa êrîşê xilas nabe. Jin êdî malek e, her mêr xwe li ser wek împarator dibîne.

Ji ber ku koletiyên din –koletiyên zarok û mêran –li ser şopa koletiya jinê têne çêkirin, jiyana civakî ya

kapîtalîzm ferz dike, ji bilî efendiyan bi qasî ku her kesî kiriye zarok ewqasî jî kiriye kole. Jiyana sosyal a civaka roja me ya îro hem weke kalekî kiribin zarok zarokî kirine hem jî kirine mîna pîrekan. “Gel û civak hez dikin ku mîna pîrekan bêne birêvebirin” ev gotina navdar a Hîtler vê rastiyê îfade dike. Malbat saziya herî kevn e ku li dora jinê pêk hatiye û dîsa li dora jinê tam ji hev de dikeve. Tişta malbatê ji hev de dixe şêwazê danehevê yê kapîtalîzmê ye. Ev şêwaz çiqasî civakê nehêle, tune bike, ewqasî pêk tê, lewma encama mirov dibîne û li bendêye ew e, çi qasî şaneya bingehîn a civakê ango malbatê biqedîne ewqasî wê karibe civakê biqedîne û atomîze bike.

Ya maskeya rûyê modernîteyê tîne xwarê, dîsa rewşa îflasê ya malbatê ye. Di şaristaniya Rojava de îflasa malbatê bi tenê qelsbûna têkiliyên civakî nîşan nade; nakokiya bi civakê re, rewşa kaotîk û krîzê jî bi kûrahî nîşan dide. Çawa ku koletiya jinê asta koletiya civakî diyar dike, rewşa kaotîk a di têkiliyên mêr-jinê de jî rewşa kaotîk û nakokiya modernîteya kapîtalîst a roja me ya îro nîşan dide.

Demografya, pirsgirêka şêniyan, ji pirsgirêka çînî qat bi qat zêdetir ji bo dinya û civakê tehlûke ne. Pirbûna şêniyan ji nêz ve bi civaka cinsiyetparêz û modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Bîst û çar saetên rojê xwesteka cinsî ya natemire, çanda xanedanî û

malbatê, polîtîka kapîtalîzm û dewleta netewe ya ji bo kara herî zêde û hêzê bi xwe re bend û sukurên li pêşiya pirbûna şêniyan diteqîne, radike. Wexta ku alîkariya teknîk û tibê li vê bê zêdekirin, rastiya derdikeve holê, ji aliyê dewamkirina civak û hawîrdorê ve rewşa herî bi tehlûke îfade dike. Kaosa demografîk bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Dinya me û hawîrdor ji mêj ve hecmê wê yê heyî (eger zêdebûna şêniyên 6,5 mîlyar bi vî awayî dewam bike) gihîştiye wî sînorî ku nikare barê wê rake. Ji vî alî ve jî nirxandina îflasa sîstemê girîng e.

Divê mirov baş zanibe ku jin weke amûreke zarokanînê xistine bin barekî xeternak û xwe lê ragirtina wê gelekî zehmet e. Ji bûyîna xwediyê zarokan wêdetir, çavkaniya pirsgirêkê sîstemeke nanozikê û suxrekar a girankirî ye. Herweha divê mirov baş zanibe ku zarokanîn ne biyolojîk e, diyardeyeke sîstemwarî û çandî ye. Her zarok ji aliyê çanda heyî ve ne carekê, gelek caran tê maneya mirina jinê. Çandeke zarokanînê hewce ye ku qîma xwe bi hindikî bîne, bi tevahî tevdîrên tenduristiyê bigire û beriya her tiştî divê ji aliyê zîhnî ve ji bo zarokanînê hatibe amadekirin. Fikra hêzê û bêserûbinîbûnê ne bi rêya zarok, divê mirov bisipêre agahî-zanîna mutleq û bedewiyê, gihîştina civaka exlaqî û polîtîk, eger mirov bi van xusûsên pêşî tên, gihandina zarokan bi awayekî yekpare analîz bike, wê hê manedartir û baştir bibe. Xulase, divê mirov mezinkirin û gihandina zarokan li

gorî pêdiviyên civaka ekonomîk û ekolojîk û li ser bingehê felsefeya azadiyê analîz û çareser bike.

Pirsgirêka ekonomîk bi awayekî bingehîn kengî jin ji nava ekonomiyê tê derxistin, dest pê dike. Ekonomî bi xwe jî her tişta dibe mijara xwedîkirin û debarê, digire nava xwe.

Dibe ku seyr xuya bike, lê li gorî min, tevî hewldanên dagirkerî û mêtingeriyê hemûyan, xwediyê rastî yê ekonomiyê jin e. Eger em bixwazin ekonomiyê ji aliyê sosyolojiyê ve bi awayekî manedar bigirin dest, helwesta herî rast ew e ku em weke hêza bingehîn jinê bibînin; ew zarok di zikê xwe de hildigire, piştî zayîneke bi zehmet, heta li ser piyan bisekine bi awayekî pir zehmet xwedî dike. Pîşesaza xwedîkirinê ya malê jin e. Wê demê divê em qebûl bikin ku jin hêza herî bingehîn e. Bersiva min sosyolojîk e ku ji rastiyê re bi hurmet e. Ji sedî sed ez têkiliya mijarê ji aliyê biyolojîk ve li ber çavan digirim. Jixwe tevî rola wê ya di şoreşa cotkariyê de bi berhevkirina pincaran a bi milyonan sal û ne tenê di hundirê malê de di gelek qadên ekonomiyê de jin ew hêz e ku hînê jî çerxê digerîne. Yewnanên antîk xwediyê anora danîna hîmê zanistan in; yewnanan ji ekonomiyê re qanûna malê, qanûna jinê digotin. Vê yekê jî ev rastî beriya bi hezaran salan piştrast kiriye.

Di rêza duyemîn de kategoriya kole, serf û karkeran heye. Hêzên şaristaniyê ew weke hunerekî sereke ji bo desteserkirina berhemê zêde û nirxê zêde bi rêbazên bêrehm û dewamî di bin destê xwe de xebitandine. Di rêza sêyemîn de hinekî din ên azad, her cure pîşesaz, bazirganên piçûk, dikandar û cotkarên xwediyê erdên hindik hene. Em li van hunermend, mîmar, muhendis, bijîşk û erbabên pîşeyên din zêde bikin, kêm zêde em ê tabloyê temam bikin.

Kapîtalîzm dijminê jinê ye ku jin hêza sereke û afirînera ekonomiyê ye. Me di tevahiya analîza xwe de hewl da ku ispat bikin; cihê jinê di jiyana civakî de û nirxê wê yê ekonomîk li asta bilind û yekemîn e. Çawa di tevahiya dîroka şaristaniyê de jî wisa bû, di qonaxa şaristaniya kapîtalîst de rastiya, 'jina ji ekonomiyê hatî kirin' ji jiyanê hatiye qutkirin, dema herî bê rehm dibîne. Ev yek veguheriye nakokiya civakî ya herî kûr û balkêş. Piraniya jinan bê kar hatine hiştin. Tevî ku karên malê, karên herî zehmet in, pênc quriş nirxê karê malê tune ye. Dîsa zarokanîn û mezinkirin karên herî zehmet in, ne tenê qîmeta xwe nîn in, her wisa weke bela têne dîtin. Jin hem karkera erzan e, bêkar e, makîne ye zarokan tîne û bi hezar zehmetiyî wan mezin dike, hem jî heqdest nagire û bi ser de jî gunehkar e! Di tevahiya dîroka şaristaniyê de jin li zemînê herî jêr hatiye bicihkirin. Lê tu sîstemê li ser

jinê, bi qasî civaka kapîtalîzmê nikaribû bi awayekî sîstematîk hêza îstîsmarê pêşde bibe. Vê carê jin ne bi tenê di zemînê jêr de li tevahiya qatan objeya newekhevî, neazadî û nedemokrasiyê ye! Ya hînê xeternak ew e ku sîstema kapîtalîst bi awayekî bi tu dema dîrokê re qiyasa wê nebe, bi dijwarî û tundiyeke nedîtî desthilatdariyeke civaka cinsiyetparêz ava kiriye, vê desthilatdariyê heta bi organên mahrem ên mirov daxistiye, zêde kiriye, jin kiriye îndustriyeke seksê, êşkence li tevahiya tebeqeyên civakê belav kiriye û 'civaka serwer a mêr' di vê dema şaristaniya kapîtalîst de mezin kiriye, mîna ku ji 'ekonomostanê' ji kirdara afirîner a ekonomiyê tolê hilîne, dijmintiya xwe ya jin û ekonomiyê li her dever û mekanî ispat dike!

Ekonomî weke gotin, aydî Serdema Kevn a cîhana Grek-Helen e. Weke qanûna malê tê şîrovekirin, ev yek hem têkiliya wê ya bi jinê re destnîşan dike, hem jî rewşa erka siyasî ya kevneşopiyê eşkere nîşan dide. Ew di ser ekonomiyê re mîna rola yekdestdariyê ya di serdema kapîtalîzmê de bi rola yekdestdariya siyasî radibin.

Mêrê bihêz û xasûk ê dest pê kir gav avêt qonaxa mêrê serwer û di nava kulmozên hêzê yên super de cihê xwe girt, di vê pêvajoya dirêj de rêyeke bi labîrent û tijî bêbextî dişopîne. Gelekî girîng e ku mirov

mekanê vî mêrî yan jî mêran ên carnan eşkere lê dixuyên û carnan jî xwe vedişêrin lêbikole. Eger mirov wan timî weke hêzên timî di nava pêngavên stratejîk ên civakî (ekonomîk, siyasî, eskerî) û taktîkan de bifikire wê me bêhtir nêzî fêmkirina rastiya wan bike.

‘Mêrê bihêz û xasûk’ mîna dizekî ket ekonomiya malê ya jinê. Qîma xwe tenê bi talanê jî neanî. Ya hînê xirabtir û tehlûketir jî jin xist rewşeke timî destavêtinê û malbata pîroz kir mîna nivîna Çil Heramiyan. Rewşa xayînekî dizane çi dike tu carî neterikand. Tovên danehevên sermaya pêşî li du mekanan  hatin çandin. Yekemîn, li nêzî ekonomiya malê, mal bi xwe hat dagirkirin; duyemîn, li dijî yekdestdariya fermî ya rewa ya dewletê yekdestdariya taybet li baregehên navendî yên çil heramiyan an jî li nêzî wan mekan girtin. ‘Mêrê bi hêz û xasûk’ ji ber ku ji çavdêriya civak û dewletê direve, pir zû bi maske û hîle di nava mekanan de geriya. Kemîn danî. Kengî keys dît weke şêrekî xwe çengî ser nêçîra xwe kir. Carnan bi xasûkiya rovî nêçîra xwe zevt kir. Mîna bûkalemûn li gorî rewşê reng girt. Di nuqteyên marjînal de xwe weke pisporê bazirganiyê îlan kir.

Jina li derveyî ekonomiyê hatiye hiştin bi xwe afirênera rastî ya ekonomiyê ye. Jin û ekonomî hêmanên mîna goşt û neynûkê bi hev ve girêdayî ne. Ji ber ku aboriyê li gorî pêdiviyên bingehîn dimeşîne, ne bi pêxîrtengiyê re rûbirû dibe, ne hawîrdorê qirêjî û

gemarî dike, ne jî gefan li avhewayê dixwe. Kengî dawî li hilberîna bi armanca karê bê anîn, rizgarbûna dinyayê jî wê bi rastî dest pê bike. Ev jî rizgariya mirov û jiyana wî ye.

Cinsiyetparêziya civakî têgîneke bi desthilatdariya di têkiliyên mêr-jinan de bi sînor nîn e. Desthilatdariyeke di her astê de li civakê belavbûyî, îfade dike. Desthilatdariya dewletê ya bi modernîteyê herî mezinbûyî nîşan dide. Tu obje bi qasî jinê tehrîk nade kirin û ji bo desthilatdariyê nabe mijar. Jin weke hebûneke kirine obje, xwedî wan xisletan e ku desthilatdariyê herî zêde bike. Timî di rewşa tehrîk-kirin û pirkirina desthilatdariyê de tê hiştin. Mirov di vê çarçoveyê de têkiliya jinê bi desthilatdariyê re analîz bike, ji bo eşkerekirina heqîqeta wê girîng e. Her zilam bi zêdeyî xwedî wê zîhniyetê ye ku hêrsa xwe ya desthilatdariyê li ser jinê pêk bîne. Heman zîhniyet weke hêrsa desthilatdariyê ya cinsê jinê ya li ser hev û zarokan pirtir dibe û tê bicihanîn. Vê carê jin dibe gurê jinê. Bûyera jêre reaksiyona zincîrwarî tê gotin, ev e.

Rola jinê di sîstema kapîtalîst a mêtinkariyê de gelekî bêhtir dest dide û eşkere ye. Ji bo sîstemê, bi tenê zarokan bêheq nayîne û mezin nake, bi heqdesteke herî kêm baz dide her kar û suxreyî. Li ser artêşa bêkaran di pozîsyona zextê û timî kêmkirina sîstema heqdestan de tê girtin. Cihê xemê ye, tevî ku

xwediya keda bi cewr û cefayê ye, Marksîst jî di navê de, tu doktrînê hewce nedîtiye behsa ked û mafê jinan bike. Ji bo vê, analîzên hewce û helwesta polîtîk pêşde nabe. Nîşaneyeke din a berfirehiya cinsiyetparêziya civakî ya serweriya zilam piştrast dike, der barê keda jinê de ye.

Serweriya zilam a ku hiyerarşiya ji kevneşopiyê li ser jinê pêşde bir, di tevahiya dîroka şaristaniyê de timî hatiye bitesîrkirin. Desthilatdariya di forma dewleta netewe de hatiye mezinkirin, hêza xwe bi giranî ji vê cinsiyetparêziya zêde û belav dike, digire. Cinsiyetparêzî fonsiyoneke normal a biyolojîk nîn e; îdeolojiyek e ku herî kêm bi qasî miletgiriyê rê li desthilatdarî û dewleta netewe vedike. Ji bo mêrê serwer, cinsiyeta jinê objeyek e ku her cure îhtîras û çavbirçîtiya xwe li ser têr dike. Gotina di Pirtûkên Pîroz de ya dibêje 'Jin erdên we ne, hûn çawa dixwazin, dikarin wisa biajon' û gotina modernîteyê ya dibêje 'Jin mîna sazekê ye, dilê we çawa dixwaze hûn wisa dikarin lê bidin' vê rastiyê tînin ziman. Dîsa gotina 'Ço ji ser serê wê, zarok jî ji malzaroka wê kêm nekin' karektera faşîst a serweriyê nîşan dide.

Modernîteya kapîtalîst ev nîzam hê zêdetir pêşde biriye. Di qada huqûqî de nîzamname û sererastkirinên qanûnî yên ji bo başiya jinê hatin kirin ji bicihanîna wekheviyê dûr in. Serwertiya mêr, di bin

mohra şaristaniyê de zewac pêşde bir, ji lewra mirov dikare wê weke saziyeke civaka cinsiyetparêz rewa dike, terîf bike. Hiyerarşî, desthilatdarî û yekdestdariya dewletê xwe di komika xwedî rengê şaneya civakî û herî zêde de nîşan dane. Di navbera wê bi xwe, bi awayê xuya dike û rewakirina wê de nakokiyeke sergirtî heye. Di şexsê jinê de saziya herî baş koletiya giştî ya civakê kamûfle û şapinêz dike, saziya zewacê ye. Pêvajoya pîrek-kirina jinê (piçûkxistin, rezîlkirin, dûvikê mêr) dikin bingeh û civakê jî gav bi gav dikin pîrek. Koletiya mêr, piştî pîrek-kirina jinê û bi wê re di zikhev de hatiye meşandin. Koletî û pîrektiya li ser jinê hatî ceribandin û encamgirtî, paşê bi mêr û çînên bindest dan qebûlkirin. Ev pêvajoya bi şaristaniyê re bi pêş ket bi modernîteya kapîtalîst re derket asta herî jor û bilind. Faşîzm di pêvajoya pîrek-kirina civakê de xwedî maneyeke taybet e. Civaka teslîmgirtî îfade dike. Modernîte civaka giştî ya pîrekbûyî îfade dike; ango her kes hatiye xesandin, qabîliyeta xwe ya parastin û bergiriyê ji dest dane, her kes êdî mêr û pîreka hev in. Komkirina sermayeyê ya dewamî bûyî, êdî wê bi awayekî din bi qasî keys û firsendê nede civakê, êrîşkar û hov bibe. Ew qad e ku destavêtin û koletî bi navê namûsê hem tê rewakirin hem jî hûrûkûr tê bicihanîn.

## 5- Cinsparêziya Civakî Pirsgirêka Malbat, Jin û Nifûsê

Di roja me de tenê nav li pirsgirêkê hatiye kirin, bi naverok hê tam nehatiye diyarkirin. Bername, stratejî, rêxistin û awayên çalakiyan hê tam bi maneya xwe di rojevê de cî negirtiye. Çawa ku dîrokê li ser bingeha koletiya cins a jinê şaristaniya civaka çînîdar weke dîroka zordestî, şer, dagirkerî û derewan dest pê kiribe, bi têkoşîna azadiya jinê û serkeftina wê jî weke dîrokeke azadî, aştî, wekhevî û rastiyê wê ji nû ve were afirandin û nivîsandin. Hemû nîşane rê didin ku di dema destpêka şaristaniya nû de wê azadiya jinê bi roleke diyarker rabe û dîsa lê îcar di asteke hîn jor de wê bikaribe çaxê jina azad bê jiyankirin.

Tevî ku cewherê demokratîkbûyînê ye, yek ji rastiya ku divê em bi serê xwe li ser rawestin mijara jinê ye û nîzama nakokî û têkiliyên li hawîrdorê ye. Ilmên civakî çiqas kêm û dereng li ser mijarên komîn û demokratîk rawestiyane, ew çend jî û heta jê zêdetir dûrî mijara jinê mane. Mîna ku bûyerên li dora jinê û serhatiyên wê pir pêdiviyên xwezayî be û ev têgihîştin xwe di hemû zanistan de nîşan dide û di helwestên siyasî û exlaqî de wek pêşferaziyeyekê tê qebûlkirin. Ya herî mirov xemgîn dike, jin bi xwe jî hîn bûye vê paradigmayê xwezayî bibîne. Çewa ku statuyên bi hezarê salan li ser gelan hatine ferzkirin û pîrozkirin

xwezayî têne dîtin, çend qat zêdetir li hemû zîhniyet û tevgera jinê jî mîna hatibe kolan û niqirandin. Çendîn gelan dikin jin, jin jî dibin gel. Wexta Hîtler dibêje; “Gel mîna jinê ne” vê rastiyê destnîşan dike. Em dema hûrûkûr nêzî mijara jinê bibin, em ê bibînin ji cinsekî biyolojîk wêdetir wek nijad, çîn û neteweyekê pê re hatiye danûstendin. Lê wek nijad, nifş û yan jî netewê herî zêde hatiye pelixandin. Divê mirov baş zanibe, tu nifş, çîn, an jî netew mîna jinê li koletiyeke sîstematîk nehatiye qewimandin.

Dîroka koletiya jinê hînê nehatiye nivîsandin. Dîroka wê ya azadiyê jî li benda nivîsînê ye. Dîroka jinê ya di tariyê de hatiye hiştin, bi qasî koletiya jinê ya kûr, ji nêz ve têkiliya wê bi desthilata dewletparêz û hiyarerşiya di civakê de bilind bû, heye. Piştî ku jin hînî koletiyê hat kirin, di civakê de hiyarerşî hat damezrandin û di nav beşên din ên civakê de rê li ber koletiyê hat vekirin. Kolebûna mêran piştî koletiya jinê tê. Koletiya cins cudahiyên wê ji koletiya çîn û netewan heye. Koletiya cins tevî zordestiyeke hişk û nermik bi derewên hisbarkirî tê rewakirin. Cudahiya biyolojîk wek sedemek ji bo koletiya wê tê bikaranîn. Hemû karên dike bi gotina “karên pîrekî” sivik têne dîtin. Ketina jinê ya nav gelemperiya civakê ji aliyê olî û exlaqî ve wek şerm tê qebûlkirin. Her ku diçe ji çalakiyên girîng ên civakî dûr tê xistin. Xebatên siyasî, civakî û aborî çendîn ketin destê hêza serdest mêran,

qelsî û lawaziya jinê mîna saziyekê cih digire. “Cinsê qels” mîna baweriyekê tê parvekirin.

Piştî ku hemû derfetên madî û manewî ketin destê mêr, êdî jin dibe ku li destê wî binere; carnan lavahiyan dike li ber digere; carnan hemû şerefa xwe binpê dike serî li ber çarenûsa xwe ditewîne û pirî caran jî dixeyide û xwe bi bêdengiyeke mezin dinixumîne. Bi gotineke din mirov jê re dikare bibêje miriya dijî. Em bi çend teşbîhan dikarin rastiyê hê berçav bikin. Teşbîha me ya yekemîn, çivîka di qefesê de ye. Çivîk carnan mîna kanaryayê bi xemil û xêz tê kirin, carnan mîna bilbil deng xweş tê kirin. Her kes li gorî xwe dişibîne çivîkekê. Pirî caran jê re çivîka serçe tê gotin. Teşbîheke din, mîna pisîkek ku timî dike new new û li binê bîreke bêbinî hatibe hîştin. Bi kurtêlan xwe xwedî dike û li ber destê xwediyê xwe baş kedî dibe.

Dibe ku teşbîhên me hinekî çor bin, lê ji bo em bi awayekî ilmî kûrbûna vê koletiyê bibînin, hewceyî bi hewldanên wêjeyî û piralî hene. Civakeke mezin cinsparêz hatiye afirandin. Helwesta rastîn a çor û hişk di vir de ye; mêr bi awayekî yekalî dest diavêje jinê û ev yek mîna qehremaniyekê tê pêşkêşkirin. Mêr heta dawiyê bi vê kêfxweş dibe û serbilind e, jin jî bi kevirkuştinê heta hepiskirina di kerxanê de û heta careke din nikaribe derkeve nava civakê bi gelek helwestên bêrehim re rûbirû dimîne. Dîsa eger bi awayekî çor rave bikim, mêr bi penîsê xwe heta

dawiyê serbilind e, lê jin ji ber wesleyên xwe yên cinsî fedî dike. Cudahiyên pir basît ên bedenî li dijî jinê hatine bikaranîn. Jintî bi xwe bûye hebûnek jê were fedîkirin. Hisa evînê goya pîroz e, mêr bi awayekî yekalî û çavsor li ser jinê ferz dike. Zarokên keçik her tim bêqîmet û heqîr hatine dîtin.

Pirsa divê were kirin ev e; gelo çima ev çend koletiyeke kûr? Bersiva wê ji sedî sed bi rastiya desthilatiyê ve girêdayî ye. Desthilatî bi awayekî xwezayî koletiyê dixwaze. Eger sîstema desthilatiyê di destê mêr de be, ne tenê beşek ji cureyê mirov, divê tevahiya cins li gorî desthilatiyê reng bigire. Xwediyên desthilatiyê çawa sînorên dewletê mîna yê xaneyê dibînin û her kirinê di navê de ji xwe re heq û rewa dibînin, desthilata mêr a di nav sînorên malê de ku mîkro modela dewletê ye, ji bo xwe her kirinê -hewce bibîne mirin jî di navê de- heq û rewa dibîne. Jina malê jî ew çend milk û malekî kevn û kûr e, bi hiseke bê sînor a mulkiyetê dibêje; “pîreka min e.” Jin -li ser navê zewacê jî- nikare îdîayeke piçûk a heq jî li ser mêr bike. Lê mêr bê sînor dikare li ser jinê û zarokan doza heq bike. Divê mirov dîsa li çavkaniya mulkiyetê di nava malê de bigere û di tasarufa li ser jinê de bibîne. Di çavkaniya mulkiyetê de jina kolekirî heye. Koletî û mulkiyeta li ser jinê hatiye danîn pêl bi pêl li tevahiya civakê tê belavkirin. Bi vî awayî her his û ramana koledar û mulkparêz di tevger û zîhniyeta ferd û civakê de tê bicihkirin. Di vê çarçoveyê de civak tê

wê astê ku li gorî avahiyên dewletparêz û her cure hiyarerşîk, amade bibe. Ev jî tê wê maneyê ku her cure avahiyên ji wan re şaristaniya çînî tê gotin bi awayekî hêsa û rewa dikarin hebûna xwe dewam bikin. Ji lewra ya tenê wenda dike jin nîn e. Ji bilî kulm û misteke dewletparêz û hiyarerşîk, hemû civak wenda dike.

Ji bo jinê demên krîzê yên taybet pir girîng nîn in. Jixwe jin timî di nav krîzê de ye. Wexta jin were gotin, yanî nasnameya bi krîz tê îfadekirin. Roja me ya îro di kaosa sîstema kapîtalîst de jina tenê hêvî dide, hindik be jî rastiya wê hatiye rohnîkirin. Femînîzm kêm be jî rastiya jinê di dawiya çaryeka sedsalê de eşkere kiriye. Di kaosê de, bi rohnîkirinê şensê guhertinê yê her rastiyê heye, lewma her gava ber bi azadiyê ve were avêtin dikare rê li ber pêşketinên hêja veke. Ji krîza roja me ya îro, azadiya jinê dikare bi serketinê derkeve.

Bêguman, wek her cureyekî cins xwezayeke jinê jî heye. Ji civakîbûyînê jî wêdetir her roja diçe biyolojî îspat dike ku jin wek cinseke biyolojîk jî hebûneke navendî û çavkanî ye. Bi kurtî bedena jinê ya mêr jî di hundurê xwe de dihewîne, lê ya mêr a jinê di hundurê xwe de nahewîne. Berovajî pirtûkên pîroz, ne ku jin ji mêr, mêr ji jinê zêde bûye. Kromozonên jinê ji yên mêr pirtir in. Xwînbûyîna jinê ya serê mehan ku jê re wek kêmasî û şermekê tê hesibandin, têkiliyeke wê ya nazik bi xwezayê re heye. Xwîn herikîna ji malzarokê,

divê wek herikîneke jiyana xwezayî ya hê neqediyaye were fêmkirin. Damara sereke ya jiyanê hînê neqediyaye û dewama wê, divê wek îradeya jinê were fêmkirin. Mijarên mîna nexweşiyên jinê têne binavkirin, ya rastîn nîşaneyên jiyanê ne. Ji ber ku jin navenda jiyanê temsîl dike. Pirsgirêkên tevlîhev ên jiyanê di malzaroka jinê, zikê wê de diqewimin. Zarokê ji wê dibe û navika pê ve mîna xeleka dawî ya jiyanê be. Li hemberî vê rastiyê mêr wek parçeyek an jî laqekî jinê xuya dike. Yek ji îspatên vê rastiyê, hisa hesûdî û çavnebariya zêde ya mêran e. Jin zêde ji xwe piştrast disekine, lê mêr di cihê xwe de ranaweste, nahewe. Mîna belayekê li dora jinê digere, natebite. Ev hemû çavdêrî nîşan didin ku bedena jinê hêlîna qelsiyan nîn e, berovajî navenda hebûnê ye. Ji lewra divê jin xwe ji navlêkirinên çanda mêrên serdest ên mîna "nexweş, kêm" tavilê xilas bike û red bike. Pêwîst e berovajiyê wê nîşanî mêr bide. Jixwe em wexta dibêjin; divê jin ji bedena xwe piştrast be, em vê rastiyê destnîşan dikin.

Di encamê de ev pêkhatina fizîkî ya jinê mejiyê hisî li cem xurtir dike. Mejiyê hisî ew mejiye ji jiyanê qut nabe. Empatî û sempatiyê bi awayekî xurt di xwe de dihewîne. Wexta li cem jinê mejiyê analîtîk pêş bikeve jî bi hebûna mejiyê xwe yê hisî bi jiyanê ve hê girêdayî ye, giran e, xwedî wê qabîliyetê ye, texrîbkar nîn e. Mêr qasî jinê ji jiyanê fêm nake. Jin bi xwe jiyan e (Di zimanê Kurdî de ku ji koma zimanê Aryen e, jîn

bi maneya jiyanê ye), qabîliyetek e; di her warê jiyanê de ji durûtiyê dûr e, nişmî ye û zelal e. Ev qabîliyeta jinê xurt e. Em vê yekê ji jiyana xwe ya şexsî jî baş dizanin.

Sifetên mîna fahîşe, fenbaz, çilvir, dejenereker û hwd. bi awayekî bêrehim ji aliyê mêr ve lê hatine kirin. Tu jin wexta di hal û rewşa xwe de be, hewceyî bi fenbazî û fahîşetiyê nabîne. Bedena wê, hebûna wê ya biyolojîk li gorî vê yekê nîn e. Afirînerê rastîn ê fenbazî û fahîşetiyê mêr e. Em baş dizanin, di dîrokê de yekemîn kerxaneya tê zanîn, B.Z. di salên 2500'an de li paytexta Sumerê Nûppûrê bi navê "mûsaqatîn" ji aliyê desthilata mêran ve hat vekirin. Tevî vê yekê, bêyî ku fedî bike, mîna fahîşetî afirîneriyeke jinê be, timî di rojevê de digire. Berhem û gunehkariya bi xwe afirandiye, dixe stûyê jinê û bi têgihîştineke namûsê ya sexte tu lanet, lêdan û kuştinê ji ser serê jinê kêm nake. Piştî vê tarîfa me li yên berê zêde kir, em wek encam dikarin bibêjin; divê jin beriya her tiştî li dijî êrîşên îdeolojîk ên mêran baş raweste. Li dijî îdeolojiya serdest a mêran, divê bi îdeolojiya azadiyê ya jinê, femînîzm û çavkaniya wê kapîtalîzmê li dawiyê bihele, xwe bi sîleh bike û têkoşînê bimeşîne. Divê li dijî zîhniyeta desthilatparêz a mêrê serwer, zîhniyeta xwezayî ya jina azadîxwaz xurt bike û bizanibe di qada îdeolojîk de bi ser bikeve. Divê neyê jibîrkirin, teslîmiyeta jintiyê ya kevneşopî fizîkî nîn e civakî ye. Ji koletiya pê dane vexwarin tê. Ji lewra divê

beriya her tiştî di qada îdeolojîk de his û ramanên teslîmbûyî têk bibe.

Azadiya Jinê, wexta bikeve qada polîtîk, divê baş bizanibe wê bi şerekî çetîn û dijwar re rûbirû bimîne. Heta di qada polîtîk de hînî bi destxistin û qezencê nebe, tu destketî mayînde nabin. Serketina di warê polîtîk de nayê wê maneyê ku jin dibe dewlet. Berovajî, têkoşîna li dijî avahiyên dewletparêz û hiyarerşîk, hewce dike ku avahiyên siyasî yên hedefa wan civaka ekolojîk azadiya cins, demokrasî ne pêk bîne. Hiyarerşî û dewletparêztî herî zêde bi xwezaya jinê re li hev nakin. Ji lewra, tevgera azadiya jinê divê ji pêkhatiyên antî-hiyarerşîk û avahiyên li derveyî dewletê re rola pêşeng bilîze. Eger bizanibe di qada polîtîk de bi ser bikeve, wê di heman qadê de koletiyê jî hilweşîne. Ji bo têkoşîna di vê qadê de divê rêxistinên jinê yên demokratîk û têkoşîna wê berfireh be. Her cure civaka sivîl, mafê mirovan, rêveberiyên herêmî yên demokratîk ji bo xwebirêxistinkirinê qadên têkoşînê ne. Mîna di sosyalîzmê de, rêya diçe wekhevî û azadiya jinê di têkoşîneke serketî ya demokratîk û berfireh re derbas dibe. Tevgera jinê ya ku demokrasiyê bi dest nexîne, nikare azadî û wekheviyê bi dest bixe.

Di warê civakî de ji aliyê azadiyê ve pirsgirêka herî girîng rastiya malbat û zewacê ye. Ev mijar mîna bîreke bêbinî ye. Ev saziyên em behsa wan dikin, ji bo jinê bi zîhniyeta civaka heyî ji qefesekê derbasî

qefeseke din dibe, hem jî ciwantiya xwe ya xama jî neçar radestî zîhniyeteke serjêker û qesab dike.

Divê mirov malbatê wek siya civaka jor - civaka desthilatê - a di nav gel de bibîne û wek saziya sîxur û ajan binirxîne. Nûneriya desthilata di nav civakê de mêr di nav malbatê de dike. Ya rastîn wexta jin dizewice dibe kole. Mirov saziyeke din nikare bifikire ku bi qasî zewacê jinê dike kole. Koletiyên herî dijwar bi vê saziyê dest pê dikin û di nava malbatê de rehên xwe berdidin. Em bi giştî behsa bihevrebûnên hevaltî û jiyana hevpar nakin. Ev mijarek e, li gorî têgihîştina wekhevî û azadiya her kesî dikare bibe xwediyê maneyekê. Em behsa malbat û zewaca klasîk a bi cihbûyî dikin. Ev rewşa em behs dikin, ji sedî sed jinê dike mulk, di warê siyasî, zîhnî, civakî û aborî de paş ve dixîne û dike ku careke din jin bi hêsanî bi ser xwe ve neyê. Eger hîmên jiyana hevpar a li ser wekheviya cins, azadî û demokrasiyê di lêpirsîneke radîkal re neyên derbaskirin, ji ber tengasiyên ajoyî, ferdî û têgihîştinên kevneşopî yên malbatê zewac û têkilî bibin, dibe ku li ser rêya jiyana azad weke ji rêderketinê roleke xeter bilîzin. Hewceyî bi van têkiliyan nîn e, ya girîng divê mirov qadên polîtîk, zîhnî û demokratîk çareser bike, azadiya jinê tam pêk bîne û li gorî vê yekê îradeya jiyana hevpar bi cih bîne.

Di roja me ya îro de mijara herî zêde mîna benîştan tê cûtin eşq e û ew jî di dîroka xwe de tu car

ev qas rezîl nebûbû û ji cewher û naveroka xwe dûr neketibû. Di tu serdema dîrokê de eşq ev qas neket ber pê û lingan. Ji eşqên kêliyekê bigirin ji têkiliyên herî xeter û bê xwê re eşq tê gotin. Jixwe tu têkilî ji van çêtir nikare têgihîştina jiyana kapîtalîzmê nîşan bide. Ya rastîn, eşqên serdema me, mikurhatinên pir eşkere ne û nîşan didin; zîhniyeta ku sîstema serdest li ser civak û mirov ferz dike li qadên herî pîroz ketiye çi rewşê. Yek ji wezîfeyên zehmet ên şoreşgeriyê ji nû ve geşkirina eşqê ye. Eşq kedeke mezin, rohnîbûna zîhniyetê û hezkirina mirovatiyê dixwaze. Yek ji şertên girîng ên eşqê; divê tu li sînorê zanyariya serdemê bî. Şertê duyemîn; divê tu li dijî çavsoriya sîstemê xwedî helwesteke mezin bî. Ya sêyemîn; divê tu xwedî exlaqekî wisa bî bizanibî bêyî azadiyê mirov nikare li rûyê hevdu binêrin. Ya çaremîn; divê ajoyên cinsî li gorî pêdiviyên sê nuqteyên me destnîşankirî xwe rabigire. Yanî ku tu negihîjî zanyariya ajoyên cinsî, exlaqê azadiyê û bi pêdiviyên têkoşîna eskerî-polîtîk ve girê nedî, her gava were avêtin înkara eşqê ye. Kesên bi qasî çivîkekê azad derfetên wan ên hêlîn danînê nebin, nikarin behsa evînê, têkiliyê û zewacê bikin. Ya rastîn, eger behs bikin, wê wextê xwe radestî koletiya nîzama civakî ya serdest kirine û diyar e qîmeta nirxên serberziyê yên têkoşîna azadiyê nizanin.

Eger wexta behsa rastiya eşqa serdema me were kirin, ji eşqa Leyla û Mecnûn zêdetir, ji gelek ehlên

tesawifê jî wêdetir, bi nazikiya zanyaran, kesên ji bo derketina ji kaosa civakî ya îro û rê li ber vekirina azadiyê, bi egîdî, fedekarî û serketinê xwe îspat bikin hene û bi qezenckirina van kesayetan eşq dibe.

Pirsgirêkên jinê yên aboriyê, wekheviya civakî, beriya her tiştî bi çareserkirina desthilata polîtîk û bi serketina demokratîkbûnê dikarin bersivên xwe bibînin. Pir eşkere ye, heta siyaset bi awayekî demokratîk neyê meşandin, di azadiyê de pêşketin nebe, wekheviyeke hişk a huqûqî zêde maneya wê nîn e.

Ya rast, divê mirov helwest û nêzîkbûna ji bo jinê wek şoreşa çandî bigire dest û li ser raweste. Niyet çiqas baş dibe bila bibe, hewldan û xebat çiqas werin kirin bila werin kirin, bi sedema çanda heyî û ji ber nakokiyên di nava rastiyê bi xwe de çareseriyeke azadiyane nabe. Nasnameya azadiyane ya herî radîkal, bi helwesta ji bo jinê, yan jî bi awayekî giştî bi serwextbûna li nîzamê têkiliyên jin-mêr û li dawî hîştina wan mimkun dibe. Divê her kes baş bizanbe, li ser navê kevneşopiyan, sergirtin û nuxumandina jinê, li ser navê hemdemiyê jî bi pornografîkirina jinê, bi qasî serê derziyê pêşketin nabe. Bi qasî têgihîştina li koletiyê, hewceyî bi têgihîştina li azadiyê jî heye. Bi vê serwextbûnê re divê mirov xwe bigihîne îradeyê. Kesên di azadiya jinê de, yanî di xwe azadkirinê de qonaxan derbas nekin, nikarin di tu warê azadiya civakî û siyasî de rê li ber veguherîn û çareseriyê

vekin. Çi hewldana azadiyê ya dualîteya mêrê serwerkole jin, li dawiyê nehêle, nikare nasnameyeke rastîn a azadiyê bi dest bixîne û divê mirov vê yekê jî wek pîvaneke bingehîn a azadiyê binirxîne. Heta têkiliya mulkiyet û desthilatê ya li ser jinê neyê hilweşandin, kes nikare têkiliya azad a mêr-jinan pêk bîne.

Di vê sedsala me de wê îradeya jinê ya azad xurt bibe. Şaş nîn e mirov vê nirxandinê bike. Belkî jî pêwîst e mirov li ser saziyên mayînde yên sedsalan dewam bikin ji bo jinê bifikirin. Dibe ku hewceyî bi Partiyên Jina Azad hebin. Destnîşankirina pîvanên polîtîk û meşandina îdeolojiya bingehîn a azadiyê, her weha pratîk û kontrol hem sedema hebûn, hem jî wezîfeya bingehîn a van partiyan e.

Bi taybetî ji bo girseyên jinan, Malên Starê yên li bajaran avakirina wan dihat fikirîn, divê wek qadên azadiyê werin pêkanîn. Bi awayekî herî guncaw û li cih pêkanîna Parkên Çanda Jina Azad girîng in. Malbatên nikaribin keçikên xwe perwerde bikin û ji ber dibistanên nîzama serdest a rewşa wan tê zanîn, zarokên keçik û jin dikarin li Parkên Çanda Jina Azad perwerde bibin, hilberînin û di beşên xizmetê de cih bigirin. Parkên behsa wan tê kirin, dikarin rola perestgehên hemdem bilîzin.

Tê gotin bêyî jinê jiyan nabe, lê bi jina heyî re jî jiyan nabe. Têkiliyeke jin-mêran a heta qirikê di koletiyê de çûbe xwarê, xuya ye wê kes pir zêde bixîne û bist bike. Ji lewra di kaosa dawîn a sîstema kapîtalîst

de hêza mezin a ji eşqê tê hêvîkirin divê li dora jinê were afirandin û pê gav were avêtin. Bawer dikim, divê ev yek ji karên pîroz û bi şeref ên qehremanên rastîn be ku dilê xwe dane eşqê û serê xwe danînê ser vê rê!

A-Ji Derketina Hiyerarşîk ve ye maneya Îdeolojiya Desthilatiyê li Cinsparêziyê Hatiye Barkirin

Jinê weke cinsekî mirov ê cudatiya xwe ya biyolojîk heye fêm dike û di mijara rastiya civakî de ev di serê hêmanên bingehîn ê korbûnê de tê. Cudahiya cinsî nabe ku bi serê xwe bibe sedema tu pirsgirêka civakî. Li gerdûnê dualîteya di her zereyê de çawa ku di tu hebûnê de weke sedema pirsgirêkê nayê dîtin, dualîteya di hebûna mirov de jî nabe ku weke pirsgirêk were bikaranîn. "Gelo hebûn çima dualî ye?" bersiva em bidin vê pirsê divê felsefî be. Analîza ontolojîk (zanista hebûnê) dikare li bersiva vê pirsê (pirsgirêk ne) bigere. Bersiva min ev e: hebûn ji bilî dualîteyê nikare hebûna xwe pêk bîne. Dualîte, şêwazê mimkunbûna hebûnê ye. Jin û mêr bi rewşa xwe ya heyî nebin jî ango ne hev-alî bin jî dîsa nikarin ji dualîteyê xwe xilas bikin. Bûyera jêre ducinsî jî tê gotin ev e. Divê mirov matmayî nemîne. Lê dualîte her tim ji bo pêkhatina cuda meyldar in. Bingehê mirov dikare ji bo mejiyê gerdûnî (Geist) li delîl bigere jî di vê meyla dualîteyê de dikare bigere. Yek ji aliyên

dualîteyê ne xirab ne jî baş e, bi tenê divê cuda be. Eger dualîte bibin wekhev wê wextê hebûn pêk nayê. Mînak du jin an jî du mêr nikarin pirsgirêka zêdebûnê ya hebûna civakî çareser bikin. Ji lewra bersiva pirsa “Çima jin an jî mêr?” qîmeta xwe nîn e yan jî eger divê bersiva vê pirsê bê dayîn wê wextê divê bersiveke felsefî bê dayîn û bê gotin, ji ber ku gerdûn divê (neçar e, di wê meylê de ye, bi wî aqlî radibe, bi wê xwestekê) welê pêk bê.

Eger mirov jinê weke têkiliyên zêde yên civakî bigire dest, wê ev bi tenê manedar nebe, ji bo bihurîna (çareserkirin) ji girêkên kor ên civakî jî gelekî girîng e. Ji ber ku her kes hînî nêrtina mêrê serwer bûye, şikandina çavkoriya di warê jinê de bi awayekî mîna parçekirina atomê ye. Ji bo şikandina vê çavkoriya di warê jinê de hewldaneke mezin a entelektuel û hilweşandina mêrtiya serwer divê. Ji alî û bereyê jinê ve em li mijarê binêrin, hema hema ev şêwe kiriye hebûna xwe û ya rastî jina bi awayekî civakî hatiye avakirin divê ewqasî jî bê hilweşandin. Em dema li tevahiya têkoşînên azadî û wekheviyê, têkoşînên demokratîk, exlaqî, polîtîk û çînî dinêrin, em dibînin ku di serketin an jî serneketina wan de li ser hêviyên wan ên şikestî (pîvan, bername û utopyayên bi cih nehatin anîn) şopên şêweyê têkiliyên (di navbera jin-mêr de) serwer (desthilatdarî) ên naşkên hene. Bi tevahî têkiliyên newekhevî, koletî, despotî, faşîzm û mîlîtarîzmê xwedî dikin, çavkaniya xwe ya bingehîn ji

şêweyê van têkiliyan digire. Eger em dixwazin maneyên hêviyên me neşkînin li gotinên wekhevî, azadî, demokrasî û sosyalîzmê bar bikin divê em têkiliyên li dora jinê hatine deribandin û tevna têkiliyên bi qasî têkiliyên xweza û civakê kevn çareser û parçe bikin. Ji bilî vê rêyeke din nîn e ku biçe azadî, wekhevî (li gorî cudahiyan) û demokrasiya rastî û exlaqê nedurû ye.

Ji dema derketina hiyarerşiyê îdeolojiya desthilatdariyê mane li cinsiyetparêziyê bar kiriye. Ji nêz ve têkiliya xwe bi desthilatdarbûn û çînîbûnê re heye. Bi tevahî çavdêrî û lêkolînên rojane û yên arkeolojîk, antropolojîk nîşan didin ku demên jin bûye çavkaniya otorîteyê hene û demên behsa wan têne kirin demeke dirêj qudandine. Otorîteya jinê ya navbihurî li ser otorîteya desthilatdarî û berhemê zêde nehatiye avakirin, berevajî çavkaniya xwe ji berhemdarî û zayînê digire. Ji lewra otorîteyek e ku hebûna civakî bi hêz dike. Mejiyê hisî yê li cem jinê bandora xwe zêde ye, bi vê hebûnê re têkiliyên xwe gelekî bi hêz hene. Di şerên desthilatdariyê yên li ser desteserkirina berhemê zêde de hatine kirin jin zêde diyar nîn e û ev jî rewşa wê bi şêwazê wê yê hebûna civakî re pêwendîdar e.

Di pêşketina desthilatdariya girêdayî nîzamê dewlet û hiyarerşiyê de mêr bi rola pêşeng rabûye, çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî vê yekê eşkere nîşan didin. Ji bo vê jî otorîteya jinê ya heta qonaxa

dawî ya civaka neolîtîkê jî pêşketîbû diviyabû bihata şikandin û li dawiyê bihata hiştin. Dîsa çavdêriyên rojane û daneyên dîrokî der barê vê de têkoşînên mezin ên cur bi cur û yên dema wan dirêj piştrast dikin. Nexasim mîtolojiya Sumer hema hema weke bîra xwezaya civakî û dîrokê têra xwe mirov rohnî dike.

Dîroka şaristaniyê di heman demê de dîroka têkçûn û wendakirina jinê ye. Ev dîrok bi xweda û evdên xwe, bi hukimdar û tebaên xwe, bi ekonomî, zanist û hunerê xwe, kesayeta mêrê serwer bi hêz kiriye. Ji lewra têkçûn û wendabûna jinê, li ser navê civakê ketin û wendakirineke mezin e. Civaka cinsiyetparêz encama vê ketin û wendakirinê ye. Mêrê cinsiyetparêz, dema ku li ser jinê hakimiyeta xwe ya civakî ava dike ewçend dilbijok û bi mehd e, her cure destdan û têkiliya xwezayî vediguherîne xwenîşandaneke serweriyê. Li diyardeyeke biyolojîk a mîna têkiliya cinsî timê têkiliya desthilatdariyê bar kiriye. Mêr tu car ji bîr nake ku mîna serketin bi det xistibe têkiliya cinsî bi jinê re datîne. Di vî warî de gelekî zêde hînbûyî ye. Di vî warî de jî gelek gotin çêkirine: “Min ew temam kir”, “Min karê wê qedand”, “dêlik”, “Divê tu ço ji ser serê wê, daşik ji zikê wê kêm nekî!” (Lê bixin bi tîran aş bikin bi qîran), “fahîşe, orûsipî”, “kurikê mîna keçikan”, “Eger tu qîza xwe serbest berdî yan wê biçe daholvan an jî zirnevan” (Serê keçan bernedin), “Divê mirov wê zû bi mêrekî ve

girê bide”. Gelek çîrok û gotinên pêşiyan ên bi vî rengî têne gotin. Gelekî eşkere ye ku têkiliya cinsî û desthilatdarî di nava civakê de çiqasî bi bandor e. Di roja me ya îro de jî her mêr ‘mafê kuştina’ jinê jî di navê de xwedî gelek heq û mafan e û ev jî rastiyeke sosyolojîk e. Ev ‘heq’ her roj têne bicihanîn. Bi giranî karektera têkiliyan bi awayê tacîz û tecawizê ye.

Di çarçoveya vê civakbûnê de malbat weke dewleta piçûk a mêr hatiye avakirin. Di dîroka şaristaniyê de saziya jêre malbat tê gotin bi şêwazê xwe yê heyî her çûye bi bandor bûye û ev jî bi sedema hêza mezin a daye amûrên desthilatdarî û dewletê ye. Yekemîn, malbatê li dora mêr desthilatdar dikin û bi vî awayî wê dikin şaneya civaka dewletê. Duyemîn, xebata jinê ya bêberdêl û bê sînor tê misogerkirin. Sêyemîn, zarokan mezin dike û bi vî awayî pêdiviya bi şêniyan tedarik dike. Çaremîn, weke modela rolê koletî û çilektiya cinsî li tevahiya civakê belav dike.

Bi awayekî bingehîn malbat bi vê naveroka xwe îdeolojiyek e. Ew sazî ye ku têde îdeolojiya xanedaniyê fonksiyonel dibe. Her mêr di nava malbatê de xwe weke xwediyê xanekê his dike. Mirov weke rastiyeke gelekî girîng bi malbatê dihise û ev jî ji îdeolojiya xanedaniyê ye ku gelekî bi bandor di binê wê de heye. Malbat çiqasî zarok û jinên xwe hebin, mêr jî ewqasî ewlehî û anorê bi dest dixe. Gelekî girîng e ku mirov malbatê bi rewşa wê ya heyî jî weke saziyeke îdeolojîk binirxîne. Eger hûn jin û malbatê bi rewşa wan a heyî

jî ji bin sîstema şaristaniyê, desthilatdarî û dewletê bikişînin, li dawiyê zêde tiştek bi navê nîzamê namîne. Lê berdêla vê şêwazê, rewşa jinê ya di nava şerekî dewam yê asta navîn de ye ku ev şêwazê hebûneke têkçûyî, piçûk-ketî, feqîr û bi êş e. Mîna ku yekdestdariyên sermayeyê tevahiya dîroka şaristaniyê çawa ya li ser civakê dewam kirin, mîna wê bi awayekî parelel duyemîn yekdestdariyeke zincîrwarî li ser dinya jinê weke 'yekdestdariya mêr' ava kirine. Hem jî weke yekdestdariya herî kevn a berê. Eger mirov hebûna jinê weke cîhana mêtingeh a herî kevn bigire dest, dibe ku me bibe encamên rastî. Belkî jî mirov ji bo jinan bibêje, gelê mêtingeha herî kevn a nebûye milet, rastir e.

Divê mirov taybetiyeke xanedaniyê baş fêm bike. Ji ber ku ev taybetî roja me ya îro jî ji nêz eleqedar dike. Ew jî ev e: divê malbat bibe xwediyê gelek kuran, ev hîmê bingehîn ê îdeolojiya xanedaniyê ye. Daxwaza sereke ya îdeolojiya xanedaniyê zewaca bi pir jinan û çêkirina gelek kuran e. Sedema vê yekê ya divê mirov fêm bike hêza polîtîk e. Rahib bi hêza 'maneyê' pêşengtî dikir, kesê bi hêz ê xanedaniyê jî bi hêza 'polîtîk' rola pêşengtiyê bi cih tîne. Di guhnedana têgîna hêza polîtîk de dibe ku zor derkeve holê. Di guhnedana hêza rahib de jî hêzeke manewî ya weke 'xezeba xwedê' bandoreke bi tehlûke ya hişyar dike, pêk bê. Serçavkaniya hêza polîtîk jî hêza eskerî ya di

bin destê mêrê xurt de ye. Di dema berê ya nêçîrvaniyê de, bi taybetî di dema jin-dayik bi bandor de, hema bibêjin; mêr bêgav û cih lê teng bûye.

Ji bo mirov vê diyardeyê bi kurtî fêm bike, divê mirov nîzama jin-dayikê û li rastiya malbatê serwext bibe: di dema jin-dayikê de mêr an diyar nîn e, yan jî bintûte ye, gelekî li ber çav xuya nîn e. Jin-dayik wexta zarokan tîne, wisa di wê rewşê de nîn e ku bi mêrê jê hez dike re eşqê bike. Eşq û civaka cinsiyetparêz hînê di rojevê de nîn e. Jin bi tu ben û tayî ji bo pîrektiyê bi mêr ve girêdayî nîn e. Mêr jî di wê rewşê de nîn e ku li ser jinê serwer bibe û jêre bibêje 'tu jina min î'. Nêçîrvanî karek e ku xwe pê mijûl dikin û ne berdar e, wexta nebe jî zêde qîmeta xwe nîn e. Di nava civakê de hîn ew rewş nîn e ku bibêje; ev zarokên min in. Zarok ên jin-dayikê ne. Jin-dayik li gorî xwezaya xwe di wê rewşê de nîn e ku li pey şehweta xwe biçe û ji bo zewqê têkiliya cinsî deyne. Bi qasî her ruhber û zindiyî seksualîteyeke wê heye. Têkiliyeke cinsî ji bo zêdebûnê heye.

Ji ber ku ji bo wan kedê didin zarokan mezin dikin, sedema bingehîn a aîdiyeta wan in. Ji ber ku ew zarokan tîne û xwedî dike, vî mafî jî bi dest dixe. Ji lewra di demekê de ku tu maneya diyarbûn û nediyarbûna bavbûnê di nava civakê de nîn e, behsa mafê bavtiyê jî kirin kelevajiye û heta tiştekî dûrî aqilan e. Lê xuşk û birayên jin-dayikê girîng in. Ji ber ku bi wan re mezin bûye. Xal û xaltîk hêza xwe ji vê

huqûqa kevn a jin-dayikê digirin. Malbata jin-dayikê wê wextê ji xal, xaltîk (eger hebe zarokên wan) û ji zarokên wê bi xwe pêk tê. Gotina 'malbata dayikanî' jî vê mijarê îfade dike. Jin-dayika li serê quncika neolîtîkê rûniştî û çanda civakî ya xwedawendiyê ya ji wê çêbûyî mirov dikare bi vî awayî şîrove bike. Ji bilî xalan mêr bintûte, hebûn û tunebûna wan zêde li ber çavan xuya nake. Mêrtî û bavtî hînê çênebûye.

Xanedantî weke îdeolojî û pratîk di encama berepaşkirina vê nîzamê de pêş dikeve. Di vê nîzamê de ku weke nîzama 'bavikanî' jî tê binavkirin tecrubeya 'kalemêr', 'hêza eskerî ya di bin destê mêrê xurt de' û bi hevgirtina şaman ê şiklekî rahibê berî pîroziyê, rêveberiya bavikanî şax û kokên xwe berdidin.

Divê pergala xanedaniyê weke îdeolojî û avahîsaziyeke ketiye zikhevdu, yekpare bê fêmkirin. Tevî ku ji nava pergala qebîletiyê derketiye jî înkara wê ye û xwe weke kakilê malbata rêveber a tebeqeya jor pêk tîne. Hiyerarşiyeke wê ya gelekî hişk heye. Çîna serdest a li pêş e. Prototîpa desthilatdarî û dewletê ye. Xwe dispêre mêr û kuran. Di xanedaniyê de pirbûna mêran ji bo desthilatdariyê gelekî girîng e. Vê xusûsê rê li ber zewaca bi pir jinan, jiyana hareman û sîstema cariyan vekiriye. Ji lewra hinek mêr bi dehan jinan re zewicîne û bi sedan zarokên wan çêbûne û ev yek bi îdeolojiya xanedaniyê re têkildar e.

Desthilatdarî û dewlet berê pêşî ji nava xanedaniyê tê derxistin. Ya girîngtir jî ew e, xanedan ew sazî ye ku di serî de qebîle û eşîra xwe, pergalên din ên qebîleyan hînî koletî û çînîbûna pêşî dike. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de hema bêje mimkun nîn e ku mirov desthilatdarî û dewleta bê xanedanî bibîne. Ev rewşa wê ji ber bi kokbûna rastiya wê ye û ji ber pozîsyona wê ye ya ku ji desthilatdarî-dewletê re dibe dibistana amadekariyê.

Xanedantî vediguhere îdeolojiya fermî û ev yek mohra xwe li avahiya malbatê dixe, bi vî awayî jî weke îdeolojiya jêr rê li ber 'malbatgiriyê' vedike. Malbat ji hev cuda ne. Di tevahiya dîrokê û beriya wê de şêweyên gelekî cuda yên bihevrebûna mêr-jinan hebûn. Nexasim tîpa malbatê ya klan a bi giranî têde jin xwedî gotin, gelekî belav bû. Di vê tîpa malbatê de mêr-zilam wer nayê naskirin. Xal û xwarzê bêtir girîng in. Tîpeke din a didutiya jin-mêr tîpa di weznekê de ye. Ev tîp jî berevajî yeqînan di dîrokê de gelekî hebû. Sîstema bi reîstiya mêr a malbatê, gelekî paşê weke xanedanî-desthilatdarî-dewletê tê resimkirin û pêşdebirin. Hedefa bingehîn jî ew e, jin û zarokên xwe ji bo berjewendiyên tebeqeyên jor xanedan, desthilatdarî û dewletê bigihînin û kesayetên peyk, girêdayî û hewcedar biafirînin. Tevî ku hîç hewce nake û rê li ber pirsgirêkên giran ên civakî vedike, zewaca bi gelek jinan re û çêkirina zahf zarokan têkiliya xwe bi berjewendiyên desthilatdarî û dewletê re heye. Her

sermiyanê malbatê jî dilê xwe dibijîne xanedan û ji lewra jî weke wî gelek jinan tîne û dibe xwediyê zahf zarokan û vê yekê weke misogerkirina jiyanê û bi hêzbûnê dibîne.

Zîhniyeta serdestî civakê misêwa vî aliyê mijarê teşwîq dike. Lê ya rastî, bi vî awayî ji çareseriyê wêdetir li tevahiya pirsgirêkên civakî derî tê vekirin. Eger mirov zanibe ev rewş ji ber îdeolojiya fermî ye û ji aliyê olî ve jî destekê didinê û dixwazin bi hev temam bikin, ev yek ji bo serwextbûna li pirsgirêkên civakî gelekî girîng e. Çanda malbatgirî û xanedantiyê ku li Rojhilata Navîn a roja me ya îro hê gelekî bi hêz e, ji ber şêniyên zêde yê rê li ber vekiriye, desthilatdarî û sedema hêrsa parxwestina ji dewletê, çavkaniya sereke ya pirsgirêkan e. Piçûkxistina jinê, newekheviya wê, bêperwerde hiştina zarokan, pevçûnên nava malbatê, pirsgirêkên namûsê timî bi malbatgiriyê re têkildar in. Mîna ku makêteke piçûk a pirsgirêkên nava desthilatdarî û dewletê di nava malbatê de hatibe sazkirin. Ji bo jihevderxistina desthilatdarî-dewlet-çîn û civakê jihevderxistina malbatê şert e.

Di çanda ereb de Elah, li cem Hindiyan Brahman û li cem Çîniyan Tao ji nifşên heman xwedayan in.

Qonaxa şaristaniyên hevpar û çandên dişibin hev, di vê demê de weke sembolên bingehîn herî zêde xwe bi xwedayên nûneriya civakê dikin, nîşan didin.

Xweber nîn e ku weke nav jî hemû texmînî di salên 2000'î B.Z. de derketine holê. Ev yek ji çanda hevpar û kûr a di bingehê wan de ye. Bi şêweyê kirin sembol (jin-dayik û ekonomiya wê ya malê êdî ji aliyê mêrê zordar û xasûk ve hatiye desteserkirin), çanda mêrê serwer îlahî dikin. Dayika xwedawend a sereke ya bi Aryenî navê wê Star, bi Sumerî Înanna, bi Hîtîtî Kîbele, bi Semîtîkî Îştar, bi Hindî Kalî ye, her diçe vedimirin û xwedayên mêr ên navbuhurî mezin dibin. Di salên 2000'î B.Z. de kengî jin di warê civakî de kişandin jêrzemînê têkçûn û piçûkxistina wê jî di warê çand û ziman de xwe da der.

Di çanda madî û manewî ya şaristaniyê de ji koletiya mêr û qebîleyan pêştir, weke cins koletiya jinê tê. Ya rastî, weke koletiya li jêrzemînê civakê, koletiyeke hûrûkûr li ser jinê hatiye ferzkirin û mehkûmî statuyeke têkçûyî, piçûkxistî, bêhnlêçikandî, lanetlêkirî û mirdarî hatiye kirin. Pîrektî û weke mêr-mêrê li ser wê xwedî erkên bê sînor, li ser vî zemînê çandî mezin û bilind dibe. Statuya jinê ya li cem Ereban û civakên li Rojhilata Navîn zemînê heman çandê parve dikin,ev yek hînê dewam dike û vê vegotina me jî piştrast dike. Bi navê namûsê kuştina jinê ji hêmanên piçûk ên vê çandê ne.

Li gorî civakê, jinek bi mêrê xwe ve girêdayî be û li malekê bi awayekî tê gotin bi namûs bijî, tê qebûlkirin. Eger jin ji vê rewşê derkeve ango gelek

mêran bîne mala xwe, yan jî berevajiyê wê mêr gelek jinan bîne malê, gelo rewş ê çawa be? Herhal bi gotineke herî ji rêzê mirov dikare bibêje, rewş ê tevlîhev bibe. Di meseleya pere de rewş hinekî din jî tevlîhevtir e. Em bi mînaka xwe dewam bikin. Ji ber ku jin derdikeve derveyî pîvanên giştî yên têne qebûlkirin, bi avêtina wê ya derve dikarin çareseriyekê bibînin. Lê di meseleya pereyan de dibe ku rewş evçend hêsan nebe. Yê pere di destê xwe de digire, eger bi namûs nebe, çiqas pere bikeve ser pereyê wî dikare bibêje; min qebûl e. Mîna di meseleya jinê de, herçî civak e, di vê qebûlkirinê de pere nekiriye amûr. Bi îhtîmaleke xurt karîbûye bibêje; dayîna ser hev a pereyan bênamûsiya herî mezin e.

Em wexta ji nêz ve li koletiya jinê binêrin, wê zêdetir aliyê wê yê ji mirovatiyê dûr dixîne balê bikişîne. Girtina jinê li malê ne tenê girtineke mekanî ye û heta girtîgeh jî nîn e. Rewşa wê rewşeke destavêtinê ya dijwar e. Herçiqas bixwazin bi nîşan, bi merasîmên bûkaniyê ser rastiya vê meseleyê bigirin jî rojeke wê bi tenê jî ji bo kesa xwe dizane têkçûna rûmet û anora mirov e. Jin ji qîmeta xwe ya hezar salan a hilberandin, perwerde, rêveberî û azadiyê welê bi rêkûpêk û rêbazên şîdetê jê hatiye kirin, ji vê jî wêdetir bi îdeolojî û vegotinên eşqê wer hatiye hincirandin, encam ji teslîmiyetê jî wêdetir e.

Nasnameya xwe ya ‘jintiyê’ ji dest dide, dikeve rewşeke din ku jêre ‘pîrektî’ tê gotin. Li cem mêrekî ji rêzê, li cem şivanekî serê çiyê ‘jin’ bi tenê dikare bibe ‘pîrek’. Pîrektî jî heq dide ku li ser wê her cure tesaruf bibe. Di nava vê tesarufê de kuştin jî heye, kengî bixwaze dikare bike. Ew ne tenê milk e. Ew milkeke gelekî taybet e. Rê dide ku xwediyê wê li ser wê bibe împaratorekî piçûk, hema xwedî tenê zanibe bi kar bîne.

Xwe xwediyê jinê dîtin bingehê fikra pêşî ya milkiyetê pêk anî. Piştre jî dor hat kolekirina mêr. Di dema şaristaniyê de em li şêweyên malbatê yên demdirêj û berfireh rast tên. Malbatên gundiyên ji rêzê û zenaetkaran her hebûn. Desthilatdar û dewletan mêr-bavê di nava malê de weke kopyayekî otorîteya xwe bi erk û rol kirine. Bi vî awayî malbat kirin rewşekê ku bû amûrê herî girîng ê rewakirina yekdestdariyan. Ji şebekeyên sermaye û serweriyê re her tim kole, serf û karker, kedkar, esker û ji bo xizmetên din rola çavkanîbûnê girt ser xwe. Ji ber vê yekê girîngî bi malbatê dan û ew pîroz kirin. Şebekeyên kapîtalîst çavkaniya herî girîng a karê ji nava malbatê bi mêtina keda jinê pêk anîn û ev yek bi awayekî sergirtî kirin, lewma ji malbatê re ev bû barekî zêde yê veşartî û neyekser lê barkirî. Malbat kirine mîna sîgortaya nîzamê û bi vî awayî ew mehkûmî dema wê ya herî muhafezekar kirine.

Rexnekirina malbatê girîng e. Eger were rexnekirin dibe ku bibe hêmanê sereke yê civaka demokratîk. Bi tenê jin ne, bi tevahî malbat weke şaneya desthilatdariyê neyê analîzkirin, îdeala şaristaniya demokratîk û bi cihanîna wê, dibe ku ji hêmana xwe ya herî girîng mehrûm bimîne. Malbat saziyeke welê nîn e mirov jê bibihure û wê li dawiyê bihêle, lê mirov dikare wê veguherîne. Îdîaya milkiyetê ya li ser jinê û zarokan a ji hiyarerşiyê mayî divê were terikandin û di têkiliyên hevaltiya hevjînan de her cure têkiliyên sermaye û desthilatdariyê cih negirin. Divê nêzikatiyên xerîzeyî yên ji bo dewamkirina cins li dawiyê bêne hiştin. Di bihevrebûna jin û mêran de nêzikatiya herî îdeal ew e, felsefeya azadiyê ya bi civaka exlaqî û polîtîk ve girêdayî esas bê girtin. Malbata ku di vê çarçoveyê de veguhere, wê garantiya herî têkûz a civaka demokratîk be û wê yek ji têkiliyên bingehîn ên şaristaniya demokratîk be. Ji hevaltiya (hevjîntî) fermî wêdetir hevaltiya xwezayî girîng e.

Divê herdu hev-alî timî ji mafê jiyana bi tenê re mayînê amade bin. Di têkiliyan de tevgera bi koletî û bi çavkorî nabe. Eşkere ye, wê malbatê di bin şaristaniya demokratîk de veguherîna herî manedar pêk bîne. Jina bi hezarê salan ji rêz û hurmeta xwe gelek tişt ji dest dane heta bi rêz û hêz nebe, yekîtiyên malbatan ên manedar pêk nayên. Malbatên li ser cehaletê avabûyî rêz û hurmeta wan nabe. Di jinûve

avakirina şaristaniya demokratîk de par û rola ji malbatê re dikeve girîng e.

B) Cinsiyetparêziya Civakî Cinawirekî Civakî yê Herî Kêm Bi Qasî Kapîtalîzmê Xeternak e

Sîstemên şaristaniyan tevahiya dîrokê sîleha herî zêde li dijî civaka exlaqî û polîtîk bi kar anîne cinsiyetparêzî ye. Bi gelek armancan mêtingehkirina jinê mînaka herî balkêş a vê vegotinê ye. Zuriyetê zêde dike, karkera bêheqdest e, xwe karên herî bi qehr e, koleya herî sernerm e. Divê objeya domdarkirina xwesteka têkiliya cinsî ye. Amûra reklamê ye. Metaya herî bi nirx e, keybanûya metayan e. Mêr, ji bo timî pêkanîna desthilatdariya xwe wê weke amûrê destavêtinê bi kar tîne û lewma weke fabrîkeyekê xuya dike. Weke objeya bedewî û deng (xeml) jî ji aliyê manewî ve civaka serwer a zilam domdar dike. Jin bi van aliyên xwe hemûyan bi rewşa xwe ya di nava civaka zilam de piçûk-ketî herî zêde di nava avahiya dewleta netewe de dibîne. Forma jinê (nasnameya hevbeş a jinê, tesewira wê) di nava civaka dewleta netewe de weke îlaheyê bi awayê xuya dike alavekî perestinê ye. Lê li vir sifetê 'îlaheyê' bi maneya ya herî piçûk-ketî, ya kerxaneyê ye. Jina weke îlahe, jina herî zêde heqaret lê hatiye kirin û piçûk hatiye xistin e. Cinsiyetparêziya di civaka dewleta netewe de ji aliyekî ve mêr herî zêde dike desthilatdarî (Her mêrê serwer

têkiliya cinsî bi awayekî sergirtî bi maneya "Min heqê vê fahîşeyê dayê", "Min ew temam kir" di mejiyê xwe de neqiş dike) û di şexsê jinê de civakê dike mêtingeha herî li binî ye. Di vê çarçoveyê de jin di nava dewleta netewe de dibe neteweya mêtingeha herî pêşdebirî ya civaka dîrokî!

Yek ji şaxên bingehîn ê şaristanî amade kir ev rastî bû. Yek ji sedemên bingehîn, hişt ku çanda madî sînor nas neke, têkiliya xwe bi vê rastiyê re hebû. Ezmûna li ser jinê bi awayekî serketî hat ceribandin xwestin li ser tevahiya civakê biceribînin. Bandora xeternak a duyemîn jî ev bû. Civak diviyabû ji bo efendiyên xwe weke pîrekan bi kêr hatibûna. Em ê hewl bidin rave bikin ku pîrektiya civakê bi sîstema kapîtalîst temam bûye. Lê hîmê vê çalakiyê di qonaxa pêşî ya şaristaniyê de hatiye danîn û bi çanda Greko-Romen xwestin weke mînakekî serketî yê civakê nîşan bidin. Lê kengî mêr bibûya pîrek mirov dikarîbû behsa pîrekbûna civakê bikira. Greko-Romen civakeke welê bûn, ev yek his kiribûn û tedbîrên xwe girtibûn. Yek ji wan xusûsan e ku baş tê zanîn, rewşa koleyan gelekî ji pîrektiyê xirabtir e. Lê pirsgirêk ew bû ku mêrê nebûbû pîrek bibûya kole. Em behsa têkiliyên ensest an jî têkiliyên ji rê derketî nakin. Em behsa nêrmêtiyê jî nakin. Hin aliyên mijarê yên derûnî û heta hin diyardeyên biyolojîk divê ji mijara behsa wê dikim cihê bêne nirxandin.

Di civaka klasîk a Yewnan de mode ew bû ku her kurekî ciwan ê azad, divê ji sedî sed xwediyekî wî, partnerekî wî yê mêr hebe. Ciwanê kurik heta bibe xwedî tecrûbe û ezmûn divê partnerekî wî yê evîndariyê hebe. Weke min berê jî behs kiribû ku Sokrates jî gotiye; di vê bûyerê de ya girîng ew nîn e ku kurik pir were bikaranîn, a girîng ew e ku kurik wî ruhî bijî. Zîhniyet eşkere ye: civaka kole têkiliya xwe bi prensîba anor û azadiyê re nîn e, lewma diviyabû ev xislet ji civakê bihatana kirin. Ji ber ku gef li civakê dixwarin. Rast bû jî. Li deverekê anor û azadiya mirov hebe, koletî nikare li wir bijî. Sîstem li vê serwext bûbû û diviyabû çi hewce ye bikirana.

Bêguman çanda Greko-Romen ev mîsyona xwe temam nekir. Di nava wê de bi dibistanên felsefî yên azad Xiristiyantiya pêş ket, ji derve jî êrîşên etnîsîteyê yên dawî li wan nedihatin û serhildanên wan, civak bi rewşên din re rûbirû kir. Gelek îşaret hebûn ku nîşan didan çanda madî her tişt nîn e û hêza wê ew qas nîn e ku serî bi her tiştî re derxîne. Lê kapîtalîzmê wê hîç hewce nedîta civakê bike 'kurikê qûnde' û karibe wê bike pîrek.

Modernîteya kapîtalîst tevî hemû xeml û xêzên xwe yên lîberal, statuya ji berê mayî azad û wekhev nake, berevajî li vê statuyê wezîfeyên nû zêde dike û bi vî awayî jinê ji berê zêdetir dixe nava rewşeke girantir. Gotinên weke karkera erzan, karkera malê,

karkera bê heqdest, karkera nerm û xizmetkar rewşa jinê ya nû û girankirî nîşan dide. Di ser de jî weke hebûneke magazînî û amûrê reklamê bikaranîna wê jî hûrûkûr tê kirin. Bedena wê bi xwe jî weke amûrekî îstîstmarê di asta metayê de sermaye jê nagere. Di karê reklamê de timî amûrê tehrîk û sorkirinê ye. Bi kurtî, nûnera herî berdar a koletiya modern e. Ma ji amûrekî bê sînor zewqê bide û ji koleya herî zêde karê bîne zêdetir metayeke bi nirx heye?

Hedefa cinsiyetparêziyê ew e, nehêle jin bêhna xwe bide. Fonksiyona bi bandor a îdeolojiya cinsiyetparêziyê ew e, hem mêr bike nexweşê desthilatdariyê, hem jî jinê di bin hisa destavêtinê de bihêle. Bi zanistîperestiya pozîtîvîst cîhana akademîk û ciwanan bê tesîr dike û nîşanî wan dide ku ji bilî yekbûna wan bi sîstemê re, tu alternatîfa wan nîn e û di berdêla tawîzan de yekbûna wan bi sîstemê re misoger dike.

Di serdema îndustriya kapîtalîzmê de piştî civaka gund-cotkariyê duyemîn saziya girîng a civakî ya ji hev belav bû, malbat û jin e. Mijareke girîng a sosyolojiya Rojavayê ser wê girtiye jî malbat û jin e. Ev sosyolojî naxwaze xwe nêzî ravekirina pirsên çima û çawa malbat hilweşiyaye, bike. Di serdema destpêkê de mafê koleyan ê malbatê tune bû û mirov jî dikare vê rastiyê bi vê ve girêdayî rave bike. Ji ber bêkarî û

xizaniya zêde dibe, di civaka şaristaniyê de şert û mercên madî yê malbata ji kevneşopiyê bi piranî ji holê radibe. Maneya civakî ya malbatê namîne. Wexta ku ferd ji civakê tê qutkirin di vê mijarê de ya para jinê dikeve ew e, mêrê serwer şertên li gorî xwezaya jinê nîn in, li ser wê bi awayekî zalimane ferz dike û di encamê de jin radestî wî dibe û jinê diavêje kolanê. Koletiya jinê weke ku reklama wê tê kirin di vê serdemê de azadî bi dest nexistiye. Koletiya jinê ya kapîtalîzmê, koletiyeke piyaseyê ye, ew çend hûrûkûr e ku şaneyeke wê bi tenê ya nekiribin meta, nehiştine. Yek ji hêmanên herî girîng ên krîzên serdema îndustriyalîzmê, li ser jin û malbatê, diqewime. Ne bi tenê bi awayê hevduberdana zêde û zarokên kolanan, mêtinkarî û desthilatdariya sînornenas a cinsiyetparêziya civakî jî kûrahiya vê krîz û hilweşînê nîşan didin. Pirsgirêka jin û malbatê ya civakê û çareseriya wan weke hêmanên bingehîn ên jiyana azad, di asta teorîk û pratîk de hewcedarî bi hewldanên mezin heye.

Lîberalîzma ku civaka cinsiyetparêz dewr girt, qîma xwe neanî bi tenê jinê weke karkera bêheqdest di malê de bixebitîne. Hê zêdegavî kir, ew weke objeyeke cinsî kir meta û ew pêşkêşî piyaseyê kir. Bi vî awayî hê zêdetir bi dest xist. Li cem mêr bi tenê ked tê metakirin, lê jin hem tevahiya bedena wê û hem jî ruhê wê tê metakirin. Ya rastî, bi vî awayî şêweyê

koletiyê yê herî bi tehlûke hat avakirin. 'Pîreka mêr' ev herçiqasî sifetekî baş nebe jî mijareke bi sînor îstîsmarê teşkîl dike. Lê mirov bi tevahî kesayeta xwe bibe meta, ev tê wê maneyê ku mirov ji koletiya dema firewnan xirabtir dibe kole. Li şûna mirov bibe koleyê kesek an jî dewletekê, mirov bibe koleyê her kesî qatbiqat bi tehlûketir e. Xefika modernîteyê li pêşiya jinê daniye ev e. Bi awayê xuya dike jin li azadiyê vedibe, lê bi vî awayî jin dikeve statuya amûrê herî rezîl ê îstîsmarê. Ji amûrbûna reklamê bigirin heta bi seks û pornoyê jin amûrê herî bingehîn ê îstîsmarê ye. Ez bi hêsanî dikarim bibêjim, di hilgirtina kapîtalîzmê de herî zêde jin xistine bin barê giran.

Di nava malbatê de nûnerê dewletê mêr, li ser jinê hem di warê mêtinkariyê de û hem jî di warê pêşdebirina desthilatdariyê de xwe berpirsiyar û xwedî erk dibîne. Zordestiya ji kevneşopiyê ya li ser jinê li her çaviyê belav dike û bi vî awayî zilam jî dike parçeyek ji desthilatdariyê. Bi vê rê, civak di asta herî jor de dikeve sendroma desthilatdarîbûnê. Statuya jinê fikir û hisa bê sînor a desthilatdariyê dide civaka zilam a serwer. Li aliyê din, ji pêkhatina karkertiya tawizkar heta bi bêkariyê, ji karkertiya bêheqdest heta bi heqdestiya herî kêm di her neyêniyê de ya berdêl pê didin jinên kedkar in; jin bi xwe ye.

Îdeolojiya cinsiyetparêz a pevkirî ya lîberalîzmê ev mijar bi tenê ji rê dernexist û cuda nîşan neda; wekî

din jî ji bo jinan bi ehemiyet veguherand varyeteyên îdeolojîk ên hatin pêşdebirin. Mîna tiştekî mirov bi destê xwe koletiya xwe qebûl bike. Mirov dikare bibêje, sîstem bi îstîsmarkirina jinê ji aliyê madî û îdeolojîk ve bi tenê ji krîzên giran nabihure, hebûna xwe pêk tîne û misoger dike. Jin neteweya mêtingeh a herî kevn a dîroka şaristaniyê bi giştî û neteweya mêtingeh a herî nû ya taybet a modernîteya kapîtalîst e. Eger ji her alî ve rewşa krîzê di asta domnekirinê de be, di vê de para mêtingehkirina jinê di serî de tê.

Ez divê eşkere diyar bikim ku ez analîzên cinsparêz ên civakî, pozitîvîst dibînim. Ez yeqîn nakim ku em karibin bi nêzikatiyên objektîv ên seresere û çor jinê analîz û çareser bikin. Nexasim em bi şîfreyên koletiyê yên dawerivandine hinavên jinê nizanin. Ez yeqîn dikim ku pir zêde bi zîhniyeta fallus-vajînayê hatiye kirin û ev zîhniyet qabîliyetên din ên mirovî kotrimî dike. Di vê babetê de nuqteya balê dikişîne ew e, di cîhana nebat û heywanan hemûyan de diyardeya têkiliya cinsî ya şêwe, dem û fonksiyona xwe ya diyar heye, li cem cinsê mirov ev şêwe, dem û fonksiyon ketiye rewşekê ku zêde hatiye dejenerekirin. Ji sedî sed diyar e ku çavkaniya dejenerebûnê civakî ye. Ya rastî, mirov dikare bibêje; bi derketin û giştîbûna pirsgirêka civakî (zordestî û mêtinkarî) bi pêş ketiye. Ji ber ku civaka dayikê ji her alî ve ji hev hatiye xistin, pirsgirêka jinê pirsgirêka sereke ya civakê ye. Ji bo

terîfeke rast, bi vî awayî destnîşankirina pirsgirêkê hewce ye.

Cinsiyetparêziya civakî herî kêm bi qasî kapîtalîzmê cinawirekî civakî yê bi tehlûke ye. Lê mixabin, serweriya mêrê xasûk û bêrehm ji bo heqîqeta vê diyardeyê dernekeve holê û asteng bike, xwedî helwesteke çavkorî ye. Tevî ku bi qasî kapîtalîzmê hewcedariya xwe bi lêkolînê heye, yek ji qadên civakî ye ku di tariyê de hatiye hiştin. Îdeolojiyên dewlet û desthilatdariyê bi tevahî çavkaniya xwe ya pêşî ji helwest û tevgerên cinsiyetparêz digirin. Qada civakî ya herî zêde û bi kûrahî mêtinkarî û zordestî, her cure koletî û sernuxumandin lê pêk hatiye, koletiya jinê ye. Objeyeke civakî ye ku tevahiya şêweyên desthilatdarî û dewletê xwe li ser ceribandine û bûye jêder û çavkaniya wan.

Dewleta netewe û kapîtalîzm a bi serwextbûneke hûrûkûr a van xisletên koletiya jinê tevdigerin, bi îhtîmameke mezin jinê weke amûra desthilatdarî û sermayeya herî pêşxistî, bi kar tînin. Divê mirov baş zanibe ku koletiya jinê nebe tu şêweyê koletiyê şensê xwe yê pêşketin û jiyanê nîn e. Dewleta netewe û kapîtalîzm, mêrê serwer ê herî bisazîbûyî îfade dikin. Ji vê jî eşkeretir; dewleta netewe û kapîtalîzm, yekdestdariya mêrê zordest û mêtinkar in.

Parçekirina vê yekdestdariyê belkî jî ji parçekirina atomê zortir û zehmetir e.

Demografî (zanista serjimar-şêniyan) weke milekî alîkar ê cinsiyetparêziya civakî, bi modernîteyê re artêşa eskerî, artêşa bêkaran, ji bo civaka netewe ya standart jî statîstîkê jî bi kar tîne û zarokanîna jinan bi pîvanên îdeal ve girê dide. Îdeolojiya jêre Malthusparêzî tê gotin vê yekê îfade dike. Serjimara mirovan ya ku li civak û ekolojiyê gefan dixwe, di cewherê xwe de pirsgirêkeke biyolojîk nîn e, ji ber ku kapîtalîzm û dewleta netewe îdeolojiya cinsiyetparêz bi kar tînin, encameke bi vî rengî derdikeve holê. Malbatgiriya modern jî di navê de, kapîtalîzm, îdeolojiya cinsiyetparêz a dewleta netewe û kirinên wê ji bo civak û hawîrdorê belkî jî çavkaniya herî mezin a pirsgirêkan e. Ji lewra divê mirov cinsiyetparêziya civakî di çarçoveya dewleta netewe de weke pêncemîn çavkaniya herî mezin a pirsgirêkên civakî bibîne û binirxîne.

Pirsgirêka nifûs û şêniyan ji nêz ve bi cinsiyetparêzî, malbat û jinê ve têkildar e. Çiqas şênî zêde bibin ewqasî jî sermaye zêde dibe. 'Jina malê' fabrîkeya nufûsê ye. Em dikarin jêre bibêjin, fabrîkeya meta û 'dolên' sîstem herî zêde hewcedarî wan e. Mixabin malbata di bin serweriya yekdestdariyê de xistine vê rewşê. Tevî ku zehmetî hemû para jinê dikevin, nirxê mal jî ji bo sîstemê diyariya herî hêja ye.

Şêniyên zêde dibin herî zêde jinê dihilhilînin. Di îdeolojiya xanedaniyê de ev welê ye. Malbatgirî weke îdeolojiya herî nadîde ya modernîteyê, qonaxa dawî ya xanedantî gihîştiyê ye. Ev xusûs hem bi zêdeyî bi îdeolojiya dewletdariya netewe re dibin yek. Ji dewleta neteweyî re timî zarok mezin dike, ma ji vê hêjatir çi heye? Şêniyên dewleta netewe çiqasî zêde bibin, ewqasî jî hêza wan zêde dibe. Em bi vî awayî dikarin bibêjin, di vê zêdebûna şêniyan de ku sînorên xwe derbas kiriye, berjewendiyên heyatî yên yekdestdariya mêr û sermayeyê yên hişk rêxistinbûyî hene. Zor, zehmetî, qehr, êş, gunehbarkirin, feqîrî, birçîtî, cewr û cefa ji jinê re; bi destxistina kara kêfî ji 'begê' wê û sermayedarê wê re. Di dîrokê de tu serdem weke vê serdemê nebû xwedî hêz û ceribandinê ji bo jinê ji piraliyan ve weke amûrekî îstîsmarê bi kar bîne. Jin weke mêtingeha destpêk û dawiyê di kêliya herî krîtîk a dîroka xwe de ye.

Li ber vî dînê seksualîteyê narkotîkên kîmyewî jî nabin tiştek û heta mirov dikare bibêje hîç in. Bi tevahî ferdên civakê bi reklamên medyatîk, ne bi tenê bi reklamên ji rêzê, bi kampanyayan kirine kesên her wekî di warê seksualîteyê de ji rê derketî. Ciwan, pîr û kal û heta zarok ferq nake; her kes tê bikaranîn. Jixwe jinê kirine weke amûrekî herî pêşketî yê seksualîteyê. Ew bi zîhniyeteke wer mehkûm kirine ku bi qasî serê derziyê beşekî wê bi awayekî cinsî xîtab neke, mîna

pênc quriş qîmeta wê nîn e, difikire. Malbata pîroz kirine dergeheke seksualîteyê. Ji dayika pîroz û xwedawendiyê ‘pîrejineke’ bêkêr li dawiyê maye. Rewşeke gelekî xemgîn û xembar e. Bi rêya sûnî ya avishiştinê jin bi temamî kirine amûrekî seksualîteyê û ev yek gihandine asta herî jor.

Rewşa berovajî jî, li gorî sîstemê, gihîştiye wê astê ku mirov nikaribin xwe lê ragirin. Anîna pir zarokan, di serî de zarokê kur, bi daxwaziya xwedîbûna pir zarokan ve girêdayî, di cewherê xwe de kevneşopiyeke civaka bavikan e, lê piştî ku teknîkên bijîşkî ketin dewrê, jinên tebeqeya jêrîn kirine mîna makîneya zarokanînê. Bi vî awayî, karekî zehmet ango gihandina zarokan jî dixin stûyê xizanan û bi vê riyê hewcedariya bi karkerên ciwan jî tê tedarik-kirin û li aliyê din jî malbateke riziyayî tê afirandin. Bi vî rengî bi kevirekî çend nîşanan bi hev re radikin. Mêr û jinên tebeqeya jor bi zarokên sûnî, kurê hewiyê û xwedîkirina heywanan têgîna zarok dirizînin qaşo pê kêmasiya ewlad tedarik dikin û bi vî awayî hewl didin heta dawiyê seksî bimînin û bi awayekî ji xwe biçin dînê nû yê seksualîteyê rîtualîze dikin. Encam; şêniya bêmane zêde dibe ku mirovatî nikare di binî de rabe, bêkariyeke di dîrokê de hîç nehatiye dîtin û pêsîrtengiya hawîrdorê, kiriye ku mirov nikaribe vî barî rake.

Di mijara jinê de mirov dikare li egoîstî û çavkoriya mêr weke diyardeyeke rojane, her saetê çav bidêre. Di vê babetê de mêrê ji her tebeqeya civakî, bêyî ku rêzikeke hiqûqî û exlaqî nas bike, çavê xwe namiçîne dikuje, qetil dike. Ma kesê xwedî wijdan dikare vê rastiyê nebîne. Helwestên bi vî rengî jî piranî li ser navê eşqê têne nîşandan. Ji ber ku têkiliya eşqê bi heqîqetê re kêm zêde hatiye şîrovekirin, yekser wê bê fêmkirin ku vegotineke bi vî rengî dereweke herî rezîl e. Çi di cîhana heywanan çi jî di ya nebatan de û heta di cîhana fizikî ya em weke 'bêcan' bi nav dikin de tu kirdareke dibe mijara eşqê, nakeve nava hewldaneke bi vî rengî. Herçiqasî hin jirêderketinên hê nehatine analîzkirin bêne dîtin jî eşkere ye ku li cem cinsê mirov sedem û maneyên kuştin û cinayetiyên bi vî rengî, gelekî cuda ne. Berê pêşî divê mirov têkiliya van kuştin û cinayetan bi serwerî û mêtinkariyê re weke yek ji xusûsên sereke destnîşan bike.

Pirsa bingehîn a divê bê kirin ev e, zilam çima di mijara jinê de evqasî hesûd, çavnebar, tehekumkar û kujer e, çima tevahiya bîst û çar saetên rojê ji rewşa xwe ya destavêtinê nagere. Bêguman destavêtin û tehekum têgînên îstîsmarê yên civakî ne. Rengê civakî ya diqewime îfade dike, hiyerarşî zêdetir bavikparêziyê û desthilatdariyê bi bîr dixin. Maneyeke wê ya din a kûrtir, xiyaneta li hemberî jiyanê îfade dike. Girêdana piralî ya jinê bi jiyanê re dikare

helwesta cinsiyetparêziya civakî ya zilam zelal bike. Cinsiyetparêziya civakî, bi bandora cinsiyetparêziya diqedîne û kor dike jidestdana dewlemendiya jiyanê, helwesta bi hêrs, tecawizkar û hakim a ev yek dibe sedema wê, îfade dike. Têkiliya xerîze û ajoya cinsî bi domdariya jiyanê re eşkere ye. Lê mirov nikare bibîne ku tu zindî û ruhber bîst û çar saetan ji aliyê cinsî ve dewamî birçî ye û xwediyê vê zîhniyetê ye. Eşkere ye ku jiyan bi tenê ji têkiliya cinsî pêk nayê. Berevajî, mirov dikare bibêje têkiliya cinsî bi awayekî kêliya mirinê ye, ya rastî li dijî mirinê pêngaveke kujer a jiyanê ye. Ango mane ev e; çalakiya cinsî çiqasî zêde be, ewqasî jiyan ji dest tê dayîn.

Ez nabêjim çalakiya cinsî bi tevahî kujer e. Îdeala bêserûbinî ya jiyanê jî di nava xwe de hildigire. Lê ev îdeal, jiyan bi xwe nîn e. Berevajî, li dijî tirsa mirinê tevdîrek e ku mirov dikare bibêje zêde qîmeta xwe ya heqîqetê nîn e. Mirov dikare vegotinê welê zelal bike: Gelo dubareyên xelekên jiyanê girîng in, yan jî weke tekxelek ew bi xwe girîng e? Piştî ku heqîqeta ya tektam hat îfadekirin, dubarebûna bêserûbinî ya xelekê zêde maneyê di nava xwe de nahewîne. Eger bihewîne jî ev ji hewcedariya xwe gihandina 'agahî-zanîna mutleq' e. Di vê rewşê de xelek çiqasî xwe baş nas bikin, pêdiviya bi agahiya mutleq jî wê ewqasî hatibe tedarik-kirin, hingê jî xelek ango zêdebûna cinsî zêde qîmet û maneya xwe namîne.

Felsefeyeke bi azadî, wekhevî û demokratiya bi kok barkirî, bi jinê re jiyaneke hevpar a were bi rêkûpêk-kirin, jê tê ku di asteke bêqusûr de bedewî, qencî û rastiyê pêk bîne. Ez bi xwe di nava statuyên heyî de jiyana bi jinê re, bi qasî ku bi pirsgirêk dibînim ewqasî jî kirêt, xirab û şaş dibînim. Di nava statuya heyî de jiyana bi jinê re ji zarokatiya min yek ji wan mijaran e ku têde wêrekiya min kêm e. Ji ber ku jiyaneke welê ye, xerîzeyek mîna xerîzeya cinsî bi hêz dixe ber lêpirsînê. Xerîzeya cinsî ji bo xatirê dewamkirina jiyanê ye. Harîqayeke xwezayî ye, divê pîrozbûna xwe hebe. Lê yekdestdariya sermaye û mêr jin ewqasî qirêj kirine ku ev qabîliyeta harîqa ya xwezayê weke 'fabrîkeyeke dolan' a herî piçûkxistî veguherandine saziya hilberandina metayê. Bi van metayan civak serûbinî hev tê kirin û hawîrdor jî di bin giraniya şêniyan de (niha şeş milyar e, em hawîrdora bi deh û pêncî milyar şêniyî bifikirin) kêlî bi kêlî hildiweşe.

Bêguman mirov bi jinekê re bibe xwedî zarok bi xwe bûyereke gelekî pîroz e: nîşan dide ku wê jiyanê neqede. Bêserûbinîbûnê bi mirov dide hiskirin. Ma ji vê hisê hêjatir his dibe? Her cins û cure di bin vê rastiyê de ber bi heyecana bêserûbinîbûnê dikeve û bi vê hisê ditamije. Nexasim ev yek li cem mirovê roja me ya îro di asteke welê de ye, gotina hozanekî tîne bîra me. Hozan wisa dibêje, "Dola me bela serê me ye." Kes nikare înkar bike ku em careke din bi şaşî, kirêtî û bê

exlaqiya mezin a yekdestdariya mêr û sermayeya bi Xwezaya Yekemîn û Duyemîn re ters dikeve rûbirû ne.

Ya bi destê mirov tê avakirin, bi destê mirov dikare were hilweşandin. Di vir de ne qanûneke xwezayê heye, ne jî çarenûseke mewzûbehs e. Li vir a em behsa wê dikin, nîzamên desthilatdariyê ne, ew destên jiyanê yên bi hormon û bi kansêr ên mêrê bi hêz û xasûk ên şebekeyê ne. Min her tim hûrûkûr manedarkirina jiyanê ya du cotên herî harîqa yên di gerdûnê de his kir. Min cesaret kir ku berê bi jinê re bifikirim û li pêşiya hemû têkiliyên xwe, li ku, kengî û çiqas xirabî hebin pêre guftûgo bikim û ji holê rakim. Bi tenê jina bi hêz, difikire, qenc, bedew û rast biryarê dide, bi vî awayî jî wexta ji min dibihure min heyranî xwe dike û dikare bibe muxatebê min, bêguman di gera min a felsefî de kevira çarqozî ye ango ya serê quncikê ye. Min timî bawer kir ku sirên jiyanê yên di vê gerdûnê de diherikin herî baş, bedew û rast wê bi vê jinê re manedar bibin. Lê bi qasî ku tu mêr ê nikaribin bi ser bixin exlaqê min ê min jê bawerkirî heye; ez ê bi malê 'mêr û sermaye' yê li pêşiya min, şêwazê hebûna xwe tu carî bi Hurmuza nod hezar mêrî re parve nekim. Hingê ji femînîzmê jî wêdetir têgîna 'jineolojî' (zanista jinê) dikare bi awayekî baş bersiva armancê bide.

Min jiyana xwe ya kurtik a antî-modernîst û berxwedana jinê ya antî-şaristaniyê ya hezarê salan

wekhev didît. Bi vî awayî, her ku diçû min ji nêzikatiya cinsiyetparêz a li dijî jinê nefret dikir, kirêt û rezîl didît. Ez pir zû lê varqilîm ku pîrektî pirbiçûkxistin e.

Ji van nirxandinên kurt encama mirov dikare derxe ew e ku ji dema dayikî û vir ve, jin bi awayekî sîstemîk û sazî bi mêtinkarî û zordestiyeke civakî re rûbirû bûye. Koletiya jinê bi qasî ku bi tu şêweyê koletiyê re mirov nikaribe bide berhev, tevlîhev û heyatî ye. Di nava dîroka şaristaniyê de bazarên koleyan ên jinê, cariyetî û saziyên hareman belkî hinekî diyardeyê nîşan bidin. Lê kirinên modernîteya kapîtalîst li ser jinê ewqasî zêde bûne, hed û hesabê xwe nîn in. Tu şaristaniyê bi qasî kapîtalîzmê bi jinê nelîstiye û îstîsmara xwe li ser bi sazî nekiriye. Diyarde ew çend hatiye îstîsmarkirin, piraniya jinan kirinên ew xistine rewşên herî rezîlane, weke xisletên bingehîn ên nasnameya jinê nîşan didin. Ne tenê ev, dekûdolab li ser serê wê tê gerandin û ew xwe weke parçeyekî destê vê dekûdolabê digerîne, qebûl dike û ew wer ketiye dest, ji gerandina vê dekûdolabê tu fikarê nake.

Em bi tenê behsa mêtinkarî û zordestiyeke diyardeyî nakin. Koletiyeke dawerivandine her şaneyên jiyanê, weke şêweyên deng, reng, beden û zîhniyetê bêxem û fikar bi dilê xwe pêşkêş dike. Hay ji xwe nîn e têkiliya xwe ya bi heqîqeta civakî re ji dest daye û kirine ku bi tenê jiyaneke li ser dikê tê lîstin be.

Ya rastî, vê îmkanê jî nabîne. Ji bo bidestxistina heqîqet û rûmeta jiyanê, ji hev belavkirina mija li dora jinê, bi tevahî girîngiya xwe diparêze.

Tevî ku rastiyek e ku bêyî jinê jiyan nabe, lê eşkere ye ku bi jineke evçend hatiye xistin jî jiyaneke manedar û rûmetdar nayê parvekirin. Jiyana bi jina heyî re her kes û giştî heta bi qirika xwe ketine nava koletiya herî rezîlane; bi vê zanîn û têgihiştinê divê mirov çareserker û çalak be, wê ev bibe rêya rast a rizgariya jiyanê. Divê mirov tu carî ji bîr neke ku bi jinê re jiyaneke bi mane û bi anor bi zanyartî û hozantiyeke mezin dibe. Yên îdeaya xwe ya eşqê hene, divê kêliyekê jî ji bîr nekin ku bicihanîna vê eşqê, bi çûyîna di rêya vê zanyartî û mezinahiyê de ye. Naxwe bi awayekî din meş û çûyîn bi eşqê re xiyanet e û ji koletiyê re xizmet e. Mirov heta xwe negihîne heqîqeta civakî, nikare bigihîne eşqê.

## Weke Zanista Jinê Jineolojî

Azadiya jinê, di şekilgirtina şaristaniya nû de wê bi rola herî hevseng dike û wekhevîxwaz rabe. Jina ku ji jihevdeketina civaka neolîtîk û vir ve her wekî ji civakê hatiye navbirin wê cardin di şertên rêzdar, azad û wekhevîxwaz de cihê xwe bigire. Ji bo hemû xebatên teorîk, bernameyî, rêxistinî û çalakî wê bên kirin. Rastiya jinê, mijareke ku ji têgîna çîna proleter û neteweya tê eciqandin ku demekê pir qala wê dihat

kirin hîn şênber, berbiçav e û dikare were analîzkirin. Mirov dikare bibêje ku veguherîna herî bingehîn a civakê, bi veguherîna wê jin pêk bîne tê diyarkirin. Jin çiqas wekhev û azad be, hemû beşên civakê jî ew qas wekhev û azad in. Bi rengekî mayînde di bicîbûna demokrasî û laîktiyê de wê rola demokratîkbûna jinê diyarker be. Bi kurtasî ev nasandina bernameyî ya derbarê diyardeya jinê de jî nîşan dide ku tevgerîna civakî ya nû bi rengê jinê wê rewşeke sereke jiyan bike.

Çaxê şaristaniya demokratîk, bi qasî jinûve zayîna gelan û dibe ku hîn jî diyarker çaxê zayîna jinan e. Hêza xwedawend a zayînê ya civaka neolîtîk jin, di tevahiya dîroka civaka çînîdar de her tim bi windakirinê re rû bi rû maye. Dîrok, di maneyekê de bi civaka çînîdar a ku bilind dibe re dîroka mêrê serdest e ku bihêz dibe. Şexsiyeta çînîdar a serdest, bi şexsiyeta mêr a serdest re pêk tê. Di vê derê de jî rêzika derbasdar e derewên mîtolojîk û cezakirinên îlahî ne. Di bin viya de jî zora çor a tazî û rastiya dagirkeriyê heye. Heta roja me, şexsiyeta mêr a serdest a civakê, fersend nedaye ku diyardeya jinê bi zanistî were nirxandin jî. Ji ol zêdetir weke qadeke tabûyî tê dîtin. Di bin navê namûsê de, ya rastî rastiya jinê ya ku mêr bi xasûkî, xayînane û bi zordarî xesp kiriye û mafên wê veşarî ne. Di tevahiya dîrokê de jin ji nasname û şexsiyeta xwe bêpar hatiye hiştin û her

tim kirine dîlê mêr, diyardeyek e ku ji çînîbûnê zêdetir rê li ber encamên neyînî vekiriye. Dîlgirtina, dîlbûna jinê, pîvangeke koletiya giştî, ketinê ye; pîvanga derew, dizî û zordariya di civakê de belav bûye; pîvanga her cure qirêjî û nokeriyê ye.

Ev dîrok berevajî were kirin, jêneger e ku encamên civakî yên herî kûr bi xwe re bîne. Bi azadî jinûve zayîna jinê, di saziyên jêr û jor ên civakê de wê azadbûneke giştî, ronîbûn û dadê pêwîst bike. Wê îqna bike ku li şûna şer aştî hîn binirx e û divê bê bilindkirin. Jina ku qezenc bike, di her astê de ew civak û takekes e ku qezenc dike. Ev çarçoveya kin jî bi aşkerayî nîşan dide ku di qada maf û azadiyên jinê de demokratîkbûn çiqas dîrokî ye. Di vî warî de sedsala 21. çaxê jina ku şiyar dibe, azad dibe û bihêz dibe bide destpêkirin, diyardeyeke ji rizgariya çînî û neteweyî jî girîngtir e. Dema şaristaniya demokratîk, ji her demî zêdetir wê bibe çaxekî ku jin zêdetir bilind dibe û qezenc dike.

Azadiya jinê divê li gorî tarîfa xwe, çarçoveyeke rast bibîne. Azadî û wekheviya giştî ya civakî dibe ku yekser ji bo jinê nebe azadî û wekhevî. Hewldan û rêxistiniyeke xweser şert e. Tevgera giştî ya demokratîkbûyînê dikare ji bo jinê derfet û îmkanan bide, lê xweber demokrasiyê nayne. Divê jin bi xwe, ji bo armancên demokratîk û rêxistiniyê hewl bide.

Beriya her tiştî hewceyî bi tarîfeke azadiyê heye ji bo bersivê bide koletiya bi jinê hatiye daqurtandin. Sîstema kapîtalîst ew çend vîzyoneke mezin û cîhaneke faraziyan xistiye şûna rastiyê, çalakiyeke herî zêde jinê piçûk bixîne (mînak pornografî) bi azadiyê re heman tişt û wekhev dibîne.

Her çend di hewldan û xebatên femînîstan de nuqteyên girîng hebin jî, hê nikarin ji mejiyê demokrasiyên ku navenda wan Rojava ne, derbas bikin. Şêweyê jiyanê yê di bingeh de kapîtalîzm heye baş fêm nekirine. Lewra nikarin li dawiyê jî bihêlin. Rewş, têgihîştina şoreşa sosyalîzmê ya Lenîn bi bîr dixîne. Tevî ew çend hewldan û gelek destkeftiyan, Lenînîzmê nekarî xwe xilas bike ji bo li baskê çepê nebe alîkarekî baş ê kapîtalîzmê. Heman tişt dibe ku bi serê femînîzmê de jî were. Ji ber ku bingehekî xurt ê rêxistinî nîn e, felsefeya xwe pêş de nebiriye û zehmetiyên mîlîtaniya jinê, îdîaya wê qels dike. Dibe ku nikaribe “sosyalîzma reel” a jinê jî pêk bîne. Lê ji bo balê bikişîne ser pirsgirêka jinê gavavêtineke cidî ye.

Têgîna femînîzmê bi Tirkiya xwe tê maneya ‘tevgera jinîtiyê’. Ji lewra bi temamî rengê pirsgirêka jinê nade û dijberê wê jî weke mêrîtiyê were tesewirkirin wê hê bêtir meseleyê sêr bike. Mîna ku maneya bi tenê ‘jina bindest a mêrê serwer’ nîşan dide. Lê rastiya jinê hê berfirehtir e. Ji cinsiyetê wêdetir şaxên wê yên berfireh ên ekonomîk, civakî û

siyasî hene. Eger em têgîna mêtingeriyê ji çarçoveya welat û neteweyan derxin û daxin asta komên mirovan, mirov bi hêsanî dikare statuya jinê weke mêtingeha herî kevn terîf bike. Bi rastî, tu diyardeyê weke ruh û beden bi qasê jinê mêtingerî nas nekiriye. Divê baş were fêmkirin ku sînorên jinê di statuyeke mêtingehê de tê hiştin ku bi hêsanî mirov nikare diyar bike.

Çawa ku di tevahiya zanistan de heye, di zanista civakî de jî vegotina mêrtiyê mohra xwe lê xistiye û rêzên di zanistê de behsa jinan dikin bi nêzikatiyên propagandîf ên hîç behsa rastiyê nakin tijî ne. Statuya rastî ya jinê bi van vegotinan mîna dîrokên şaristaniyê yên çînî, mêtinkarî, zordestî û êşkenceyê dinixumînin belkî jî çil qat ji wan zêdetir dinixumîne. Li şûna femînîzmê têgîna jineolojiyê (zanista jinê) belkî çêtir bersiva armancê bide. Diyardeyên jineolojiyê derxe holê bi herhalî wê derbarê gelek beşên teolojî, eskatalojî, polîtîkolojî, pedagojî û welhasil heta sosyolojiyê de ji loji'yên wan kêmtir xwedî pareke rastiyê nebe. Hem ji aliyê fizîkî ve hem jî ji aliyê maneyê ve jin beşê herî berfireh ê xwezaya civakî pêk tîne û ev ne ya guftûgoyê ye. Hingê çima ev parçeyê herî girîng ê xwezaya civakî nebe mijara zanistê? Sosyolojî gelek beşên xwe hene û heta pedagojî jî beşek ji wê ye û der barê perwerde û hînkirina zarokan de ye. Zanisteke ev qas hatiye dabeşkirin çima jineolijiyê pêk nayne û gelo ev xusûs ji vegotina

wê ya bi serweriya mêr û pêve bi tiştekî din tê ravekirin.

Heta xwezaya jinê di tariyê de bimîne, wê tevahiya xwezaya civakê rohnî nebe. Xwezaya civakî bi awayekî rastî û berfireh were rohnîkirin, hingê rohnîkirineke rastî û berfireh a xwezaya jinê mimkun dibe. Ji dîroka mêtingehkirina jinê heta bi mêtingehkirina wê ya ekonomîk, civakî, siyasî û zîhnî statuya wê were zelalkirin, wê ev yekê bibe alîkariyeke mezin ji bo zelalkirina tevahî mijarên din ên dîrokê û civaka îroyîn.

Bêguman zelalkirina statuya jinê şaxekî meseleyê ye. Şaxê wê yê girîngtir derbarê pirsgirêka rizgariyê de ye. Bi gotineke din çareserkirina pirsgirêkê hê zêdetir girîng e. Gelek caran tê gotin, asta azadiya giştî bi asta azadiya jinê re di weznekê de ye. Ev gotin rast e, lê ya girîng ew e, wê nava wê çawa were tijîkirin. Azadî û wekheviya civakî bi tenê wekhevî û azadiya jinê diyar nakin. Ji bo vê hewcedarî bi teorî, bername, rêxistin û mekanîzmayên çalakiyê heye. Ji vê jî girîngtir, xuya dike ku siyaseta demokratîk a bê jin nikare bibe, heta polîtîkvaniya çînî jî wê kêm bimîne, aştî û hawîrdorê jî neyê parastin.

Divê mirov jinê ji statuya 'dayika pîroz, namûsa esasî, ya dest jê nabe, hevaleke bêyî wê nabe' derxe û weke tevahiya obje-sûbje bixe ber lêkolînê. Bêguman beriya her tiştî divê mirov van lêkolînan ji qeşmertiyên bi navê eşqê biparêze. Heta şaxê herî

girîng ê lêkolînê divê rezîliyên mezin ên di bin navê eşqê de (di serî de destavêtin, kuştin, lêdan, dijûnên yek ji ya din sosretir) hatine veşartin pêşkêş bike. Gotineke Heredot heye dibêje "Tevahiya şerên Rojhilat-Rojava ji rûyê jinê de derketine." Ev gotin bi tenê dikare rastiyekê rave bike. Ew jî ev e, weke mêtingeh bi nirx bûye, ji lewra jî dibe sedema şerên girîng. Jixwe dîroka şaristaniyê welê bû, lê modernîteya kapîtalîst hezar qat ji wê girantir û bi awayekî piralîbûyî mêtingehkirineke jinê temsîl dike. Li nasnameya wê kola ye. Dayika tevahiya kedan, xwediya keda bêheqdest, karkera xwedî heqdesta herî kêm, ya herî bê kar, çavkaniya bê sînor a arezû û zordestiya mêr, makîneya zarokanînê ya nîzamê, pîrika mezinkirina zarokan, amûra reklamê, amûra seks û pornoyê, bi vî awayî mêtingehkirin dûvdirêj diçe. Kapîtalîzmê bi qasî ku di tu mêtinkariyê de mekanîzme pêşde nebiriye di mêtinkariya jinê de mekanîzma pêş xistiye. Herçiqasî bi dilê me nebe jî dubare dubare em li statuya jinê vedigerin û ev êşê dide me. Lê ji bo yên mêtinkarî li ser wan dimeşe zimanê rastiyan bi awayekî din nabe.

Tevgera femînîst li ber rohniya van rastiyan bêguman divê tevgera herî radîkal a dijberê sîstemê be. Tevgera jinê bi rewşa wê ya modern em dikarin reh û kokên wê bibin bispêrin Şoreşa Franseyê û piştî çend qonaxan karîbûye heta roja me ya îro bê. Di qonaxa pêşî de li pey wekheviya huqûqî beziyaye. Ev

wekheviya tê maneyê îfade nake di roja me ya îro de bi awayekî berfireh pêk hatiye. Lê divê mirov baş bizanibe ku naveroka wê vala û pûç e. Mîna mafê mirovan, ekonomîk, civakî û mafên siyasî di mafên din de jî pêşketineke şeklî heye. Bi awayê xuya dike jin jî bi qasî mêran xwedî azadî û wekheviyê ye. Lê ya rastî, xapandina herî girîng jî di vî şêwazê azadî û wekheviyê de veşartiye. Bi tenê di dema modernîteyê de ne, di tevahiya demên hiyarerşîk û şaristaniyan de jin di hemû çaviyên civakî de ji aliyê zîhnî û bedenî ve dîl hat girtin û bi koletiyeke pir kûr hat xebitandin. Ji bo azadî, wekhevî û demokrasiya vê jinê hewcedarî bi xebatên teorîk ên berfireh, têkoşîna îdeolojîk, xebatên bernameyî û rêxistinî, ji van jî girîngtir pêdivî bi çalakiyên bi hêz heye. Bêyî van, xebatên jinê û femînîzmê wê ji xebatên jinê yên lîberal ên ber dilê sîstemê xweş dikin wêdetir tu maneyê îfade nekin.

Muhtemel zanista jinê pêş bikeve, mirov çareserkirina pirsgirêkan bi mînakekê rave bike wê têra xwe me hîn bike: Divê mirov bizanibe ku xerîzeya hundir a cinsîtiyê yek ji şêweyên herî kevn a hînbûnê ye. Bersivê dide pêdiviya cinsê mirov ji bo zuriyeta xwe dewam bike. Ji ber ku derfet û îmkanên ferd ê jiyana bêserûbinî bijî nîn e, xwe neçar dibîne weke potansiyela zêdebûnê xwe dubare di yeka din de pêk bîne. Ya jêre xerîzeya cinsî tê gotin ev e. Kengî ev potansiyel şert û mercên di cih de dibîne xwe zêde dike û jiyanê dewam dike. Bi awayekî li beramberî

tehlûkeya qirbûn û mirinê dibe çare. Mîna dabeşbûna pêşî ya şaneyê ye. Şaneya yek e, xwe pir dike û bi vî awayî xwe bê mirin dike. Eger em hê bi awayekî giştî bibêjin bûyer ev e, gerdûn li dijî valatî û tunebûna dixwaze wê daqurtîne xwe timî bi curbicurkirinê zêde dike û bi vî awayî meyla xwe ya bêserûbinîbûnê di jiyana zindî de dewam dike.

Fer an jî ferda ev bûyera gerdûnî ya bi cinsê mirov dewam dike zêdetir jin e. Zêdebûn û pirbûn di bedena jinê de pêk tê. Rola mêr di vê bûyerê de têra xwe talî ye. Ji lewra di dewamkirina zuriyetê de bi tevahî berpirsiyarî ya jinê ye û ev ji aliyê zanistî ve jî xusûseke tê fêmkirin. Jixwe jin bi tenê cenînê di zikê xwe de hilnagire, mezin nake û nazê. Hema hema heta bi mirina xwe jî li zarokên xwe miqate dibe û bi awayekî xwezayî bi vê berpirsiyariya xwe radibe. Hingê encama pêşî ya divê em ji vê bûyerê derxin ew e, divê di tevahiya mijarên têkiliyên cinsî de ji sedî sed jin xwediyê gotinê be. Ji ber ku her têkiliya cinsî ji bo jinê bi awayekî potansiyel rê li pirsgirêkên giran ên nikaribe ji binî rabe vedike. Divê mirov baş fêm bike ku jineke deh zarokan bîne ji aliyê fizîkî ve, heta ji aliyê rûhî ve dikeve rewşekê heft xwezî bi mirinê.

Nêrtina zilam li seksualîteyê hê zêdetir berevajî û bêberpirsiyarî ye. Di vê de korkirina desthilatdariyê û cehalet di dereceya yekê de diyarker in. Herweha bi hiyarerşî û dewleta xanedaniyê re bûyîna xwediyê pir zarokan ji bo mêr tê maneya bi hêzbûneke dest jê

nabe. Pirzarok bi tenê ji bo dewamkirina zuriyetê ne, mayîna weke desthilatdarî û dewletê misoger dike. Bi awayekî ji bo dewleta tê maneya yekdestdariya milk ji dest neçe, divê xanedanî mezin be. Bi vî awayî, hem ji bo hebûna biyolojîk, hem jî ji bo hebûna desthilatdarî û dewletê, jinê dikin amûrê anîna pir zarokan. Ji bo jinê bingehê xeternak ên mêtingehkirinê bi yekemîn û duyemîn xwezayê ve girêdayî bi vî awayî tê amadekirin. Mirov hilweşîna jinê bi van her du xwezayan ve girêdayî analîz bike gelekî girîng e. Hewce nake ku mirov zêde rave bike, di bin statuya vê xwezaya duber de mimkun nîn e ku jin ji aliyê rûhî û bedenî ve demeke dirêj zindî û nehilhilî li ser piyan bimîne. Hilweşîna rûhî û bedenî di zikhev de pêk tên û ev jî dihêle ku jin ji bo jiyana yên din dewam û têkûz bike, di berdêlê de jiyaneke bi qehr, kin û bi cefa jiyana xwe bi dawî dike. Gelekî girîng e ku mirov dîroka şaristanî û modernîteyê li ser bingehê vê rastiyê analîz bike û bixwîne.

Em wehameta pirsgirêkê ji aliyê jinê ve li aliyekî bihêlin. Şaxekî din ê pirsgirêkê heye ew jî pirsgirêka demografiyê ye ango zêdebûna şêniyan e. Bandora xwe bi awayekî giran li ser tevahiya xwezaya civakî û hawîrdora ekolojîk dide hiskirin. Çi ji aliyê zanista jinê ve, çi jî ji aliyê tevahiya zanistên civakî ve yek ji dersên herî bingehîn a divê were girtin ew e, divê şênî bi rêbaza 'hînbûna xerîzeyên hundir' dewam neke, neyê mezinkirin û ji bilî hin rewşên îstîsnayî neyê piçûk-

kirin. Bi rêbazeke herî paşvemayî mîna xerîzeyên hundir dewamkirina zuriyetê û bi rêbazên zanistî yên tevahiya dîroka şaristanî û modernîteyê hatine pêşdebirin destekdan sedema bingehîn a zêdebûna sînornenas a şêniyan e. Cinsê mirov weke xwezaya civakî bi tenê bi rêyên xerîzeyên hundir, nexasim jî bi ajoyên cinsî hebûna xwe dewamkirin rewşeke gelekî paşvemayî îfade dike. Asta mejî û çandê ji bo hebûnên civakî bi naverokên pêşketî bê dewamkirin potansiyelên hînbûnê pêşkêş dike. Ferd û kom bi mejî û çandên xwe, bi saziyên xwe yên felsefî û polîtîk xwedî wan îmkanan in ku xwe demeke dirêj dewam bikin. Ango bi rêya xerîzeya hundir dewamkirina zuriyetê û pirbûna mirov bi vî awayî maneya xwe namîne. Mejî û çanda mirov ji mêj ve ji vê rêbazê bihuriye. Ji lewra ji vê paşvemayînê bi awayekî bingehîn şaristanî û prensîba karê ya modernîteyê berpirsiyar e.

Hîç şik û guman têde nîn e ku pirbûna zêde ya şêniyan DESTHILATDARÎ Û YEKDESTDARIYA ZÊDE ye; ew jî tê maneya KAR'a herî zêde û mezin. Tevahiya dîrokê cinsê mirov bi pir zêdebûna xwe bi tenê civak ne, hawîrdor û xwezaya xwe jî aniye ber tunekirinê û ji sedî sed ev encama DANEHEVA DESTHILATDARÎ Û SERMAYEYA KUMULATÎF û ev jî tê wê maneyê encama QANÛNA KARA ZÊDE ye. Sedem û tesîrên din hemû di dereceya talî û duyemîn de rol digirin.

Wê wextê ji bo çareserkirina pirsgirêka jinê ya ji niha ve bi qasî çiyan mezin bûye û pêşîgirtina li hilweşîna ekolojiyê berê pêşî divê pirsgirêka demografiyê were çareserkirin û di vê de berpirsiyariya bingehîn divê ya jinê be. Ji bo vê jî şertê pêşî divê jin tam azad û wekhev be; mafê wê yê tam ê siyasetkirina demokratîk hebe; di tevahiya têkiliyên bi cinsiyetê re pêwendîdar de gotin û îradeyeke tam heqê wê ye. Ji bilî van rastiyan, bi temamî wekhevî, azadî û rizgariya jinê, civakê û hawîrdorê pêkan nîn e. Bi heman awayî bi şêwebûna siyaseta konfederatîf û siyaseta demokratîk jî mimkun nîn e.

Jin herweha weke hêmana bingehîn a civaka exlaqî û polîtîk, li ber rohniya azadî, wekhevî û demokratîkbûyînê ji aliyê etîk û estetîka jiyanê ve bi roleke heyatî radibe. Zanista etîk û estetîkê parçeyekî zanista jinê ye ku jê nabe. Ji ber berpirsiyariyên wê yên giran ên di jiyanê de jin ê di tevahiya mijarên etîk û estetîkê de hem weke hêza fikir û hem jî weke hêza bi cihanînê rê li pêşketin û gavavêtinan veke û ev jî ne ya guftûgokirinê ye. Têkiliya jinê bi jiyanê re li gorî mêr hê bêtir berfireh e. Asta pêşketina mejiyê hisî têkiliya xwe bi vê re heye. Ji lewra estetîk weke bedewkirina jiyanê ji aliyê jinê ve mijareke hebûnî ye. Ji aliyê etîkî ve jî (Teoriya exlaq, estetîk = teoriya bedewiyê) berpirsiyariya jinê berfirehtir e. Aliyên çê û xirab ên perwerdeya mirov, girîngiya jin û aştiyê, xeternakî û xirabiya şer, nirxandina pîvanên mafdarî û

dadê, diyarkirin û gihîştina biryarê, ji aliyê civaka exlaqî û polîtîk ve jinê hê bi awayekî rastî û berpirsiyarî tevbigere. Ji ber ku ev li gorî xwezaya wê ye. Bêguman ez behsa jina qûqla û siya mêr nakim. Li vir ez a behsa wê dikim, jina azadî, wekhevî û demokratîkbûyîn dawerivandiye hinavê xwe û qebûl kiriye.

Zanista ekonomiyê weke parçeyekî zanista jinê were pêşdebirin wê hê zêdetir rast be. Ekonomî hê ji destpêkê ve şêweyekî xebata civakî ye ku jinê bi awayekî bingehîn têde rol girtiye. Ji ber ku xwedîkirina zarokan li ser pişta jinê ye, ekonomî ji bo jinê maneyeke heyatî îfade dike. Jixwe maneya peyva ekonomiyê “qanûnên malê, pîvanên debara malê” ye. Ev jî eşkere ye ku karê bingehîn ê jinê ye. Ekonomî ji destê jinê hatiye stendin û ketiye destê tefekar, bazirgan, pere, sermayedar, desthilatdar-dewlet û rayedarên mîna axayan tevdigerin. Ev bûye derbeke mezin li jiyana ekonomiyê ketiye. Ekonomiya ket destê hêzên dijberê ekonomiyê, bi lez bû hedefa bingehîn a desthilatdarî û mîlîtarîzmê û tevahiya dîroka şaristanî û modernîteyê bû sedema sereke ya şer, pevçûn, pêxîrtengî û bihevketinên bê sînor.

Di roja me ya îro de ekonomî, ji aliyê kesên têkiliya xwe bi ekonomiyê re nîn in bi lîstikên kaxizan, ji rêbazên qumarê xirabtir kirine qadeke lîstikê, bi awayekî bê sînor nirxên civakî desteser dikin. Pîşeyê pîroz ê jinê ku ew bi xwe bi temamî li derveyî vê qadê

hiştine, veguherandine pîşeyê makîneyên şer, amûrên trafîkê yên hawîrdor kirine jiyan lê nebe, îmalatxaneyên berhemên bêkêr ên ji bo karê û tu têkiliya xwe bi pêdiviyên bingehîn ên mirovan re nîn in, lîstikên borsa, buha û faîzê.

Tevgera azadî, wekhevî û demokratîk a jinê ya xwe dispêre zanista jinê û femînîzmê jî digire nava xwe, eşkere ye ku wê di çareserkirina pirsgirêkên civakî de bi rola sereke rabe. Divê mirov qîma xwe bi rexnekirina tevgerên jinan ên rabihuriya nêz neyne, zêdetir giraniya xwe bide ser dîroka şaristanî û modernîteya jinê zêdetir têk birin. Eger di zanistên civakî de mijara jinê, pirsgirêka wê û tevgerên wê hema hema bêje tune be, berpirsê vê yê bingehîn avahiyên çandî yên madî û zîhnî yên hegemonîk ên modernîte û şaristaniyê ne. Bi nêzikatiyên teng ên wekheviyê yên huqûqî û siyasî belkî alîkariya lîberalîzmê were kirin; lê bi nêzikatiyên bi vî rengî çareserkirina pirsgirêkê bidin aliyekî, weke diyarde jî çareseriya wê nabe. Mirov îdîa bike ku tevgerên femînîst ên heyî ji lîberalîzmê qut in û bûne hêzên dijberê sîstemê, wê ev ê bibe xwe xapandin. Yek ji pirsgirêka bingehîn a femînîzmê ew e, eger weke tê gotin radîkal e, wê wextê divê beriya her tiştî xwe ji binî ve ji hînbûnên lîberal, ji jiyan û şêwazên fikir û hisên wê qut bike, şaristanî û modernîteya dijminê jinê ya li pişt xwe analîz bike û li ser vî bingehî giraniya xwe bide rêyên çareseriyê yên manedar.

Femînîst sîstema bavikî dibînin, lê zirara modernîteyê daye jinê bi heman tundî û tûjiyê rexne nakin. Wexta rexne dikin jî weke ekol, tevger û sîstem di afirandina civak û jina alternatîf de bi rola neçar û bêzaran radibin. Dijbertiya modernîteyê ya oldarên radîkal û tevgerên kulturalîst weke ekol û tevger hê lawaztir e. Ya li pey diçin û dixwazin, herî zêde lihevkirin e.

Gavavêtina Femînîzmê tevî hemû kêmûkurtiyên xwe, bi qasî ku alîkariya heqîqeta jinê kiriye, hêja û bi nirx e. Modernîteya demokratîk bi xwe jî rastiya jinê analîz dike û xwe dike heqîqet. Tevî vê yekê, ji bo ku rexneya femînîst û tevgera wê bike parçeyekî xwe yê dest jê nabe xwe nêzikê wê dike. Belkî mirov bibêje parçe rast nîn e; jina azad weke kirdara sereke ya jiyanê tevlî sîstema xwe dike.

Beşa duyemîn

Li Rojhilata Navîn Di Serhildana Demokratîk de cihekî jinê yê xweser heye

Li Rojhilata Navîn di serhildana demokratîk de cihekî jinê yê xweser heye. Weke hêza afirîner a neolîtîkê ji aliyê civaka çînîdar ve biçûkdîtîna xwe qet tu car hezim nake. Her tim bi fikar li serdestiya mêr

nêhertiye. Bi tevahî di ferqê de ye ku mafên wê tên binpêkirin. Bêçaretiya wê, wê di nav êşên giran de dihêle. Dizane ku tu car ne layiq e ku wê xistine vê rewşê. Ya rastî ew, bi veşarî alîgirê çanda xwedawendê ye. Qet bi cidiyet ji xwedayên mêr bawer nebûye. Dizane ku her tim di nav valahiyekê de ye. Bi êş û hêrs hîs dike ku hurmet û hezkirina heq dike nîşanî wê nadin. Tu car efû nekirine ku ev qas muhtacî destê mêr hatine kirin; zêdetir jî xwe efû nekiriye. Hay jê heye ku mêr ji hezkirinê dûr, bêexlaq û hov e. Baş dizane ku ji hêza hezkirinê jî bêpar e. Bûye qurbana ev qas nakokiyan ku weke ku tê zenkirin jin nezan nîn e zêdetir nêzî zanyariyê bûye. Kîngê bawer bike, tu kes nikare weke wê hêza girêdanê xurt nîşan bide. Bi giştî hemû jin, bi taybet jinên Rojhilata Navîn, bi van taybetiyên xwe, hêza herî zindî û çalakvan a civaka demokratîk e. Serketina dawî ya civaka demokratîk bi jinê mimkun e. Jin û gelên ji neolîtîkê ve li hember civaka çînîdar li erdê xistine, li erdê mane, weke xwediyê rastîn ê pêngava demokratîk, hem ji dîrokê tola xwe hiltînin, hem jî li çepê şaristaniya demokratîk ku bilind dibe cihê xwe digirin û antîteza pêwîst ava dikin, bi rastî jî di avakirina civakeke wekhev û azad de desteka civakî ya herî saxlem, xurt pêk tînin. Ger li Rojhilata Navîn demokratîkbûna civakê bibe antîtez, wê zêdetir bi saya jin û piştre jî ciwanan bibe. Şiyarbûna jinê û weke hêza pêşenga civakê li ser dika dîrokê cihê xwe girtin di nirxa antîtezeke rastîn de ye.

Dinyaya jinê, zanabûna wê, wîcdan, hezkirin û parastina wê ji bo zayîna nirxên şaristanî yên cuda berendam e. Li gor şexsiyeta çînî ya şaristaniyan pêşketinên bi mêrê desthilatdar, ji vî aliyî ve jî jinê dike rewşa antîtezeke bihêz. Hem di civakê de bihurandina cudahiyên çînî, hem jî bidawîkirina serdestiya mêr, ji antîteziyê jî wêdetir di hêjahiya senteza nû de ye. Her wiha, rewşa pêşeng a jinê di demokratîkbûna civaka Rojhilata Navîn de, di çapana dinyayê de di rewşa hem antîtez (ji Rojhilata Navîn bûnê çavkaniya xwe digire) hem jî sentezê de taybetiyên dîrokî dihewîne.

Hem civatîbûna dîrokî, hem jî jeocivatîbûn ferz dike ku mirov bi tayekî xurt ê diyalektîkî nêzî herêmê bibe. Heta her parçeyekî zeman û mekan, her serdem û beşek ji dema dîrokê neyê analîzkirin, ne roja me ya îro, ne jî hemû nîzamên şaristaniyan tam têne fêmkirin. Ji dîroka nivîskî zêdetir dîroka nehatiye nivîsandin pir girîng e. Dîsa ji mekanên zêde navê wan hatine gotin zêdetir, çîroka mekanên nehatine ziman pir girîng in.

Navekî din ê sîstema bavikanî hiyarerşî hema bêje çaviyê civakê yê neçizirîbe û danewerivîbe nîn e. Belkî ji beriya dewletê bi hezar salan hiyarerşiyê civak bi rê ve bir. Hêza baviktiyê li tu devera cîhanê qasî li Rojhilata Navîn xwe ba nedaye û nefes li jiyanê

neçikandiye. Hê jî li ser nirxên dijîn, wek kesayeta mêr û jin, çanda etnîk, malbat û têgihîştina namûsê hêza baviktiyê diyarker e. Bajarên diviyabû çanda dijber biafiranda, şopên kûr ên jiyana çolter yanî baviktiyê hê jî li ser xwe hildigire. Di nav okyanûsa çolter û reşahiyê de mîna giravokan dimînin.

Pirsgirêkeke din a herî hindik bi qasî dewletê giran bûye, zîhniyet û tevgera civakî ya ku li dora jin û malbatê pêk hatiye. Li jor dewlet, li jêr malbat, mîna dualîteyeke diyalektîk a cennet û cehennemê pêk tînin. Dewlet modela xwe ya mîkro di nav malbatê de pêk tîne, daxwazên malbata mezin jî dibe xwe wek makro dewletê bihûnin. Her malbata îdeal çareseriyê di dewletbûnê de dibîne. Siya despotê dewletê di nava malbatê de “despotê piçûk” “sermiyanê malê” mêr e. Despotê dewleta mezin, çiqas bi erk û wezîfe ye, dikare hewl bide bi awayekî kêfî rê bide ber cîhanê, sermiyanê piçûk jî di nava malbatê de li ser serê jin û çend zarokan bi heman karên nîzamiyeta mutleq tevdigere.

Mêr û jinên Rojhilata Navînî ew çend tevlîhev in divê bi awayekî xweser werin analîzkirin. Eger analîzeke malbatê, jinê û mêrê serwer bi qalibên giştî yên sosyolojîk bêne kirin wê gelek bi kêmasî bibe. Aliyên herî hişk û tarî yên rastiya siyasî, îdeolojîk û exlaqî bi jin û mêr têne nîşandan. Nakokiyên di nava

malbatê de ji yên di nava dewletê de kêmtir nîn in. Malbat ji saziyeke civakî wêdetir maneya wê heye, mîna “qulika tarî” ya civakan be. Em wexta mijara jinê digirin bin hûrbînê, gengaz dibe ku em drama hemû mirovatiyê bixwînin û bibînin.

Em heta di şaristaniya Rojhilata Navîn de malbatê wek modeleke mîkro ya dewletê analîz nekin, wê tehlîleke civakî ya baş kêm bimîne. Eger îro li Rojhilata Navîn pirsgirêka jinê bi qasî ya dewletê giran bûbe, dîsa di binê vê de bi qasî dîrokeke dirêj a dewletê, koletiyeke jinê ya tevlîhev û dirêj radizê. Eger di nexşeyê de sêgoşeya Bermûda jin-malbat-mêr baş neyê destnîşankirin, her keştiya çareseriya civakî ya di ber re biçe wê daqurtîne. Di okyanûsa civakî ya sêgoşeya Bermûda de li Rojhilata Navîn dewleta mîkro malbat e. Wexta hiyarerşî û dewlet mezin dibin, ji sedî sed projeksiyonên xwe di nav malbatê de nîşan didin. Dewlet û hiyarerşiya di nava malbatê de xwe nebîne, şensê wê yê jiyanê xurt nîn e û nikare hebûna xwe dewam bike. Di şaristaniya Rojhilata Navîn de ev dualîte pir bi hostayî tê hûnandin û tu car nayê îhmalkirin.

Divê mirov jinê wek cins, nifş û çîneke ku ji mêj ve hatiye dîlkirin bigire dest û hindik be jî di warê sosyolîk de analîz bike. Ji lewra bi kurtî be jî divê em kurtedîroka koletiya jinê bihûnin û li ser rawestin. Naxwe em ê nikaribin baş li malbat û mêr yanî ji

aliyekî din ve li dewlet û civakê serwext bibin. Ji ber ku me di beşê berê de hewl dabû jinê tarîf bikin, ez ê dubare nekim. Lê dîsa jî em ji bîr nekin ku di hin nirxandinan de jin di nava civakê de ji aliyê biyolojîk ve wek cinseke kêm û bi qusûr tê dîtin, ev bi temamî îdeolojîk e,-hûnandineke fikrî ya mêrê serwer e- divê ev nirxandin ji nedîtî ve neyê. Ji ber ku bi awayekî ilmî jî îspat bûye ku jin wek hebûneke biyolojîk û civakî hînê bi qabîliyet e.

Navenda çanda malbat-dayikê Rojhilata Navîn e. Li gorî agahiyên ilmî yên di dest de hene, ev çand B.Z. ji salên 15000'an pêve diberide û pêş dikeve. Li qûntarên hundur ên rêzeçiyayên Toros-Zagros hebûna heywan û nebatan, ji bo kedîkirin û malbatê derfet û îmkan didin. Ax û bahewaya herêmê, celebên tene û hubûbat, heywanên mîna pez û bizinan di vê pêvajoyê de rol dilîzin.

Di jiyaneke bi cihbûyî de jin hînê bi hêsayî dikare zarokan bîne û mezin bike. Tevî jiyaneke bi cihbûyî, rewşeke baş a bahewayê, nebat û heywan, derfetên bingehîn ên jiyaneke malbatî diafirînin. Gelek darên mêwan û celebên nebatan ji bo xwarinê hene. Kedîkirina pezkoviyan û bizinê, bi xwe re hewcebûna bi hirî, şîr û goşt tedarik dike. Dar û nebatên bi ber têne danîn û ev yek hatinê qat bi qat zêde û dewlemend dike. Êdî heywan yekser nayên kuştin û serjêkirin, têne kedîkirin û xwedîkirin. Bi vî awayî ji şîr, hirî û goştê wan sûd tê wergirtin û bîra rojên

tunebûn û xelayê tê kirin. Ji bo jin-dayik bi zarokên li dora xwe nîzameke malbatê deyne, di her du mijaran de jî xwedî tecrûbe ye. Derketina ji şikeftê, kedîkirina heywanan, danîna dar, pel û pincaran, avakirina xaniyan, dibe ku tiştekî sivik xuya bike, lê di dîrokê de bi qasî derketina mirov a heyvê gavavêtineke girîng û mezin e.

Holikên têne danîn bi hêsayî gundan pêk tînin. Li gelek herêmên Kurdistana îro -li Amed Erxeniyê li Çayonu, li Batmanê li Çemê Xalan, li Ûrfayê li Newala Çolê û li Gobeklîtepe, Bradostiyan, Hekkarî Max- B.Z. di salên 11000 de pir bi xurtî bermahiyên vê çandê tên dîtin. Li tu devera dinyayê mîna vê çandê kevn a bi cihbûyî nayê dîtin. Li vê derê gelek fîgur û peykerên piçûk ên jinê hatine peydakirin. Ev yek jî xurtbûna çanda malbat-dayikê îfade dike. Her wisa mirov dikare di zimanên herêmî de daçekên mê jî mînak nîşan bide. Di roja me ya îro de jî jin hînê di heman waran de hosta ye û ev yek mijarê piştrast dike.

Çavkaniyên Sumeran jî nîşan didin ku wexta yekemîn sîte bajêr tên avakirin jî ev çand bi tesîr e û hebûna xwe bi xurtî dewam dike. Mîtolojiya li dora xwedawend Înanna -xwedawenda Ûrûkê- hatiye hûnandin gelek tiştan hîn dike. Nemaze li dijî hilkişîna mêr a serweriyê, berxwedana jinê, hezar qat li têkoşîna femînîstên îro ye. Jin bi xurtî li dijî xweda Enkî -di Sumeran de fîgurê mêr ê pederşahiyê temsîl dike - diqîre ku jin xwediyê çi şaristaniyê ye. Bi

zimanekî helbestwarî destnîşan dike ku ew xwediyê 104 “me”yan e; Enkî bi hîleyan jê dizîne û divê wan paş ve bidiyê. Ev vegotina mîtolojîk ku diçe BZ 3000 salan, rola jinê ya di şaristaniya Sumeran de pir bi balkêşî nîşan dide. Her wisa Înanna wek kok bi xwedawenda çiyê Nînhûrsagê ve tê girêdan. Nînhûrsag ji aliyê etîmolojîk ve - Nîn=xwedawend, kur=çiya, sag=herêm - tê maneya xwedawenda herêma çiyayî. Li Mezopotamya Jêr dema çiya tê gotin Zagros û rêzeçiyayên pêve tên hişê mirovan. Wê wextê ev nîşan dide ku çanda xwedawendiyê ji herêmên çiyayî daketiye xwarê.

B.Z. di navbera salên 4000 û 2000’î de wek navenda şaristaniyê çanda jin-dayikê li Sumeran hînê bi tesîr e. Bi mêr re di heman weznê de ye. Di hemû belgeyên wê demê de ev giranî xwe nîşan dide. Perestgehên xwedawendan zêde hene. Li dora jinê hînê çandeke şermê û fediyê nehatiye deribandin. Nexasma seks wek karekî îlahî tê ziman. Ne şerm û fedî, ji çîroka herî erotîktir vegotinên wêjeyî hene. Her çalakî û tevgera di warê seksê de wek nirxandina jiyanê, mane û qîmeteke bedew dibîne. Seksîtiya jinê wek balkêşî û hurmeteke awarte maneyê dibîne. Di jiyana pişt re ya dij-şoreş de hînê jî bi tu awayî şerm li jinê nayê kirin. Timî pesnê bedena jinê tê dayîn. Merasîmên zewacê her çend hatibin belovajîkirin jî - çalakiya kirêtkirinê ya mêr - ji wê demê mane. Di destanên Memê Alan, Mem û Zîn û Derwêşê Evdî de ku

li Kurdistanê hînê têne gotin, ev rewşa xurt a jinê tê îfadekirin. Mirov dikare yekemîn orjînên van destanan bigihîne BZ 4000 salan.

Di hûnandina mîtolojîk a Înanna de hem şivan-mêr û hem jî cotkar-mêr wek alîkaran xuya dikin. Şivan Dûmûzî -ev têgîn yekemîn orjîna mezinbûna mêr e- û cotkar Enkûmdî, li hemberî xwedawend Înannayê di warê hurmet û dilsoziyê de li ber hev didin. Ji bo bibin alîkarê wê yê sereke, tu tiştek namîne ku nakin. Pir bi eşkere Înanna hînê pêşengiyê dike. Mêr wek şivan û cotkar ji serweriyê hînê dûr e. Em di destaneke din a navdar a Sumeran de di Destana Babîlan (Ennûma Elîş) de dibînin ku rewş berovajî ye. Mêrê ku bi awayekî awarte hêz bi dest xistiye xweda Mardûk û dayika ji hêzketî Tîamat dualîteyeke dîrokî ne; pir tiştan hîn dikin. Jin-dayik, xwedawend-dayik bi awayekî xeternak tê reşkirin û kirasê şermê lê tê kirin. Ji bo jinê bêfazîlet, bêkêr û xeternak nîşan bidin, qalibên mîtolojîk pir bi dijwarî têne tengavkirin. Em dibînin B.Z. ji salên 2000'an pêve ev çand belav dibe. Di statuya civakî de li dijî jinê guhertineke mezin heye. Serweriya civaka bavikanî êdî di wê hêzê de ye ku dikare xwe bike destanwarî. Her tiştê derbarê mêr de tê mezinkirin û qehremankirin, her tiştê bi jinê ve eleqeder piçûk tê xistin, şerm lê tê kirin û tê bêqîmetkirin.

Di dîrokê de bi vî awayî yekem car di warê cinsî de şikestinek dibe ku bandoreke mezin li ser civakê

dike. Em ji bo vê guhertina di warê jinê de li Rojhilata Navîn dikarin bibêjin yekemîn şikestina mezin a cinsî ya dij-şoreşê. Em dibêjin li dij şoreşê. Ji ber ku bandoreke erênî ji bo pêşketinê li civakê nake. Berovajî, serweriya hişk û tund a bavikanî li ser civakê ferz dike, jinê li derve dihêle û dike jiyan xizan bimîne. Di şûna civaka cot deng de, rê li ber civaka fer a mêran vekirî ye. Li Rojhilata Navîn bi vê şikestinê re belkî jî di warê serberjêr çûyînê de gava yekemîn tê avêtin. Encamên wê her ku çûne hînê reştir bûne. Êdî civakeke yekalî ya bi çanda mêraniyê pêk tê. Mejiyê jinê yê hisî ku demekê harîqa diafirandin û heta dawiyê însanî û geş bû, wenda dibe û di şûnê de mejiyê analîtîk ê radestî dogmatîzmê bûye; ji xwezayê qut bûye; şer mîna fazîletekê dihesibîne; ji xwînrijandinê zewq digire; her danûstendina kêfî li ser mêrê kole û jinê heq dibîne; cih digire. Ev mejî yan jî celebê ramanê berovajî mejiyê jinê ye. Ji ber ku di navenda mejiyê jinê de xwezaya zindî û hilberandineke însanî heye.

Piştî ku di civakê de mejiyê analîtîk ê mêr dibe serwer, di afirandinê de paşketineke cidî tê dîtin. B.Z. di navbera salên 6000 û 4000'an de -serdema jin-dayikê- gelek vedîtin hene, lê B.Z. ji salên 2000'î ve pir hejmareke hindik îcad û vedîtin xuya dikin. Li cem vê yekê, çanda şer-desthilatê têra xwe belav dibe, fetih mîna pîşeyekî mezin -pîşeyê kralan- tê hesibandin û amûrên bingehîn ê dewletan dibe fetih û zevtkirin. Bi

kurtî li derve hiştina jinê û hurmet nîşandana ji bo otorîteya mêrê fatîh û şerker bi hev re pêş ketine. Saziya dewletê mîna vedîtineke mêr dibe xwedî mane, şerên bi armanca talan û xenîmetê jî dibin mîna şêwazekî debar û hilberandinê. Di şûna bandora hilberandina jinê ya li ser civakê, bandora xenîmet û şerê mêran li ser civakê de cih digire. Di navbera dîlketina jinê û çanda civaka şerker de têkiliyeke nêz heye. Şer hilnaberîne, desteser dike, talan dike. Her çend rola zorê di hin şertên xweser de - ji bo pêşî vekirina li azadiyê û dijderketina li dagirkerî û mêtingeriyê - ji bo pêşketina civakî diyarker be jî bi piranî rola wê neyînî ye û hilweşînker e. Çanda tundiyê ya daweriviye hinavê civakê jî bi şeran xwe xwedî dike. Di navbera dewletan de şûrê şer, di nava malbatê de destê mêr tîmsala serweriyê ye. Hem civaka jor, hem jî civaka jêr di nav diranên şûr û dest de ne. Timî pesnê çanda tehekumê tê dayîn. Kesayetên herî mezin bi xwînrijandinên neheq serbilind dibin û wek fezîletekê dizanin. Nemaze qralên Babîl û Asûran bi serê mirovan beden avakirin û dîwar lêkirin ji şan û şerefê dihesibînin. Terora dewletê û çanda tundiya civakî ya di roja me ya îro de jî ku pir zêde heye, çavkaniya wê ev çand e, ku em destnîşan dikin.

Di dîroka olên yek xwedayî de duyemîn şikestina mezin a çanda cinsî li dora jinê pêş dikeve. Şikestina di serdema mîtolojîk de vê carê wek qanûn dibe emrê xwedê. Kiryarên derbarê jinê de êdî bi

fermanên pîroz ên xwedê ve tên girêdan. Fîgurê têkiliya di navbera Sara, Hacer û Hz. Îbrahîm de nîşan dide ku ola nû serweriya mêr erê dike. Serweriya bavikanî baş bi cih dibe. Cariyetî dibe sazî. Zewaca bi pir jinan re tê erêkirin. Têkiliya hişk a Hz. Mûsa bi xuşka wî Marîam re dide nîşan ku para jinê ya di mîrasê de tê rakirin. Civaka Hz. Mûsa bi tevahî civakeke mêran e. Ji bo jinan tu wezîfe nayê dayîn. Jixwe şerê bi Marîam re jî bi vê sedemê ye. Vegotina "bila jin bi destê xwe yên di hevîr de têkilî karê mêran nebe" ji wê rojê maye.

Di şaristaniya Rojhilata Navîn de li navenda hemû çareseriyên pirsgirêkan pirsa jinê heye. Em ê vê carê bûyerên dîrokî dubare nekin û ji bo dema pêş wê slogana me vê carê welê be; sêyemîn şikestina cinsî ya mezin li gorî mêr nebe. Heta di nava civakê de wekheviya cinsiyetê pêk neyê, tu daxwaza wekhevî û azadiyê wate û cih nabîne. Ji bo demokratîkbûyîneke mayînde û berfireh dîsa azadiya jinê hêmana bingehîn e. Ev sîstema jin kiriye mîna mal û mulkekî, neksa wê jî dîsa pirsgirêka jinê ye. Demekê dihat gotin çîna karker, îro divê şûna vê gotinê nifşê jinê cih bigire. Beriya çînayetiyê divê nifşê jinê were çareserkirin ku mirov karibe netewiyet û çînayetiyê jî baş fêm û çareser bike. Eger ji ser jinê his û îradeyên koleker ên mîna zilam, bav, evîndar, bira, dost û hwd. rabin wê azadiyeke rastîn a jinê mimkun bibe. Evîna herî baş

mulkiyetbûneke herî xeter e. Eger jin hemû berhemên serweriya mêr afirandine wek raman, ol, zanist û qalibên hunerî hûrûkûr di moxila rexneyan re derbas neke, wê nasnameya jinê dernekeve holê. Beriya her tiştî divê jin bibe ya xwe, êdî nebe mulk. Jina bûye mal û mulk wê nehêle mêrekî baş û bi fazîlet jî çêbe. Bi jinek bi vî rengî re rabûn û rûniştin li pêşiya mêrê azad jî asteng e. Jinek ev çend piçûk hatibe xistin, berovajî maneya xwe mêrekî piçûk ketiye.

B.Z. di dawî û beriya salên 1000'î de em dibînin ku bi Kraliyeta Îbraniyan a Dawûd û Silêman re, êdî çanda haremtiyê berfireh dibe. Jinan ji hev re dikin xelat. Pêvajoyeke nû dest pê dike ku tê de deng û hilma jinê nîn e. Tesarufa li ser jinê tu cudahiya xwe ji ya li ser malekî nîn e. Ev rewşa di dewleta ola nû de xwe di nav malbatê de jî nîşan dide. Jina di bin serweriya çanda dewleta olî û bavikanî de, mimkun nîn e behsa rola wê were kirin. Jina herî baş ew e, ya herî zêde bi mêrê xwe û bi serweriya bavikanî re li hev dike. Di reşkirina jinê de ol jî tê bikaranîn. Beriya her tiştî, Ew (Hewa) Adem ji rê derdixîne û dibe sedem ji bihuştê were qewirandin. Ji lewra ew yekemîn jina gunehkar e. Lîlîta serî ji xwedayê Adem re -fîgurê bavikantiyê- natewîne, şeytan esas dibîne -fîgurê mirov ê ebdiyetê red dike û serî tewandina (secdekirin) ji bo Adem qebûl nake- û pê re hevaltiyê dike. Reşkirina mîtolojîk mînak tê girtin û bi awayekî

olî dewam dike. Di serdema Sumeran de îdîaya jin ji parsûyê mêran hatiye afirandin di Pirtûka Pîroz de jî cih digire. Di nav pêxemberan de ku hejmara wan digihîje hezaran, yek jin tune. Cinsîtiya jinê wek guneh tê nirxandin; timî tê reşkirin; piçûk tê dîtin û bi vî awayî dibe mîna prensîbeke toreyî. Jina di civakên Sumer û Misriyan de xwedî cihekî payeberz bû, êdî objeyeke şermê, guneh û ji rê derxistinê ye.

Em tên serdema Hz. Îsa, fîgura Meryemê derdikeve pêşberî me. Her çend dayika xwedayê kur be jî tu têkiliya wê bi xwedatiyê re nîne. Di şûna xwedawend-dayikê de dayikeke bêdeng û timî çavşil maye. Ketina jinê dewam dike. Xweda -mêrê serwerî jinê- pifî Meryemê dike û Meryem jê ducanî dibe. Ev têgîn têra xwe nakok in. Di xirîstiyaniyê de baweriya sê-alî ya Bav-Kur-Ruhê Pîroz di cewherê xwe de sentezeke olên pir xwedayî û yek xwedayî îfade dike. Di vê serdemê de baweriyên genostîk -xwedêzan- û paganîstîk -pûtperest- bi awayekî zêde belavbûyî, têkiliya xwe bi Xirîstiyaniyê re heye; bi baweriya hişk a yek xwedayî ya Îbraniyan re têkoşîneke dijwar dikin. Di encamê de ev her sê meyl û ekol li hev dikin. Di dema Hz. Mûhammed de jî sê meylên bi vî rengî hene û wek olekî bi encam dibe. Ya herî balkêş, Meryema diviyabû wek xwedawendekê bihata dîtin, mîna amûrekî Ruhê Pîroz xuya dike. Ev rastî pir eşkere nîşan dide ku xwedayetiyê tam rengê mêrtiyê wergirtiye. Di serdema Sumer û Misriyan de xweda û

xwedawend hema hema wek hevdu ne. Di serdema Babîlan de jî hînê dengê xwedawenda dayik gur derdikeve.

Ya bi Hz. Îsa û Meryem pêk tê ev e, jin êdî bi çavên şil pîrekeke bêdeng e û dayikeke sernerm e. Ew êdî hîç behsa xwedayetiyê nake. Nexasma li mala xwe li ber zarokên -xwedayên kur- xwe yên kur e, ku êdî qîmetek wan heye. Ji kebanîbûna malê zêdetir tu rola wê di nava civakê de namîne. Qada gelemperiyê bi tevahî li jinê tê girtin. Di Xirîstiyaniyê de mijara ezîzeyan -jinên bakîre- rewşa jinê ya dixwaze xwe ji gunehên mezin xilas bike nîşan dide. Ango xwe vekişandina quncikê ye. Ev pêvajoya sulûk û xwe vekişandina quncikê bi sînor be jî rê li ber pêşketinên erênî vedike. Bi hindikî be jî ezîzetî xilasbûna ji têgînên cinsî û şermê îfade dike. Sedemên wê yên madî û manewî xurt in, ji bo vê sulûkê ji dojeha li malê çêtir bibîne. Guman nîn e ku piratîkeke dîrokî ye. Bi awayekî din mirov dikare bibêje di dîrokê de yekemîn partiya jinên xizan e. Pir bi melûlî be jî çanda xwedawendan a li perestgehan di keşîşxaneyan de geş û zindî dike.

Kiryarên ezîzeyan cihekî wan ê girîng di dîroka şaristaniya Ewrûpayê de heye. Zewaca bi yek jinê re bi giranî çavkaniya xwe piratîka ezîzeyan e. Her çend jin di şertên herî zor û zehmet de, wek keçkaniya xwe seksîtiya xwe çavkaniya xeterê hesibandibe jî dîsa di payeberzbûna jinê de roleke xwe ya girîng heye. Aliyê

neyênî jî ew e ku di şaristaniya Ewrûpayê de wek nerazîbûnek li dij zewaca Katolîk -hîç bernedana jinê-heye ku rê li ber metabûna cinsî ya jinê vedike. Bêguman bi saya kapîtalîzma mezin dibe.

Statuya nû ya jin bi Îslamiyet û Hz. Mihemed bi dest dixe, her çend ji çanda bavikanî ya qebîleyên çolê çêtir be jî di cewherê xwe de çanda Îbraniyan esas wergirtiye. Statuya jinê ya baş şiklê xwe girtî di dema Dawûd û Silêman de çi be, di dema Hz. Mihemed de jî heman tişt e. Dîsa pir zewacên bi armanca siyasî û jiyaneke tê de zêde bi cariye, rewa tê qebûlkirin. Her çend zewac bi çar jinan hatibe bi sînorkirin jî cewher naguhere. Têgihîştina dibêje; "Jin zeviyên we ne, hûn çawa bixwazin hûn dikarin bajon" baş nîşan dide ku jina bûye milk nimûne tê girtin. Têgihîştina Hz. Mihemed li evînê jî balkêş e. Di temenê xwe yê pêncî salî de bi Eyşeya neh salî re evînê dijî û ev eleqeya wî ya zêde ji bo jinê eşkere dike. Timî pesnê jina xwe ya yekemîn Xetîceyê dide û ev jî qîmet dana wî ya jinê nîşan dide. Bi giştî li hemberî jinê bi hestiyarî tevdigere. Lê saziya heremtî û cariyetî ya li pey xwe dihêle ji aliyê tebeqeyên dewletê yên pişt re tên, pir xirab tên bikaranîn.

Hz. Eyşe, ji ber ku piştî wefata Hz. Mihemed tevlî şerê desthilatê yê navbera xelîfeyan dibe wenda dike. Wê qîmeta jinê bi êşeke mezin hîn bibe û bibêje; "Ya Rebî, li şûna ku te ez jin bianiyama dinyayê, te ez wek kevirekî bianiyama çêtir bû." Hînê di têkiliya Mûsa-

Marîam de kişif dibe ku li desthilatê cih ji jinê re nîn e. Li serdema navîn li Rojhilata Navîn a feodal di statuya jinê de tu pêşketineke erênî nîn e. Qalibên dîrokî li ser kar in. Ji têkiliya eşqê ya di navbera Leyla û Mecnûn de tê sembolîzekirin, tu encameke bi xêr dernakeve. Di feodalîzmê de ji eşqê re cih nîn e. Jinê li malbata di bin pêşbaziya dewleta bavikanî de pêvajoyeke pir bê şexsiyet dijî. Bi awayekî mutleq dîla daxwazên xwediyên desthilatê ye. Bi temamî dibe amûreke di xurtkirina desthilatan de rol dilîze. Bi giştî ji civakê tê muceredkirin. Di şert û mercên koçberiyê de hînê jî şopên jiyana komîn a seretayî hene û ev yek hurmetekê dide jinê. Lê jina di bajaran de tam koletiyeke kûr dijî.

Her ku diçe zehmet dibe, ji bo cihê jinê yê di bin tehekum û nîzama mulkiyetê de were tarîfkirin. Di roja me ya îro de jin wek encameke hezarê salan, mîna berateyekê dijî. Ji rê derxistina sîstema kapîtalîzmê hînê baş nehatiye dîtin. Jin li civaka Rojhilata Navîn objeyeke di navenda paşverûtiyê de cih digire. Mêrê Rojhilata Navîn ê têkçûyî hemû heyfa xwe ji jinê hiltîne. Li derve çiqas heqaret lê werin kirin, bi zanebûn an jî xweber berdêla vê yekê hemûyî ji jinê distîne. Mêrê ku nikare civaka xwe biparêze û rêya çareseriyê nabîne, hemû hêrs û tundiya xwe mîna dînekî di nav malê de li ser serê jinê û zarokan ditemirîne. Di bingehê bûyer û kuştinên "namûsê" de ev rastiya balkêş heye. Ya rastî, mêrê namûsa xwe di

warê civakî de binpê kiriye, berovajî dizîvire û hêrsa xwe li ser serê jinê ditemirîne. Bi awayekî pir sivik, sembolîk, neçar û xwepêşadaneke namûsparêz doza xwe qaşo çareser dike. Mîna psîkoterapî bike tevdigere.

Di binê pirsgirêkê de dozeke civakî û dîrokî ya wendakirî radizê. Yek ji pirsgirêkên bingehîn ew e ku ji vî “mirî” re divê were gotin; ew heta bi vê doza dîrokî û civakî re rûbirû nebe û wezîfeyên dikevin ser milê wê bi cih neyne, wê tu car nikaribe xwe ji vê qirêja namûsê xilas bike. Namûsa rastîn bi keçkaniya azayê cinsî yê jinê nîn e, bi parastina keçkaniya civakî û dîrokî dibe. Divê mirov vê rastiyê bide hînkirin û bi cih bîne.

Ez yeqîn dikim, bi vê vegotina me ya kurt a dîrokî hat fêmkirin ku li Rojhilata Navîn mezinbûna pirsgirêkên malbata îro, bi qasî pirsgirêkên di nava dewletê de girîng in. Zordestiya ji du milan ve tê, pirsgirêkê dijwartir dike. Şêwazê civaka dewletê û bavikanî ku ji mêj ve tên, û qalibên hemdem ên şaristaniya Rojava nabin sentezek, berovajî mijarê dikin girêkeke kor. Pirsgirêkên ku di nav dewletê de hatine afirandin û li hev hatine gerandin, di nav malbatê de hînê zêdetir germole bûne. Malbatên pirzewac û pirzarok ji aliyê aborî ve nikarin debara xwe bikin. Zarokên mezin dibin û şêniyên ciwanan ên zêde dibin, bê kar in û ev jî malbatê bê kêr dike. Malbata ku li gorî dewlet û aboriyê hatiye eyarkirin, ji

her du aliyan ve jî nikare bimeşe û di heriyê de bist bûye; çikiyaye. Ne malbata şêwazê wê Rojavayî, ne jî malbata şêwazê wê Rojhilatî dikare bijî. Di van şert û mercan de malbat dejenere dibe. Tevî ku hemû benên civakî vedirşin jî malbat hînê jî li ber xwe dide. Ji ber ku di warê civakî de malbat sitara bi tenê ye. Ji sedî sed divê mirov malbatê piçûk nebîne. Rexneyên em dikin, malbatê ji kokê ve red nakin, em hewl didin ji nû ve mane bidinê û destnîşan dikin ku hewce ye ji nû ve bi awayekî têkûz were avakirin.

Ji pirsgirêka jinê girantir, divê mirov pirsgirêka mêr bixîne rojevê. Çareserkirina têgîna desthilat û serweriya mêr, ji koletiya jinê kêm girîngtir nîn e. Belkî jî hinekî zehmet e. Yê xwe nêzî veguherînê nake, ne jin, zêdetir mêr e. Wexta dest ji fîgurê serwertiya mêrtiyê ber dide, dibe xwediyê hisa hukumdarekî mîna dewleta xwe wendakirî û wek têk çûbe li ser totikên xwe rûdinê. Ya rastîn, divê mirov nîşanî wî bide ku ev serweriya hindurê wê piçûk, wî ji azadiyê dike û wî dike muhafezekarekî temam.

Eger mirov pêşî bibêje pirsgirêka dewletê, paşê jî ya malbatê, ev helwesteke rast nîn e. Pêwîst e, mirov van her du rastiyan bi tayekî diyalektîkî bi hev re bigire destê xwe û analîz bike. Sosyalîzma reel jî digot; em berê dewletê çareser bikin, paşê dorê were civakê, lê niha encam li ber çavan e. Pirsgirêkên bingehîn ên civakê nabe ku yek li pêşiya ya din were girtin û bi vî awayî were çareserkirin. Divê di nav hevdu de bi

awayekî yekpare, têkiliya yekê bi ya din re were danîn. Ya rast ew e ku wexta ber bi çareseriyê ve jî gav were avêtin heman rêbaz were şopandin. Çawa ku bêyî çareseriya zîhniyetê dewlet, bêyî dewletê malbat, bêyî jinê çareserkirina mêr kêm dimîne, bêyî ku berovajiyê wê were kirin, rêbazên çareseriyê kêm dimînin.

Di civakê de mîna kevneşopiyekê her sazî xwe bi tundiyê xwedî dike. Li qatê herî jêr ê civakê malbat jixwe nikare hilmê û nefesê bistîne. Nemaze tundî li ser jinê rewşa şer îfade dike. Şaneyeke jinê nîn e ku ji ber tundiyê nelerize. Rewşa zarokan jî heman tişt e. Rêbaza bingehîn a perwerdeyê tundî ye. Zarokê bi tundiyê hatibe terbiyekirin, bêguman wexta mezin bibe mirov dikare ji wî jî li benda heman tiştî be. Bi serweriya ku xwe dispêre tundiyê serbilind e, jê zewq digire û pê xweş e. Hisa bi hêzbûnê ya xwe dispêre desthilat û tundiyê diviyabû wek nexweşiyeke herî xeter a civakî bihata nirxandin, lê wek hisa herî mezin û bi kêf tê îlankirin. Rastiyek e, diviyabû lanet lê bihata kirin, lê wek fazîlet û mezinbûnekê tê destnîşankirin.

Dibe ku maneya jinbûnê; mirova herî zêde di zor û zehmetiyê de be

Pir girîng e ku mirov pirsgirêkên jinê yên di nava civakê de berê pêşî ji aliyê civakî-dîrokî ve bigire

dest û li ser bisekine. Pirsgirêka jinê pirsgirêkek e ku di çavkaniya tevahiya pirsgirêkan de ye. Em dibînin ku mirovatiyê hê gav neavêtiye civaka dewletdar a çînî li ser jinê hiyerarşiyeke hişk a mêrê serwer (bavikan) bi sazî bûye. Ji bo sedemên pêkhatina serweriya mêr serî li gelek vegotinên olî û mîtolojîk dane. Destana Xwedawenda Ûrûkê Înannayê vê pêvajoyê nîşan dide. Di vê destanê de mirov ji bo xwezayê, xwedawenda dayik û pîroz a berê hesreteke mezin dibîne. Di nava pergala dewlet û hiyerarşiya bavikan de hatiye asêkirin û ji ber hîlekarî, xasûkî û zordariya mêrê serwer nalenala wê ye. Di Destana Babîl de ev rastî hê zêdetir eşkere û bi tesîr tê ziman. Ango pevçûna Mardûk û Xwedawend Tîamatê. Di mîtolojiya Sumeran de tê gotin jin ji parsûyê mêr hatiye afirandin. Ev îfadeyeke sembolîk e. Olên yekxwedayî jî vê helwestê dewam dikin. Jina weke xwedawend diket zîgûratên Sumeran weke orûsipiyekê ji perestgehê derdiket. Kerxaneya pêşî li bajarên Sumeran tê vekirin. Payeya jinê ji orûsipîtiya perestgehê ber bi carîyetiya qesrê ve tê bilindkirin. Li bazarên bazirganiyê objeyeke kole ye ku dest jê nabe. Di şaristaniya Greko-Romen de bi tenê koleya karên nava malê ye. Di nava polîtîkayê de cihê wê nîn e. Di şaristaniya Ewrûpayê de objeyeke cinsî ye ku bi peymanekê bi mêr ve hatiye girêdan. Di şaristaniya kapîtalîst de orûsipiyeke giştî ya gerdûnî ye. Dîrok bi mêrê serwer re bi temamî bûye xwediyê

avahî û maneyeke cinsiyetparêz. Dîrok êdî weke mêr dimeşe.

Pîrek-kirina jinê (tê maneya kolekirina jinê), piştre di civaka zordestî û mêtinkar de pîrek-kirin li ser objeyên mêr jî tê meşandin. Klîka jor a siyasî, eskerî û rahib a civakê dikeve pozîsyona cinsên serwer û beşên jêr ên têne rêvebirin jî her diçe dibin pîrek. Di civaka Greko-Romen de mêr ji ciwaniyê ve bi helwesteke cinsiyetparêz a zêde tê perwerdekirin. Di tevahiya serdemên şaristaniyan de helwestên çeloxwarî yên cinsî weke encama helwestên cinsiyetparêz ên ji jinê re, pir têne dîtin. Êdî jin çiqasî kole be, mêrê kole jî ewqasî jin an jî pîrek e.

Di civaka Rojhilata Navîn de li van pirsgirêkên koka xwe dîrokî wexta pirsgirêkên îro yên çavkaniya xwe amûrên kapîtalîst ên mêtinkarî û zordestiyê jî zêde dibin, ya rastî ji bo jinê jiyaneke kabûswarî bivê nevê pêk tê. Dibe ku maneya jinbûnê, mirova herî zêde di zor û zehmetiyê de be. Mêtinkarî û zordestiya çor a li ser civakê, qatbiqat li ser ked û bedena jinê pêk tê. Hê nû hay jê çêdibe ku jin jî mirov e. Helwesta bêrûmet a cinsiyetparêz a hişk hatiye wê astê ku şûna xwe ji lêgerîna hewcedariya bi dostek û hevrêyekê re bihêle. Qet nebe êdî guftûgoya vê tê kirin. Divê baş bê zanîn ku di civakê de jiyaneke rast bi jinê re pêk neyê, jiyaneke manedar jî wê çênebe. Em divê zanibin ku jiyana herî xweşik û manedar bi jineke azad a bi

temamî bûye xwedî rûmet re pêk tê û bi vê zanînê divê em vegotin û çalakiyên xwe pêşde bibin.

Di dema şeveqavêtina dîrokê de bi nasnameya xwe ya civakî ya bi heybet, jina ku rola dayik-xwedawendiyê bi xwe ve danî, mixabin di Rojhilata Navîn a roja me ya îro de daxistin rewşa metayeke herî bêqîmet û bênirx. Ev dîroka ku diviyabû bi serê xwe çîrokeke wê ya trajîk hebûya, em zêde nikarin wê bînin ziman û ji derfetên vê yekê mehrûm in. Lê em dikarin encamên wê rexne bikin. Ewrên ji mijê yên bi destê mirov li dora jinê hatine çêkirin, divê ji hev bêne belavkirin û bi vî awayî keşifkirina rastiya wê, yek ji erk û wezîfeya pêşî ya lezgîn a civakî ye.

Di çanda civakî ya Rojhilata Navîn de bi belge û delîlên xurt piştrast bûye ku nîzama dayikê pêk hatiye. Piştî vê nîzama bavikanî (ji salên 5000 B.Z. ve her bi pêş ketiye) ceribandina sîstema îstîsmar û zordestiya pêşî îfade dike. Şoreşeke bi kok a li dijî jinê ye. Mal û zarok dikevin bin serweriya mêr ango saziya bavtiyê. Ji ber ku rê li nîzama muhafezekarî, zordestî û îstîsmarkariyê vedike zêdetir dijşoreş e. Wer xuya ye ku bûyîna xwediyê gelek zarokan nîzama pêşî ya mal e. Çiqasî zarok zêde bibin hêz, mal û milkiyet jî ewqasî zêde dibin. Têkiliya bavikantî û xanedantiyê bi milkiyetê re eşkere ye. Xanedantî saziya malbatê ya herî berfireh e; ji klanê mezintir e, hay ji xwe çêbûye û

milk nas kiriye. Şêweyê pêşî yê baviktiyê ye. Bi paşveketina xwedantiya jinê li ser mal û zarokan re parelel dimeşe. Çanda dayik-xwedawendê şûna xwe ji çanda qral-xwedayên zilam re dihêle. Di çanda Sumeran de mirov van bûyeran bi awayekî balkêş dikare bibîne. Tevahiya dîroka şaristaniyê zewac û saziya malbatê di bin bandora modela xanedantiyê de bi pêş dikeve. Ji ber ku xanedantî weke yekdestdariya desthilatdariyê û îdeolojiya mêrê serwer hat qebûlkirin an jî dan qebûlkirin, zewacên serdest neçar man otorîteya bav nas bikin. Bi kurtî yên hatine avakirin ne xwezayî ne, belê nîzamên mîkro yên otorîter û îstîsmarkar in.

Sîstemê ji mêj ve şensê xwe yê sererastbûnê bi reforman ji dest daye. Ya pêdivî pê heye 'şoreşeke jinê ye' ya ku wê li tevahiya qadên civakî were meşandin. Çawa ku koletiya jinê koletiya herî kûr e, divê şoreşa jinê jî bibe şoreşa herî kûr a wekhevî û azadiyê. Şoreşa jinê divê hem di teorî û hem jî di çalakiyê de gavên bi kok biavêje. Beriya her tiştî li dijî îdeolojiya cinsiyetparêz şerekî dewamî û dijber hewce dike. Şoreşa jinê ferz dike ku li dijî zîhniyeta tecawizkar a bîst û çar saetên rojê li ser kar e, di warê exlaqî û polîtîk de jî şer were xurtkirin. Ji bo şoreşa jinê, divê diyardeya zarokanînê ya bi armanca mêtinkarî û desthilatdariyê were mehkûmkirin û redkirin. Şoreşa

jinê ferz dike ku îradeya zarokanînê bi temamî ji jina azadbûyî re were hiştin.

Divê di îdeolojiya xanedantî û malbatê de şoreş pêk bê. Herçî ya herî girîng jî divê mirov ji felsefeya heyî ya jiyana bi jinê re, belkî jî ya ji vê rastir, ji vê bêfelsefetiyê bibihure. Divê mirov hêza jiyanê, bi jinê re ne di têgihîştina zarokanîn û amûra têrkirina xwestekên cinsî de, weke tayê herî xurt ê dostaniyê, hevaltiyê û civakbûnê di afirandina bedewî, sedaqet, aştî û esaletê de ji bo parvekirina bi awayekî azad û wekhev bibîne.

Bêguman bi jinê re parvekirina jiyaneke azad û wekhev, hewce bi zanyartiya beramber bi heqîqeta civakî ya mutleq rast dimeşe, heye. Eşqa rastî bi tenê di hevsenga hêzê ya heqîqeta civakî de bi beramber hev, dikare pêk bê. Bi kesayetên bi koletî, destavêtin û desthilatdariyê bûne, eşq tu carî pêk nayê. Îflasên malbatan û ezmûnên serneketî yên dewamî û zêde pêk tên, vê rastiyê piştrast dikin. Heger jin jî herî kêm bi qasî mêr bibe xwediyê hêza civakî û zanyartiyê, hingê dibe ku evîn û xweşikî, bi awayekî azad û wekhev di nava aştiyê de û bê desthilatdarî çêbibin û bi parvekirinê pêk werin. Roja me ya îro ferz dike ku şoreşa jinê ya sedsala 21'ê li pêş were girtin. Slogana "Yan jiyan an jî barbartî" vê şoreşê ferz dike.

Civaka Rojhilata Navîn bi qasî ku hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke gund-cotkariyê heye, ewqasî hewcedariya xwe bi duyemîn şoreşeke jinê heye.

Şoreşa jinê, dayiktiya neolîtîkê ye. Ya rastî, şoreşa neolîtîk a muhteşem şoreşeke jinê bû. Şoreşa neolîtîkê şoreşek e ku hê jî mirovatî bi mîrateya wê debara xwe dike. Ev dij-şoreşa mezin a ku li ser bingeha dij-şoreşa baviktî, şaristanî û modernîteyê civaka xwezayî bi paş ve xist, bû encama koletiya herî kûr a jinê û ev li tevahiya civakê belavkirî, di roja me ya îro de li qadên civakî hemûyan di nava rewşa xwe ya kaotîk û krîza sîstematîk de ye ji hev de dikeve.

Mirov fêhm dike ku ya li ser jinê tê ferzkirin xiyaneta bi jiyanê re ye. Eger jiyan tê xwestin, divê berê pêşî di hevsenga hêzê ya zanyartiya beramberî de ji nû ve bi jinê re di çêkirina hisên bedewî û mezinahiyê û parvekirina wan de bi ser bikeve. Divê mirov vê rastiyê ava bike û xwe bigihîne heqîqeta wê. Di vê mijarê de divê tek û gerdûnî, ango jin û mêrê berbiçav, mêr û jintiya mucered a îdeal di zikhev de pêk bên. Ji bo pêkhatina vê jî divê îrade û têgihîştina wê bê pêkanîn. Weke milk û weke xwedî divê mirov hevdu ji binî ve biterikînin. Li şûna namûsa rêûresm û kevneşopiyê divê mirov balkêşbûna kesayeta esîl û bedew pêk bîne.

Eger şoreşeke jinê ya bi kok, ango di jiyan û zîhniyeta mêr de guhertin çênebin, rizgariya jinê mimkun nîn e. Ji ber ku heta jina bi xwe sereka jiyanê ye rizgar nebe, jiyan timî wê weke leylan û serabekê pêk bê. Heta mêr bi jiyanê re jiyan jî bi jinê re li hev neyên anîn, şadûmanî û bextewarî jî wê tim xeyaleke

tewş bin. Ji bo jinê û jiyana azad rastiyên civakî bê sînor in. Civaka Rojhilata Navîn û jina wê, bi şaristaniya bihurandî û bi modernîteya li fetha wê rast hat, çiqasî karibe bê xistin ewqasî hat xistin, ew bi xwe êdî ew nîn e, ew xistin rewşa objeyekê. Mirov pirsgirêka civakî bi diyardeya jinê analîz bike û bi heman diyardeyê li çareseriyê bigere, rêbazeke rast e. Eger mirov şoreşa jinê ku çareseriya dayikan e, li ser dayika pirsgirêkan ferz bike, hingê dikare gav bi gav bigihîje heqîqetê.

Çareseriya modernîteya demokratîk di pirsgirêka jinê û şoreşê de bi îdeal û bi çalakî ye. Neteweyên modernîteya demokratîk jin nebe bi proje nabin û ne projeyên pêkanînê ne. Berevajî, şoreşên welê ne ku di her gava xwe de bi parvekirina zanyartî û çalaktiya bi jinê re pêk tên. Tevî ku ji bo avakirina civaka ekonomîk hewcedarî bi pêşengiya jinê heye, ji nû ve avakirina wê jî hewcedariya xwe bi hêza jinê ya kominî heye. Ekonomî pîşeyê civakî yê jinê bi xwe ye, çalakiya wê ye. Ekolojî zanistek e ku bi tenê bi hestyariya jinê dikare bigihîje civakê. Jin weke nasname, hawîrdorparêz e. Civaka demokratîk civakeke welê ye ku hewcedariya xwe bi îrade û zîhnê azad ê jinê heye. Eşkere ye ku modernîteya demokratîk serdema şoreşa jinê û şaristaniya wê ye.

Tevgerên pêwendîdarê pirsgirêkên jinê û hawîrdorê heta ji modernîteyê nebihurin mimkun nîn

e bi awayekî gav û gotinên wan hevgirtî, bimeşin. Ji bo gav û gotinên hevgirtî û serketinê şert e ku ev tevger xwe bi yekparebûna tevgera civaka demokratîk ve girêbidin.

Civaka sivîl a roja me ya îro di van xebatan de herçiqasî kêm be jî mirov dikare mînakeke vê yekê bihesibîne. Ya rastî femînîzm tevgereke civaka sivîl a girîng e û di bingehê xwe de ekoleke îdeolojîk e. Ji lewra jî hewce dike ku xwe li ser bingehê zanistî ava bike. Lê ekolên femînîst, di warê analîzkirina civaka cinsiyetparêz a mêrê serwer de ku hêza hiyerarşî, desthilatdarî û dewletê ji xwe re dike palpişt û bi giranî hukim li jinê dike, di warê pêşkêşkirina modela çareseriyê de û di vê çarçoveyê de hewldanên têne kirin, di jiyana xwe de ji aliyê pêkanînê ve misêwa bi bêhêzî û serneketinê re rûbirû dibin. Kesayetên awarte nebin, milîtaniya jina azad zehmet e ku xwe bigihîne serketinê. Hin serketinên bêne bidestxistin jî wê bi êrîşên rojane û berfireh ên civaka cinsiyetparêz re bêne asîmîlekirin. Ji lewra pêkanîn û pratîka kominên ekonomîk, îdeolojîk û polîtîk ên di mîhwera azadiya jinê de bivê nevê hewce dikin.

Modernîteya demokratîk divê xwezaya jinê û tevgera wê ya azadiyê weke yek ji hêzên xwe yên bingehîn bizanibe û di vê çarçoveyê de hem pêşdebirina wê û hem jî weke hevgirtiyê xwe di serê

erkên xwe de bihesibîne û di xebatên jinûveavakirinê de wê binirxîne.

Akademiyên bi giranî jin bin tevî ku bi heman naverokê bin dikarin aliyên wan ên xweser bi awayekî zanistî pêk bînin û dibe ku bi vî awayî di cih de be. Ji bo bi tenê teorîk nemînin divê ji gelek aliyan ve tevlî pratîkê bibin û ev jî yek ji xisletên têne xwestin e. Akademî li gorî zeman û mekan pêdivî li ber çavan têne girtin û têne avakirin û xebitandin. Çawa ku di dîrokê de mînakên van saziyan gelek têne dîtin (ateşgedeyên Zerdeşt ên li ser çiyan, baxçeyên Eflatûn û Arîsto, peyarêyên Sokrates û Stoagiran, keşîşxane û tekkeyên serdema navîn û hwd.), saziyên sade û bi dilê xwe xebatê dikin. Ji serê çiyan bigirin heta bi quncikên kolanan her mekan dikare were hilbijartin

Di dayikên kurd de çanda xwedawenda dayik a bihêz a serdema neolîtîkê hê jî bi rengekî xurt tê jiyankirin

Divê mirov belavbûna li Kurdistanê ne fizîkî, bi awayekî çandî bifikire. Texmînî 6000 sal berê rengê avabûna eşîrê xuya dike. Hin eşîrên Kurd ên li çiyê dimînin peyvên bi kar tînin li cem Hûriyan peyda dibin. Heta gelek peyvên di koma zimanê Hînd-Ewrûpayî de wek mûrd=mirin, jin=jiyan, ra=ro,

star=stêrk û hwd. vê rastiyê nîşan didin. Wekheviya di navbera nîzamê xwedayî û mîtolojîk de jî balkêş e.

Rewşa derbasbûnê ya di navbera şaristaniyên Sumer-Hîtît de, hêmanekî din e, hebûna eşîrî ya proto Kurdan xurt dike. Ji ber ku dewletbûneke zû wê tasfiya wan hêsan bike, jiyaneke nîv-koçerî, yanî şêwazeke jiyanê ya mîna gerîla tercîh dikin. Li hawîrdora wan çiqas dewlet ava dibin, ew çend hewce dibînin ku eşîra xwe xurt bikin. Li cem kurdan eşîr nîv-gerîla ye. Em wexta ji nêz ve li rêxistinbûyîna eşîrê dinerin, em dibînin erkê dayikê û azadî derdikevin pêş. Jin gelek bi tesîr û xweser e. Encama em dikarin ji vê derxînin ew e ku berxwedana eşîrê di asta nîv-gerîlatiyê de pêş ketiye. Em careke din dibînin ku asta azadiyê ya jinê di vir de jî asta azadiya civakê diyar dike. Hêz, jêhatîbûn û wêrekiya kevneşopî ya jina kurd çavkaniyekî wê yê kevn ê dîrokî heye. Aliyê neyênî yê şêwazê jiyana eşîrî ew e, îmkanê wê kêm in ji bo wergere civakeke berfirehtir û pêşketîtir.

Ji ber ku di serdema neolîtîk a cotkariyê de jin hînê fonksiyonel e, di civaka kurd de giraniya jinê heye. Îhtimaleke xurt e, jinê ev hêza xwe ya ku demeke dirêj bi kar aniye, bingehê wê şoreşa cotkariyê ye. Hêmanên mêbûnê yên di ziman de û kulta xwedawend Starê belge ne ku vê heqîqetê piştrast dikin.

Ji vî aliyî ve ne rasthatineke e ku di nav gelên Rojhilata Navîn de kurd ji wan gelan e ku aliyên wan ê azadiyê herî pêşketî ne. Ev, bi pêşketina wan a dîrokî ve girêdayî ye. Biyanîbûna çînên serdest û mêtinger û zêde nirxeke erênî ku bidin tune ne, li hember xweza û dagirkeriyên biyanî tevahiya dîroka xwe di rewşa berxwedanê de bûne, di qezençkirina taybetiyeke wiha de rolekî girîng dilîze. Ji vî aliyî ve jî jin hîn li pêş ve bi vê rastiya dîrokî ve girêdayî ye. Di dayikên kurd de çanda xwedawenda dayik a bi hêz, hê jî bi rengekî xurt, bihêz tê jiyankirin. Jinên kurd bi qasî ku li ser îdîaya xwe ne, diparêzin, zêde girêdan û hurmeta wan ji ola bi serdestiya mêr, çand û şêwazê jiyanê re di cewherê xwe de tune ye. Yê heyî jî ji ber çewisandinên madî û manewî yên naçar û kevneşopiyan vê rewşê qebûl kirine. Ev ji ku tê fêmkirin; çawa ku fersend dibînin serî radikin.

Tevî ku li Kurdistanê malbat pîroz tê dîtin jî, nemaze ji ber tunebûna astek wê ya azadbûyînê, tunebûna derfetên aborî, pirsgirêkên tendurustî û perwerdê, malbat tam di cendereyekê de asê kiriye. Rewşa jin û zarok ketinê tam felaket e. Ya esas, kuştinên bi sedema namûsê têne kirin, semboleke rewşa jiyanê ya bi giştî ketiyê, nîşan dide. Namûsa civakê ya hatiye qedandin, di pozê jinê re tînin. Mêrê îflaskirî hêrsa vê yekê ji jinê distîne. Di şert û mercên heyîn de malbat bi demokratîkbûyîna giştî ya civakê

dikare bikeve rêya çareseriyê. Mafê weşan û perwerdeya bi zimanê zikmakî qismî be jî dikare pêşî li xirabûna nasnameyê bigire. Destekdaneke taybet a aborî dikare ji bo demekê malbatên xizan xilas bike.

Ji bo veguherîna civakî, wekhevkirin û azadkirina helwestên cinsiyetparêz ên civakî têrê dikin. Li dijî kiryar û têgihîştinên jinê wek mulk dibîne tedbîrên bi tesîr hewce ne.

Di saziya malbatê de jin, zarok û mêr hêmanên sîstemê yên herî zêde xetimîne. Sîstemê malbat kiriye mîna sergovekî û hemû nakokiyên sîstemê di vê saziyê de xeniqandine. Zewac, mêr-pîrek û zarokan hînê nekarîne têkiliyên sîstema feodal li dawiyê bihêlin. Bi têkiliyên bêînsaf ên kapîtalîzmê dor li wan hatine girtin, tam jiyaneke zindaniyan dijîn.

Li Kurdistanê li derveyî dewletê û beşekî bi sînor ê hevkar mirovatiyeke din heye ku kes ne dikare behsa wan bike û ne jî binivsîne. Eger pirsgirêka wekhevî, azadî û nasnameyê yên din neyê çareserkirin, em nikarin bibêjin civak ji şerekî herî qirêj hatiye kirin. Di civaka kurd de, di malbata wî de, di pîrek, mêr û zarokên kurd de şerekî yekalî yê trajîk diqewime.

Dîroka PKK'ê di heman demê de dîroka kurd û Kurdistanê û dîroka guhertin û veguherînên mezin ên civaka wê bû. Mirov dikare bibêje; di çaryekê dawî yê sedsala 20. de mora PKK'ê li Kurdistanê hatiye xistin. Veguherînên wê yên zîhniyetê, serûbinkirina wê bûn malê dîrokê.

Li hundirê welat û li derve, li hemû parçeyên Kurdistanê potansiyela wê ya rêxistiniyê heye, ji bo vê jî zemîn, lojîstîk, derfet, kadro, gelek kom, sazî û dezgehên sivîl hene. Her weha li derveyî welat û metrepolên cîran bi mîlyonan girseyeke gel a sempatîzan heye. Li cem jinê rêxistinî û hişyarbûneke mezin heye. Mîna ku li dora jinê dinyayeke nû hiltê û ava dibe. Helwestên paradigmatîk û teoriya nû, hêmanên wê yên bingehîn bi azadiya jinê dibin. Rewşa ciwanan jî ji ya jinê cuda nîn e. Ciwantiya ji eleqe û germatiya xwe tiştek wenda nekiriye, şopgerekî bi biryar ê îdeala civaka azad e. Ciwantî divê slogana "Yan jiyaneke azad yan jî hîç" mîna alekê tu car ji destê xwe nexîne.

Li Rojhilata Navîn xebata min a destanî ya sêyemîn, ya derbarê azadiya jinê de ye. Li gor min ev xebata divê beriya xebatên niştimanî û rizgariya kedê bin ya herî zehmet bû. Jin, çîna bindest a yekem û bi kok a paşverûtî û koledariyê, netew û cins bû. Li gor ku dixuyê, cudahiya cins ji bo newekhevî û

çewisandinê dikin hincet. Ger bi kûrahî dîrok were lêkolînkirin wê fêm bibe ku jin, bi tevahî qurbanên destpêkê yên serdestiya civakî û siyasî ne. Çîna yekem a her cure newekhevî û kolekirinê ye li ser mirovahiyê tê ferzkirin. Piştî ku jin hate kolekirin, ew kirin tişteke (ne kirde) sernerm û kedîkirî ya malê, dor hatiye ser afirandina civaka çînîdar û dewletê. Mêrê zalim û derewkar piştî ku jinê xist, bi wêrekiya ji vê girt hewl daye ku mirovên din û hevcinsê xwe jî biçewisîne û dîl bike; mîtolojî û olên ku sîstemên fikrê yên herî derewkar in afirandiye. Belê ji bo gelan mîtolojî û olên nêzî rastiyê dikin jî hene. Em behsa mîtolojî û olên serdest û dagirkerên ku derewkarî û zordestiyê hildiberînin dikin. Dema mirov li van ol û mîtolojiyan dinihêre, jin bi hezar û yek dek û dolaban, bi zordestiyan gav bi gav ji textê xwedawendiyê ya bi heybet tê xistin, bêqîmet tê kirin û dawiyê jî tê tunekirin.

Ne mimkun bû ku ez şervanekî azadiyê bim û viya nebînim. Weke zarokê azadiyê yê van axên ku ola xwedawenda dayik afirandiye û bûne cî û mekanên xwedawendên evînê yê destpêkê, min ê bixwesta mezinên, pêşiyên me yên destpêkê û çavkaniyên azweriyê fêm bikira, lêbikola û hincetên wan ên hebûnê bidîta.

Min xwe dida pirsgirêka jinê, ev ji pirsgirêka anoreke şexsî wêdetir e. Tam jî dijberî pêwîstiyên cinseltiyê yên besît û sivik in. Ji min re wisa hat ku

hevdîtina cinsan mutleq derxim ser ajoya cinsî ya heywanî, derxim asta dostaniya mezin û rêhevaltiyê ev egîdiyeke rastî ye û ez ketim wê ferqê ku ber bi jinê ve çûyîn tirsonekî ye. Mêrê serdest tirs afirandibû. Di bin navê namûsê de vê lîstokê dileyîst. Dema ku digot 'Ez ji te hez dikim' jî cara duyem dida ber kêran. Neheqiya wî saw bi mirov re çêdikir. Weke cins jinê hincirandibû, peritandibû, fizîk, jîrekî û hestên wê mehf kiribû. Mêr û heta jina sosyalîst jî ku ji xwe ew qas bawer bûn nikaribûn xwe ji fîgurantiya sivik a vê lîstokê xelas bikin. Bi ew hêza ji azadiyê re bi bîrçûbûneke mezin min xwe da pirsgirêkê. Min gelek dahûrandin, diyalog û axaftinên bi naverokeke kûr kirin. Ne weke xwediyekî wan, lê weke hunermendekî, ji sekin û fizîkeke xweşik heta jîr û jêhatî bin û hetanî bigihên asteke ku bi dengê zimanê xwe tameke tu tiştekî din nikare bide bidin, min mudaxeleyî her tiştên wan kir. Gihîştin, mezin û xurt gihîştin lê naşî û xeşîm bûn. Jiyana bi lanet û efendiyên wan mêr li ber serê wan bûn. Ji wê tecrûbe û hostayiya ku li hember wan û bi wan re şerê mezin ê cins û cewher bidin bêpar bûn. Bi vê êşê xwe ji kendalan ve avêtin. Di agiran de şewitandin, bi bombeyan xwe parçe parçe kirin. Wan, li ser navê qehremaniyê her tiştî kirin. Lê bi tenê bûn. Mêraniya li hember wan, nedixwest ji bilî nêzikahiya xwe ya çor nêzikahiyeke din, dostanî û rêhevaltiya mezin a wekhevan bîne bîra xwe. Mîna kulîlkan diçilmisîn û diçûn.

Bi qasî ku ji kutla xwedawendê ji dil bawer bim gihîştim hêza hurmet û hezkirinê. Çiqas xwestin şerê min ê jinê yê mezin ji çav de bixînin jî min bi layiqî bi cî anî. Tu yê ji bo jinekê hem xiyanetê li kar û erkên herî pîroz bikî û protestovanî bijî, hem jî ji bo rêhevaltiya bi esîl a jinê karê dikeve ser milê te nekî! Di serî de PKK, min xwest ez nîşanî hemû derdorên eleqedar bidim ku tu aliyekî şerê jinê yê mirov sivik bigire, bibîne tune ye. Min bi rêgez û cidiyet heta dawî xwest û ferz kir ku herî kêm bi qasî xwedayên mêr ên herî derewkar û zordar, dinyaya xwedawenda ku hêza rastî û evînê ye jî bê naskirin, hezkirin û hurmeta pêwîst bê dayîn.

Her çiqas xayîn û hevkar jê derketibin jî, tu car ne mimkun e ku mirov ên tevlî van hewldana bûne ji bîr bike. Hele şehîdên wan, weke ezîzeyên herî pîroz ên van axan û gelên me her tim wê werin bîranîn. Her yek ji wan mîna xwedawendên dilêrane ên rastîn in. Min yekîtî û partîbûyîna ên mayî bi rêzdarî pêşwazî kir, bûm alîkar. Min her tim got ku ew divê bibin ewlehiya jiyana azad û xweş, xweşik. Bi baweriya wê rojekê mûtleq bibin ew jina bihêz a wê mêrê paşverû, derewkar û zordar bînin rê min heta dawî hewldanên xwe berdewam kirin. Mirov bi jina tenê mulkê wî ye mezin nabe, nabe mêr. Min ne xwest ez wiha mezin bibim, ne jî bibim mêr; heta bûyîneke wiha rûmetşikên dît. Ez dizanim ku min jinê xistiye rewşeke zor û zehmet. Ez dizanim ku min wan anîne rewşeke

wisa ku parçeyek ji êgir in. Ez dizanim ku hinek ji wan dijminayetike mezin û neheqiyeke pir jî dikin. Ez dizanim ku min wan bi tenê jî hiştiye. Lê heqîqeteke girîng ku ez dixwazim ew bizanibin, ew bi qasî ku çarenûsa şer jî aştiyê jî diyar bikin divê bihêz bin. Heta ev nebe jiyan heram e. Heta ev nebe evîn nabe. Heta ev nebe tu hesret nayê têrkirin, têr nabe. Tenêtî û veqetîn, ji bo ev mezinahî bi dest bikeve û serwerî were qezençkirin, rêya divê bê derbaskirin û fatûrayên deyn ên divê werin dayîn in.

Li mekanê dayika xwedawend û xwedawendên evînê, bi hêza azadî û wekheviya ku hezar salan dane windakirin, di xebat û şerê bi navend jin de ez hêvî û baweriya xwe diyar dikim ku wê xweşikî û jîrtî ji nû ve were avakirin, ya heyî bi qasî ku peymaneke civakî ya nû bixe jiyanê bibe xwedî hêza cewherî. Di tevahî rêhevaltiya jinê ya tije hezkirin û rêzdarî de bi qasî îdîa, mîna karkerekî evînê, heta dawiya nefesa xwe misoger e ez ê hewldanên xwe berdewam bikim. Bêguman û bêfikar e ku bi qasî ku wê mane bidinê û pêwîstî pê bibînin ez ê rêhavalên jinê bim û ez ê her tim wisa, rêheval bimînim.

Ez divê diyar bikim ez cî û girîngî didim prensîba moral û estetîk a wek şêwazê jiyanê, hezkirin û rêzdariyê. Girêdana min a bi prensîba "Ya wê jiyan azad be yan jî qet nebe" ve ji zayînê heta mirinê an jî heta bi hetayê ye. Hezkirin û rêzdarî, bi estetîk û

exlaqa azad mimkun e. Rast e ku min jinê di navenda vê de daye bicîkirin, rûniştandin. Min tu jê fikar nekir ku jina azad a bi çalakiya azadiyê dizê û jiyana li derdora wê bi pêş dikeve wê herî xweşik û dostane be. Neketim kompleksê. Li şûna ol û civaka bi serdestiya mêr, min maneyeke mezin da feraseta bi giraniya xwedawendê ya ol û civakê ya jinê ku herî kêm wekheviyê diparêze. Ji bo ev pêk were, min karkeriya azadî û evîna jinê kir. Min bi çavê mulk li tu jinê, her wiha li tu mirovî nenihêrt, neda nihêrtin. Ez ku di vê rêya xwe de ji rastî û nirxên exlaqî û estetîkî bêyî ku tawîzan bidim heta dawî dimeşim, encameke xwezayî ya pêkhatine şexsiyeta min e.

Di PAJK'ê de israr û pêşketin dikare bibe fazîletên xwedawendiyê, saftiya melekan û xweşikbûna Afrodît

Li ser jina di civaka kurd de, şopên ji dema neolîtîkê mane hînê jî bandora xwe dewam dikin. Tevî vê yekê, qehra hemû pêvajoyên şarastaniyan kişandiye. Karekterek wê ya berxwedanê heye. Eşekere ye, li îxaneta serdemê qewimiye. Wexta ev tayebetî bi hewldanên gerdûnî yên femînîzmê re bigihîjin hevdu, partiyeke cuda ya jinê dikare di têkoşîna demokratîkbûyîn, wekhevî û azadiya civakî de roleke mezin bilîze. PAJK li gorî vê rolê hatiye damezrandin. Her çend nikaribe bi hêsayî xwe ji

têgihîştina mêrtiya serdest xilas bike jî di azadiyê de israr wer girîng e ku dest jê nabe. Ya herî baş ew e ku ji bo azadkirina cîhana jinê, jin bi xwe mejiyê xwe yê hisî û mejiyê analîtîk bi hev re bixebitîne û pêk bîne. Divê jin mîtolojî, felsefe, dîn û zanistê ji nû ve li gor xwe di ber çavan re derbas bike, bi mejiyê xwe yê xweser û azad şîrove bike û bixe pratîkê. Eger mirov bi mejiyê jinê nêzî teorî û pratîkê bibe dikare bigihîje dinyayeke nêzî xwazayê, aştiyane, azadîxwaz û wekhevîxwaz a bi jiyaneke bedewî barkirî.

Sentezeke welê ya jinê, çandeke mêr a çareser neke, hêzeke jiyanê ya nikaribe ber bi xwe ve bikişîne û çalakiyeke nikaribe bide meşandin, nîn e. Heta fazîleteke jinê -li dijî çanda koletiyê ya di tevahiya dîrokê de hatiye ferzkirin û li dijî zilamtiya despotîk-ya di hempayê pîrozbûna xwendawendên mîtolojîk û dîrokî de pêş nekeve, di jiyanê de esalet, azadî û wekhevî nabe. Eger ev nirx neyên bidestxistin, wê jiyanê timî ji destçûyî be.

Di polîtîkaya kadro de yek ji mijarên ku nêzikbûneke xweser dixwaze, dabaşa PAJK'ê ye. Di vê mijarê de nirxandin û destnîşankirina çend xusûsan girîng dibînim. Ez bawer dikim ku divê kadroyên kakil ên PAJK'ê hebin. Pirsgirêka jinê ji texmînan wêdetir hînê zêde di hemû pirsgirêkên demokratîkbûyîn, azadî, wekhevî û heta ekolojiyê de xwedî roleke kilît e.

Li gor ku em ê nikaribin hemû jinan bi carekê ve azad bikin, divê em vê yekê beriya her tiştî bi kadroyên kakil bi cih bînin. Eger kadroyên kakil ên PAJK'ê xwe azad nekin wê çawa mêr û jinên pir bûne pirsgirêk, azad bikin? Di vê mijarê de gelek diyalog û hewldanên min ên ji bo çareseriyê têne zanîn. Ez dikarim bibêjim ku di vî warî de ez hînê jî ponijîme û min yeqînên xwe gihandine hevdu.

Di tevahiya dîroka şaristaniyê de wek yekemîn çîn, cins û netewa kole em bi rastiya jinê re rûbirû ne. Xistina jinê ya mala taybet û mala giştî (kerxane) ji şêwazên vê koletiyê ne. Çavkaniya zordestiyê biyolojîk nîn e, sosyolojîk e. Saziya mêrtî-pîrektiyê bi şêwazên xwe yên di şaristaniyan de bi taybet li dijî jinê û bi giştî jî li dijî hemû civakê hatiye xebitandin. Li hindurê malê împaratorê siyasî fîgurê mêr e. Mêr li hemberî pîrekê timî rola despot dilîze. Ev yek tu têkiliya wê bi niyeta ferdî re nîn e. Divê wek rewşeke şaristaniyê were fêmkirin.

Dibe ku ya rast ew be, mirov azadiya jinê bi çanda malbat-dayikê (dayika xwedawend) ya piştî şoreşa cotkariyê gihîşt qonaxeke mezin, bide destpêkirin. Min ji lewra nihêrtina sêalî ya li mîtolojiyê mîna Xwedawend-Melek-Afrodît wek tesewirekê hilbijart. Em heta îmaja sivik a pîrek-qîzê hilneweşînin, em nikarin xwe bigihînin meznahî, hurmet û bedewiya jinê. Pîvanên şaristaniyê

çavkaniya wan zilam e û jin ji hemû pîvanên wê yên melek, bedewî û pîrozbûna xwedawendîtiyê xistine.

Min hewl dabû ez têgihîştina xwe ya li mijara dayiktiyê jî rave bikim. Li gorî min jin hînê jî ji mêr zêdetir li hemberî xwezayê hişyar û nazik e. Mêr mîna şaxekî jinê be. Wek tê texmînkirin ew navend nîn e. Agahiyên zanistî jî vê yekê piştrast dikin. Kedxwarî û zordestiya mezin a li ser jinê, di asteke dûrî aqilan de, wê kir ku rastiya xwe veşêre û xwe cuda nîşan bide. Gotina mêran mode ya li jinê hatiye kirin ev pêvajo bi vegotin, uslûp û şîrovekirinên dûrî aqilan ên ol, felsefe û heta zanist û hunerê, gihandiye qonaxeke din. Ev helwesteke welê zalimane û bê esil e, jin kiriye ku ji xusûsên hîç baweriya wê pê nîn e jî stû tewandiye. Bila kes li bendê nebe, ez wek mêzînkarekî hêz û azadiyê tevlî vê lîstika şaristaniyê bibim û erê bikim. Kêfa min ji dinya xwedayên mêr re nayê û her weha min rûyê wan ê rastîn jî fêm kiriye. Divê baş were zanîn ez ê beşdarî xwedatiya vê dinyayê nebim. Ev xwedatiyên bi ol, polîtîka, huner û zanistê wek dewletê xwe nîşan didin, kengî werin çareserkirin ji bo min dibin cihê eleqeyê. Tevî ku ez xwedawendîtiya jinê seyr û balkêş dibînim jî ez lê hayil bûme ku bi cihanîna wê zehmet e û egîdiyê dixwaze. Lê ji bo temenek hînê bi aştiyê, bedewiyê û berpirsiyariyê bijî, hêja ye xwe li ser rêya azadiya jinê bide, ji ber ku ez bawer dikim bêyî hêza wê diafirîne wê jiyana behsa

wê tê kirin nebe. Berovajî, mêrantiyeke xwe spartiye koletiya jinê ta ji zarokatiyê û hînê jî ji bo min kirêt e. Bila kes li bendê nebe ku ez vê kirêtiyê erê bikim.

Yê mayî jî rastiya em wek eşq bi nav dikin dikare diyar bike. Xuya ye hêdî hêdî tê fêmkirin ku ez eşqê li ser polîtîka me ya kadroyên jin ferz dikim. Ev helwest ji aliyê cinsî wêdetir hewl hatiye dayîn bi têgîneke cidî ya çandî, siyasî, azadî û wekheviyê di zikhev de were pêşxistin. Tarîfeke eşqê hewce dike ku jin ji çanda xwe ya koletiyê rizgar bibe, mêr jî ji çanda xwe ya serweriyê xilas bibe û di qada siyasî de li bin mêzînên demokratîk bi helwesteke azad û wekhev, bibe. Ev helwest, têkiliyeke seresere ya bi arzûyên cinsî yên mêrê serwer û jina kole ji sînoran derketî red dike. Têkiliyên xwedatiyê yên hewce di navbera jin û mêran de pêk werin ku bi giştî di şaristaniya çînî de û bi taybetî jî di sîstema kapîtalîst de zehmet in, divê bêne fêmkirin. Ji xwedatiyê mabest û qesda me ew e ku di çîroka gerdûnê ya bîst mîlyar salî de (li gorî agahiyên dawî yên zanistê), bi mejiyê hisî û analîtîk li xwe hayil bûne, hêza manedariyê ye ku heyecaneke mezin dide. Ya li hebûna xwe hayil dibe û divarqile xweza ye. Jin ji mêr zêdetir nêzî vê gerdûnîbûyînê ye. Agahiyên zanistî vê yekê nîşan dikin. Ez dema dibêjim jin gerdûnî û xwedawendî ye, ez vê yekê qesd dikim. Ev maneya xwe car caran di huner, siyaset, zanist û şoreşên dinyayê de dide hiskirin, kengî xwe di têkiliyên jin û mêran de nîşan bide, wê demê mirov

dikare behsa xwedatiyê bike. Divê wisa be. Tevî ku olan ev yek ferq kirine jî, lê ji ber nasnameya xwe ya îdeolojîk a bi giranî mêr e, jin li derve hiştine û zirar dane wê xwedatiya îdîaya wê kirine. Em hewl didin vê xwedatiyê di navbera her du cinsan de bi mêzîn, awayekî demokratîk, azad û wekhev pêk bînin. Ji ber ku cihê berfirehkirina tarîfê ev xet û rêz nîn in, ez vê xusûsê dibirim.

Baş e, di roja me ya îro de têkiliya serdest bi vê tarîfê re li hev dike? Berovajî di dest de amûrên kujêr ên mîna bivirê Romayê û hînê dijwartir bi gotinên sexte yên evîndariyê beden û têkiliya jinê nayê kuştin? Ma mêr mîna beraz pêk nayne? Têkiliya mêr û jin a di roja me ya îro de ku dixwazin rewa bikin, belkî di serê yek ji şêweyên koletiya maskekirî de tê.

Kadroyên kakil ên PAJK'ê li derdora 300 xwedawend, melek, Efrît (ji Afrodît û perî tê) divê li gorî tarîf û têgînên behsa wan tê kirin werin nirxandin. Xwedawend ew jin e ku li aliyê xwe yê gerdûnîbûnê serwextbûyî ye, di mêzîna hêzê ya demokratîk de zane rûnê û her weha dizane têkiliyên civakî li ser hîmê wekhevî û azadiyê bide meşandin. Li hemberî vê jinê, wê mêrê newêribe serweriyê bike, wê tenê hurmet û hezkirina xwe nîşan bide, bi darê zorê hezkirin û hela hela têkiliyeke cinsî wê nikaribe jê bixwaze. Lê kengî bi mêzîna hêza demokratîk xwe wekhev û azad kir, wê karibe bi heman pîvanan ji jinê hezkirin û hurmetê bixwaze û divê ev yek wek

prensîba me ya bingehîn a exlaqî were fêmkirin. Kengî ev prensîba exlaqî bi cih were anîn, belkî jî ew rastiya em jê re dibêjin eşq biqewime. Wekî din her cure helwest bi eşqê re îxanet e. Wexta bi eşqê re jî îxanet were kirin, her cure afirandin û serketin bi cih nayê anîn. Di nav refên PKK'ê de eşqeke rastîn bi serketinê û qehremaniyeke xwe ispatkirî mimkun dibe.

Baş e, em gelek revên jin û mêran dikarin çawa bi nav bikin? Aşkere ye, em dikarin wek xwe ipatkirina nasnameya kurd a qediyayî binirxînin. Gelek hevalên me yên 40-50 salî hem têkiliyeke sivik a koletiyê najîn, hem jî li ser xeta eşqê nikarin bibin xwedî raman û pratîk. Bi rastî ev trajediyeke dilêş e. Heta trajedî û komedî di zikhev de ne. Hinek wek velîstibin. Hinek wek jin-mêr dema têne cem hev tatmîn dibin, hinek di xewnên xwe de... hinekan ji wan jî mijara zewacê wek mijareke sivik a siyasî ferz kirin. Hinek ji wan jî bi sedema ajoyên wan ên cinsî hatine gemkirin, li hemberî hemû wezîfeyên xwe yên şoreşgerî ketin nav protestoyeke objektîf. Bi kurtî bendewariyên xwe yên di nav sîstema derve de ferz kirin. Ez van hevalan fêm dikim. Lê wek jin û mêr dema em di îmtîhanên herî dijwar ên jiyanê re derbas bûn, me sozên azadî û wekheviyê dan hevdu. Me sond xwar wê ev sozên me karibin li welatekî azad û di civakeke demokratîk de bi cih werin. Hûn nikarin înkar bikin ku min ji bo girêdana bi soz û biryardariya me, hemû hewldan nîşan nedane.

Ez şerê eşqê di çarçoveya van tarîfan de dikarim pêşniyar bikim. Divê mirov bi edaleta jinan ewle be. Bi giştî ji mêran guman tê kirin ku dema jin bê tedbîr be, her cure xirabiyê pê bike. Eşkere, di bin vê gumanê de zordestî û zordariya hezarsalan heye. Yeqînên min berovajî helwestên mêrê serdest diparêzin. Di xwezaya jinê de dad, azadî û wekhevî pir zêde diqewime. Ya rastîn, cewherê civakîbûyîna jinê xwe dispêre edalet, azadî û wekheviyê. Dîsa heta dawiyê aştiyane ye. Dizane ku jiyaneke watedar bi tevahî dikare li ser hîmê van têgînan pêş bikeve. Di têgîna xweşikî û bedewiyê de jî naziktir û serdest e. Alternatîfên xwe bi şer, zordarî û bêedaletiyê nake; ev li dijî xwezaya wê ye, dîsa li dijî şêwazê wê yê civakîbûyînê ye. Ji bo ev xusûs hemû werin fêmkirin, divê derfet û îmkanên jinê yên azad hebin. Jin çiqasî karibe bi awayekî azad tevbigere, wê ew çend karibe tercîhên wekhev, adil û xweşik pêş bixîne. Ji lewra ji bo di civakê de têgînên bedewî, edalet û wekheviyê cih bibînin, azadiya jinê şert e.

Mêrekî ji xwe piştrast, divê ne ku li pêşiya şêwazeke welê ya azadiya jinê bibe asteng, berovajî, divê bizanibe hewce ye destek bidê. Li şûna ku bibêje jina min, bibêje jina divê azad bibe. Di vê rewşê de mirov dikare şertên rastiya eşqê diyar bike. Beriya her tiştî ji bo jin karibe mafê xwe yê hilbijartinê bi kar bîne, şertê yekemîn ew e ku divê di azadî û wekheviyê de bi mêr re bigihîje heman hêzê. Ji bo vê jî divê di

civakê de demokratîkbûyîn tam pêk were û ev jî yek ji şertên pêş e. Şertê duyemîn ew e, pîvanên mêr bi hezar salan li dijî jinê bi dest xistine, divê di xwe de û di civaka serwer a mêr de li dawiyê bihêle û bi vî awayî qebûl bike ku bi jinê re xwedî yek hêz e. Eşkere ye ku di van şertan de têkoşîneke demokratîk azadî û wekheviyê were meşandin wê ferd hînê nêzî rastiya eşqê bike. Ji bo vê yekê jî beriya her tiştî divê eşqên nîzamên heyîn werin înkarkirin.

Egîdî û qehremaniyeke rastîn dikare di çarçoveya van tarîfan de maneyê bibîne. Mirov dikare ji meyl û eleqeyên eşqê yên kesên welê re rêz bigire. Mêr û qîzên me yên xwe bi egîdî avêtin nav agir, di heman demê de ji bo em li eşqê îxanet nekin hişyarî ne. Ew ji bo welat û gelê me, hem prensîbên eşqê yên pîroz û hem prensîbên guhdanê û bi cih anînê, hem jî qehremanên rastîn in. Em jî divê herî hindik hêza xwe ya hurmetê ji bo van qehremanan nîşan bidin. Ez dizanim ev pîvan pir zehmet in. Lê ji şewateke qijeqij û qîreqîr zehmetir çi heye! Eşq ew rastiya me ye ku herî zêde dikare bide şerkirin. Di nav PAJK'ê de kesên di vî warî de, dibe ku derkevin. Ji ber ku ez îşaretên vê yekê dibînim van nirxandinan dikim. Herî kêm divê em li pêşiya gavavêtinên welê mezin û kesên doza jiyaneke mezin dikin, nebin asteng. Bila xwe bixin guftûgoyê, perwerde bikin û ji dîroka bi lanet çipî dîroka azadiyê bikin. Bila pîvan û rêzikên jiyanê yên bi rêz, evîn û eşqê pêş ve bixînin. Bila her cure rêxistinî û pratîkên

xwe bigihînin biryarê. Bila ji kongreyên xwe heta civînên xwe yên rojane nîzamên xwe damezrînin. Bila xwe bigihînin hêzeke rastîn a eşqê. Ma tiştekî din ji vê bi nirx û qîmetir heye? PAJKeke xwe gihandibe vê hêzê, pirsgirêkeke nikaribe çareser bike û wezîfeyeke nikaribe bide meşandin, nîn e.

Belkî yên di nava me de jî û gelek derdorên din, bibêjin di rastiya kurd û Kurdistanê de têgihîştinên bi vî rengî yên eşqê nikarin biqewimin. Ez dibêjim tiştekî welê hêjayî dîroka gelê me nîn e. Kevneşopiyên me yên destanan li gorî van tarîfa ne. Li ber serê me li Botanê, li çiyayên Sîpanê û Şengalê destanên Memê Alan, Mem û Zîn, Derwêşê Evdî hene û gelek nêzî xwedatiyê ne.

Dibe ku zehmet be, mirov destanên eşqê yên berê li gorî roja me ya îro pêk bîne. Jixwe min û hevalên me yên şehîd karkeriya rêya eşqê bi qehremanî pêk aniye. Eger kesên xwedêgiravî canê wan eşqê dixwazin qîmeta van hewldanan fêm nekiribin, yan kor in, yan fesad in, yan rezîl, yan jî xayîn in. Ji bo eşqê ma hînê ji me çi tê xwestin?

Di wezîfeyên şoreşgerî de tu yê tu serketinê bi dest nexînî û paşê jî bibêjî canê min têkiliyê dixwaze! Eşkere, kesên xwediyê vê helwestê heya rûyê wan çiriyaye û şerm nakin. Li Kurdistanê eşq naşibe bûyerên di filmên Holywood û Yeşîlçamê de diqewimin. Bi qasî zanyariyê, serketinê xwedatî û xwedawendiyê dixwaze. Çivîk bi xwe jî li cihên dest pê

nebûyî hêlîna xwe çêdikin. Li cihûwar û dilên heta qirikê hatine dagirkirin, eşq dikare hêlînê çêke? Her hêza tu xwe biavêjiyê berê nizanim wê ji eşqa te çi bike. Serhatî û ezmûna min nîşan da ku bêyî îxanet li wezîfeyên şoreşgerî were kirin, jiyan bi jineke nîzamê re mimkun nîn e. Di nav refên me de dibe ku zewacên sivik bibin. Ez ê vê yekê, weke koletiyê û daxwazek ji bo dewamkirina fizîkî, şîrove bikim. Ji bo ez ji van hevalan re nebêjim xayîn şert ew e ku di wezîfeyên şoreşgerî de performansa serketinê bi dest bixin. Naxwe eger ji bo têkiliyê wezîfeyên şoreşgerî bixin xizmetê, ya wê demê biqewime, îxanet e. Dîroka kurdan bi giranî ji ber têkiliyên bi vî rengî di îxanetê de çikiyaye. Rexneyeke din jî ew e ku zewaca sivik di berdêla ji destdayîna eşqê de dibe. Ez hînê alîgirê şerê eşqê me. Temen û sînorê vê yekê tune. Wek min anî ziman, kî ku eşqê daxîne arzûyên cinsî wê/î bi eşqê re îxanet kiriye. Di şertên têkoşîna me de ji bo eşqê di wezîfeyan de şertê serketinê hêvî, arzû, îrade, hêza têgihîştinê, lêgerîna li bedewiyê, cesaret, fedekarî û di şer û aştiyê de heta encameke bi şeref bawerî ye, ku hewceyî pê heye. Şerê ji bo aştî, azadî û welatparêziyeke bi şeref ku şerên ji bo eşqê ne jî wê di rastiya PAJK'ê de ji bo serketinê hêza hewce bibîne; di kesayeta jina azad bibe de wê mêrê azad were afirandin.

Ji ber ku min di beşên din de nirxandibû, ez ê wek wan temam bikim bînim ziman. Di çarçoveya Rojhilata Navîn de min şerê 'namûsê' mezin meşand û di serî de diya min, li pey wê jî min ev kevneşopiya hemû gelê kurd û gelên din ji naveroka wê ya sivik û çor a cinsî derxist û bi hostayî nîşan da ku di nav şer û siyasetê de çawa dibe xwedî mane. Encama vê yekê jî ew bû ku jin netew, çîn û cinsê destpêkê ye ku hatiye kotin û mêtin. Ji sedî sed çi têkoşîna sosyalîst û demokratîk dibe bila bibe, eger wek cins, çîn û milet di azadiya jinê re derbas nebin wê nikaribin bigihîjin armanca xwe. Di civaka kurd de têkiliya xwe nespêre jin û wekheviyê, ji aliyê teorîk û pratîk ve pêşdebirina wê esas nebîne, tu qîmeta zewacê, cinsî û eşqê nîn e. Min bêzar bike jî ez ê dubare bikim ku têkiliyek bi vî rengî ji têkiliyeke 'mala taybet û giştî (kerxane) zêdetir tu qîmeta wê nîn e. Ji bo min soza ji jinê re tê dayîn, hevaltiya pê re maneyek wê ya felsefî kûr û dîrokî heye û her weha hewldaneke pratîk a welatparêzî, azadî û wekheviyê di nava xwe de werdigire. Cihê xemê ye, ferq nayê kirin ku min bi qasî teoriyeke rastîn a eşqê, şerekî wê yê mezin meşandiye.

Ez vekirî hîştina atmosfera di nav refên me de li eşqê wek pêdiviyeke pêşketina azadî, şer, wekhevî û demokrasiyê dibînim. Li cihekî ku li eşqê vekirî nebe, demokrasî, azadî, wekhevî û welatparêzî pêş nakeve. Heta jin bi awayekî mezin ranebe pêdarê tu doza şerefê ya gelan bi ser nakeve. Di nav tevgera min de

azadiya jinê di serê nirxên bingehîn de tê. Jixwe tevgera jinê li tevahiya cîhanê di şoreşên civakî de ku bûyerên nû diqewimin, aliyekî bingehîn e. Şoreşa jinê di nava şoreşê de şoreş e. Têgihîştina li jina azad, jinûve têgihîştna li dîrok, civak û jiyanê ye. Yek ji wezîfeyên bingehîn ew e ku divê mirov jinê ji paşverûtiya dînî ya feodal û metakirina kapîtalîzmê rizgar bike. Dîsa yek ji wezîfeyên bingehîn e ku divê mirov jinê ji zewac û exlaqê mêr ê feodalîzm û kapîtalîzm pê barkirî, xilas bike.

Ez hewce nabînim zêde rave bikim. Jin bi rastiya PAJK'ê neçar e rola xwe bilîze. Min di nirxandina xwe ya dawî de ji bo jinê vegotinên mîtolojîk xwedawendbûyîn, melekbûyîn û Afrodîtbûyîn bi kar anîbûn û ev di cewherê xwe de serhildanê li dijî çanda mêrê serwer ê pênc hezar salî îfade dike. Vê çandê jin xistiye rewşeke xirab. Zewaca naveroka wê mulkiyet tê de yek ji gefxwarinên mezin e. Em heta azadiya jinê pêk neynin, em di tu mijarê de nikarin jiyaneke bi nirx û manîdar li qadeke hêjayî jiyînê bibe, biafirînin. Wê şerê mezin ê jinê bibe. Heta ev şer nebe wê welatparêzî û wekheviyê pêş de neçe. Eşq berovajî texmînan, teorî û pratîkeke tam a sosyolojîk dixwaze; yanî em nikarin daxînin arzûyên sivik ê du ferdan. Eşq egîdiyeke mezin, serketin û evînê dixwaze. Ya/ê serketina wê/ nebe eşqa wê/ jî nabe. Rûyê eşqê timî li şerê serketinê yê azadiyê ye. Eşqa kedkariyê ya ez li pey diçim mirov dikare wer tarîf bike.

Bêguman em dizanin ferd ji du cinsan pêk tên. Lê em li meydana şer in. Ji ber ku fatihan her tiştê me zevt kirine, jinên em bibêjin ên me ne, nîn in. Jinên heyî bi kalîteyeke erzan kirin meta û alav, ha ew jin hene. Têkiliya şervanên azadiyê bi van jinan re di cewherê xwe de ters e. Têkiliya jinên li pey azadiyê bi van mêran re jî hînê terstir e. Ji dema Eflatûn a tê gotin ew e, ya girîng mirov xwe bi îdeayan dewam bike. Dewamkirina xwe ya fizîkî xwe dispêre ajoyên hundur ên cinsî. Ez ajoyên hundurîn ên cinsî nas dikim. Ji bo gelê me karibe hebûna xwe dewam bike qada bi tenê ye, jê re hatiye hîştin. Ew jî li serê wî bûye belayeke mezin. Ya girîng ew e ku zuriyetek îdeal were dewamkirin. Ew jî bi şerên mezin ên felsefîk û civakî dibe. Di encamê de yê nikaribe eşqê şoreşê pêş de bibe, mîna li Tirkiyê, dikare şêwazê jinê yê bi dolbend û sergirtî biceribîne. Bêyî bixînin qada eskerî û siyasî, bi jineke karibe li mala xwe rûnê bi şertê îxanetê li wezîfeya xwe nekin dikare destûra zewaceke ebdiyetê were dayîn. Lê ez dubare dikim. Zewacên bi vî rengî zewacên nîzamê berê ne, divê bi qada eskerî û siyasî neyên kirin. Naxwe wê deriyên atmosferê heta dawiyê li bandorên jiyana koleker a feodal û kapîtalîst were vekirin. Di artêşên nîzamên paşverû de jî ev tişt nîn in.

Rastiya li cem me diqewime hînê girîng û dîrokî ye. Min ji bo komek hevalên jin têgînên xwedawendbûyîn-melekbûyîn-Afrodîtbûyîn pêşniyar kirin, çanda Rojhilata Navîn bi awayekî xeternak jinê

dike kole, ji lewra ji bo şerê li dijî vê çandê min ev têgîn pêşniyar kirin. Di vê dema dîrokê de hewceyî bi vî cureyê jinê, bi vî nifş û zuriyeta jinê heye. Jixwe bi sedan ji wan bi qehremaniyên xwe yên herî mezin û şehadetên xwe ev rastî ispat kirin. Bîranîna wan maneyeke mezin îfade dike. Ez hînê jî yeqîn dikim ku gelek jinên me yên leheng hene. Kesayetên wan ên mezin, bi cesaret, bi dad û bi eşqê nû derdikevin holê. Mînakên neqane yên mejiyê hisî û analîtîk ji nû ve diafirînin. Ev qonaxeke girîng a dîrokî ye. Min bi xwe jî cesaret nekir bi van jinan re bibim ku xwediyê vî cewherî bûn, hela hela bi têgihîştina nîzamê li derveyî me min hîç newêrîbû wan bikim pîrek û nikarim bikim jî. Em ji bo bi hêzbûna jinan çi bikin hindik e. Ew jixwe eşqê kolektîf temsîl dikin. Gelek heval hene mirov bi wan serbilind bibe. Ez di vê qonaxê de bawer nakim ku evîna taybetbûyî pir bi xêr be. Di nav şertên aştiyê de bêguman wê zewacên azad bibin. Lê di van şertên heyî de, nemaze di meydana şer de zewacên azad çiqas dibin, ez jî tê de, ji pratîka hin hevalan hatiye fêmkirin.

Di vê mijarê de ez naveroka rastîn a zewaca Osman bi jina eslê wê Îranî re baş nizanim. Dibe ku maneyek wê ya siyasî jî hebe, yan jî dibe ku heweseke sivik a zewacê be. Lê eger vê yekê weke pêdiviya jiyaneke hemdem di nav hevalan de belav bike, dibe meylek pir tehlûke. Heta cesaretkirina wî ji bo vê yekê bi xwe tehlûke ye. Di demên buhurî de hin komên di

nav çepên Tirk de bi vê rêbazê hema hema rêxistinên xwe qedandin. Ez dubare dibêjim; bêyî ku bikin meseleya siyasî kesên xwediyê zewacên gundî, bajarî, bûrjûwaziyên piçûk û yên dixwazin hînê nû malê deynin, bi şertê di wezîfeyên xwe de serketîbin, bi destûra rêxistinê hin kes dikarin dewam dikin. Bi biryarên keyfî yên ferdî nabe. Dem ne dema dewamkirina zuriyetê ye, beriya her tiştî dem ew dem e, em li pey îdealên xwe yên welatparêzî, siyasî û zîhnî ber bi serketinê ve baz bidin. Heta şertên herî kêm çênebin, mêranî-pîrektî, zarok û eşqê bibin bela serî. Ez heta dawiyê ji eşqê re bihurmet im. Lê eger çalakî û felsefeya me digihîne wê nebe, ez hata dawiyê xwe ji xapandinê re dibêjim; na. Di çarçoweya van têgînan de ez bawer dikim ku wê hewldanên pratîk me hînê azad bikin û wê rê li eşq û evîna em bi hesreta wê vekin.

Jiyana hemdem û penaberbûyîna xwe bispêre Başûr dîtinên watedar nîn in. Jiyana di rewşên awarte de jiyana şoreşgerane ye. Helwestên penaberbûyînê di her warî de tehlûke ne. Mirov dikare ji bo zarokên normal, kal û pîran û hin jinan behsa jiyana muhaciriyê bike. Mirov dikare Kampa Mexmûrê weke muhacir bi nav bike. Lê helîna di nav kurdên Iraqê de ne ji taybetî û ne jî ji giştî re xizmetê dike. Eger me jî li Sûriyê penabertî qebûl bikira, yên bi serê me de hatin nediqewimîn.

Veqetîna ji jiyana navend dewlet û şaristaniyê paşveçûyîn nîn e. Berovajî, eger mirov ji xwezayê bibe û ji kesayeta desthilatê ya bi derew û xwînê werimiye, negere belkî jî tu car negihîje jiyaneke têkûz. Berê mirovatiyê ji civaka nexweş ber bi civaka bi tendurustiyê, ji civaka tengavkirî, obez û ji hawîrdorê qutbûyî ya mîna kanserî bibe zêde bûye bajarî ber bi civaka ekolojîk, ji civaka dewletdar a ji serî heta binî totalîter û otorîter, ber bi civaka komîn a demokratîk û civaka azad-wekhev e. Eger mirov karibe xwe ji çanda nêçîrvaniyê ya rê li ber komkujiya heywanan vekir, şaristaniya rê li ber komkujiya mirovan vekir û bi awayekî zincîrwarî rê li ber felaketa xwezayê vekir xilas bike, dibe ku mirovatî ji bo jiyaneke nû çirkînî bi derî bixîne. Kesayeteke bi exlaq û polîtîk a bi heywan re bûye dost, bi xwezayê re li hev hatiye, bi jinan re jiyaneke xwe dispêre mêzîna hêzê ya bi aştî, azad-wekhev û eşqê parve dike, hêza zanist û teknîkê ji lîstoka şer û desthilatê derdixîne, bi qasî hêza Enkîdo dikişand bajêr û bi dewletê ve girê dida, min jî dikişîne û bi mane dibînim. Ji sedî sed ez behsa hesreteke bi sedema girtîgehê hatiye afirandin nakim. Ez behsa raman û paradigmayeke mezin a rûhî dikim. Ez ji helwesta kategorîk, ji perestbûna hêza mezin, ji serdem û jiyanên di bin lekeyên xwînê yên şaristaniyê de mîna stêrkan dibiriqin, bi rastî ez hem bêzar bûm û hem jî nefret dikim.

Kral Gilgamêş jî hewl dida şervanên xwe yên xurt ji qebîleyên li herêmên daristan û çiyayî yên li Bakurê Iraqa îro, berhev bike. Rêbaza wî ya berhevkirinê jî gelek seyr e. Sîteya Ûrûkê jiyaneke nû keşif kiriye. Şoxûşengiya jiyana bajêr têra xwe balkêş e. Yek ji xusûsên sereke yên vê jiyanê balkêş dike fahîşetiya jinê tê. Ya rastîn, xwedawenda-dayik a pîroz ku hêdî hêdî li mala taybet û mala giştî (kerxane) tê girtin, ji bo kêf û zewqa mêran têra xwe dibe balkêş. Koleya wî ya nû jê re derfetên jiyana bi kêf ên bêsînor pêşkêş dike. Têkoşîna xwedawenda Ûrûkê Înannayê (navê wê berê yê li çiyê Nînhûrsag e, yanî xwedawenda herêma çiyayî. Malbat-dayika şaristaniya Neolîtîkê pêş de biriye temsîl dike. Li dora dayikê civak mezin dibe û wek sembol nasnameya xwedawendîtiyê bi dest dixe) bi yekemîn xwedayê mêr ê qurnaz Enkî re tewş nîn e. Xuyaye, yek ji mijara herî li dij derketiye bikaranîna jinê li malên taybet û malên giştî (kerxane) wek metayeke cinsî ye. Ji ber vê yekê li ser xwedawendîtiyê şerekî mezin dide. Di destanê de wek têkiliya Enkîdo bi Ûrûkê re jina navdar a kêfê ya bajêr tê nîşandan. Ev sedem mirov dide bawerkirin. Ya Enkîdoyê kovî li ber devê çem dike nêçîra xwe dîsa heman jin e. Enkîdo çendîn bi jina bajêr ve tê girêdan, êdî dibe esker-fermandarekî baş ê Gilgamêş. Serhatiya Gilgamêş-Enkîdo paşê di destanê de wek numûneyeke bêhempa hatiye hûnandin.

Dema min çûyîna xwe ya yekemîn a bajêr û dibistana seretayî bi çîroka Enkîdo re rûbirû kir, ez di têgihîştina wê de dereng nemam ku destan esas behsa min jî dike. Di vê mijarê de feyda wê heye, ez behsa bîranînek xwe jî bikim. Zarok teşwîq dikirin ji bo biçin dibistana seretayî ya gundê mezin Cîbînê. Yek ji wan zarokan bi navê Şewket bû. Birayê piçûk ê Cimoyê min yekemîn çalakiya xwe ya gerîla li dijî wî kiribû. Diya wî yek ji wan jinên xizan û seretayî yên gund bû. Lê roja Şewket çû dibistanê vê jinê nirxandinek kir ji profesorê herî baş çêtir tespîtek kir. Hînê jî di hişê min de ye, weha gotibû; "Şewketê me bûye hikûmet." Min maneya vê gotinê hînê di vê parêznameya xwe ya dawiyê de baştir çareser kir.

Rêwîtiya me ya ber bi bajêr û dewletê ve, bi arzûya me ya ji bo dibistana eskerî û siyasî xurtir bû. Otorîte otorîteyê dikişîne. Diviyabû em ne bi meşê bi bazdanê bigihîştana otorîteya eskerî û siyasî. Dema asteng jî derdiketin ez xemgîn dibûm. Dema min nekarî biçim dibistana eskerî, min ê xwe pir bê şens bihesibanda. Di vê pêvajoyê de jina bajarî jî balkêşiyeke xwe ya cuda, lê di heman demê de hêzeke balkêş a di heman îstîqametê de bû. Şoreşgertiya me wê di bin van şertan de wek dewletparêziyeke baş pêk bihata. Sosyalîzm wek rewşa dewletê ya herî bêqisûr dihat fêmkirin. Em ê herî baş bi wê rabûna ser xwe. Ew mîna amûrekî hemdem bû ji bo em pê bifirin.

Îsyankariya me jî wek hesreta rabirdûyê û wek nerazîbûnekê li dij nûbûnê dihat fêmkirin. Kurdîtî jî timî wek pirsgirêkek xwe dida der dihat hiskirin.

Di bûyera Kesîre de jî wer bûbû. Ya esas, jinikê bi awayekî xeternak diqîriya. Heta bi şaneyan dida hiskirin û digot; "Ez îxanet im, nêzikî min nebe." Lê min digot; "bi qasî ku tu aşiq bibî divê tu bi min re bî." Eşqa min, hevalên min û dostên min êdî bûbûn yek û dema heman stranên îxanetê digotin, min ê jî bigota û ez neçar bûm min bigota "eşqa min, hevalên min, dostên min çiqas stranên xweş yên şoreşgerî û welatparêziyê dibêjin."

Ez di vê çarçoveyê de helwest û dîtinên xwe diyar dikim, lê mijarên zewac û jiyaneke hemdem pêwîstî pê heye em zêde li ser rawestin. Eger mesele di çarçoveyeke sivik a civakî û biyolojîk de bi sînor bimana min ê hîç behs nekirana. Lê aliyên wê yên cidî yên siyasî û çalakî hene. Min bi xwe jî ji nêz ve eleqeder dike.

Ez bi hewayek wer hesiyam ku min di warê jiyana civakî û jinê de kêm û di rewşeke şaş de dibînin. Ev rewşek heta dawiyê cahîlane bû û dibû tehlûke ku têkoşîna mezin û çi diqewime neyê dîtin, her weha bi awayekî bê sewiye xwe ferz dikir. Min ji destpêka vê parêznameyê nîşan da ku ez ji heft salî bi dora xwe re ketim şerekî sosyalîteyê (yên vê yekê nikaribin tam

binirxînin nezanên mezin in, an jî xwediyê nerazîbûneke mezin in) û min ev yek ji bo têgihîştinên derkevin bibe bersiv bi bîr xistine. Li hemberî yekî mîna min ku ji heft salî pêve bi mafê sosyalîteya dayika xwe re ketiye têkoşînê û ev hêz nîşan daye, qalkirina ‘jiyana sosyalîteya hemdem’ li dijî min tê maneya şer. Ev ne tenê şerekî sosyalîteyê ye, di heman demê de aliyên wê yên siyasî jî hene. Ji bo mijarê rohnî bike, min mînaka Kesîre ji bo vê yekê, hewl da dûrûdirêj îzah bikim. Tênegihîştina li min û jinê, li ‘Apo û jinê’, ne tenê ji bo PKK’ê, ji bo serdema me jî wendahiyek e. Di serdema me de yek ji kesên şerê mezin ê ji bo jinê meşandiye ez im. Di vê mijarê de ez pir ji xwe piştrast im. Ez yeqîn nakim ku kesekî mîna min hebe, têkiliyên civakî, siyasî û eskerî yên li dora jinê ev çend bi kûrahî çareser kiribe. Çi sosyolog, çi aşiq, çi jî esker an jî siyasetvan be. Ez neçar im bînim ziman ku min eşq û evînên gelek hevalên xwe yên egîd ên keç û xort taqoz û asteng kirin ji bo vê jî min teorî û helwestên teorîk ên dûrî aqilan nîşan da. Ez di wê rewşê de me ku karibim formulê bibêjim.

Dema rahibên Sumer dayika min a xwedawen û jina eşqê Îştarê birin perestgehê, ji wê birin qesra kral, gel kralên xweda û wexta ku mirin bi wan re bi saxî kirin gorê heta mêjiyê hestiyê xwe hîs kiribû. Ew kralên xweda bin jî, min tu car qebûl nekir çawa li ser sifreyên ziyafetê wê kirin parçeyekî kêf û zewqa xwe.

Lê min fêm kiribû ku dayika min a xwedawend û jina eşqê heta roja me çawa piço piço bi hostahiyeke mezin dagir kirin û xwarin, ji hev de xistin û ya jê mayî weke zewaca duserî avêtin ber qûlên xwe, ji koleyên xwe yên mêr re mîna para bêdengbûnê hiştin.  Vê diyariya wan min weke mêrekî di dilê xwe de neda qebûlkirin, her ku ez ji xwe piştrast bûm ku ez ê bikaribim bibim kurekî baş ê dayika xwe ya xwedawend û jina eşqê, zêdetir bi çoş û rûmet dibûm. Her wiha min cara destpêkê axên dayikê di kûraniyên dîrokê de fêm dikir, nakokiyên ku bi hezar salan in bi girêkên kor hatine hasêkirin çareser dikir, ji hev vedikir û min ferq dikir ku zayîna îcar manedar e. Yên ku mirinê ferz dikin, tevahiya sedsala 20., hemû komplovan, kî dibin ew dizane, min qebûl kiribû ku ez ê bikaribim li hember hemûyan li ber xwe bidim û hêja ye viya weke peyam ji dostên xwe yên ji min bawer in re pêşkêş bikim. Min dikarî bi hemû ziraviyên wî dahûrînim ku ji Hîroşîmayên ferz dikin jî xetertir weke bombe min kirine pakêt û wiha bavêjin ser gelên me; min pîmên wan jê vedikir û hemû amûr, kel û pelan davêt rûyê bombevanan û rihet dibûm. Ez alîgirê mirov bûm, xwedayên zordar careke din têk çûbûn.

Parêznameya min ji bo hemû mirovatiyê dikare hin tiştan bide hînkirin. PKK'yeke ji nû ve hatiye avakirin, dikare hemû hevalên min ên esîl, hêza maneyê û hevalên min ên îradeya wan heye, bigihîne

hevdu. Koma Gel dikare hemû gelê Kurdistanê û dostên wan li bin banekî demokratîk bîne cem hevdu. Li dijî yên êrîşê sererast bînin ser jiyana me, welat û civaka me, HPG dikare şerekî parastinê bimeşîne; dikare ji bêhurmetan, zalim û neheqan hesab bipirse. Jinên me yên herî esîl bi têgihîştina xwedawendên hemû deman, dikarin bi nasnameya PAJK'ê ya bi rûmet, sadetî û xwerûtiya melek û ezîzeyan û bedewtiya Afrodîtê dide, bigihîjin hevdu.

Jiyana efsûnkar li Kurdistanê weke Jin û Jiyan pêk hat

Jiyana bi heybet û balkêş li vir hilat; li Kurdistanê weke Jin û Jiyan pêk hat. Di nava hezarê salan de vê carê jiyan bi hiyerarşî û desthilatdariyên dewletan di rewşa berçav a Jin û Jiyanê de li heman mekanî hat wendakirin.

Piştrast bûye ku destan hemû kopiyên Destana Gilgamêş in. Bihuşt û dojeh tev bi van jiyanên pêkhatî û wendakirî re têkildar in. Nexweşiya desthilatdariyê, bi rastî jiyanê dikuje. Bi serwextbûna li vê rastiyê, divê mirov zanibe, projeya Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk di heman demê de projeya wê rastiyê ye ku li devera jiyan bi nexweşiya desthilatdariyê hat wendakirin, jiyana jina azad a nebû desthilatdar weke civaka ekolojîk û ekonomîk hatiye keşifkirin û dîtin. Her proje di heman demê de utopya paşerojê ye.

Civaka Demokratîk û Moderníteya Demokratîk di nava cudahiyan de utopya pêkhatî ya paşerojê ne (di nava cudahiyan de bi awayekî azad û wekhev).

Ev xislet hemû li ser cografya Kurdistanê şensekî mezin didin pêkhatina siyaseta demokratîk. Qadên cotkarî-av-enerjiyê ji bo yekîneyên kominî hem îdeal in, hem jî ev yekîne xwe weke pêdiviyekê ferz dikin. Şert û mercên pêşketina civaka exlaqî û polîtîk jî têra xwe li cih in. Herweha çanda xwedawend-dayikê berê pêşî û bi awayekî herî bi hêz li vê cografyayê pêk hatiye. Zemînê bingehîn ê çanda xwedawend-dayikê ye ku bi navên Star, Îştar û Înannayê li tevahiya Rojhilata Navîn û dinyayê belav bûye. Tevî hemû hewldanên qedandin û qelandinê yên li ser hatin meşandin, jin xwedî potansiyel e ku bi wêrekî, têkoşerî û rûmetî mînakên jiyanê nîşan û raber bike. Tevî hewldanan hemûyan jî îdeolojiya civaka cinsiyetparêz bi qasî civakên din ên cîran bi sazî nebûye. Di avakirina civaka demokratîk de ku wekhevî (bi cudahiya xwe) û azadiya jinê pîvana bingehîn e, ev xisletên çandî yên dewlemend di nava hev de dijîn, potansiyeleke mezin di nava xwe de dihewînin. Ango di bin paradîgma moderníteya demokratîk de ji bo pêkhatina neteweya demokratîk û civaka ekolojîk-ekonomîk şert û mercên herî di cih de pêşkêş dike. Projeya Konfederasyona Demokratîk a Kurdistanê hê ji niha ve şensê pêkhatina wê heye.

Çi li derve çi li hundir, çi di zikê dayikê de çi di dem û mekanekî li ezman de, jiyana mirov bi tenê bi azadî, wekhevî (bi cihêrengiyan) û demokrasiyê dibe. Li derveyî vê şêweyên jiyanê jirêderketî ne, ango bi nexweşî ne. Ji bo jiyan bikeve ser riyeke rast û têkûz bibe, şoreş jî di navê de divê bi gotin û çalakiyên cihêreng ên civakî têkoşîn bê kirin. Ji bo vê jî îrade û zîhniyeta etîk, estetîk, felsefî û zanistî bê pêkanîn.

Jinên ciwan her ku diçû di nava refên me de zêde dibûn û vê jî dikir ku em bersiveke bi kok bidin pirsgirêka azadiya jinê.

Min der barê jinê de cara pêşî di Adara 1987'an de dest bi analîzan kir. Belaya bi riya jinê anîbûn serê min ango anîbûn serê tevgerê, min heta bi mejiyê hestiyê xwe his kiribû. Li hemberî helwestên ku hevriyên min dîn û har kiribûn, min cara pêşî bi rêbazeke nû, bi rêbaza analîzan hewl da bersivê bidim. Di serî de Ayşe Akarsu ya Pazarcixî, Saîme Aşkin a ji Dersimê û Ayten a ji Nisêbînê ku bi kuştinê hatibûn cezakirin, di vê gavavêtina min a analîzan de xwedî par in. Ji ber ku min cezakirina van jinan tu carî nikarîbû qebûl bikim. Pirsgirêka jinê her ku diçû cidî û giran dibû. Di her dewreyeke perwerdeyê de min analîzên der barê vê mijarê de gaveke din pêşde dibir û kûr dikir. Jinên ciwan her ku diçû di nava refên me

de zêde dibûn û vê jî dikir ku em bersiveke bi kok bidin pirsgirêka azadiya jinê. Lê belaya bêrehm a bi navê Kesîreyê li ser serê min di vê xebata min de bi rola sereke radibû. Kuştina wê ne rast bû, lê ewqasî bêîmkan kiribû ku mirov nikarîbû saetekê jî bi wê re bimîne. Hêmaneke gelekî zîrek bû. Çawa ku hevrê Mahsûm Korkmaz bû şehîd, gotinên wê kirî nîşan didin ka çiqasî zîrek e û çiqasî rast rêxistinê dişopîne. Gotinê wê ev bûn: "Kesê ku tu herî zêde jê piştrast û pê ewle Mahsum Korkmaz jî çû, niha tu yê çi bikî?" Mîna ku bixwaze ez paş ve gavê biavêjim û teslîmî wê bibim. Bi hêrs û êşa ji ber helwestên bi vî rengî min pêngava 1987'an avêt.

Bi rêbazên ji kevneşopiyê min karîbû hezar caran ew bikuşta yan berdana û jê rizgar bibûma. Lê maneya helwesteke bi vî rengî ji bo min têkçûneke îdeolojîk û polîtîk bû. Wekî din, min partî û rêxistin bi wê re parve bikira yan jî teslîmî wê bikira, dîsa encam wê heman tişt bûya. Hêmaneke durist bûya jî keda wê tune bû. Bi tenê bi hosteyî çavdêrî dikirin, bi maneyeke neyênî pêngavên taktîkî sor dikirin. Di şexsê wê de der barê jinan de çi hebû min dixwest analîz bikim. Herweha min dixwest têkiliyên jin û mêran ên li dora min her ku diçûn xwe ferz dikirin jî ji hev derxim, lewma min dixwest bersivên bi kok ên azadî û wekheviyê bidim wan.

Tevlîkirina jinan a nava xebateke mîna rêxistina eskeriyê ya ji sedî sed mohra mêran li ser e û bi

îdeolojiya mêrê serwer pêk hatiye gelekî bi rîsk bû; tiştekî wisa bû, mîna ku mirov dinamêtê bixe nava xebatan. Têgihîştina jin û mêrên heyî, ji têgihîştina cinsiyetparêz a çor û ji kevneşopiyê wêdetir nediçû. Têgihîştina wan ji hev du re ji tehrîk-kirin û sorkirinê, ji îşaretdayîna bi çav û birûyan wêdetir bi pêş neketibû. Min bi destê xwe belayeke mezin anîbû serê xwe. Fermandarê navdar ê gerîla Che Guevara jî dema jinan digire nava refên xwe wê di warê tatmînbûna cinsî de şaş nabîne, weke pêdiviyeke hewcedarî pê heye qebûl dike. Min nikarîbû ev qebûl bikirina, min ev bi xwe û xebatên rêxistinê, bi taybet jî qada eskerî bida qebûlkirin, ji serî ve maneya vê ew bû ku me xwe bi destê xwe tesfiye dikir. Min nikarîbû jinê bi rewşa heyî jî bihişta, ji ber ku rewşa wê ya heyî jî bi tenê ji bo tesfiyebûna me têrê dikir. Heval an jî ekîbek tune bû, hukim li xerîzeyên cinsî bike, wan bi awayekî rast, li ser bingehê hunerê polîtîk û berjewendiyên rêxistinê binirxanda. Ne ji bo min û ne jî ji bo rêxistinê rast bû ku me jinê li derve bihişta û şoreşek bê jinê pêk bianiya. Bi tenê rêbazeke din dima ew jî bi gotina gelêrî me yê ew ‘bi serî bikirana’ yan ‘serê wan girê bidana’ û ‘zewaca şoreşgerî’ ya rêxistinên çepgir ên şoreşgerî kiribûn mode jî dibe ku bibûya çare. Lê min ev rêbaz rast nedidîtin. Erê van rêbazan wê enerjiya şoreşgerî pûç bikirina, lê belê jixwe şert û mercên fizîkî derfet nedidan zewac û sergirêdanên bi vî rengî. Ev dihat wê maneyê, kê kel û pelên xwe berhev bikira

wê berê xwe bidaya Ewrûpayê û lê bibûya penaber an jî biketa nava gel û li ser navê rêxistinê weke kurtêlxuran bijiya û ji bilî vê jî rê nedima. Ev jî şêweyekî din ê tesfiyekariyê bû.

Riya ku min ceriband, di çanda Rojhilata Navîn de şêweyekî têkiliyê bû, kes lê nefikirîbû û heta bîr nebiribû; li derveyî zewaca weke hewcedarî dihat dîtin, jiyan û şerekê viya yê di nava nakokî û têkiliyên diyalektîk de li ber çavan digirt. Di vê çarçoveyê de min dixwest ez hem mêr û hem jî bi taybetî jinê bi heyîna wan û azadiya wan a rastî ya insanî bida naskirin. Ev îmtîhaneke mezin a navxweyî ya şoreşgertiyê bû. Pir hat îstîsmarkirin, pir xirab hat bikaranîn, kirin destikê bi sedan xapan. Lê dîsa jî jinên delal û zîrek, jinên bi destê xwe û egîd bi van xebatan derketin holê.

Me gelek keçên bedew û zîrek şehîd dan. Ji bo em bersiva hesretên wan bidin hema bêje min her roj xwe ji nû ve afirand. Lê ji ber ku min nikarîbû bersivê bidim timî bi êş û jan bûm. Min bi awayekî azad û dîrokî xwe gîhandibû jinê. Lê bi awayekî mîna Ferhat û Şîrîn ez ê tu carî negihîştibûmayê. Lê min bawer nekir ku derbaskirina ji vê rewşa çîroka nostaljîk û pêkanîna gihaştinê ew qas jî hewce û manedar e. Di şertên heyî de ango di nava sîstemên hegemonîk de min ji hev derdixist ku xwegihandina wê kuştina eşqê ye. Yanî, ya girîng ew bû, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî hemûyan xebata bi eşq bû. Ya rastî,

exlaqê heqîqî yê eşqê ew e, mirov karibe xwediyê wê hêz û qabîliyetê be, li dijî pirsgirêkên civakî şer bike û wan çareser bike. Kesên ev hêz û exlaqê wan tune bin, kesên nikarîbûne vê hêzê û qabîliyetên xwe pêşde bibin, ne dikare eşqa wan û ne jî exlaqê wan ê eşqê bibe.

Divê ez li xwe mikur bêm ku demekê ez jî bi nexweşiya modernîteyê ketim, dê û bav jî di navê de min xwest ez ji her tiştê van erdan birevim. Ez gelek caran li xwe mikur têm ku di jiyanê de yek ji mijara ez zêde pê xapiyam ev bû. Lê ez dizanim, ez tu carî bi tevahî ji rastiya ku Braidwood çavdêriya wê kir jî qut nebûm; ez mîna zarokekî qûntara wan çiyan, min serê çiyan jî weke textê xweda û xwedawendan, qûntara çiyan jî weke hin goşeyên bihuşta wan afirandî dît û timî xwest lê bigerim. Ez hîn zarok bûm navê 'dînê çiyê' li min kiribûn. Ez paşê hîn bûm ku ev jiyan hînê zêde ya xweda Dionysos e. Li pêş û paşiya wî koma keçikên hunerkar û azad a bi navê Bakha, Dionysos geriyaye. Bi hev re xwarine, vexwarine û kêf kirine. Min ji vê jiyana xwedayî hez kiribû. Fîlozof Nietzsche jî ev xweda tercîhî Zeus kiribû. Ji vê jî wêdetir li bin gelek gotinên xwe 'şagirtê Dionysos' nivîsandiye.

Wexta ez li gund bûm, herçiqas bi olê re li hev nedikir jî ji lîstikên keçikan ên nîşanê û wekî din wêdetir, min hez dikir ez bi wan re bilîzim. Li gorî min a bi awayekî xwezayî diviyabû bibûya jî wisa bû. Ez tu

carî razî nebûm ku çanda serdest jinê bigire û piştperde bike. Min qanûna bi navê namûsê tu carî nas nekir. Ez hînê jî ji guftûgokirin, lîstik û parvekirina pîroziyên din hemûyan a azad û bê sînor bi jinê re dibêjim 'erê', lê li ser navê çi dibe bila bibe, sedema wan çi dibe bila bibe, ez ji her girêdan û koletiya bêhna milkiyetê jê bê û li ser hîmê hêzê re, heta dawiyê dibêjim 'na'.

Li van çiyan, min tim hewl da komên jinan ên azad bi îlhameke xwedayî silav bikim û wisa bi wan re 'manedar' bibim. Di nûçeyan de gelek caran tê gotin 'Komeke jinên ji Başûr-Rojhilat ên li romorka traktorê yan jî pişta komyonê barkirî wexta ji bo rêncbertiyê diçûn filan herêmê di qezayê de mirin'; ez wexta van hevokan dibihîsim, hêrsa min a li hemberî mêrê qaşo xwediyê jinê, malbat, hiyarerşî û dewletê bi qasî li hemberî tu bûyerê nîn e, radibe. Tim tê bîra min, bi qasî ez ji vê rewşê hêrs bûbûm hê ji tu bûyerî re ew qas hêrs nebûbûm. Ma çawa dibe, ji nifşên xwedawendan evqasî piçûk ketin? Ruh û hişê min ev piçûk-ketin tu carî qebûl nekir û zîhnê min jî ev yek tu carî ranekir. Ji bo min jin wê yan di asta pîrozbûna xwedawendan de be yan jî wê hîç nebe. Tê gotin: 'Di civakekê de asta jiyana jinan gihîştiyê, pîvana asta jiyana wê civakê ye.' Ez timî li ser rastiya vê gotinê difikirim. Min ji bo diya xwe hevoka 'ji çanda xwedawendên dayik maye' bi kar anîbû. Ew jî weke wan şîşman û qelew bû. Ji ber ku mîna jinên

modernîteyê li hev nehatibû çêkirin, min nikarîbû pîrozbûna di wê de bidîta. Tevî ku min di jiyana xwe de êşên gelek mezin kişandine jî ez tu carî bi awayekî cidî negiriyam. Lê piştî ku min qalibên modernîteyê hilweşandin di serî de diya min û di şexsê wê de dayikên herêmê (Rojhilata Navîn) hemûyan bi dilekî şikestî û çavên şil bi bîr tînim, dinêrim. Diya min ji bîrê bi zehmetî ava derdixist bi satilê dibir û wexta diwestiya û di nîvê rê de datanî min baz dida qurûs dibûm bi hemdê xwe vedixwar. Ez niha li wê maneya qurtên avê, weke yek ji bîranînên xwe yên herî bijartî û xemxwar dinêrim, dibînim.

Ez ji her kesî re jî pêşniyaz dikim ku piştî qalibên zîhnê yên modernîteyê hemû hilweşandin dikarin ji nû ve li têkiliyên xwe yên dê-bavê binêrin. Ez dixwazim dîsa bi heman awayî li tevahiya 'têkiliyên gund' yên ji neolîtîkê mayî temaşe bikin. Bêguman serketina herî mezin a modernîteyê ew e ku karîbû nêrîna me ya çandî a panzdeh hezar sal e hatiye avakirin, hilweşîne û vê çandê tune bihesibîne. Mirov fêm dike ku tu kes ji kes û komên mirovan ên evçend hatin hilweşandin û tune hatine hesibandin, nêrîneke azad, serbilind, dildariya jiyanê û berxwedanê hêvî neke.

Bûyera dudiyan di van salan de xwesteka min a ji bo jinan bû ku dilebitî. Beriya komê di nava şert û mercên modernîteyê de ez ne xwediyê wê hêzê bûm

ku nêzî jinan bibim. Dinya jinan, dinyayek bû ku min nas nedikir û ez jê direviyam. Bi tenê hisên min ên platonîk hebûn ku min di hundirê xwe de mezin dikirin. Ti carî wê ne pêkan bûya ku ez li cem kesekî li wan mikur bihatima. Ji dema gund ve nêrîna jinan li min balkêş bû. Lê ez li vê tu carî serwext nedibûm. Lê kengî min ev paşê şîrove kir, ez yeqîn dikim ku ez li cudahiya vê balkêşiyê hayil bûm. Wan cudahiya min bi eleqe ji hev derxistibûn. Belkî jî der barê min de li cem wan perçikên hêviyan çêbûbûn. Mîna ku wisa bibêjin: "Ho zarok! Tu nizanî çi bi serê me de hatiye. Rewşa me weke tu dibînî nîn e. Tew te zanibûya çi dibe çi diqewime! Herçî tu mêr bî jî dîsa hêviyên me ji te hene." Ne ku ez li xweşikbûna jinê hayil nebûbûm. Tê bîra min, ji bo yekê, ji bo keçeke kurd min hukmekî wisa dabû "Ji bo te, ji bo qewm û zuriyeta te, hêjaye mirov şerê serxwebûnê bimeşîne."

Ez yeqîn dikim ku bi sedema hemşehriya Mazlûm Dogan bû, di dema komê de min kesa bi navê Kesîre Yildirim nas kir. Ji ber eleqeya wê ya ji komê re me ew jî ji komê dihesiband. Min jiyana wê ya berê qet nizanîbû. Lê ji destpêkê ve fikarên min hebûn ku wê bi awayekî berbiçav nîzama nava komê xira bike. Hêza min tune bû ku ez wê kontrol bikim. Ji bo selameta komê min hewce dît ku ez pêşniyar bikim, di nava komê de bi yekî re bibe dergistî. Herçiqasî ji vê helwesta min bêhna muhafezekarî û kevneşopiyê bê jî min ev kir. Karîbû bi min re yan jî bi endamekî di nava

komê de bibûya dergistî. Ya rastî, min dixwest ez tercîha wê bim. Lê jinik xwedî karektereke dêlguran bû. Lê rastî fêm kiribû, ango fêm kiribû ku ez hewl didim wê kontrol bikim. Lewma tercîha xwe ji bo yekî din kir. Anora min a kevneşopî bi awayekî cidî hatibû binpêkirin, lê min dengê xwe nekir. Dîsa min li xwe daneanî li ber vê yekê rabim. Lê dîsa jî tiştekî wisa bû ku mîna mirov ji duaya bi cih nayê re bibêje amîn. Têkiliya wê nemeşiya, nikarîbû bimeşîne. Kengî min car din ji bo têkiliyê berê xwe dayê, hem ez gelekî hilhilî bûm, hem jî me endamekî hêja yê komê ji dest dabû.

Rewşa min a hisî ya dilebitî dibû arîşeyeke cidî û bi îhtîmameke mezin min hewl da ku ev rewşa min tu carî xwe di nava komê, partiyê û heta HRK'ê de nîşan nede. Pêxîrtengiyeke mîna ya dawiya salên 1960'î der barê Xwedê de girtibû min, xwe der barê vê jinê de nîşan dida û dubare dikir. Ez nizanim vê jinê çima xwe nêzî komê kir. Ez yeqîn nakim ku eleqeyeke wê ya cinsî hebû. Heta dawiyê di warê eleqeya cinsiyetparêz de serdest bû û ev tiştekî vebirî bû. Di vê nuqteyê de ez xapiyabûm. Tevî ku hêza min a ez wê bi dest bixim tunebû jî min di vê de israr kir.

Min têkilî heta bi zewaceke şiklî û yekalî pêşde bir. Bi kartvizîta zewacê di serê havîna 1978'an de cara pêşî bi balafirê daketim Amedê. Belkî jî di dîrokê de, di têkiliyên mirovan de min meha hingivîn a herî seyr û neyênî pêk anîbû. Dema jinik bû weke qalibekî

qeşayê, tu şensê min ê çareseriyê tunebû. Ez ne di wê rewşê de bûm ku derdê xwe ji kesî re bibêjim. Ji ber ku ji vê rewşê bi tenê ez berpirsiyar bûm. Di vê têkiliyê de berpirsiyariya jinikê tunebû. Min çi kiribû, min ew dîtibû. Bi gotineke din min çi ajotibû, min ew diçinî. Ya rastî, hîç haya min ji nasnameyeke bi vî rengî ya jinê tunebû û lewma nedibû ku ez jê hêviyan bikim. Jin bi tevahî dêlguriya xwe li hemberî min bû. Min li vê rewşê, bi temamî deh salan, heta havîna 1987'an, heta ew bi vîna xwe ji tevgerê veqetiya, bi awayekî wisa xwe ragirt, ez bawer nakim ku ev di nava du mirovên din de hatibe ceribandin. Ceribandineke bi dehşet û tirsnak bû.

Ez bi saxî derketina ji nava vê têkiliyê weke derhoze û mûcîzeyekê dibînim. Bûyerên statuya jinê ya di çanda Rojhilata Navîn de serûbinî dikirin dibûn sedema zehmetiyê û min li hemberî vê hewl dida kesayeta xwe li ser piyan bigirim. Pevçûn û hevduberdan ne çare bûn. Ji ber vê, min rewşa kesa li hemberî xwe dişiband rewşa pêxîrtengiya xwe ya ji ber şika ji hebûna Xwedê ya ketibûmê. Diviyabû min ev têkilî ji aliyê siyasî û îdeolojîk ve ji hev derxista. Wekî din, heta analîzên der barê jinê de nehatina kirin, çareseriya siyasî û îdeolojîk jî bi temamî pêk nedihat. Di vê demê de hêza min a analîzkirina jinê pêş neketibû. Min ê ev ji sala 1987'an ve pêş bixista. Lê çawa ku bersiva min a ji bo şehadeta Hakî Karer amadekirina Pêşnûmeya Bernameyê bû, bersiva min a

ji bo vî şerê psîkolojîk jî xebata min a bi navê Rêya Şoreşa Kurdistanê bû. Di Havîna 1978'an de min ev xebat weke bingehê teorîk ê bernameyê amade kir. Bi vê derûniyê, amadekirina Manîfestoya Şoreşa Kurdistanê hêz û qabîliyeteke mezin divê. Dema min behsa mûcîzeyê kir, min xwest îşaret bi vê rastiyê bikim.

Di felsefeya Hegel de şertê pêkhatina eşqê; di navbera jin û mêr de bidesxistina hevsenga hêzê ye. Ev şertê hewce lê belê kêm, jina bi hêzbûyî îfade dike. Em behsa hevsenga hêza madî û çor nakin. Hevsenga hêzê ya behsa wê tê kirin, hevsenga fizîkî, derûnî û civakî ye. Ango tê gotin, eşq bi wê jinê re ku di nava koletiya herî kevn û ya herî kûrkirî de ye, nabe. Ji bo ez di pratîkê de nava vê fikra felsefîk a para rastiyê têde heye tijî bikim, diviyabû min jinên di nava refan de piralî (îdeolojîk, polîtîk, exlaqî, estetîk, fizîkî û heta eskerî –ji bo xweparastinê-, ekonomîk, sportîf û hwd.) bi hêz bikirina û lewma min pêşî giraniya xwe da vê yekê. Eger mirov bixwesta li hemberî jinê bi hurmet û hevgirtî bibûya û bixwesta bi awayekî rast, baş û xweşik xwe bigihanda hezkirinê diviyabû jin bi hêz bikirina û ez bi temamî bi vê hayjixwebûnê bi jinê re eleqedar dibûm. Ango heta jin bi hêz nebûya eşqa wê jî wê pêk nehata. Min ji sedî sed ji rastbûna vê terîfê bawer dikir. Ez ji xwe piştrast bûm ku diviyabû di vê mijarê de paşve gav nehata avêtin. Piştî ku min hêz û

qabîliyeta di vî warî de bi dest xist, xebatên min ên der barê jinê de bi nirx dibûn. Mîna ji kabûs û xeweke hezar salan hişyar bibin keçikan li min dinêrî û himbêz dikirin. Tevî ku ez di van mijaran de gelekî bi îhtiyat bûm jî ez netirsiyam wan bi hezkirin û hesreteke bê dawî himbêz bikim û wan bikim taca serê xwe.

Di vê mijarê de du têgihîştinên şaş timî xwe ferz kirin: Hin kesan bi awayekî kevneşopî dixwestin bi serî bibin, bi xerîzeya cinsiyetparêziyeke çor a tu bingehê wê yê îdeolojîk, siyasî û çalakiyê tune di bin navê bi hev re bûnê de her cara firsend bidîtana tevgerên rezîlane nîşan bidana, kesên bi vî rengî têra xwe zirar didan. Li hemberî vê, sofîtiyeke hişk, ango helwestên xwe ditepisandin û bi navê wê ji bandorên cinsiyetparêziyê bibihurin, ji mezinkirina pirsgirêkê wêdetir tu encam nedidan. Xebatên li ser xeta demokratîk, azadî û wekheviyê hatin pêşdebirin bûn pîvaneke têkûz a azadiya civakî. Bûyerên pratîk rastî, xweşikî û qenciya nêzikatiya bipîvan piştrast kirin.

Ji lewra min li têkiliyên fermî weke têkiliyên bêhna desthilatdariyê ji wan tê dinêrî û dilê min li wan germ nedibû. Mîna alternatîfekê bûn ku min ji gel dûr dikirin. Gelek dost, kes û kom hatin cem me. Em bi wan re baş eleqedar nebûn û mîna ku ev hemû encama desthilatdarbûnê bûn. Fena ku ez di navbera gel û desthilatdariyê de diçûm û dihatim.

Kûrfikirkirina min a li ser dualîteya desthilatdarî û demokrasiyê bi saya van têkiliyan e.

Min jin weke kategoriyeke cuda ya gel nirxandin. Herçiqasî şert di cih de nebûn jî min timî hewl da ji wan re cihekî bibînim. Min fikar nekir ku malên lê diman bidim berpirsiyariya wan. Hinek kesên rezîl, ji ber ku nasnameya jinê rast ji hev dernexistibûn û qebûl nekiribûn, ev nêzikatî û xebat şaş dinirxandin. Dema jin an jî keç dihat gotin, timî têkiliyên cinsî yên çor û erzan dihatin bîra wan. Lê bi herhalî di xebatên jinan de ez bêhtir li girîngiya rastî, heqîqeta dîrokî û civakî hayil dibûm. Ew ji bo min cewherê xebatên sosyolojîk bûn. Li qada xwe, herçiqasî teng bû jî min nîzama hîyarerşîk a li ser wan xira dikir û tiştên mirov ji vê hîn dibû mirov nikarîbû ji hezaran pirtûkî hîn bibûya. Platforma têkiliyan a min bi wan re danîbû statuya mêrê serwer a di çarçoveya pîrek û zilam de hatibû danîn parçeparçe dikir. Ya rastî, ez bêhtir jî bi parçeparçebûna vê statuyê bextewar dibûm. Her ku diçû derdiket holê ku ew objeyeke cinsî nîn in, mirovên hêja ne û bi vê yekê em serbilind dibûn. Ev nêzikatî li hezkirinê bi xwe rê vedikir. Ew cîhana hezkirin û rêzgirtinê ya ku ji nava rastiya dîrokî û civakî tê, yek a din nas dike lê ji sedî sed kes zorê li kesî nake, xwedî hêzeke bêhevta ye. Herçiqasî ji nava wan kesên ji pîreka ketî nikaribin bibihurin derketin jî û hewl dan bi gotegotên xwe xira bikin jî gelek jinên hêja û gelek bi kalîte derketin.

Piraniya wan jî şehîd bûn. Ez ê ji wan re nebêjim qehremanên bênav, ew qehremanên rastî bûn. Eger jiyaneke civakî ya mirov pê rabe wê hebe, bi tenê bi dilsoziya bi bîranînên wan û bi meşa li ber rohniya wan a rênîşaner re dibe. Jiyaneke bi jinê re bi tenê di vê astê de jiyaneke hêja ye. Jiyanên din ku li ser nivînên ji perîkên çivîkan derbas bibin jî li gorî min ji perpitîna di çalekê de tu cudahiya xwe tune ye. Bi kurtî ez gihîştim vê encamê: Rastî, bedewî û qenciya xwedayî ya li cem jinê bibîne û pêre bijî! Pir hindik be jî me ji vê jiyanê para xwe girt, me parve kir û em jiyan. Ez dema dibêjim em jiyan, min xwest ez diyar bikim ku felsefeya jiyana azad bi tenê li ser bingehê vê parvekirinê dikare manedar bibe û mirov dikare wê terîf bike.

Pêşî min dengê Aramê Tîgran bihîst û bandoreke cuda li min kir, min pir gelekî paşê dema ev şîrove kir, min fêm kir ku ev dengekî wisa ye, bêhtir nêzî rastiya kurd, bi taybet nêzî rastiya gelê kurd e, nemaze di anîna ziman a heqîqeta gelê kurd de ev deng bêhtir nêzî rastiya kurd bû. Lewma min qebûl kir ku huner şêweyekî din ê ravekirina heqîqetê bû. Di nava wî dengî de hem bangek ji bo rastiya gelê kurd hebû, hem jî weke naverok ‘eşqeke hêvîjêbirî’ dianî ziman. Ji lewra bi rastiya min re gelekî li hev dikir. Ji aliyekî ve bi lêgerînên xwe min hewl dida pirsgirêka kurd rave bikim, ji aliyê din ve jî ev yek bi muzîkê bi

hêz dibû û ev xusûsek bû ku dihat fêmkirin. Lêgerîna îdeolojîk û muzîk ji bo pirsgirêka kurd êdî milê xwe dabûn hevdu û dimeşiyan.

Eleqeya min a ji bo jinê jî di van salan de bi heman awayî çêbû, beridî. Bi awayekî xwezayî girêdanên bi arezû yên di salên pêşî yên ciwaniyê de bi serê ciwanan de tê, ji bo min jî pêkan bûn. Bi awayekî biyolojîk û kevneşopî nêzî jinê nedibûm û ji vê dûr ketibûm, eleqeyeke min a di vî warî de jî çênebûbû. Di nava şert û mercên bajêr de jina xwe nîşan dida bi xemla modern bû. Bala min dikişand, lê nêzikbûna min a keçeke ku li gorî modernîteya Tirk gihîştibû, bi qasî Çiyayê Qaf îhtîmaleke dûr bû. Ji bo vê, ne min xwe xwedî hêz didît, ne jî ji bo vê min hewl dida. Dema min xeyal meyal çav li hinek keçikên bi eslê xwe kurd digerand, min ew çîrokên eşqê yên hêvî ji wan birî yên di nava muzîkê de derbas dibûn his dikirin. Çawa ku min berê jî diyar kiribû, min ji bo rûyê hin keçan gotibû; “Divê zuriyeta vê keçikê jî bibe zuriyeteke hêjayî azadiyê” bi vî awayî gotina min ji nêz ve têkiliya xwe bi pirsgirêk û rastiya kurd re heye.

Muzîka Aram çiqasî di rastiya kurd de rewşa ‘bûyera hêvî jê birî’ nîşan dida, ew dîmenê min li ser rûyê keçikê didît jî ewqasî nîşan dida ku rastiya kurd bûyereke bêhêvî ye, lewma bi sînor be jî têgihîştineke min a namûsê hebûya, diviyabû ez bi pey vê bûyera bêhêvî biketima ango diviyabû bi pey rastiya kurd biketima û min ev bi israr dianî ziman. Li gorî

çavdêriya diya min, hatibû fêmkirin ku ez ê bi vî halê xwe nikarîbûma bi jinê re bibûma. Jina modernîteyê, dema dibû tirk bi qasî Çiyayê Qaf dûr, dema dibû kurd jî bi dîmenekî eşqa bêhêvî xwe nîşan dida. Eleqeya ji bo jinê ya ciwanên kurd û tirk ên li cem min, ji bo min ne exlaqî û ne jî estetîk xuya dikir. Lewma min tu carî dilê xwe nebijand wan û ez nefikirîm xwe nêzî keçekê bikim.

Tevî vê yekê, ji nişkê ve di zewacê de bist bûm û ev hêja ye ku bê fêmkirin. Çawa ku di beşên pêwendîdar de min rave kir, ev nêzikatiyeke welê bû ku aliyên wê yên îdeolojîk, etnîk, polîtîk û psîkolojîk ketibûn nava hev. Di wî temenî de min ceribandina zewacê bi awayekî weke 'qebqebûkirinê' qebûl kiribû. Ji aliyê rûhî û kevneşopî ve tu carî nezewicîm. Lê pir zor be jî min bi xwe dabû qebûlkirin ku ji bo dîmenê îdeolojîk û polîtîk ê li dora jinê ji hev derxim ceribandineke bi vî rengî girîng e û divê ez ji pêkanîna wê netirsim. Bi taybetî bi vê têkiliyê min xwe gihand rastiya kurd elewî û jinê, min têkiliya vê bi nasnameya kurd, bi pirsgirêk û çareseriya wê re danî û divê ez bi girîngî bibêjim, ev 'gelekî zor' bû, lê dersek bû ku pir tiştan jê hîn bûm. Eger ez ji vê pirsgirêkê nebihurîbûma û wê ez têk biribûma, pir zehmet bû ku mirov bigota, ez ê di gavavêtinên ber bi rastiya kurd de bi ser ketima.

Nuqteya ku ez lê matmayî bûbûm ew bû, fîgureke jinê mîna Edûlê çawa karîbû rastiyeke ewqasî kûr a dîrokî û civakî îfade bike. Bi ya min, ev yek ji pirsgirêka bingehîn a wêjeya kurd e ku hê ji hev nehatiye derxistin. Bêguman aliyên mijarê yên bi şexsê min re têkildar hebûn. Ne bi tenê li Çiyayê Şengalê û Deşta Mûsilê, hewl didan li ser xeta Şam-Heleb-Atîna-Moskova-Duşanbe-Roma-Naîrobiyê derbê li min bidin. Nabe ku mirov di navbera her duyan de têkiliyê daneyîne. Ya balkêş ew e, tevî ku min kaset gelek caran da guhdarîkirin, hejmareke zêde keç û xortên li dora min bi min re heman his û hest parve nedikirin. Heta dema ku ez li Romayê bûm, hozan Şivan Perwer tevî wêjevan-helbestvan Mehmûd Baksî hatibûn serdana min. Şivan dîsa di hewaya xwe ya berê de bû. Mirov nikarîbû jê li bendê be ku karibe bi kûrahiya dîrokî-civakî ve dakeve. Rewşa Mehmûd Baksî bêhtir mirov xemgîn dikir. Min hevpeyvîna dawî bi wî re kir. Xwesteka wî ji min ew bû, li çiyayekî cenazeyên gerîlayan hatibe veşartin ew jî bê veşartin. Mîdeya wî têk çûbû. Rojên wî yên bi jimar mabûn. Ew jî hêdî hêdî dimir. Li ber çavên min weke Derwêşekî Evdî yê ku modernîteya Ewrûpayê ew hêdî hêdî dikuşt û bi qasî hemdem bû weke karîkaturê wî çêkiribe, xuya dikir. Pir hewl dabûn wî li dijî min bi kar bînin. Lê girêdana xwe ya ji dil tu carî ji dest nedabû. Ez di rojên xwe yên dawî yên li Romayê de careke din bi ber bayê bandora çîrokên trajîk ên kurdî yên ji

kevneşopiyê ketibûm û li gorî min ev bi qasî ku balkêş bû, ewqasî jî manedar bû. Paşê tevî ku hîç adeta min nebû, ji bo bîranîna Destana Derwêşê Evdî ev rêz ketin hişê min:

Ez li Çiyayê Şengalê li cem Derwêşê Evdî bûma!

Li ser pişta hespên spîbozî min xwe berdaya Deşta Mûsilê.

Dema Derwêş derb xwar, min ew rakira, bibira çiyayên Kurdistanê.

Min ji wî re bigota; "Binêre, bi hezaran Edûlê û Duwanzdekan hene"

Min bigota, li van çiyayên xwedawendan lê textê xwe danîne, xweş razê.

Mirin ji ku û çawa tê bila bê êdî xeman nexwe,

Kurdîtî û jiyana azad a misogerbûyî rastiyên ebedî ne.

## Di Neteweya Demokratîk de Hevjiyana Azad

Mirov heta li têkiliyên di navbera jin û mêran de serwext nebe, ne dikare li tu pirsgirêka civakî bi temamî serwext bibe, ne jî dikare ji hev derxe. Di bingehê pirsgirêkên civakî de pirsgirêk û problematîkên di têkiliyên jin û mêran de hene. Saziya zewacê ya bi awayekî yekalî di civaka hiyarerşîk û civaka şaristaniyê de li ser jinê hat ferzkirin, serweriya

mêr piralî ava kir û bi vê re belkî jî di xwezayê de bi qasî ku tu zindî û ruhberî nedîtî, hîmê saziyeke koletî û hewcebûnê hat danîn ku bi tenê xweserî civaka mirov e. Statuya pêşî ya civakîbûn, çînayetî û netewetiya serdest-bindest, timî li ser vî bingehî ava dibe. Di binê her şer û pevçûnê de jî ev rastî heye. Tişta ku dîroka şaristaniyê û qonaxa wê ya herî dawî moderníteya kapîtalîst herî zêde ser wê girtiye, ew berevajî kiriye û neyênî nîşan daye, rastiya der barê statuya koletiya jinê ya li ser vî bingehî ye. Jina ku di civaka şaristaniyê de bi şeytên re wekhev tê dîtin, di sosyolojiya moderníteyê de kesayeta herî sernerm a konformîzmê û diya ku zarokan tîne ya karkertiya malê ya bêheqdest e.

Diviyabû serwextbûna li tevahiya naverok û şêweyên asta koletiyê ya ku bi hezarê salan bi aqil û destê mêrê mêtinkar û zordest ketiye jiyana jinê, bibûya gava pêşî ya sosyolojiya rastiyan. Ji ber ku şêweyê mêtinkarî û koletiya di vê qadê de prototîpa tevahiya şêwegirtinên mêtinkarî û koletiya civakî ye. Berevajiyê vê jî rast e. Têkoşîna wekhevî û azadiyê û asta destketiyên vê têkoşînê li dijî mêtinkarî û koletiya xistine nava jiyana jinê, bingehê têkoşîna wekhevî û azadiya li dijî mêtinkarî û koletiya di her qada civakî de ye. Têkoşîna azadî û wekheviyê di dîroka şaristaniyê û moderníteya kapîtalîst de li ser bingehekî rast pêş nakeve û rê li ber serketineke bi hêz venake, sedema bingehîn a vê yekê ew e, zîhniyet

û saziyên mêtinkarî û koletiya şêwe danê û xistine nava jiyana jinê baş nehatiye fêmkirin û têkoşîna li dijî wan weke bingeh nehatiye dîtin. Çawa ku dibêjin, masî ji serî ve genî dibe. Wexta ku bingeh rast û durist neyê danîn, avahiya were lêkirin wê di lerzeke biçûk de xira bibe. Di dîrokê û roja me ya îro de bêhejmar mînakên vê rastiyê hene.

Kengî mirov hewl bide pirsgirêkên civakî çareser bike, divê mirov hûrûkûr li ser diyardeya jinê bifikire, ji bo hewldanên wekhevî û azadiyê jiyana jinê bike çavkanî û ev yek divê hem bingehê rêbaza lêkolînê û hem jî bingehê hewldanên zanistî, exlaqî û estetîk ên hevgirtî be. Rêbazeke lêkolînê ya ji rastiya jinê bêpar, têkoşîneke azadî û wekheviyê ya jinê nexe navenda xwe, nikare bigihîje heqîqetê, nikare azadî û wekheviyê pêk bîne.

Ji bo jiyaneke rast, ya bingeh ew e, divê mirov beriya her tiştî jinê terîf bike û rola wê ya di nava jiyana civakî de diyar bike. Em vî hukmê xwe ji bo taybetiyên biyolojîk û statuya civakî ya jinê nadin. Têgîna jinê weke hebûn girîng e. Mirov çiqasî jinê terîf bike, terîfkirina mêr jî ewqasî pêkan dibe. Em bi mêr nikarin dest pê bikin, jiyan û jinê rast terîf bikin. Hebûna xwezayî ya jinê di statuyeke navendîtir de ye. Ji aliyê biyolojîk ve jî ev wisa ye. Civaka serwer a mêr, statuya jinê têra xwe biçûk xistiye û tune hesibandiye, lê ev, ji bo serwextbûna me ya li rastiya jinê divê nebe asteng. Xwezaya jiyanê zêdetir bi jinê re têkildar e.

Herçiqasî jin gelekî ji jiyana civakî hatibe dûrkirin jî dîsa ev rastî bi vî rengî ye û nabe şaşî, berevajî piştrast dike. Ya rastî, zilam bi hêza xwe ya zordar û tuneker di şexsê jinê de êrîşî jiyanê dike. Tunekerî û dijminatiya jiyanê ya mêr weke serwerê civakî têkiliya xwe ji nêz ve bi rastiya wî ya civakî re heye.

Em dema vî hukmê xwe gerdûnî bikin, em dikarin dualîteya enerjî-madeyê ji xwe re bikin bingeh. Enerjî li gorî madeyê bêhtir bingeh e. Made bi xwe enerjiya pêkhatî ye. Made şêweyê bi formbûyî yê hebûn û veşartina enerjiyê ye. Made bi vê xisleta xwe enerjiyê dixe qefesê û herikîna wê dicemidîne. Her forma madeyê para xwe ya enerjiyê cuda ye. Jixwe ev cudahiya enerjiyê cudahiya form û avahiyên madî diyar dike. Enerjiya di form û madeya jinê de ji enerjiya di madeya mêr de cuda ye. Enerjiya jin hildigire hem zêde ye, hem jî xisleta enerjiya wê cuda ye. Forma jinê rê li ber vê cudabûnê vedike. Di xwezaya civakî de enerjiya mêr a vediguhere mekanîzmayên desthilatdariyê, bi form û şêweyên madî bi gewde dibe. Şêwe di tevahiya gerdûnê de weke enerjiya cemidî muhafezekar in. Di civakê de serwerbûna mêr, şêweyê bûyîna desthilatdariyê ye. Di vê rewşê de enerjiya hildigire bi giranî bûye xwedî form. Enerjiya venaguhere formê gelekî kêm e û li cem kêm kesayetan pêk tê. Enerjiya li cem jinê bi giranî nabe form û şêwe nagire. Enerjiya wê di rewşa xwe ya herikînê de dimîne. Di form û qefesa mêr de neyê

girtin wê weke enerjiya jiyanê herikîna xwe dewam bike. Jêhatîbûna manedanê, helbestwarîtî û xweşiktiya jinê ya nehatiye cemidandin û hişk-kirin, bi vê rewşa enerjiyê ya giraniya xwe heye, ji nêz ve têkildar e. Ji bo serwextbûna li vê rastiyê divê mirov hûrûkûr li jiyana zindî û ruhberan serwext bibe.

Em kengî bi vê perspketîfa felsefîk berê xwe bidin rastiya jinê, em ê bigihîjin wê encamê ku divê têkiliya jiyana manedar bi aliyên jinê yên xweşik, rast û baş bêne pêşxistin. Em bi vî hukmî rabin, nabe ku armanca bingehîn a bi jinê re zêdebûn û pirbûn be. Ji ber ku zindiyên tekşane yên besît jî haya xwe ji zêdebûnê hene û belkî jî mirov dikare bibêje, jiyanên wan ên yekarmancî li ser vî bingehî hatine şîfrekirin. Lê gerdûn diberide. Beridîna bi pêş dikeve nîşan dide ku tekşane xwe dubeşî parçeyên wekhev dike û ev jî dawiya jiyanê nîn e, berevajî bi vê çalakiya dabeşbûna mîlyaran carî ya tekşaneyê jiyan bi lez pircure û pircuda dibe. Em bi vê jî dizanin ku bersiva piştî wê ya manedar zêdebûn û pirbûn nîn e, guhertin û veguherîn e. Ji bo jiyanê zêdebûn navgînek e ku pêdivî pê heye, lê ji bo mirov li jiyanê serwext bibe tu carî têrê nake. Zêdebûn navgîn e, armanc an jî manedar nîn e. Ya rastî, jiyaneke maneya wê bi tenê zêdebûn û pirbûn be, jiyaneke gelekî kêm û bi qusûr e. Ma dibe ku rewş li cem tekşaneyê bi vî rengî be, lê belê jiyaneke mirovane bi jinê re bi tenê bi pirbûn û

zêdebûna cinsî ve girêdayî be, ev ne bi tenê kêmbûna maneyê di heman demê de korbûnê jî îfade dike. Li gorî ku bi jinê re mîna amîpan zêdebûn wê çênebe, nabe ku mirov pirbûna bi jinê re bixe navend û hedefa jiyanê, naxwe ji beridîna mezin a zindiyan mane û dersa pêdivî pê heye nehatiye girtin. Jixwe bi teknolojiya roja me ya îro civaka mirov ji pirsgirêka kêmbûnê bi temamî bihuriye. Pirsgirêka kêmbûnê ya cinsê mirov tune ye, berevajî, her diçe mirov pir zêde dibin û zêdebûna wan gihîştiye wê astê ku êdî di dinyayê de hilnayên. Ev pirbûn û zêdebûn bi serê xwe dibe pirsgirêkeke gelekî mezin. Jixwe bi zindiyê tekşane jî piştrast bûye ku leza zêdebûnê bi asta paşvemayî ve têkildar e û her zêdehiyek di heman demê de mirinek e. Pirbûna fizîkî di tevahiya cureyên beridînê de xwedî maneyeke bi vî rengî ye. Hebûna bi mirin, yeqîn dike ku bi xwezêdekirinê wê karibe dewamî bijî, lê bi vê dixape. Xwe bi kopiyê xwe dewamkirin, dikare hewcedariya ewlebûnê û xwesteka tevlîbûna bêdawîbûnê razî û têr bike, lê jiyanê nake rastî û nake heqîqî.

Xulase, felsefeya jiyanê ya xwe disipêre zêdebûna bi jinê re maneyek xwe ya cidî nîn e. Di civaka çînî de bi sedema diyardeyên weke mîrate û bihêzbûnê mane li jina dizê bar kirine û ev jî maneyeke têkiliya xwe bi mêtinkarî û zordestiyê re heye û ji bo jinê negatîf e. Ango jina gelekî dizê ew jin e ku zû dimire. Eger kêm zayîn yan jî bi giştî pirsgirêka

pirbûna şêniyan li cem cinsê mirov hebe, hingê jiyaneke bi jinê re ya maneya wê gelekî payeberz bi jina hîç nazê re pêkan e. Gelên mêtingeh ên paşvemayî yên nikarîbûne weke civak û ferd xwe bi hêza polîtîk û entelektuel pêşde bibin, pirzarokanîn dikare ji bo wan weke xweparastinekê qîmeta xwe hebe. Ji bo pêşî li qirkirina xwe bigire, bi anîna gelek zarokan dewamkirina zuriyetê jî rêbazeke bersivdanê ya berxwedanê û dewamkirina hebûnê ye. Lê ev xweparastina wan civakan e ku şensê wan ê jiyaneke azad zêde nîn e. Lewma di civakên wisa de ku asta maneyê gelekî ketiye, bi jinê re jiyaneke li ser bingehê rast û estetîk mimkun nîn e. Rastiya civakên heyî yên dinyayê vê yekê piştrast dike. Jiyana bi jinê re di warê bergirî û xwe xwedîkirinê de aliyekî xwe yê xweser nîn e. Bergirî û xwe xwedîkirin ji bo her zindî û ruhberî heye. Zêde manedar nîn e ku mirov jiyana bê jin an jî bê mêr guftûgo bike. Di tevahiya jiyanên cot û fer de diyardeya nêrtî û mêtiyê heye. Ango pirsgirêk ne bi xwe bi hevjiyanê re, bi maneya wê re ya di civaka mirov de ye.

Şêwazê jiyana civaka mirov ne şêwazê zindî yan jî ruhberekî din e. Xwedî taybetiyên wisa ye ku dikare di nava xwe de û li ser xwezayê diyardeya hukimranî û desthilatdariyê pêş bixe. Çawa ku em di desthilatdariya dewleta netewe de dibînin, ji aliyê hejmar û naverokê ve li dû netewa bi hêz bazdan dikare dinya me ya jiyanê veguherîne qebra jiyanê. Li

vir rewşa çeloxwarî ji ber civakê ango civaka mêrê serwer pêk tê. Hegemonya mêrê serwer li ser jinê pêk tîne dinya me dixe rewşekê ku dike jiyan lê nebe. Ev encam jî ne bi beridîneke biyolojîk, lê bi desthilatdariya hegemonîk a bi serweriya mêr tê. Ango divê jiyana bi jinê re ji diyardeya desthilatdariya hegemonîk a bi serweriya mêr rizgar bibe. Jina ku jiyana wê di bin hukimraniyê de derbas dibe, bi zarokanînê mirovatî mîlyonan sal dewam kir, lê bi modernîteya kapîtalîst re ev xisleta wê ya zarokanînê bi awayekî îronîk dawiyê li jiyanê tîne. Jiyan bi jina di bin vê statuya heyî de nîşaneyên dawîhatina li jiyanê nîşan dide. Bêhejmar nîşaneyên vê rastiyê hene. Eger em wan rêz bikin:

a- Şênî bi qasî ku di vê dinya me de hilnayên zêde dibe û gihîştiye qonaxekê ku hebûna ruhber û zindiyên din jî dixe tehlûkeyê. Jiyaneke bi vî awayî bi wê jinê re ya di vê statuya heyî de, xwezayîbûn û ekolojiya jiyanê her roja derbas dibe bileztir dixe tehlûkeyê.

b- Dîsa ev jiyan di nava civakan de û li derveyî wan rê li ber tundiya desthilatdariyê ya bêsînor vedike. Asta milîtarîzm gihîştiyê vê rastiyê têra xwe piştrast dike.

c- Seksualîteya jinê bi awayekî xeternak tê bikaranîn û li ser vê zordestî û mêtinkariyeke xeternak hatiye pêşdebirin. Jiyan bi tevahî ji rê hatiye

derxistin, hema bêje bi jirêderketineke cinsî re ya ku xwe bêmane dubare dike, kirine yek.

d- Jina di civakê de kirine ne tiştek û pêjna wê nayê, kirine makîneyeke ku zuriyetê dewam bike, metayeke cinsî û hêza herî erzan a karkirinê. Mîna ku maneyeke wê ya din tune be.

e- Mîna ku li ser jinê qirkirineke çandî tê meşandin. Lê jin bi rola xwe ya seksualîte û dewamkirina zuriyetê weke endama artêşeke karkerên bêheqdest an jî bi heqdesteke erzan dixebite nirxekê îfade dike. Ji bo karibe xwe ji aliyê fizîkî, exlaqî û manewî ve biparêze ew ji hêza wê mehrûm kirine.

f- Di nava van faktoran de civakeke jinê di nav lepê jiyaneke bêmane de biperpitîne û binalîne, ew civak bi tenê dikare nexweş be. Jina bêmane wê civaka wê jî bêmane be.

Mirov dikare van nîşane û îşaretan zêdetir bike. Ev jî dide xuyakirin ku hevjiyana bi jinê re pêdiviya xwe bi awayekî eşkere û bi lez bi veguherîneke bingehîn heye. Bi jina bêparastin û bûye milk hevjiyana azad ne pêkan e. Ji aliyê exlaqî ve jî ev yek ne pêkan e. Ji ber ku kengî exlaq tê tunekirin koletî dikare pêk bê. Hemin em nikarin ji exlaqê hêzên hegemonîk re exlaq bibêjin. Hêza hegemonîk, di vê navberê de mêrtiya hegemonîk bi tenê bi hilweşîna exlaqê civakî re dikare pêk bê. Li gorî ku jiyan bê jin nabe, ji bo rizgarkirina jiyanê rizgariya jinê ferz dibe. Berevajiyê vê rastiyê jî rast e, bê mêr jî jiyan dibe, lê

ew jiyan jî bi koletî dibe. Ev vegotina me zêdetir der barê wê jinê de ye ku di nava avahiya civakî de ye. Pirsgirêka jinê di nava cîhana zîhniyetê û têkiliya wê de girîngtir dibe. Heta zîhniyeteke dijberê nîşaneyên neyênî yên der barê jinê de yên li jor hatin ravekirin bi awayekî serketî pêk neyên, bi giştî hevaltî (bihevrebûn), bi taybetî jî hevaltiya jiyana azad (bihevrebûna jiyana azad) pêk nayê. Ango weke teza dijber ji bo jiyaneke di asta hevaltiya azad a bi jinê re erkên divê bêne bicihanîn xulase mirov dikare wisa rêz bike:

a- Beriya her tiştî pêdivî bi têgîneke hevjiyana ekolojîk heye ku di bingehê wê de pirbûn û dewamkirina zuriyetê tune ye, li gorî îdeala mirovatiyê ya gerdûnî ye û hebûna zindiyên din jî li ber çavan digire. Asta gerdûnî ya ku civak gihîştiyê jiyaneke azad bi jinê re ferz dike. Sosyalîzma rastî bi tenê dikare li ser bingehê jiyaneke azad a bi jinê re bê avakirin. Ya sosyalîzm divê pêşî bike (ne ya paşî) ew e, divê ji sedî sed jiyana azad bi jinê re bigihîne astekê.

b- Ji bo vê jî divê mirov bi awayekî zîhnî û sazî li dijî desthilatdariya hegemonîk a mêrê serwer têbikoşe û di asta hevaltî û bihevrebûna azad de serketina têkoşîna zîhniyet û sazîbûnê misoger bike. Bêyî vê serketinê mirov nikare hevjiyana azad pêk bîne.

c- Jiyana bi jinê re divê tu carî weke dewamkirina xerîzeya cinsî û temendirêjiyê neyê şîrovekirinê. Çi şaristanî, çi jî modernîteya kapîtalîst

jiyana cinsiyetparêz a civakî gihandine asteke xeternak û heta ev jiyana cinsiyetparêz di tevahiya qadên zîhnî û sazî de neyê tesfiyekirin, bicihanîna hevjiyana azad ne pêkan e. Di nava paradîgma û wan saziyan de ku jinê weke diyardeyeke milk û objeyeke cinsî dibînin, jiyan ne bi tenê bêexlaqiyeke mezin e, di heman demê de şêwazê jiyanê yê herî şaş û kirêt e. Di nava van şert û mercan de mînakeke din a diyardeya civakî nîn e ku evqasî jinekê yan jî mêrekî biçûk bixîne û birizîne.

d- Kengî milk-kirina jinê hat redkirin, ji cinsiyetparêziya civakî ya tê bikaranîn bi temamî bê bihurîn, di her asta civakî de wekhevî (li ser bingehê cudatiyê wekhevî) pêk hat, hevjiyana azad bi jinê re pêkan e.

e- Kengî jin ji bo dewamkirina zuriyetê nebe amûr, nebe karker an jî bêkar, nebe karkereke erzan an jî bêheqdest, di her qadê de nebe meta bibe kirdar, hevjiyana azad pêre pêkan e.

f- Civak bi tenê di van şert û mercan de dikare li gorî hevjiyaneke azad be ango dikare ber bi civaka azad û ya xwedî şertên wekhev biberide.

g- Di nava şert û mercên erênî de hevjiyana azad bi jin û mêrên nirxê xwe yê mejî û avabûnê zêdekirî re pêkan e.

Divê mirov ji bîr neke ku şaristaniya hegemonîk û modernîte di berdêla înkara hevjiyana azad de pêk hatine. Ango şertê bivênevê yê eşqa civakî hevsenga

hêzê hem a mejî hem jî ya avabûnê di navbera jin û mêr de bê derfet bibe, eşq pêk nayê. Di nava şert û mercên zewacê de ku têkiliyên kolewarî yên civaka kole û jidestdana maneyê kêlî bi kêlî lê tên çêkirin, eşq pêk nayê. Ji ber vê yekê, kengî hevjiyana azad bêîmkan dibe bandora kujer a desthilatdariya hegemonîk û modern çêdibe. Lewma jiyana mirovatiyê ku ew weke mûcîzeyeke bi heybet qebûl kirî, nirxa xwe ya mûcîzewî û avzûnkirî ji dest dide, bi taybet ji bo jinê veguheriye felaketeke bi qehr û xwekuştinê. Divê mirov baş zanibe ku hevjiyana azad bi awayekî civakî hatiye avakirin. Ev jiyan di navbera nêr û mê de pêk nayê; di navbera jinîtî û mêrîtiya civakî ya avakirî de pêk tê. Divê neyê jibîrkirin ku avabûna hegemonîk her du cins jî seqet kirine, têkiliya di navbera wan de ji wê bi tesîr bûye û weke têkiliya hegemonîk xwe nîşan daye. Di têkiliya hegemonîk de eşq bi pêş nakeve. Di eşqa mirov de şertê bingehîn ew e, divê her du alî ango hev-alî xwedî îradeyên azad ên wekhev bin.

Ji ber ku şaristanî û modernîteyê hem bi jiyana îdeolojîk hegemonîk û hem jî bi ya bisazî didin qebûlkirin, tevahiya dîrokê mirov di mijara eşqê de timî di nava paradoksê de dimînin. Gelekî behsa eşqê tê kirin, lê pêk nayê. Wêjeya dinyayê hema bêje ji vegotinên trajîk ên eşqên pêk nayên pêk hatiye. Destanên dibêjin timî jin bûne sedema derketina şe-ran jî vê rastiyê piştrast dikin. Tevahiya şêweyên hunerî mîna ku mikurhatina li eşqa pêknehatî bin. Di

metnên dînî de jî têkiliyên xweda û xwedawendan, bi awayekî mîna berhemên kevn in ku ji xwestekên xurt ên yekalî yên pêk nehatine çêbûne. Sîstemên şaristaniyan hevjiyan weke qada 'jiyana taybet' pîroz kirine û ev jî hukmek e ku herî zêde heqîqeta civakî berepaş kiriye. Têkiliya di hevjiyanê de xwedî taybetiyên wisa ye ku ji binî ve bandorê li ser tevahiya têkiliyên civakî û gerdûnî dike. Ya rastî, gelemperî weke taybetî, taybetî jî weke gelemperî were fêmkirin wê bêhtir li xwezaya civakê were. Têkiliya hevjiyanê xwedî taybetiyên welê ye ku ji binî ve tesîrê li têkiliyên civakî û gerdûnî hemûyan dike. Durûtiya herî mezin a şaristaniyê ew e, ev têkiliya gerdûnî bi tenê weke têkiliyeke mahrem a dualî û taybet hesibandiye. Yek ji sedemên bingehîn ku hiştiye zanîna sosyolojîk bêqîmet û bêkêr were hesibandin ev e. "Jin mirov an dike fîlozof an jî dîn dike" ev gotina dibêjin a Sokrates e û gotina gelêrî ya dibêje "Jin mirovî dike wezîr jî, dike rezîl jî", dîsa bi vê gelemperiya rastî re têkildar in. Jixwe ji hev cudakirina qadên civakê weke 'taybet' û 'gelemperî' berevajîkirineke modernîteyê ye. Di civaka rastî de jihevcudakirinên bi vî rengî maneya xwe nîn in. Ya rast, jiyankirina şêweyên têkiliyê yên bingehîn û diyarker in.

Li ser navê jiyanê gava pêşî ya em biavêjin nava civaka mirov, divê der barê hevjiyana azad de be. Tu qada jiyanê bi qasî qada hevjiyana azad xwedî xisleta bingehîn û diyarker nîn e. Ekonomî û dewlet weke

têkiliya bingehîn têne hesibandin û ev fikreke sabit a sosyolojiya modernîteyê ye. Di encamê de ekonomî jî û dewlet jî navgînên hevjiyanê ne. Nabe ku hevjiyan bikevin xizmeta ekonomî, dewlet û olê. Berevajî, divê dewlet, ol û ekonomî bikevin xizmeta hevjiyanê. Lewma berevajiyê vê xwe li tevahiya sosyolojiya modernîteyê gerandiye.

Li gorî vê vegotinê hemûyî qada divê pêşî bi zanistî mirov pê dakeve, qada hevjiyanê ye. Mîtolojiya serdema destpêkê ya gelekî hov tê dîtin û ol timî ji vê qadê dest pê dikin û ev bêsedem nîn e, ji ber ku bi heqîqeta civakî re têkildar e. Hevjiyan, bi taybet zanista li dora jinê were pêşdebirin, wê bibe gava pêşî ya ber bi sosyolojiya rast ve bê avêtin. Ne bi tenê weke zanist di sosyolojiyê de, divê di tevahiya qadên hunerî û felsefî de gava pêşî di van têkiliyan de bê avêtin. Jixwe hewce nake ku mirov bibêje, ol û exlaq weke şaxekî felsefeyê divê pêşî di vê qadê de gavê biavêjin. Exlaq û ol têra xwe bi vê qadê ve xwe girêdane.

Weke encam mirov dikare bibêje, di serdema me de têkçûna hêzên mêtinkar û desthilatdariya hegemonîk herî zêde bi hilweşîna di warê hevjiyanê de xuya dike. Têkiliya jin û mêr ewqasî deklase bûye, maneya xwe ji dest daye, ne bêyî wê dibe ne bi wê dibe ango êdî li ber qedandinê ye. Yên şoreşa destpêkê nesipêrin analîza vê rewşa kaotîk, bêgav wê kaosê dewam bikin. Kesên şexsî yan jî kolektîf gavê diavêjin, eger vê qadê di warê zanistî, felsefî û hunerî de bikin

bingeh, bi tenê hingê dikarin ber bi hevjiyana azad ve gava xwe biavêjin. Ev gavên pêşî yên bêne avêtin, weke ku gelek caran yeqîn tê kirin, gavên taybet ên di navbera du kesan de têne avêtin nîn in, der barê civaka sosyalîst demokratîk a bê pêkanîn de gavên pêşî yên gerdûnî ne.

Sosyalîstbûn, beriya her tiştî di hevjiyanê de divê bi asta azadiyê re têkildar be. Divê mirov şêwazekî jiyanê bike bingeh, çawa ku pratîkên wê yên dijwar û bi pîvan di destpêka jiyana mîtolojiya kevn û dînî de dihatin dîtin. Kengî mirov karibe ji şêwazên jiyanê yên sîstemên şaristaniyê û modernîteya kapîtalîst ên mirovan kedî dikin bibihure, hingê dikare hevjiyana sosyalîstwarî ava bike. Tu têkiliya hevjiyanê bi seksualîteya banalîst a sîstemê re, bi lîstika malbatokê re, bi dewamkirina zuriyetê re û tevahiya temenekî bi 'serdanîna ser balgiyekê' re nîn e. Bi taybet tu eleqeya xwe bi têkiliyên cinsî re tune ye ku bi temamî bûne nexweşiyeke rojane. Jixwe li cem tu ruhber û zindiyekî din rojane têkiliya cinsî nîn e. Berevajî li cem zindiyên din ev li ser bingehekî demî pêk tê û ev jî piştrast dike ku têkiliya cinsî ya li cem mirovan bi şêwazekî civakî hatiye çêkirin. Di warê têkiliya cinsî de birçîbûn û dîsa di vî warî de sînor derbaskirin, têkiliya xwe bi desthilatdariya hegemonîk û avakirina şêweyê civakî re heye. Cinsiyetparêziya mêr a li ser jinê tê ferzkirin bi tevahiya şêweyên xwe weke desthilatdariyekê xwe diyar dike. Ev

cinsiyetparêzî mirovan bextewar nakin, bihêlin bextewarkirin û şadkirinê, berevajî bi temamî çavkaniyeke nexweşî û xemgîniyê, qedandin û mirina zû ne. Binyeya tu jin û mêrî bi têkiliya cinsî ya cinsiyetparêziyeke bi vî rengî re li hev nake. Bi taybet cinsiyetparêziya ku kapîtalîzm bi reklamkariya jinê gij dike, bi temamî têkiliya xwe bi hegemonya îdeolojîk re heye û bi vê jî qanûna kara herî zêde pratîk dike. Mirov dikare bibêje, tu têkiliya civakî bi qasî cinsiyetparêziyê nikare sîstemê hilgire. Lewma ji bo mirov karibe bibe antî-kapîtalîst divê karibe vî şêwazê jiyanê yê cinsiyetparêz red bike û jê bibihure.

Di têkiliyên hevjiyanê de asta bê pêkanîn çiqasî zanistî, hunerî û felsefî be, ewqasî jî wê gavavêtina jiyana sosyalîst pêkan be. Ji bo sosyalîzmê, beriya her tiştî pêkanîna têkiliyên hevjiyanê, ji aliyê pratîk û prensîb ve nirxek xwe heye, mirov nikare jê bimîne. Ji bilî vî şêwazê têkiliyê, rêyeke din nîn e ku mirovî bibe sosyalîzmê. Eger têkiliyên bi vî rengî hebin jî wê neyekser bin û li şaşiyan vekirî bin. Divê mirov têkiliyên hevjiyanê weke têkiliyên di navbera du kesan de fêm neke. Fêmkirineke bi vî rengî kêm e. Bêguman têkiliyên dualî yên hevjiyanê dikarin pêk bên, lê bi tenê bi vê yekê bê fêmkirin rast nîn e. Hevjiyan bi hêzeke mezin a manedan, estetîk û exlaqê pêk tê, ji dualîbûnê şûştî ye û bêhtir jiyaneke bi xwe û cewherî ye.

Jin û mêrên bi jiyana sosyalîst ve girêdayî, kengî jiyana azad bi awayekî gerdûnî û kolektîf pêk anîn, dikarin û şensê wan heye bi awayekî taybet jî rast û xweşik bijîn. Mirov dikare di tevahiya tevgerên mezin ên civakî yên dîrokê de vê rastiyê bibîne. Gelekî girîng e ku mirov jiyana taybet bi lîstikên zewacê û ji wê zêdetir neyênî bi şêweyên li derveyî zewacê re tevlîhev neke.

Di jiyana fer û taybet de tevahiya potansiyela kolektîf û gerdûnî ya civakî veşartiye. Lê di şêweyên taybet ên kedîkirin û malbatê yên şaristanî û modernîteyê de gerdûnîtî û kolektîvîte têne înkarkirin. Mirov heta nikaribe vê yekê ji hev cuda bike, nikare jiyana azad a taybet a sosyalîstwarî pêk bîne. Di çarçoveya têkiliya sosyalîst de mêr û bi taybet jî jin a bi zanistî, estetîk, exlaqî û felsefî rabe dibe xwedî hêzeke mezin a balkêşiyê. Kesayetên jin û mêrên bi vî rengî, li hemberî jiyana civakî têk naçin, berevajî bi hebûna xwe jiyana civakî ya azad ava dikin. Ji ber ku di vê cotbûna feran de bi hev ewlebûn û hurmet serdest e, cih ji nexweşiyên sîstemê yên mîna hesûdî, kaprîs, çilekî, têrnebûn û bêzarkirinê re nîn e. Ji ber ku hevdu nakin milk, yek li hemberî yê din bi îdeaya heq (di hiqûqa bûrjûwa de ev heye) ranabe. Hêza wan a manedanê ya di weznekê de dikare li cem kesekê/î yekparebûnê, di yekparebûnê de jî kesekê/î pêk bîne.

Tevgerên civaka dîrokî bi tenê bi kesayetên wisa manedar bûne, bi ser dikevin. Kesayetên bi vî rengî divê timî weke sosyalîst bêne zanîn, bîranîn û bendewariya wan bê kirin.

Ji bo pêşketina civaka sosyalîst, di warê pêkanîna teoriya hevjiyana azad de hin tecrûbeyên dîrokî hene, girîng in ku mirov wan li ber çav bigire. Xiristiyantiyê di vê babetê de jiyana rahib û rahîbeyan weke şert danîbû pêşiya kadroyên xwe. Di pêşdeçûna şaristaniya Rojava de roleke girîng a vê pêkanînê heye. Xiristiyantiyê neyêniyên civaka cinsiyetparêz bi vê pêkanîna kadroyî gelekî bi sînor kir. Ji ber ku zexta cinsî ya li ser zîhniyeta rûhî gem kiriye di pêşdebirina civakbûnê de bi roleke girîng rabûye. Lê nikarîbûye rê li ber pêşketina diyalektîkî ya hevjiyana azad gengaz dike veke; li hemberî wê weke reaksiyon cinsiyetparêziya civakî ya modernîteya kapîtalîst serî rakiriye. Hevjiyana bi yek kesî re ya milkperestiya modern, rê li ber peydabûna şêwazekî jiyanê yê dijberê çanda rahib û rahîbeyan, seriyekî duyemîn ango duqutbûnê vekiriye. Di bingehê pêxîrtengiya jiyana modern a yekhevalî de çanda rahib û rahîbeyan a Xiristiyantiyê heye. Ji bo ji civaka cinsiyetparêz bê bihurîn her du çand jî xetimî mane. Di binê pêxîrtengiya çanda cinsiyetparêz a civaka Rojava de ev rastî veşartî ye.

Der barê çareseriya mijarê de Îslam jî bi ser neketiye. Berevajî jiyana rahib û rahîbeyan Îslamê jî

girîngî bi têrbûna têkiliya cinsî daye û yeqîn kiriye ku wê bi zewaca bi gelek jinan û jinên di statuya cariyeyan de pirsgirêkê çareser bike. Di Îslamê de pêkanîna hareman bi awayekî bi rola kerxaneya taybetîkirî radibe. Ji kerxaneyê cudabûna wê ew e, bi taybetî ji bo hinan e. Bi xwe di navbera her duyan de tu cudahî nîn e. Ev pêkanîna cinsiyetparêziya civakî bi roleke diyarker rabûye ku civaka Rojhilat li gorî civaka Rojava paş bikeve. Ji ber ku Xiristiyantiyê cinsiyetparêzî bi gem kir rê li ber modernîteyê vekir, lê ji ber ku Îslamê dilçûna zêde ya cinsiyetparêz teşwîq kir, di vê mijarê de ji rewşa civaka kevn zêdetir paşve ket û kir ku li hemberî civaka modernîteya Rojava têk biçe. Di têkçûna jin û mêrê Rojhilat li hemberî jin û mêrê Rojava de rola cinsiyetparêziya civakî gelekî girîng e. Ji texmînan wêdetir bandora cinsiyetparêziyê li ser pêşketina civakî heye. Civaka Rojhilat û Rojava gelekî ji hev cuda bûn. Di vê de rola cinsiyetparêziya civakî gelek e. Lewma divê mirov baş li ser vê xalê raweste. Têgihîştina Îslamê ya cinsiyetparêziyê, çi di girankirina kolekirina jinê de, çi jî di desthilatdarkirina mêr de, li gorî şaristaniya Rojava rê li ber encamên zêdetir neyênî vekiriye.

Dema ku mirov pratîka hevjiyana azad pêş bixe, hin xusûsên girîng hene ku divê jin û mêr ji alî û bereyê xwe ve hay ji wan hebin. Jina ku şensê wê ji bo hevjiyana azad heye yan jî dixwaze bibe xwedî vî şensî

xusûsên berê pêşî divê guh bidiyê û bi cih bîne, mirov dikare wisa rêz bike:

a- Dema ku jin bi mêr re hewl da seksualîteyê parve bike, divê hay ji xwe hebe ev bi tenê bi tatmînkarî û xwetêrkirineke biyolojîk bi sînor nîn e, divê berê pêşî zanibe ku ev dişibe wê rewşê, mîna ku bi piling re di qefesa wî de razê, bi penceke hêz û desthilatdariyê re rûbirû be. Bi taybet di rewşeke mîna rewşa esaretê û birçîbûnê ya piling di qefesê de, dikare bike ku mêr pencên xwe bêhtir bi kujerî bi kar bîne. Divê jin baş pê zanibe carekê bi têkiliya zewacê ya klasîk ket qefesê ew êdî bi hêsanî sax ji wir dernakeve; berdêla ketina qefesê yan wê bi canê xwe bide yan jî wê bibe mêpilingeke dîlbûyî. Tîpa ku bûye mêpiling jina bûye mêr temsîl dike, gelekî kirêt û keraxî ye. Têkiliya cinsî ya di navbera mêrê hegemonîk û jina mêroke ya bi temamî teslîmbûyî de di pêkhatina vê kirêtî û rezîliyê de bi rola sereke radibe. Roja mêr jinê ji keçikanî dixin wê rojê serbilind in, di binê vê de tatmîn û têrbûna cinsî (diyardeya biyolojîk) nîn e, ji ber ku di vê têkiliyê de têkiliya desthilatdar-kole pêk hatiye mêr serbilind e. Kengî jin ji keçikaniyê tê xistin, ev ji bo wê dibe destpêka koletiyeke bêsînor. Rê li ber hisa efendiyê desthilatdar vedike û ev jî tê wê maneyê ku ji mêraniya xwe piştrast bûye. Paşê ev rêbaz li ser lawikan tê ceribandin. Saziya koletiyê li ser her du cinsan jî hat pêkanîn. Jin bi qasî mêr li pey têkiliya cinsî naçe û ev jî

têkiliya xwe bi saziya koletiyê re heye. Çalakiya têkiliya cinsî ya ku moderníteya kapîtalîst ew bêsînor zêde kiriye, amûrekî koletiyê ye ku bi awayekî herî berfireh li ser cinsê mirov hatiye ferzkirin; bêsînor derfet dide desthilatdarî û mêtinkariyê. Gelekî girîng û manedar e ku piraniya olan bi guman nêzî vê têkiliyê bûne, ji ber ku kirêt e, mirov dixe û rê li ber neheqîqetê vedike.

b- Jin nebûbe keseke zewacê, divê ji bîr neke ku di her qada civaka mêrê serwer de mîna mêr ê bi psîkolojiya pilingekî her kêlî xwe çeng bike ser nêçîra xwe tevbigere, lewma divê ew jî şêwazê tevgera xwe li gorî vê pêk bîne. Piling kengî firsendê bibîne ango di vê mijarê de kengî astengekî civakî yê karibe jê bibihure derkeve pêşiyê, wê pencekî xwe biavêje jinê. Mêrê desthilatdar di vê kêliyê de wê tu sedema exlaqî û wijdanî nas neke û wê bixwaze jinê bike nêçîra xwe. Ne sergirtina olî, ne jî hiqûq li pêşiya vê nikare bibe asteng. Divê jin bi vê rewşê zanibe û wisa derkeve qada civakî, ya rastî, ewlehiyeke xweparastinê nebe divê jin danekeve qadên civakî yên xirûxalî û kes lê tunebe.

c- Divê jin ji bîr neke ku hedefa bingehîn a moderníteya kapîtalîst ew e, jinê bike koleyeke modern, bi taybet vê jî hem bi rêbazên hişk ên hêza pere û desthilatdariyê îfade dikin, hem jî di serî de wêje bi rêbazên nerm ên hêza hunerê nîşan didin pêk tîne. Moderníte li hemberî jinê, çi bi rêbazên pere û

desthilatdariyê, çi jî bi gelek sozên ji bo eşqê dide, di wê pozîsyonê de ye ku ji mêrê civaka berê qatbiqat zêdetir bi hêza êrîşê rabe. Li hemberî hêza xeternak a mêrê serwer pere û eşqê, gera jinê ya li jiyana azad ji xeyaleke tewş wêdetir tu maneya xwe nîn e. Herçiqasî bi tevahî bi duristî û tevgerên xwe yên xweşik nêzik bibe û li pey hevjiyana azad biçe jî jin li hemberî mêrê modernîteya heyî nikare xwe ji têkçûnê rizgar bike. Ango her rê wê bibe koletiya jinê ya modern.

d- Eger jin tevî vê civaka mêrê serwer hemûyî di azadmayînê de israr bike, hingê divê yan xwe li jiyaneke tenêbûna wê mezin an jî li zehmetiyên milîtaniyek e ku her kêliya wê bi têkoşîna sosyalîstiyê tijî derbas dibe, ragire. Tenêtî ji bo rewşên marjînal e. Jiyana sosyalîst jî jiyaneke xwedawendan a di hemtayê çanda xwedawendên berê de ferz dike. Divê neyê jibîrkirin ku yek ji taybetiyên xwedawendan ew bû ku bi mirovên mêr re nedizewicîn. Lê kengî mêr bû xweda, em ji dîrokê dizanin ku ji xwedawendan zêde tiştek nema. Ya ji jinê re dimîne melekbûn e. Lê jina bûye melek jî jina hinekî hêza xwe ya cins wenda kiriye temsîl dike. Jineke bi vî rengî, di civakê de ji rola qasidbûnê wêdetir tu rola wê namîne. Di mîtolojiyê de fîgurên Înanna û Afrodît îmgeya jineke cudatir e. Rûyekî jinê yê xweşikiya xwe, balkêşiya xwe ya cinsî û hêza xwe ya bedenî hê ji dest nedaye temsîl dike. Înanna-Afrodît weke Xwedawenda Eşqê hêmana hevjiyanê ya lê bigere, ew hêman e ku karibe

hevjiyana azad pêre parve bike. Divê baş were fêmkirin ku bi piranî hêmanekî bi vî rengî bi tenê nîv-xweda û nîv-mirovekî mêr ê mîna Prometheûs e. Di dîrokê de û di roja me ya îro de ev hêman an jî bi piranî mêr, mirov bi tenê dikare weke fîgurekê tesewir bike. Bi şerekî dûrî aqilan mirov dikare wî berbiçav bike. Jin heta xwedayên bêmaske yên xwe bi hêzên xeternak ên modernîteya kapîtalîst gurçûpêç kirine têk nebe nikare xwe pêk bîne. Ev berbiçavkirineke zor e, lê bêîmkan nîne. Sosyalîstbûn, hinekî jî bi berbiçavkirina îmaja Înanna-Afrodît û Prometheûs pêkan e.

Ji bo mêrekî li pey hevjiyana azad diçe, xusûsên berê pêşî divê pêk bîne mirov dikare xulase weha bîne ziman:

a- Ev mêr jina derkeve pêşberî wî, divê baş zanibe ku di bin şaristaniya pênc hezar salî û hegemonya wê ya kapîtalîst a pêncsed salî de li her cure şertên koletiyê hatiye gerandin. Çareyeke bi tenê ya vê jinê heye, li hemberî mêrê bûye piling bibe mêpiling. Stratejî û kêlî bi kêlî taktîkên jiyana wê bi tevahî li ser vî bingehî hatine avakirin. Eger em mijarê berevajî bixwînin, ew jî li gorî xwe xwediyê qefesekê ye, li hevalmêrekî digere ji bo bixe hundirê wê. Eger mêr li pey hevjiyaneke azad be, rizgarbûna ji stratejî û taktîkên jineke bi vî rengî herî kêm bi qasî yên jina kole zor in. Jineke bi vî rengî, bi stratejî û taktîkên xwe koletiyê ferz dike, lewma mêrekî sosyalîst ê li pey

hevjiyaneke azad berê pêşî divê li vê qadê têbikoşe û heta li vê qadê bi ser nekeve nikare ji bo têkoşîna civaka sosyalîst gavê biavêje.

b- Mêrekî ji bo zewacê givrokî bûbe, divê zanibe ku herî kêm bi qasî jinê ketiye bin bandora saziya koletiyê. Ji bo ev mêr ji bandorên wê yên neyênî bibihure divê di mekanê malê de timî li pey jiyana sosyalîst bibeze. Bi jina kole re jiyan bi koletî dibe, çewt dibe. Ji bo mirov karibe ji çanda mala giştî (kerxaneyê) ya taybetî bûye bibihure, divê mirov karibe bibe xwediyê çanda hevjiyana azad.

c- Li dijî çanda cinsiyetparêz a modernîteya kapîtalîst ku mirovan ji rê derdixe, divê mirov timî û bi awayekî serketî bi nefsa xwe re şer bike. Stratejî û taktîkên ji bo teslîmgirtina mêr hatine pêşxistin herî kêm bi qasî dîltiya jinê, mêr diqedînin. Divê mirov ji bîr neke ku di modernîteya kapîtalîst de mêr ji aliyekî ve bi tenê weke mêrtiya biyolojîk hatiye nepixandin û zêde mezinkirin, li aliyê din jî ew bi tevahiya çanda wî ya civakî kirine jinkok û pîrek. Mêrê biyolojîk ê zêde cinsiyetparêz ji aliyekî ve dikin piling, li aliyê din jî bi çanda jinkokiyê (jina kolebûyî) wî dikin mîna pisîkekê. Heta ku ev mêrtiya modernîte ferz dike neyê hilweşandin, mirov nikare bibe sosyalîst û nikare ji bo civaka sosyalîst têbikoşe.

d- Tevî van hêmanên neyênî gişan jî ji bo hevjiyana azad herî kêm bi qasî têkoşîna jina azad têkoşîna mêrê azad jî divê. Ji bo mêrtiyeke azad, divê

mirov karibe ji kesayeta mêrê ku civaka mêrê serwer ew kiriye kole, bibihure. Di rastiya me ya civakî de hê jî ariftî heye û divê mirov karibe xwe bigihîne wê mertebeyê. “Mirov weke mêr ji diya xwe nabe, mirov paşê dibe mêr” di çarçoveya vê gotinê de mirov dikare bibêje, mirov weke mêrê şaristaniyê bê dinê jî mirov dikare bibe mêrê azad. Forma mêrtiya Prometheûsî di serdema me de mirov bi tenê dikare bi zanist, felsefe û hunerê modernîteya demokratîk berbiçav bike. Divê mirov bi girîngî fêm bike ku mîtolojî, ol, felsefe, zanist û huner ji bo jiyanê ne û rola wan a sereke pêkanîna hevserî û hevaltiya azad e û di vê çarçoveyê de divê mirov wan exlaqî û estetîk bike. Zewacên hemdem ên heyî dewama çanda xanedaniya hiyarerşîk in. Ev çand bi qasî heft hezar salan temenê xwe heye. Li qada vê çandê nirxên bingehîn ên civaka dewletdar têne çêkirin û destavêtinê weke norm û namûsê bi kesayetên mêr û jin didin qebûlkirin. Ji ber ku ev çanda destavêtinê ya bi armanca desthilatdarî û mêtinkariyê li kesayetan bar dikin, eşq pêk nayê, gelek jin û mêr hevdu berdidin û malbat ji hev belav dibin. Li dijî vê çanda destavêtinê, mirov dikare civaka sosyalîst û azad, bi kesayetên kêlî bi kêlî bi felsefe, zanist, etîk û estetîkê têne barkirin, pêk bîne. Eşkere ye ku hevjiyana azad a li ser vî bingehî çêbibe, wê her tim ji bo ferd û civakê rê li ber xweşikî, rastî û qenciyê veke.

Jiyana bi heybet û mûcîzewî ya ku modernîteya kapîtalîst ew hilweşandiye, em dikarin wê bi tenê bi hevjiyana azad, kesayeta wê ya sosyalîst û têkoşîna wê ya civakî bi dest bixin û parve bikin. Ji bo vê jî divê mirov ji zarokatiyê dest pê bike, bi taybet jî keçikan di saziyên modernîteya demokratîk de bi zîhniyeta azad perwerde bike û bi têkoşîna civakî ya sosyalîst demokratîk praktîze bike û vê yekê weke şêwazê jiyanê bipejirîne, viya azad bike û bi ser bixe.

Di vê mijarê de pirseke din a bersiva wê gelekî tê meraqkirin şêwazê min ê jiyana bi jinê re ye. Jiyan bi jinê re çawa dibe? Min bersiva vê pirsê jî di cildan hemûyan de car caran da. Bi taybet di şert û mercên modernîteyê de jiyan bi jinê re gelekî girîng e. Ev pirsgirêkeke welê ye, bi awayê em keçekê bixwazin, li keçekê bigerin û bixapînin, bi mala 'giştî' [kerxane] an bi mala 'taybet', bi pirzarok an jî bêzarok çareser nabe. Ji bo mirov vê pirsgirêka stûna navmalê ya dil û mejiyê pirsgirêkên civakî ye çareser bike, divê bi awayekî bingehîn bi zanistî, felsefî, etîk û estetîk nêzî meseleyê bibe. Di serdema me de, ji bo hevjiyana azad bi jinê re di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de berpirsiyarî û hêzeke mezin a zanistî, felsefî, etîk û estetîk divê. Mirov heta statuya jinê ya di dîroka şaristaniyê de û di serdema modern de nizanibe û nebe xwedî wê hêzê ku karibe helwesteke etîk û estetîk nîşan bide, pêre kîjan bihevrebûnê biceribîne

bila biceribîne, her jiyana bi wê re wê bi şaşîtî, bêexlaqtî û kirêtiyê bi encam bibe.

Ji bo mirov jiyanê têk nebe, şert e ku beriya her tiştî jiyana bi jinê re bi awayên rast, bi exlaq û estetîk (bi awayê xweşik) pêk bîne. Di şexsiyeta jinê de bi tevahî şêweyên koletiyê hatine ceribandin û pê dane qebûlkirin. Lewma ji bo mirov bibe mêrê rast, bi exlaq û xweşik şertê pêşî ew e, divê mirov vê nasnameya jinê ji hev derxe, bike hevrê û hevjînê doza azadî û wekheviyê. Eger rêzên parêznameya min ên têkildarî mijarê rast bên xwendin, wê baştir bê fêmkirin ka çima ez girîngiyê didim şêweyê jiyanê yê bi vî rengî û weke pîvan ferz dikim. Exlaqê şaristaniyê yê di çarçoveya desthilatdariya modernîteyê de têkiliya cinsî ya cinsiyetparêz a bi maneya ‘min karê wê temam kir’ ferz dike (şêweyekî welê yê têkiliyê ye, têkiliya cinsî ya biyolojîk jî ji rê destxistiye) û ev şêwazê jiyanê yê paşvemayî bêexlaqî û kirêtiyeke mezin diafirîne. Eger şerê min ê mezin ku min li dijî vê meşandiye û encamên wê rast bên fêmkirin, jiyan ê bi jinê re bêhtir bi exlaq û xweşik bibe. Ji bo vê jî her mêr û jina ji berpirsiyariyê para xwe girtî, bi taybet ji bo jin bi hêz û azad bibe, li tevahiya qadên civakî bibe xwediyê heman giraniyê divê pratîk û nêzikatiyên zanistî, felsefî, etîk û estetîk her tim pêşde bibe û bi rêxistin bike, li zîhniyet û saziyên neteweya demokratîk bi cih bike.

Em dizanin ku di jiyana zindî û ruhberan de sê fonksiyonên bingehîn hene. Ev, xwe xwedîkirin, parastina hebûna xwe û dewamkirina zuriyeta xwe ye. Em dema behsa jiyana zindî û ruhberan dikin mebesta me bi tenê yekeyên biyolojîk nîn in, her hebûna gerdûnî li gorî xwe xwedî fonksiyonên zindîtiyê yên bi heman rengî ne. Ev fonksiyonên bingehîn li cem mirov gihîştine asteke cuda. Li cem civaka mirov rasyonalîte gihîştiye asteke welê ya pêşketinê, eger mirov serê xwe jê neêşîne, dibe ku hebûna tevahî zindiyên din bi dawî bike. Eger gerdûna biyolojîk di astekê de bê rawestandin, jixwe domnedarkirina cinsê mirov ê bi xwe pêk bê. Ev paradokseke cidî ye. Cinsê mirov ê ji niha ve hejmara wî ji heft mîlyaran bihuriye bi vê lezê pirbûna wî dewam bike, di demeke pir kin de wê ji wê asta biyolojîk bibihure û domnedarkirina jiyana mirov ê derkeve holê. Tişta rê li ber vê vedike, rasyonalîteya mirov e. Ango heman rasyonalîte, berî ku mirov bigihîje wê asta biyolojîk, divê pir zêdebûnê rawestîne. Pirbûn û heyîn bûyereke xerîb e. Makîneyek e ku em dikarin jêre aqlê xwezayê bibêjin, timî bi roleke hevsengê radibe û hevsenga di navbera heyîn û pirbûnê de pêk tîne. Lê rasyonalîteya mirov cara pêşî ye ku li ber vê mekanîzmeya hevsengê radibe. Ya rastî, têgîna xwedabûnê jî ji vê rasyonalîteyê derketiye holê. Mirovê di rasyonalîteyê de sînor nas nake xweda ye. Taybetiyên rasyonel ên

mirov rê li ber avakirina xwedayan, olan û sîstemên din ên afirîner vekirine.

Yekşaneyê li dijî tunebûnê xwe yekser bi dabeşkirinê pir kiriye û ev ji bo domdarkirina jiyanê tê fêmkirin. Xerîzeya pirbûnê ya li cem her yekeya zindî heta bi mirovî xwesteka jiyanê ya bêserûbinî îfade dike. Xwesteka ji bo jiyana bêserûbinî xwestekeke welê ye ku mirov lê serwext nebûye; qabîliyeta lê serwextbûnê jî gelekî bi sînor e. Gelo divê mirov li vê xwesteka jiyanê serwext bibe yan na, ev jî bi xwe guftogoyeke din e. Lê kengî mirov li xwesteka jiyanê serwext bibe, wê fêm bike ku bi dewamkirina zuriyetê xwe nagihîne maneya jiyanê. Jiyana kesekî û mîlyonan kesî yek e. Pirbûn hem jiyanê manedar nake, hem jî dikare hêza bîrewerî û serwextiyê jî berevajî û lawaz bike. Bêguman mirov der barê wê de serwext bibe, di gerdûnê de bûyereke harîqa ye. Bê sedem navnasa xwedatiyê li mirov nehatiye kirin. Piştî ku der barê xwe de gihîşt hêza serwextbûnê, nabe ku ji bo mirov pirsa bingehîn dewamkirina zuriyetê be. Mirovê bîrewer û serwextbûyî zuriyetê dewam bike, ne bi tenê hevsengê li dijî tevahiya zindiyan xira dike, hêza bîreweriyê ya mirov jî dixe tehlûkeyê. Bi kurtî, nabe ku mirovê serwextbûyî derdê wî yê sereke dewamkirina zuriyetê be. Xweza di mirov de gihîştiye asteke welê ku dewamkirina zuriyetê ji bo wî êdî pirsgirêk nîn e. Mirov dikare bibêje, çawa ku li cem her zindiyî dewamkirina zuriyetê baqî ye, wê li cem

mirov jî baqî be û wê her wisa dewam bike. Rast e. Lê ev xerîzeyek e ku bi hêza serwextbûnê re dikeve nakokiyê. Ango divê mirov pêşî cih bide serwextbûn û bîreweriyê. Eger bi qasî ku em pê dizanin gerdûn di heqê xwe de cara pêşî li cem mirov gihîştibe asta herî jor a hêza xwenaskirinê, hingê divê mirov pê gelekî bi heyecan bibe ango belkî fêmkirina gerdûnê maneya rastî ya jiyanê be. Ev jî tê wê maneyê ku mirov ji xeleka jiyan û mirinê ya timî li dora xwe dizîvire dibihure, ma mirov dikare ji vê mezintir li coş û cejneke xweserî mirov bifikire. Ev bi awayekî, Nîrwana ye, Fenafîlah e, xwe gihandina bîreweriya mutleq e, ji vê wêdetir ne maneya jiyanê dimîne, ne jî hewcedarî bi şadûmaniyê!

Mirov dibîne di civaka kurd de jiyan herî zêde li dora diyardeya jinê nayê hiştin û tê tunekirin. Di çandeke civakî de ku navê jin û jiyanê bi awayekî rastî dike yek (peyvên weke jin, jiyan, can, şen û cîhanê timî ji yek kokê zêde bûne û hemû jî rastiya jin û jiyanê îfade dikin), di jinê de jiyan tê tunekirin û ev jî nîşaneya sereke ye ku civakîbûn tê qedandin. Ji çandeke bingehê şaristaniyê li dora jinê daniye û rê li ber çanda xwedawendiyê vekirî tişta mayî ew e, der barê jiyana bi jinê re çavkoriyeke mezin û çilekiyeke teslîmî xerîzeyan bûyî heye. Jiyana civakî ya di nava pencê modernîteya kapîtalîst de ya li pey kevneşopî, îmha û înkarê diçe, jiyanek e ku bi temamî mehkûmî neçariya jinê hatiye kirin. Têgihîştina li namûsê ya

xwe disipêre jinê mîna çepera dawî ya parastinê be, rewşeke ji maneya xwe ya rastî nomosê (nomos = pîvan an qanûn) dûrketinê îfade dike. Bi rengekî pir dijwar namûsparêziya jinê kirin, bênamûsiyeke civakî ya pir dijwar îfade dike. Ji namûsa civakê, ango ji nirxên bingehîn ên ku wê li piya dihêlin çiqasî dûr ketibe an jî hatibe dûrxistin, di rewşeke welê de be, ew qasî ji bo jinê namûsparêzî bi temamî paradoksek e.

Kengî namûsa civaka xwe ji dest dan, kurdan bîr nebir ku wê namûsa jinê jî nikaribin biparêzin û ev bi tenê ne cehalet e, di heman demê de li ser navê exlaqê bêexlaqî ye. Têgihîştina namûsê ya di bin navê namûsa jinê de dixwazin li ser piyan bigirin mêrê kurd ê ji aliyê exlaqî û polîtîk ve qediyayî ye û ev hewldana mêr a îspatkirina hêza xwe ya li ser koletiya jinê ye. Êşa serdestiya biyaniyan a li ser wî û civaka wî dixwaze di serê jinê de ku di bin destê wî de ye, derxe. Bi awayekî xwe terapî dike. Eşkere ye ku li gelemperiya dinyayê koletiya jinê giran e, lê belkî bi qasî ku li tu devera dinyayê nebe, statuya jina kurd di koletiyeke pir giran de ye. Di civaka kurd de bi giştî bûyera pirzarokanînê rûyekî din ê vê rastiyê ye. Cehalet û tunebûna azadiyê, di civakên bi heman rengî de jî ji bo dewamkirina hebûna xwe weke çareya bi tenê yan jî ji ber bêçaretiyê pir zarokan çêdikin. Di her civaka ji bîreweriyê mehrûm de diyardeya pêk tê ev e. Paradoks di vir de ye, ji ber ku xwexwedîkirin û ewlekarî tune ye, pirzarokanîn rê li ber pirsgirêkên

mezin vedike. Bêkarî weke aşûta ji serê çiyê bê xwarê mezin dibe. Jixwe sîstema karê ya kapîtalîst vê hejmara zêde ya mirovan dixwaze da ku koletiya bi heqdestekî kêm bimeşîne. Kevneşopiya şaristaniyê û modernîte milên xwe didin hev û tevahiya hilweşîneriya xwe li ser jinê bi vî awayî pêk tînin.

A) Jina azadbûyî civaka azadbûyî ye.

Em timî dibêjin, kengî jin û jiyan ji jinbûn û jiyanbûnê derketin şert û mercên civakbûnê jî hildiweşin û ji hev de dikevin. Hêmanên em dikarin ji wan re şoreş, partiya şoreşger, pêşeng û mîlîtan bibêjin, eger vê rastiyê ji hev dernexin û nekin ser riya azadiyê wê nikaribin bi rola xwe rabin. Kesên bi xwe bûbin girêka kor wê nikaribin girêka kor ên kesên din ji hev vekin. Ango kesên xwe azad nekiribin wê nikaribin kesên din azad bikin. Yek ji encamên girîng ên PKK û şerê gel ê şoreşgerî di vê mijarê de gihîştiyê ew e, azadî û rizgariya civakê bi analîzkirin, rizgarkirin û azadkirina diyardeya jinê dibe. Lê çawa ku me diyar kir, mêrê kurd jî namûsa xwe ya gelekî hatiye berevajîkirin an jî bi awayekî zanistî bi danasîneke rastir bênamûsiya xwe di serweriya mutleq a li ser jinê de dibîne. Ya bi awayekî bingehîn divê ji hev bê derxistin ev nakokiya no û dijwar e.

Ji ber ku di beşên beriya vê de me behsa hewldanên bi vî rengî kiribû, em ê dubare nekin. Li ser

riya avakirina neteweya demokratîk li ber rohniya vê ezmûnê tiştên heta niha li ser navê namûsê hatine kirin, berevajiyê tiştên diviyabû bihatina kirin in. Ez behsa mêrtiyeke kurd a berepaşkirî ango hinekî jî behsa xwe dikim. Ew jî divê wisa be: Divê em têgihîştina xwe ya milkiyetê ya li ser jinê bi temamî biterikînin. Jin bi tenê û bi tenê divê ya xwe be (xwebûn). Heta divê wer zanibe ku bê xwedî ye, bi tenê xwediyê wê ew bi xwe ye. Eşq, hezkirina çavkorî jî di navê de divê em bi tu hesta girêdanê bi jinê ve neyên girêdan. Bi heman awayî divê jin jî xwe bi kesî ve girê nede û kesî neke xwediyê xwe. Şertê pêşî yê şoreşgertî û mîlîtantiyê divê bi vî awayî be. Kesên bi awayekî serketî ji vê ezmûnê bibihurin, bi awayekî di kesayeta xwe de azadî pêk anîne, lewma bi vê kesayeta xwe ya azadbûyî dikarin dest bi avakirina neteweya demokratîk û civaka nû bikin.

Tam jî di vê nuqteyê de em xwe digihînin danasîna rast a eşqê. Kengî ew kesê nikare hilweşîn û jihevdeketina civaka xwe rawestîne, ji namûsê ango bi awayekî zanistî û rast ji bênamûsiya ku li dora jinê bi dualî hatiye çêkirin dest bikişîne û bi awayekî mîlîtanî xwe li avakirina neteweya demokratîk rakişîne dikare xwe bigihîne maneya wê ya civakî û pir zor be jî wê xwe bigihîne potansiyela pêkhatina eşqê.

Di pêvajoya netewebûyînê de azadbûyîna jinê gelekî girîng e. Jina azadbûyî civaka azadbûyî ye. Civaka azadbûyî jî neteweya demokratîk e. Me behsa

girîngiya şoreşgerî ya berevajîkirina rola mêr kiribû. Maneya vê ew e, li şûna ku li ser jinê serwer bibe û zuriyetê bi jinê dewam bike, netewebûyîna demokratîk bi hêza xwe dewam bike û ji bo vê hêza îdeolojîk û rêxistinî pêk bîne û otorîteya xwe ya polîtîk serwer bike; bi awayekî îdeolojîk û polîtîk xwe çêke. Ji pirbûna bi fizîkî zêdetir divê bi hêzbûna zîhnî û ruhî bê xurtkirin. Ev rastî xwezaya eşqa civakî pêk tînin. Ji sedî sed divê mirov eşqê weke hevhestyariya di navbera du kesan de û cazîbeya cinsî nebîne. Heta divê mirov bi ber bayê xweşikiyên şiklî yên maneya wan a çandî tune ye jî nekeve. Modernîteya kapîtalîst sîstemek e ku li ser înkara eşqê hatiye avakirin. Înkara civakê, harkirina ferdiyetê, ketina cinsiyetparêziyê ya her qadê, xwedakirina pere, li şûna Xwedê danîna dewleta netewe, weke xebatkareke bêheqdest an jî ya bi heqdestê herî kêm bi nasnamekirina jinê înkara bingehê madî ya eşqê ye jî.

Divê mirov xwezaya jinê baş nas bike. Eger mirov seksualîteya jinê bi awayekî biyolojîk balkêş bibîne û li ser vî bingehî nêzî wê bibe û têkiliyê pêre deyne, ev ji serî ve têkçûna eşqê ye. Em çawa ku ji bihevrebûnên biyolojîk ên ji cureyê zindiyên din re nikarin bibêjin eşq, em ji bihevrebûnên mirov ên biyolojîk ên li ser bingehê cinsî re jî nikarin eşq bibêjin. Em ji vê re dikarin bibêjin fonksiyona normal a zêdebûna zindiyan. Ji bo vê fonksiyonê hewcedarî bi mirovbûnê jî tune ye. Jixwe heywan-mirov vê

fonksiyonê bi hêsanî bi cih tînin. Yên eşqa rastî dixwazin, divê vî şêweyê zêdebûnê yê heywan-mirov biterikînin. Em çiqasî karibin jinê weke objeyeke cazîbeyê ya cinsî nebînin, em ê ewqasî karibin jinê bikin hevrê û dosteke hêja. Hevrêtî û dostaniya bi jinê re ya ji cinsiyetparêziyê bihurî têkiliya herî bi hêz e. Bi jinê re di şertên hevjiyana azad de jî divê di bingehê têkiliyan de avakirina civakê û neteweya demokratîk hebe. Em divê mîna di modernîteyê de û di nava sînorên kevneşopiyê de jinê di rola hevser, dayik, xuşk û evîndarê de nebînin û ji vê bibihurin. Beriya her tiştî divê em têkiliyên mirovan ên bi hêz ku xwe disipêrin avakeriya civakê û yekîtiya maneyê serdest bikin. Jinek an jî mêrek dema hewce kir divê dest ji hevsera xwe, ji zarokê xwe, ji dayika xwe, ji bavê xwe û ji evîndara xwe bikişîne, lê divê ji rola xwe ya exlaqî û polîtîk a di civakê de tu carî dest nekişîne. Mêrê bi hêz tu carî li ber jinê nagere, li pey wê naçe, jêre dijûnan nade, lê nade û hesûdiya wê nake. Hevsera wî û evîndara wî be jî dema bixwaze jê veqete divê destê xwe nediyê, topizka xwe jî lê nede. Heta, heke hebin, piştî ku rexneyên xwe lê kirin, wê pêre alîkar be da ku weke dixwaze bijî. Eger dixwaze bi jinê re têkiliyeke bingehê wê yê îdeolojîk û civakî bi hêz pêk bîne, divê tercîhê û pirsê ji jinê re bihêle. Asta azadiya jinê, tercîha wê û kêrhatina tevgerê ya bi hêza wê çiqasî bi pêş ketibe, jiyaneke bêhtir manedar û xweş pêre dibe.

Di şertên roja me ya îro de hevjiyana azad a herî îdeal a mêr û jinê, di rastiya me ya civakî de kengî xebatên zehmet ên avakirina neteweya demokratîk bi serketinên mezin pêk hatin, dikare pêk bê. Li Kurdistana roja me ya îro di rastiya civakî de diyalektîka eşqeke manedar divê bi giranî platonîk be û bi vî awayî pêk bê. Ev eşq hêja ye. Eşqa platonîk eşqa fikir û çalakiyê ye. Lewma hêja ye. Her tim bi jina herî bedew a dinyayê re mayîn eşq nîn e. Jixwe ji ber ku eşq nîn e, piştî bihevrebûneke demkin durûtî wê xwe nîşan bidin. Ji ber ku bi awayekî bêmane ev têkilî çêbûye yan li ser bingehê têkiliyeke cinsî hatiye danîn. Li hemberî vê di pratîka PKK û KCK'ê de koleyên doh gelek jin û mêrên tu carî li cem hev bi hev re nebûne, di avakirina neteweya demokratîk a gelê xwe de hemûyan bi hev re bi eşqeke platonîk karên mezin bi ser xistin û îspat kirin ka çiqasî kesayetên bi hêz in jî. Di vê mijarê de bi sedan nirxên me, şehîdên qehreman hene. Ev qehremanên mezin in ku bi ser ketine bibin Mem û Zîn.

Ez bi vê wesîleyê divê ezmûn û tecrûbeyên xwe weke deynekî bînim ziman. Bi qasî ku tê bîra min, dema ez zarok bûm, min di lîstikên xwe yên pêşî de hebûna keçikan weke pêdiviyeke azadiyê hesibandibû. Xuşkên min jî di navê de, di tevahiya pêvajoyên zewacan de mîna min ew hemû ji dest dabin hestek li cem min çêdibû. Jixwe kengî ez hinekî mezin bûm û min exlaqê namûsê yê hişk ê civakê dît, min xwe bi

tevahî vekişand. Lê ev xwe vekişandina min bi awayekî dilê min bimîne û bişikêm nebû. Min hêdî hêdî fêm dikir ku me jin ji mêj ve wenda kirine. Ez ji statuya jin û mêran a hatibû avakirin hîç razî nebûm. Min her tim şik û guman dikir ku ev statu li ser şaşiyan hatiye avakirin. Statuyek bû ku min nikarîbû qebûl bikim. Di çarçoveya vê statuyê de daxwaza min a bi jinê re bim hîç çênebû. Ez yeqîn dikim ku diya min li vê rewşê zû hayil bûbû û ji min re weha gotibû; “Bi vî halê xwe tu nikarî bi jinê re bibî.” Bi rastî min tu carî nexwest jineke min hebe. Min bixwesta jî min hîç nizanîbû ez ê çawa bi jinê re bijîm. Ez her ku mezin bûm, ez bûm mîna zarokekî mezin. Mêrê li ber serê min her yek ji wan bûbûn mîna gurê jinan. Lê ez weke kesekî belengaz mabûm. Xeyal û meyal eleqeya jinan a ji bo min tê bîra min. Ez yeqîn dikim ku wan ez weke ‘bûyereke bêhêvî’ didîtim. Ya rastî, ez weke tebayekî şîrîn, lê ne li gorî demê didîtim û welê didan hiskirin. Di demekê de ku her kes ji xwe re li mêrekî, li evîndarekî digeriya, ez di van mijaran de bêhnçikandî bûbûm. Eşqa min ji bo tiştên din ên weke eşqa xweda jî tune bû. Eleqeya min a bi tenê ji bo heval û hogirên baş bû.

Beriya ku ez behsa bûyera zewaca xwe ya ji nişkê ve ya pûç bikim, divê ez bibêjim, eleqeyên min ên mirov wan weke eşqa platonîk bi nav bike, hebûn. Ez her ku li wê bedewiya xwedayî ya li cem jinê hayil dibûm, jê bi tesîr dibûm. Lê ji bo ku ez vê ji aliyê din re

bibêjim ne xwesteka min û ne jî hêza min hebû. Min di bingehê vê eşqa platonîk de timî welatê ji dest çûyî, Kurdistan, nasname û kurdê wendabûyî didît. Li gorî min, yên welat û nasnameya xwe wendabûyî eşqa wan bi hêz, bi xwestek û bi îrade pêk nayê. Mixabin û cihê xemê ye ku ev tespîta min rast bû. Ez bibêjim di bingehê zewaca min a pûç û bi tehlûke de hest tunebûn wê derew be. Eger ez bibêjim bi tenê bi armancên polîtîk bû, ez ê durûtiyê bikim. Hest jî û armancên polîtîk jî hebûn. Ez nizanim wê berê li derî da yan jî min lê da. Ez bibêjim xweber çêbû ew jî ne realîst e. Li gorî min ravekirina vê têkiliyê bi tenê ew e, eşqa welatê ji destçûyî û eşqa nasnameya civakî ya wendabûyî pêk nayê. Bûyerên diqewimîn jî ev piştrast dikin. Ew sal ji wan salan bûn ku têde eşq tu carî pêk nedihat. Jixwe muzîka Aram a min bihîst jî behsa vê nemumkiniyê dikir. Bi hêrseke mezin a ji ber di van şertan de pêknehatina eşqê, min xwe li avakirina PKK'ê û şerê gel ê şoreşgerî rakişand û ez dikarim bibêjim, di vê hewldana min de rola vê mijarê hebû. Dema ku gelek jin tevlî xebata min bûn, ya me bi wan re dikir eşqa kolektîf bû. Şert û merc ji bo eşqa ferdî tune bûn. Ji bilî min di nava PKK'ê de û li derveyî PKK'ê gelek kesan eşqa ferdî ceribandin û min bi xwe newêrîbû ez bikevim nav hewldaneke bi vî rengî. Dîsa tirsonekiyê ez zevt kiribûm. Ya rastî, ez timî li ser nemimkuniya eşqên bi vî rengî difikirîm. Ev fikra min jî rast bû. Wan deman ez timî li 'bûka axê' difikirîm. Di

fikra min de tu carî cihê fikra ‘bûka min’ tune bû. Bi sedan keçên ji min wêrektir, bedewtir û zîrektir hebûn. Beşekî mezin ji wan bûn şehîd. Min timî xwest bi wan bidim hiskirin ku ez ê wan im. Lê ev hewldaneke badilhewa û tewş bû.

Di rewşên bi vî rengî de divê li cem ferd, hêmanên eşqê di azadkirina welatekî de, di rizgarkirina netewe û civakekê de bêne temsîlkirin. Ji bo vê jî gelek şerên polîtîk û eskerî divên; hêzeke zêde ya îdeolojîk û exlaqî divê. Herweha bêparmayîna ji estetîkê û bedewiyê qebûl nake. Kesên bi îdîaya eşqa platonîk radibin dema bixwazin eşqa xwe taybetî bikin û bi awayekî berbiçav pêk bînin, divê bersiva van şert û mercan hemûyan bidin. Eger hêza wan ji bo van şertan têrê neke yan divê eşqa xwe ya platonîk dewam bikin, yan jî hêza wan têra vê jî neke û nikaribin maneyê bidinê, hingê wê bikevin zewacên modernîte û şaristaniyê (kevneşopiyê) ku di wan de pîvanên biyolojîk an jî bihevrebûnên cinsî yên koledar serdest in. Eşqa azad bi zewacên biyolojîk-koledar an jî têkiliyên li derveyî zewacê li cem hev nabin. Qanûnên eşqê xwe li têkiliyên bi vî rengî ranagirin.

Ez ji şehîdên me yên mezin ên jin, ji wan nirxên payebilind hîn bûm ku jin hebûneke bi nirx e. Tişta bi wan pêk hat, belkî jî bi wan eşqa welatê ji destçûyî û nasnameya civakî ya wendabûyî ji nû ve bi awayekî azad hat bidestxistin. Jixwe ev jî eşqeke gelekî hêja, mezin û heqîqî bû. Eşqeke welê bû ku xayîn û durûyên

wê gelek bûn û bi vî awayî min jî bîranîna Mem û Zînê hem zindî kir û hem jî pêk anî.